

LÊKOLÎN

Li ser romana kurdî

Weşanên



Înstîtûta Kurdî
ji bo lêkolîn û zanist

Lêkolîn

Kovara Înstîtûta Kurdî ji bo lêkolîn û zanist-Hejmar 16-Payîz 2010

Berpirsiyarê giştî
Fehmî Balayî

Edîtor
Fevzi Özmen

Redaksiyon
Fevzi Özmen

Mîzanpaj
Fevzi Özmen

Vogelsangerstr 10
50823 Köln

Tel.: 00 49-0221.16 89 62 17

institutakurdi@yahoo.de
www.institutakurdi.com

Tekiliya Bank: Sparkasse KölnBonn,
Konto-Nr.: 190 128 4743
BLZ.: 370 501 98

Înstîtûta Kurdî
ISBN: 3-930943- 59 - X

NAVEROK

I.	<i>Pêşgotin</i>	5
II.	<i>Hevpeyvîn</i> Medenî Ferho	25
III.	<i>Hevpeyvîn</i> Loqman Polat	41
IV.	<i>Gotar</i> Helîm Yusiv	51
V.	<i>Hevpeyvîn</i> Fêgîn Melîk Aykoç	79
VI.	<i>Hevpeyvîn</i> Adîl Zozanî	86
VII.	<i>Hevpeyvîn</i> Ömer Dilsoz	93
VIII.	<i>Hevpeyvîn</i> Diyar Bohtî	100
IX.	<i>Hevpeyvîn</i> Yaqob Tilêrmenî	106
X.	<i>Hevpeyvîn</i> Hesenê Metê	111
XI.	<i>Hevpeyvîn</i> Perwîz Cihanî	114
XII.	<i>Hevpeyvîn</i> Tengezar Marînî	125
XIII.	<i>Gotar</i> Loqman Polat	131
XIV.	<i>Gotar</i> Mihemed Çelkî	136
XV.	<i>Gotar</i> Îbrahim Seydo Aydogan	141

Peşgotina Înstîtuyê

Jiyana bê hûner rij e

Jiyan ne bi tenê şer û berxwedan e, herwiha ne bi tenê xwarin, vexwarin û xew e jî.

Gelek caran hewcedariya însên bi guhdarîkirina çîrokeke xweş, xwendina romanekê, temaşekirina fîlmekî, şanoyekê, guhdarkirina parçemuzîkekê û hwd. jî çêdibe.

Jiyaneke biwate, dewlemend, bisewiye, bitehm û layiqê navê jiyanê, bê pirtûk, bê wêje, bê muzîk û hûner nabe.

Carna mirov bêhnek û çend kêliyan be jî dixwaze ji nav teqûreqa serêşên jiyana rojane derkeve, bêhna xwe hinekî berde, wensa xwe bîne û de-meke aram, bê stres derbas bike, biçe cîhaneke din, xwe bi nav xeyalan de berde, "çend bêhnekan ji felekê bidize".

Di demên wiha de, wêje û edebiyat, hûner û muzîk bi hewara mirov de tên.

Şovalyên zemanê xwe, kubar û hezjixwekirî ji devê gerok û çîrokbêjan li destanên kevin, destanên qehremanî û evînan, li helbestên şaîran guhdarî dikirin.

Guhdarîkirinê, hewcedariyên wan yên rûhî dikewandin, di vî alî de valahiyên çêdibûn dadigirtin, taqet û hewesa jiyanê binûve fikir li ba wan.

Tebeqe û komelanên xelkê jî li meydana û li gasînan şano temaşe dikirin, li ode û dîwanxaneyan li çîrokan, fabl û stranên corecor guhdarî dikirin.

Li Ewropa şaîrên sazband û ozan di nav şatoyan û xelkê de diçûn û dihatin, xelk diwenisandin, kêfxeş û dilşa dikirin. Qirdik û qerfvanan xelk dikenandin, ji west û betla karên giran dadiweşandin, dilên wan avreşandî dikirin.

Berî televîzyonên îro derkevin, xelkê westa xwe di ode û dîwanxaneyan de bi riya wêjeya devkî, stranên dengbêjan, dengbêjên mîna Evdalê Zeynikê, Şakiro, Semawî, Fermanê Buroyê Kîkî, Birê Fermano û Hwd. dia-

nîn.

Kurt û kin, ji roja mirovayetî pêde bûye û bi vir de, tim ademîzad li rê û rêbazekî derxistina bêhna xwe, anîna westa xwe û ji bo buhurandina wexteke xweş fikiriye, afrêneriya xwe bi kar aniye û di sedsal û hezar-salan de, ev profesyoneltiya wêjeyî, kulturî ku îro ewçendî bi şax û per bûye, bêsekin bikar aniye.

Wêje; devkî û nivîskî

Dema mirov bixwaze li ser wêjeya neteweyekî lêkolînekê bike, berî her tiştî mirov serî li berhem û çavkaniyên devkî û nivîskî dide.

Di vî alî de wêjeya kurdan ya devkî dewlemend e, kevin e, bi şax û per e, ji efsane û mîtolojiyên çendamarî, çendrengî, ji diyardeyên astrolojîk, kozmografîk, ji destanên mîna Gilgamêş, Mem û Zînê, Xecê û Siyamed, Zembîlfîroş û hwd. bixwedî dibe.

Heçî wêjeya Kurdî ya nivîskî ye, ne dewlemend be jî, dînamîk e, ciwan e, xwedî îdîa û hewildar e.

Temenê helbestê ne di bin hezar salan re û yên pexşanê û rojnamgeriyê jî di ser sed û pêncî û di ser sed û diwanzde salan re ne.

Sedemên dewlemendnebûna wêjeya nivîskî tîen zanîn. Gilalekirinek:

1. Statuya Kurdan ku dirêjayî û dewama perçebûneke çendcarî ye û di asta yekem de qedexeyîyên ji bo Zimanê Kurdî ku bi taybetî sedsala dawî li gora perçan hinekî bê guhertin jî, heta tu bêjî bes, pêsîr li peyv û gotina kurdî teng kiriye û wêjeya bi vî zimanî xistiye asêgehê.
2. Nivîsandin şiklek şahid bû, ne li xêra xwediyê xwe bû. Bi nisbet welatên din yên cîhanê em rewşeke bervaja û bi nakok dibînin. Bi giştî rûmet û payeyeke nivîskariyê heye, belê li Kurdistanê bervaja nivîskar ji ber zimanê nivîskariya xwe dihate cezakirin.
3. Enstîtû, pirtûkxane û çapxaneyên Kurdan dereng ji diya xwe bûn, yên hebûn jî lewaz bûn. Îmkanên madî tîen nedikirin. Em zanin bê ka Mîqdat û Evdirehman çendî li vî alî û li wî alî ketine da ku rojnameya xwe biweşînin. Rewşa Celadet, Kovara wî Hawar û coreyê fînan-sekirina wê jî tîen zanîn.
4. Wêje û bi taybetî jî roman, zimanekî dewlemend û bihêz dixwaze. Zimanê Kurdî mabû di gundan de. Li her aliyê cîhanê navendên ziman bajar in, ziman li bajaran bi pêş dikeve, bihêz û dewlemend dibe. Bajarên ne di destên Kurdan de binecîhên bajêr asimîle dikirin û girêdayê vê coxrafya Zimanê Kurdî, çendî sal dubhurîn, ewçendî

tengtir dibû. Alfebe jî pirsgirêkek bû, ne yek çendek hebûn; kirîlî, aramî-erebî û latînî.

5. Tiştê dihate nivîsandin jî ne her bi tenê kêmbû, belê bi sed dijiwarîyan piştî ku çap dibû jî, ne dighişt xwendevanên kurd. Romana Erebe Şemo piştî derketina xwe bi 40-50 salan hê nû dighe destên beşek ji xwendevanên Kurd, yê Rehîmê Qazî û gelek nivîskarên din jî wiha.
6. Wekî din pirsgirêkên zaravan û hemfêmkirinê jî hebûn.

Wêje, çavkaniya xwenaskirinê ye

Ji bo em xwe nas bikin em kî ne, çi ne, doh çi bûn, em ji ku hatine, piştî me li ku ye, li cîhekî çawa ye ? Ji bo bersiva van pirsan pêwîst e em dîrok, kultur û wêjeya xwe nas bikin.

Stendhal gelekî di cihê xwe de û bi îsabet gotiye: wêje awêne û neynikeke gerok e ku civat xwe tê re dibîne.

Bi her şaxên xwe wêje; bi helbest, çîrok, roman, şano û Hwd. ji her şaxekî din yê hûnerê zêdetir serçaviyeke ku azadiyê dixwaze, di nav şert, merc û li ser zemînên azad bi pêş dikeve.

Gava li ser ziman û wêjeyê zilim û qedexeyî hebin, ji ziman û hûnerê re sînor bêne danîn, ziman nebe zimanê xwendinê, perwerdê, zimanê sûk û bazarê, zimanê birêvebirinê, zimanê zanist û keşfan û dawîya dawî zimanê wêjeyê, ew ziman bi pêş nakeve û di nav zeman de dimire, wînda dibe, nimûneyên wiha hene û ne kêmbûn.

Wêje mana li jiyanê ye, nîşan û delîla herî xwurt e ji bo man û nemana neteweyekî, qelsî û xwirtiya wî.

Di wêjeyê de temenê netewe dirêj dibe, dîrok, rabûn û rûniştina netewe, karakter û tîpên wî nemir dibin, arşîv dibin.

Mirov dikare ji çend alîyan de dîrok û rewşa wêjeya kurdî bigre dest, nîqaş bike. Heger ji awira lêkolîn û gotarên li ser wêjeya kurdî mirov dest pê bike, divê mirov bêje ku xebatên di vî alî de hatine kirin, gotar û lêkolînên di malper û di medya Kurdî de cîh girtine, digrin, têne weşandin, ne hindik in. Ji bo mirov bibe xwedî fikrekê têr dikin.

Li teniştêke din, îro di kitêbxaneyên me de hejmarek lêkolîn hene bi vî zaravayî yan jî bi zaravayê din.

Wek, Dîroka Edebiyata Kurdî ji Prof. Qanadê Kurdo, Antolojiya Feqî Huseyn Sagniç, du cildên Mehmet Uzun, Antolojiya Çîrokên Kurdî ji Firat Cewerî, Berhemên Ferhad Şakelî li ser Dîroka Çîrokên Başûr,

xebatên Elaedîn Secadî, Xelîl Dihokî û Hwd.

Yanî em di vî alî de zêde ne xezan û ne bêreferens in. Li ber destên me û bi awayekî mirov bi hesanî kare xwe bighîne wan serçavî hene.

Ji wêjeya kurdî çend bêhnek:

Dîroka wêjeya kurdî têra xwe kevin e. Behsa zemanekî bi qasî hezar salan dibe. Di vê derbarê de li ser tekst, nivîskar û berhemên ewil dîtî hene.

Li gora dîtina serdest û pişta xwe dide qebûla piraniya kesên pêwendîdar, Baba Tahirê Uryan di destpêka vê eniyê de cîh digre.

Ango, ber bi doh de şopên wêjeya kurdî heta bi Baba Tahirê Hemedanî diçin û ji wir û pêde bi kêmanî ji bo îro êdî şopa bi nivîskî nexwiya dibe.

Em dibêjin ji bo îro, ji ber ku lêgerînên di nav Kurdistan de, tim îmkan û mecala Kurd, tiştekî nû tap bikin, li belge û dokûmanên hene dokûmaneke din zêde bikin, li belgeyeke nû rast bîn û ev jî bibe faktorê guherîna dîtî û encamên qebûlbar, tim heye.

Naxwe ji bo îro em vê bêjin ku xebat, beyt û xezelên Baba Tahir, wek yê ewil û ew jî mîna şair û nivîskarê destpêkê qebûl dibe.

Ji xwe piraniya antolojiyên hene jî bi vî pîrê wêjeya me dikevin rê, wî dîkin bismilaha sedsalên bi dû xwe de.

Ev jî çend sed salan piştî hatina îslamîyetê ye. Jê û wîrdetir bi nivîskî tiştek heye tune ye naye zanîn.

Li gora Celadet Bedirxan, “ji eserên beriya îslamê hesêb tiştek nemaye. Piştî îslamîyetê ji nav Kurdistan gelek şair, edîb û peyayên zane rabûne. Lê eserên xwe bi piranî bi Erebî, bi Farisî an bi Tirkî nivîsandine û ji wan mîlet û edebiyata wan re xizmet kirine. Herçî şairên Tirkan yê mezin yê ko serê Tirkan bilind dîkin Nabî, Nefhî û Fizûlî hersê jî kurmanç in” (Hawar hej.33.)

Baba Tahirê pêşeng

Em kurt be jî hinekî Baba Tahirê Uryan yan jî Hemedanî nas bikin, Baba Tahir ji Hemedanê ye.

Li gora aghdariyên berdest û gelek ji wan jî rîwayet in, di nav salên 928-940 î de ji diya xwe bûye. Sala 1010’an jî miriye. Ji bo çima navê wî bû ye Baba Tahirê Uryan hin dîtî hene.

“Baba” ji ber ku mezin û rêberê Terîqeta Ehlil heq e.”Uryan” ji ber ku tu pûte û nîrx nedaye bi kincan û lixwekirinê.

Ew bi vî awayê xwe dişîbiya Diyojenesê navdar. Diyojenesê, li ser gotina Skenderê Meqedonî ka ew jê çî dixwaze, bersiva wî kurt û hişk e: „Ez ji te tişteki naxwazim, xwe ji ber tava min bide alî!“

Diyalokeke ne dûr ji ya di nav Skender û Diyojenes de, di nav Baba Tahir û Ertugrul Begê Selçûkî de jî derbas dibe.

Baba Tahir di nav kurdên Ehlil Heq de mîna pêxemberekî ye. Bi taybetî ev bahwerî di nav Kurdên Rojhilat de; li herêmên Senendej, Hemedan, Loristan û Îlamê zêde ye.

Helbestên Baba Tahir di nav Yarsaniyan de wek beyt û sirûd hatine xwendin û xwediyê popûlarîte û pîroziyeke payebilind in.

Baba Tahir li ser sal û sedsalên piştî xwe bandêreke şopdiyar hiştiye. Kesên Kurd mîna Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran, Farisên mîna Omer Xeyam, Mewlana Celaleddînê Romî, Yunus Emre, Ehmed Yadewî di bin bandêra wî de mane.

Ji sala 1444'an û pêde destnivîsên beyt û xezelên wî pêde dibin. Li Tehran, Stenbol û li Ewropa, li Rûsya hatine çapkirin, zêdekirin û parastin.

Cara dawî du beytên Baba Tahir bi wergera Sabah Kara sala 1998'an di bin navê Weşanên Nûbihar de hatin çapkirin.

Ew yekemîn şairê Kurd e ku helbestên wî gihiştine me. Ew ji bo wêjeya kurdî „hîmeke xurt, bingeheke qewîn, kokeke neriz e“.

Û piştre

Sedsalên piştî Baba Tahir hejmarek nav derdikevin pêş. Wek Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Melayê Batê, Ehmedê Xanî, Ismailê Bazîdî, Şerefhanê Heqarî, Miradxanê Bazîdî û Hwd.

Ev şair giş ji medresan derketine û bi xwe jî bi giranî dersdarên medreseyan in. Wan perwerdeya xwe bi Farisî û Erebî dîtine, belê bi kurdî nivîsandine.

Herwiha ev şair bi giştî ji tesewufê tî, xwendayên serdema tesewufê ne. Di sedsalên jiyanên wan de tesewîf serdest e, wek beşek ji kilasîkên me tîne binavkirin.

Helbet ev divê bê gotin ku rola nivîskarên kilasîk û zimanê nivîskî xwediyê rol û girîngiyeke bînaqas e.

Ji bo ku Zimanê Kurdî bibe zimanekî zindî, berz û entelektuelî van kilasîkan xebatên hêja kirine.

Wan asta ziman rakirine, ziman ji asta zimanê rojane derxistine, kirine zimanekî wêjeyî û nivîskî. Zimanek bi nivîsandinê dikeve ser riya standardîzebûnê.

Zimanê nivîskî gava ewil û herî saxlem e, ber bi zimanekî neteweyî, berz û akademîk de.

Em dikarin ji vê qonaxê re qonaxa yekemîn ya kilasîkên kurdî bêjin. Bi xetên stûr ev qonax heta bi salên piştî 1800'î û derketina Mele Mehmûdê Beyazidî fera giran e, di mêzênê de.

Berî Mele Mehmûdê Beyazidî gelek şair û nivîskar derdikevin. Em li vir pêwist nabînin yeko yeko behsa jîyan û berhemên wan bikin. Ev ne armanca vê pêşgotinê ye.

Em dê bi kurtî behsa du kesan ji wan bikin. Ew jî Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî ne.

Jixwepîştrast û bixwebahwerê kurd, Melayê Cizîrî

Melayê Cizîrî, di nav salên 1570-1640'î de jiyay e. Jiyanek ku li zemanê Mîr Şerefxanê duhem rast tê.

Têkiliyên Cizîrî û Mîr baş in, ewçendî ku di nav goristana malbata Mîr de hatiye gorkirin ku ne bûn û nimûneyeke ji rêzê ye.

Ev hinekî payeya Lordiyê li Ingilîstanê tîne bîra mirov. Kesê vê payeyê digre derdikeve kategoriyeke din ya civakê. Wek nimûne gurûbê salên 60 û 70'î Beatles ku ev paye girt li Ingilîstanê.

Di dema feqetî û şagirtiya xwe de Cizîrî di nav Amed û Colemêrgê de çûye û hatiye, li Medresa Sora navdar li Cizîrê, li der û dora Amedê û li Eskîfê ders dane.

Li gora Ferhad Şakelî ji % 70-80 yê nivîskarên kilasîk di bin bandêra Melayê Cizîrî de mane. Feqe û şagirtan dîwana wî wek ders xwendine, qesîdeyên wî di nav xelkê de belabûne, hatine jiberkirin, di dîwanxane, mizgeft û hucreyên feqiyên Kurdistanê de olan dane.

Li ser Mîr helbest nivîsandine, wî jî mîna Ehmedê Xanî xwe ji siltan û deshelatdarên Faris û Osmanî dûr girtiye.

Bi giranî helbestên wî li ser evîna xwedayî ne. Di dîwana wî de navê Selma ku derbas dibe li gora hinek lêkolînerên Kurd mîna Jan Dost, navekî sembolîk e û di cîhana îslamî de şairên heman nav bikar anîne zehf in, ango ev nav hevbeş e, yê cara ewil bikar tîne ne Cizîrî ye, berî wî jî

şairên Erebb û Faris bikar anîne.

Cizîrî çend ziman zanîbûn û ji helbestên wî derdikeve ku mirovekî kûr û bikapasîte ye, serdestê dem û wêjeya hevçerxên xwe ye.

Destnivîsên dîwana Cizîrî, gelekî belabûne, bi riya şagirt û medreseyan Kurdistanê hatine parastin.

Di nav xelkê de li ser Mela gelek çîrok û efsane hene. Ji awira hûnerê, hêza bikaranîna Zimanê Kurdî û metaforan de Cizîrî xwurt e.

Bandêra şairên Faris û bi taybetî Hafîz û Seedî li ser Cizîrî diyar e, têra xwe xwurt e. Belê di nav salan de ewçendî Cizîrî mentehî, bixwe û hêza xwe ya hûnerî bahwer dibe ku di helbesteke xwe de bêje:

Dev ji Hafîz û Sadî berdin werin helbestên Cizîrî bixwînin. Çend alim, kesayetî û siyasatmedarên kurd jî di mesela bahweriya bi xwe de, ev şopa Cizîrî her yekî bi awayê xwe û dema cihê wê hatiye di konteksteke din de binûvekirine, domandine.

Çend nimûne:

1. Me ji navserên Kurdan bihîstîye ku rojekê li goristaneke Şamê alimekî Kurd û yekî Erebb dikevin qirika hev. Yê Erebb li cîhekî hêrs dibe û ji yê kurd re „ji kurdan welî çênabin“ dibêje. Hê gotina wî di devê wî de ye ji gorekê ji yê di bin çengên yê Erebb de lingek ji gorê bilind dibe û pê re jî qîrek: **”kî dibêje ji kurdan welî dernakevin.”**
2. Nimûneyeke din ya Ehmedê Xanî ye dema dibêje Kurd ne bêmarîfet û ne bêkitêb in, ew xwedî hûner û îrfan in.
3. Nivîsa Seîdê Kurdî li ser deriyê otêla Beyazida Stenbolê ku bi xwe lê dimîne jî bi heman bahweriya Cizîrî hatiye gotin : **”Li vir pîrs nayên kirin, bersiva pîrsan tê dayîn.”**
4. Ê dawî nivîsa li ser deriyê Akademiya Mehsûm Korkmaz hatiye nivîsandin jî hêjayê binavkirinê ye: **”li vir ne bêhnîk, belê dîrok tê analîzkirin û jihevderxistin.”**

Mêjiyê neteweyî Ehmedê Xanî:

Di sedsala jiyana Xanî de zimanên serdest sê heb bûn: Erebbî ku zimanê pîroz, zimanê quranê bû, Farisî ku zimanê edebiyatê, destan û şehnameya Firdewsî bû û dawî jî Osmanî ku zimanê Fizûlî, Nefî û Baqî û giş şairên desthelatdariyê bûn.

Xanî bi van hersê zimanan jî zanîbû, belê bi kurdî nivîsand, ala kurdî

rakir. Bi berhemên xwe, bi Memûzîna xwe, qalibên kevin, serdest û degel şikenandin, guh neda bendên wan, bi xwe û hêza zimanê xwe bahwer bû, berê keleka xwe da jor, da ya dijar û dîrokî.

Wî binmaye û „girika binê piyalê neda bi şerbeta xelkê“. Ne xwe kêmi kesî qebûl kir û ne jî gel û zimanê xwe.

Wî ji bo Zimanê Kurdî esasek danî. Bi xwe gotiye min zaravayên kurdî tîkel kirin. Naxwe yekemîn hewildarê standardîzekirina Zimanê Kurdî ye Xanî.

Helbet berî Xanî jî ciwamêrên bi kurdî nîvisandin hebûn, ev tî zanîn. Belê naverok, mesaj, bang, şîret, pêşniyaz, rêpêşanderî û awe û şeweyê destavêtina pîrsgirêkên civaka kurdî, riyên çareseriyê, enerjî, navtêdan û hêza di berhemên Xanî de, Xwedê heye, îro dinya sibe axret e, cihê ye û çendqatan di ser yê Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Eliyê Herîrî re ne.

Xanî serwest û şarezayê zemanê xwe, dil û mêjiyê Kurdên bindest, şûrkêş û betlê siberoj û diwarojê bû.

Ji roja hazir zêdetir ew, sal û sedsalên piştî difikirî, dûrbîn û pêşbîn bû, anten û frekansên wî nadir, nişmî û xweser bûn. Rehên wî kûr, damarên wî zerdeştîyane, çendçiqulî û zêdeşaxî bûn.

Ew bi qasî ilmê olî û tesewufa îslamê, ewçendî jî haydarê felsefeya Yewnaniya kevin bû. Mirovekî mentehî, geryayî, dinyadîtî, bi gotineke hedefbîntir, qudbê zemanê xwe û qonaxên piştî bû, tovekî zexim û hestep bû, zêrekî helandî, kapasîteyê çargurçikî, ji weqî û ji rîtîlê bû.

Kurd çendî bi Xanî serbilind bin, mafê wan e, hêja ye. Ew mîna Shakespeare, Firdewsî û Fizûliyê ye. Mem û Zîna wî jî ne kêmi Romeo û Juliye, Leyla û Mecnûn û Şehnameya wan e. Ji bo me gelekî ji wan binirxtir e û di serwaretir e.

Tiştê ji bo Xanî gerek bêne gotin ne bi tenê ev çend tişt in. Xanî bi Mem û Zîna xwe projeya wêjeyê berz û bilind, ji awura naverokê dewlemend, pîrralî û serketî daye destpê kirin. Çerxa wê bi ger xistiye.

Bi xebatên xwe û bi tyabefî bi Nûbara Biçûkan, yekemîn ferhenga kurdî û erebî pêşkêşî gelê Kurd û kitêbxaneya wî, şagirt û xwendayên wî kiriye.

Kesê ewil e ku ne zaravayek belê çend zarava; Mihemedî, Silîvî û Bohtî bikaranîne û gava herî cidî û dîrokî li ser riya lihevnêzîkkirina diyalektên kurdî xistiye rê, coxrafya bikaranîna Zimanê Kurdî fireh kiriye.

Pêşeng û tîkoşerê fikra kurdîtiyê ye. Ew rih û mêhdiyê li dijî tecalên

serdest e ku Kurdistan di nav xwe de perçekirine û li ser navê pêxember, gotina bêesil ku guya nifir li Kurdan kiriye ku “nebin dewlet”. Wî ev sefsete, ev sefseta xelkê bihêl li aliyekî, yekî wek Şerefexanê Bedlîsî bi xwe jî bêt hema bahwerî anîbû pê, çawa Lutherê Elman beyanameya papayê Roma li ber deriyê dêrê agir pê ve kir, wî jî bi awayê xwe ew pûç û vala derxist, nasnekir û da nav lingan.

Xanî ji awura metod û pedagojiya perwerdekariyê jî gelekî li pêşiya zemanê xwe bû, hêjaye lêkolînên taybet û ew di asta pedgog û alimên mina Pestalozzi, Komenskî û Hwd din e.

Ew avakarê çanda pirsê ye, tije bang û mesaj e, di wateyeke xwurt de ew niwênerekî aqil û rohnîdariyê ye, rewşenbîr û rexnegîrekî zeman û deshelatdarên tirk, faris, ereb û mîrên Kurd e. Ne bi tenê bi kurdî nîvisî, belê bû kesê ewil ku înzeya xwe avêt binê fikra dewleteke kurdî û neteweyî jî

Kêmaniyên Kurdan, derd û êşên wan, di nav xwe de hevnegirtin û bêtifaqiya wan, berî herkesî dît û ji bo çareseriyê wê, rê û rêbaz çî ne û li vir hewcedariya bi serokekî Kurd çendî pêwist e zelal û sayî destnîşan kir. Wî baş zanîbû û kûr fêhm kiribû ku gelê bêserok wek pezê bê şivan e.

Serokê ew dixwaze divê zana û bîrbir be, têgihiştî û bibiryar be. Ji vê awurê li ser serokayetiye û serokê ew dixwaze nêzîkayê li Pilaton dike. Li gora Pilaton jî gerek fîlozof û zanan dewlet birêve bibirana.

Xanî hêrs e ji gotinên mina ku “kurd nezan in, cahilin û bêkîtêb in”. Bêkîtêbûnê qebûl nake. Sebebeke dest davêje berhemeke wuha mezin mina Mem û Zînê jî ev hers e.

Em vê hêrsê îro li ser ast û bi sewiyeke din li ba birêz Ocalan jî dibînin. Cara ewil tiştekî wuha diqewime li cîhanê ku girtiyekî siyasî, rewşenbîr, entelektuel û xwedîqelemekî dozê, li himberê dadgehên jiserxweçûyan, ne bi parêznameyekê belê bi hejmarek parêzname li pey hev, xwe û gelê xwe biparêze.

Li ba her Kurdê hinekî navika xwe dibire, mûyekî dumûyan ji xwe çavziwa û razî ye, ev hêrs divê hebe û bibe tiradisyon û çandek.

Em Kurd bi Xanî serbilind in, ew ji bo me hêz, taqeta çogan û bahweriya bi xwe, gel û serokayetiye xwe ye.

Şik tê de tune ku Xanî ji ber ku gelek ji daxwaz û hêviyên wî hatine cîh û tene cîh, îro ji hercar zêdetir di gora xwe de rehet e.

Bila di nav erkên me de mestirkirina rehetiya Xanî û bicîhanîna daxwa-

zên wî tim di rojevê de be û garantîkirina wan jî sozek ji sozên me yên berdewam, bêetlahî û bêyefş be.

Ji aliyekî din serdema kilasîk

Ev qonaxa kilasîk bi aliyekî xwe jî qonaxa mîrekên Kurdan e. Di vê qonaxê de, li Kurdistanê deshelatdariyên navendî, ne serdest in, deshelatdariya wan teng û bi sînor e.

Emaret û mîrekiyên Kurdan, li ser bingehe peymana bi Siltan Yawûz re ji salên 1500'î yan hatiye îmzekirin, xwediyê nisbeteke serbixwetî ne.

Di tenişta wêjeyên bi erebî, farisî de, bi nisbeteke kêr be jî wêjeyek kurdî jî heye.

Ber bi nîvê dawiya salên 1800'î de emaretên Kurdistanê, di bin zexta împeretoriyên dualî de, lewaz dibin û bi taybetî piştî emaretên Bedirxaniyan, Şêx Ubeydullah û yên din yek li pey ya din hildiweşe, di enî û cebhê wêjeyê de bêdengiyek li welat qar dibe.

Dengên hene kiz dibin, çend dengên mina yên Mele Mehmûdê Beyazidî û Hecî Qadirê Koyî jî nabin bersiveke xwurt û têra şikenandina vê bêdengiyê nakin.

Deng û berhemên wan jî mîna yên Xanî û Cizîrî dibin tovek ne ji bo roja têdeyî şîn bê, belê zêdetir ji bo siberojê dikevin erda Kurdistanê ku piştî dizeqîtînin, bi ser axê dikevin. Ji bo vê jî çend dehsal divên.

Çend nimûne ji nesrên vê qonaxê

1. **Aqîday Kurdî.** Mewlana Xalid Neqşibendî Şarezûrî. Bingehên îslamê.
2. **Mewlûdname.** Şêx Huseyin Qazî 1790-1869. Jiyan, ceng û jidayikbûna pêxember
3. **Adet û Risûmatnameyê Akradiye.** Mele Mehmûdê Beyazidî 1797-1889
4. **Tewarîxî Qadîmî Kurdistan.** Ev beşek ji wergera Şerefnamê ye 1543-1604. Teslîmê Jaba kiriye Mele Mehmûd.
5. **Peymana Nû (Incîl)** ev wergera Incîlê bikurdî ye. Sala 1872'an li Stenbolê, bi alfebeya Ermenî hatiye nivîsandin û weşandin.

Ev jî yek ji wan damaran e ku alfebeya kurdî bi tîpên ne erebî tê nivîsandin.

Îtîraza ewil li alfebeya bi erebî û hişyarkirin û jixewrakirina hestê ku kurdî bi alfebeyeke ne îslamî û ne erebî dikare bê nivîsandin.

Aliyekî vê yê sekûler, rojavayî jî heye helbet. Li vir divê mirov lê bikole ka gelo hayê Celadet yan jî berî wî bi salan, yên birayên wî Mîqdat û Evdirehman hebû ji vê alfebê yan na.

Weşaneke bi naverok kurdî û bi alfebe ermenkî, şikenandina tabûyekê ye. Belê ev tabû ne Kurd, Ermenî dişkînin û ji ber vê jî, şikenandin çendî dibe ya Kurdan bi nîqaş e.

wêjeya li sorgonan

Êdî ji vir û ha de, mirov divê hinekî behsa wêjeya li sorgonan wêjeya li derve, ne li ser axa welat, li diyaspora bike.

Siyasetmedar, nivskar û xwedîpênûsên Kurdan li derveyî welat li riyên mana li jiyanê digerin. Êdî di nav wêje, weşan û çapemeniya Kurd û xwendevanên Kurd de dûrayîyek mezin heye.

Demekê çarçeweya wêjeya kurdî, bi hejmarek weşanên ne biserûber, gelek caran temenkurt, piştî çend hejmaran diesekinin li ber xwe û li ber rih dide.

Du bira Mîqdat û Evdirehman hêjayê bibîranîn û binavkirinê ne. Ev herdû bira sala 1898'an berî sedsal bidawî bibe, dagere sedsala piştretir, rojnameya Kurdistan li Qahîre derdixin.

Çîrok û serpêhatiya vê rojnameya ewil û birayên Bedirxanî dirêj e, bi serê xwe karê semînar û lêkolînekê ye.

Em kurt bibirin. Mîqdat piştî 5 hejmarên ewil xwe li ber tehdît û gefên Siltan Evdilhemîd nagre û bi qasî em agehdar in dev ji rojnamê berdide vedigere Stenbolê.

Evdirehmanê bira jî hejmarên mayî li çend welatên Ewropa mîna Siwîsre û Ingilîstan derdixe û piştî hejmara 31 ê taqeta wî jî dawî diçilke, nefesa wî jî têra ewqasî dike û rojname bi gotineke di nav gel de „emir dide haziran“. Sal 1902 ye.

Arşîva neteweyî Mela Mehmûdê Beyazidî

Berî em derbasî salên 1900'î bibin bi çend gotinan be jî em Mela Mehmûdê Beyazidî jî bibîr bînin.

Mela Mehmûdê Beyazidî wek kesê hê di salên 1800'î de dest bi nesra Kurdî kiriye qebûl dibe.

Ew ji mirovên pêşeng, dûrbîn û li ser asteke bilind, xwe berpirsiyar dibîne beramber dîrok, civak, rastî û xweseriyên welatê xwe.

Beyazidî di eniya sosyolojîk, arşîv û wergerê de jî pêşengek e. Ew li

Kurdistanê geriyaye, adet û teqalîdên Kurdan tap kirine, not kirine û piştî kirine berhem. Ji vê awirê mirovekî angaje ye, xwediyê çavdêriyên xwurt e.

Bi van aliyên xwe kesekî din ku bikaribe lingên xwe li yên wî bide, bibe yek ji kilasê wî û xwediyê heman payeyê be, mirov nikare bi hesanî di nav hemdemên wî de bibîne

Sosyolojiya ewil Xanî kiriye, dibe ku hinekî û bi nisbetekê jî Şerefxan kiribe. Li ba Şerefxan giranî dîrok e, belê li ba Xanî û Beyazîdî aliyê sosyolojîk têra xwe diyar û serdest e.

Ji awira çîrokên gelêrî de jî ew di nav pêşengan de ye. Hejmara çîrokên dane Aleksander Jaba ku salên dawî ji aliyê Alî Şêr hatine weşandin bînerin.

Di mesela wergerê û hilanîna nîrxên welat û gelê xwe de jî li pêş e, di ser derûdora xwe re ye, li pêşîya hevta û hawzemanên xwe ye.

Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî wergerandîye Kurdî. Mixabîn hê nehatiye dîtin.

Ew kesekî çendalî, bîrbir, sexî û berhemdar e. Çend zimanan zane, di vî alî de jî ne kêmtî Xanî ye.

Ji zarwên Kurdan re mamostetî kiriye. Li ser wêje, Zimanê Kurdî û rêzimana kurdî kar kiriye.

Ew pîr û pêşiyê arşîva kurdî ye. Helbest wergerandîye ji zimanên din.

Ew kesekî xwedîproje û bernameyeke xebatê ye, wa xwiyaye kesekî bi disiplîn e.

Ji awira dîrokê, ew berdewamkirê Şerefxan û ji awira ziman, netewiyet, rastnivîsê û îspatkirina hêza Zimanê Kurdî, xwe wek şagirtê Xanî dibîne û bi wergervanî û arşîvgiriya xwe jî, di herduwan de jî dubihure, wan derbas dike, di ser wan re ye.

Naxwe

Pêşengiya dîroknîvîsandinê Şerefxan, ya netewiyet, felsefeya siyasî û edebî, Ehmedê Xanî û ya arşîvgirtin û wergerê jî Mele Mehmûdê Beyazîdî dike.

Salên berî çarperçebûna Kurdistanê

Sala 1900'î malbata Babanzadeyan li Misrê û li Ewropa du rojname bi navê Kurdistan û Umîd derxistine. Lê zêde deng nedane, heta salên dawî jî hayê kesekî zêde ji wan tunebû.

Heşkere û zelal e ku tim û berdewam di nav rewşa gelê Kurd û wêjeya Kurdî de girêdaneke organîk heye. Wêjeya kurdî girêdayê du faktoran bûye:

1. Ya yekê rewşa dewletên navendî û deshelatdar, xwurtî û lewaziya wan, kontirola wan û
2. Ya duhem jî rewşa Tevgerarizgarîxwazî ya Kurdan, partî saziyên Kurdan, hêza kurdan ya leşkerî, siyasî û rêxistinî bûye.

Piştî 1902'an cardî deng ji Kurdan dibile, dengê wan nema tê. Bi taybetî di aliyê ramanî, hûnerî weşan û çapemeniyê de bêpêjnîyek serdest dibe.

Meşrûtiyeta II ango sala 1908'an careke din deriyekî nû vedike. Ji bo dem û peryodeke kurt be jî deshelatdariya dewletê dest dughere û di encama valahî û lewaziya kontirola navendî û hinek serbestiya nisbî de ku bi xwe re tine, destên di qirika kurdan de hinekî sist dibe.

Sansûr radibe, bi dehan rojname û kovar derdikevin. Di vê navê de rewşenbîr û siyasetmedarên Kurdan ji sorgonan vedigerin, berê xwe di-din welat. Kurdên vedigerin, komele û rêxistinan ava dikin, rojname û kovarên xwe derdixin.

Wek nimûne:

1. Kurt Teavun ve Teraki Gaztesi.
2. Osmanli Kurt Ittihat ve Terakki Cemiyeti Diyarbakir 1908
3. Fukaraperver Cemiyeti li Amedê 1909. Rêxistineke civakî ye û hinekî dişibe Sarmaşika îro û Heyva Sora Kurdistanê.
4. Amidi Sevda 6 hejmar 1909
5. Peyman hevalbendê Ittihat û Terakkî ye, Ziya Gokalp jî nivîskarê wê ye.

Salên nav 1912-13'an rêxistina Hêvî, Komela Xwendevan û şagirtên Kurd, çend kovaran derdixin, wek:

1. Rojî Kurd, organê rêxistina Hêvî ye.
2. Yekbûn
3. Hetawî Kurd.

Em dibînin ku hinek nav bi zaravayî soranî ne.

Di vê peryoda bikeys de çend berhemên mina pirtûk jî çap bûne. Wek:

1. Mewlûda Ehmedê Batêyî 1906
2. Elîfbêya Kurmancî ya Xelîl Xeyalî Beg û
3. Serf û Nehwa wî.

Ev rewşa relativ bi ber û berhemdar teqîben heta destpêka şerê Cîhanî yê

Yekem dewam dike.

Bi dirêjaya 4 salên şerê Cîhanî yê yekem ango salên nav 1914-1918'an cardî bêj hema weşan û çapemenî disekine.

Çalakîyên ramanî, rewşenbîrî û lêkolînerî, wêjeya Kurd, çapkirina pirtûkan, çalakîyên siyasî û rêxistinî diqerimin. Ev heta bi derketina kovara Jîn dewam dike.

Jidayikbûna Kovara Jîn vê bêbereketî û sitewriyê ji bo demeke kurt be jî dide aliyekî û dibe kilîta saleke bibertir.

Balkêş û karakterîstîk e ku ev peryodên wiha rohnî û li xêra Kurdan kurt in. Heger mirov dîrokî li wan binere, mina wê ye ku tu çavên xwe bigrî û vekî. Ya serdest û dirêj peryodên tarî, bêber û stewr in.

Kovara Jîn, organê Kurd Tealî cemyetî ye, li ser hev 25 hejmar derketine. Ev kovar jî di valahiya ku piştî Şerê Cîhanî yê yekem de pêktê derdikeve.

Di vê kovarê de mafê Kurdan yê kulturî, zimanî û wêjeyî, jiyana wan ya civakî, bi awayekî xwurt dihate bihîstin.

Di coxrafyake ne fireh de be jî, dighe guhên xelkê û ji aliyê çavan ve tê dîtin, tê pêşkêşkirin.

Sala 1919'an Mem û Zîna Ehmedê Xanî çap dibe. Xebatên li ser Ehmedê Xanî û berhemên wî berî Kurdistan têkeve qonaxa çarperçeyî teqîben berhema dawîye di jiyana wêje, weşan û çapemeniya kurdî de.

Salên di nav çapa Mem û Zînê û sala 1923'an de dibin salên Peymana Sewrê, Lozanê, salên perçebûna Kurdistanê û statuya îro, statuya ji pola, mîna asêgeheke ku giş hewlên Kurdan ji bo derketina ji nav, bê encam dimînin û hê nû piştî şerekî 30 sale û bêrawestan, mirov dikare bêje hinek derz û terk lêdikevin.

Sala 1923'an Mistefa Kemal li ser binaxe û kavilê împeretoriya Osmanî Komara Tîrkiye îlan kir.

24'ê Tîrmeha 1923'an bi Peymana Lozanê sînorên Tîrkiye hatin danîn. Kurdistan bû çarperçe, kete vê statuya îro, statuya di rengê "toqa lanetê" de.

Çend gotin jî ji bo romana kurdî.

Salên dawî hinekî jî bûne salên jidayikbûna romana kurdî û çavbelkirina romanivîsên Kurd. Ev pêşketinek e, kêfa mirov pê re tê, dilê mirov pê xweş dibe.

Di serdemekê de ku cîhan ji her gav biçûktir bûye, haydariya li ser wêjeya neteweyên din qet bi sedsalên buhurî re miqayese nabe û mirovê ji xwe re bike kar, dikare di nav çend seetan de salê li kîjan welatê pêşketî, çend roman derdikevin nas bike, ev rewşa nû li welatê me, di nav nivîskarên me de li welat û li derveyî welat, ne zêde be û hinekî be jî bêhna mirov derdixe.

Li welatê me roman jî di nav de, giş şaxên wêjeyî, hûnerî, şêwekarane û bi giştî lêkolînerî, girêdayê rewşa şoreşê û derece û nisbeta hişyarî û siyasîbûna gelê Kurd bi pêş dikevin, geş û gurr dibin, yan jî di cihê xwe dihejmêr in, diqerimin û di bin erd û di dehlîzan de, di nav toz û tirabêlkê de bêxwedî û bêxwedan, wek destnivîs û ne weşandî dimînin.

Li çu der û li çu deveran berdewamiya jiyana û afrêneriya fikrî, rewşenbîrî û hwd. ewçendî bi berxwedana çekdarî, siyasî û rêxistinî ve ne hatine girêdan, ewçendî nebûne berê şoreşê û xebata siyasî.

Ev jî tê wateya ku afrêneriya ramanî û hûnerî ne serbixwe ye û ji ber mercên bindestiyê nebûye meyleke berdewam û di nav ketinên dirêj û rabûnên kurtxayan de jiyana xwe domandiye. Ev aliyên giştî ne û kêmkê zêde ji bo herkesî, her parçe û her qonaxê ne.

Ji ber vê, tim neqeb û dever ketinê, maye wek bêhnek û bîstikên dûr ji hev, xelekên qetyayî, bê girêdan, her yekê bi serê xwe, bê berdewamî, zarok, naşî û ecemî.

Destpêk hene, belê bêpiştire, bê bidûdeyî, destpêkên qerimî, bêliv û bizav, dorpêçkirî, di asêgehên dagîrkeran de û li bendeyî destûra vê hêzê û hêza din.

Dema rewş wiha be wê wêjeya kurdî bi giştî û roman bi taybetî çawa bistewe û li ser kîjan binge hî balix û kamil bibe?

Bi gotinên din cardî ji ber heman çerx û heman nîrê jiyana siyasî û civakî, çirûsk û tîrêjeke afrêner ku rojekê ji rojan, di keys û derfetekê de, di nav terk û derzên deshelatdariyên total re çavên xwe vekiribe, lingên xwe avêtibe nav jiyana jî, ji ber astengî, dijberî û nelibariyan, ya hê roja çavên xwe li dinyayê vedike tê qurmiçandin, yan jî ji bêmecalî ji pêjin dikeve û dimîne li bendeyî fersend, delîve û bayekî din.

Her mirovekî bîrbir dikare vê bibîne û ji bo dîtina wê jî hinekî lêhûrbûneke diyalektîkî bes û têr dike.

Serpêhatiya romana kurdî

Romana yekemîn, romana Şivanê Kurmancan ku bi salan me wek Şivanê

Kurd zanîbû, heta salên bêj hema 1969'an jî li dora 35 salan bêpêjin bû, di 72'an de çap dibe û hayê Kurdên perçên din hê nû jê çêdibe .

Tişt nemaye ku nehatiye serê nivîskarê wê Erebe Şemo, ketiye zîndan, bûye mehkûmê Sibîrya û hê piştî mirina Stalîn û hatina Kuruşov, deriyekî xêrê jê re vedibe.

Romaneke din ji romanên ewil, romana Rehîmê Qazî Pêşmerge ye. Pêşmerge jî piştî çapa yekem ku li dora 1958'an e û nivîsa wê jî gelekî berî çapa wê qediyaye, bi deh salan piştî çapê hê nû hayê xwendevanan çêdibe jê.

Jana Gela Ibrehîm Ehmed ji tirsê girtin û sansorê û ji bo wîzeyê çapê bigre, li derekê netgerpile, neteqine wek diyariyekê ji bo şervanên Ceza-yirê tê pêkêşkirin.

Li Rojava piştî Hawar disekine bi gotinên Helîm "heta 1969 an dema Gulîstana Cegerxwîn derdikeve, belavokek jî bi kurdî rûwê dinyayê nabîne".

Helbet yên hene jî qedexeyê ne û bi hesanî; bêgirtin, şikence û asaq, ji cihên xwe nikarin bilivin, di nav axê de veşartî ne. Bin erdê tije pirtûk, kaset û weşanên bi kurdî ne, gelek dê û bav heta niha jî pirtûkên zarwên xwe ji tirsê ku wê tiştek bê serê wan, dişewitînin, dilê wan bi bin axê jî rehet nabe.

Li Bakur jî xwe rewşê tê zanîn. Li Amedê jî bo her peyva bi kurdî karmendên dewletê di zemanê xwe de Kurd ceze dikirin û hê îro jî ev ranebûye. Berpirsiyarê Rojnameya Azadiya Welat 166 sal ceze xwarine, niha di zîndanê de ye.

Rewşa Başûr hinekî ferq bike jî heman pirsgrêk bi reng û coreyên din be jî li vir jî serdest in û îmkana xebatên li vir hatine pê bigihe perçên din, di asta zana qantirê de ne ji tiştên asayî ye.

Ji vê awirê sîh salên şoroeşa dawî, şoroeşa PKK girîng in, bi aliyekî xwe jî bûn salên bidestxistina berdewamiyekê, ev wê bandêra xwe li her aliyê jiyana Kurdan û bêgoman li wêjeya kurdî û romanê jî bike.

Ji niha ve mirov kare bêje kiriye û êdî em ji destên derveyî xwe derdikevin û xwe bi xwe dibin xwediyê çarenûs û siberoja xwe. Em li ser riya qonaxeke bi berhem, berhemên cîdî û di asta yên wêjeya cîhanê de ne.

Reng û şaxên afrêneriya fikrî zêde dibin

Heta berî bi 20-25 salan çend istisna ne tê de, Kurdan bi şeweyekê giştî helbest dinîvisandin û ew jî bi giranî kilasîk û bikafiye bûn.

Îro cîhana wêjeyî girêdayê guhertin û pêşketinên salên ber bi îro de, di encama rengarengiya medyayî; televizyon, radyo, rojname û bi sedan malperên çalak, gelekî zindîtir û dewlemendtir e.

Di vê eniyê de jî diyarde û berjengên qonaxeke bêrdartir, bi zareveyê me î soranî, xêranetir berçav dibin, gavên nû xwiya dibin û mirov pê dihesa ku romana kurdî riya xwe girtiye û wa xwiya wê careke din jî bernede.

Zêdebûna hejmara romanên û pênûsên ciwan, nûhatî û jixwe bahwer, bivê nevê bi xwe re hewcedariya bi rexnegîriyê jî rapaş dike, dixe rojevê.

Rojev, xal bi xal serast dibe, distewe û ji bo bişibe rojevên dinya û alemê, hêviyek tê pê, mezin dibe û ev jî dibe faktorekî navtêdan û dilxweşiyê nû.

Lewra wêje bi giştî û roman û rexnegîrî bi taybetî, hevalcêwiyên hev in, bê hevûdû nabin, yek ya din dixwaze, bi ger dixe û wek libên tizbiyê nebe jî bi awayê xwe didin pey hev, didin di ber hev re û dualî bi hev bihêz û kûr dibin.

Roman projeyeke mezin e

Heçî roman e, projeyeke mezin e; beş û navçeyên wê hene, têkiliya nav van beşan, lihev xwarin û hevtemamkirina wan, ji serî heta dawî, avakirinek e; avakirineke aktîv e, birih e, civat e, têkîlî ne, dîrok e, sosyolojiye, qehreman in, bicîhkirina qehremanan e, erd û dema wê heye; teswîr in, nasandinin, diyalog in, aliyên fizîkî û derûnî yên aktorên wê hene. Bi hezaran peyv, bidehhezar û bi sedhezaran hevok dixwaze.

Dawî projeyek e zimanî ye, ne mîna helbestê ye ku carna çend gotin jî têr dikin, yan jî çîrokeke ku mîna bezeke sedmetroiyê be, roman meretonek e, înfomasyon û agahdariyeke fireh û pîralî dixwaze, di wêjeyê de ast û sewiyek e, azmûnek e, piştî xwe dide berî xwe, dawîya dawî ziman xwe di romanê de li mêzênê dike.

Ji awira dabaşa me ziman, berî her tiştî hejmarek peyv e, ferhengê e, biwêj in, peyvên pêşyan in, termînolojiyê şax û baskên ilmî ye, materyaleke nivîsên berdest e, ango pirtûkxaneyek e. Ev aliyên giştî û ji bo herkesî ne. Aliyekî subjektîf jî heye.

Ew jî tecrûbeya nivîskar, tehsîla wî/wê, têkiliya bi pirtûk û xwendinê re, serdestiya fikrî û ziman e. Zimanek bi çend tiştan bipêş dikeve û xwe ji romanê re amade dike:

1. Axaftin. Ziman zindî û sazkar radigre, dibe têkiliya ziman bi jiyanê re.
2. Nivîsandin. Ziman liqalib dixe, bedew û şeh dike, kapasîteya wî ya îfa-

dekirinê bihêz dike, derdixê asta kodên hevbeş û kolektîf.

3. Perwerde. Ziman dewlemend, piralî û standardîze dike, ji milyonan re dike mal û di pirtûkên dibistan û xwendegihan de wek materyalekî neteweyî pêşkêş dike.

Û dawî ev hersê diyarde bi hev re çend û çawa ne, bi kîjan nisbetê bi erkên xwe radibin, çendî li gora dem û zeman in, di romanê de xwe li mêzênê dikin, bejna xwe bi bejna wêjeya cîhanê re didin ber hev û xwe diceribînin.

Di romanê de hêza ziman, hêza nivîskar heyaleselah,” hilînin ji ber min”, xwe bidin alî, ez hatim” dibêje. Lehiya ziman di romanê de radi-be.

Romana kurdî heye

Gotin jê re navê ku romana kurdî heye, qet nebê em ji hejmara romanên me xwendine, me nexwendine û bihîstine, şika me ji vê nemaye.

Romanivîs û rexnegîrên me Bavê Nazê û Ibrahim Seydo Aydoğan jî vê zanin, zêdetir nebe ne kêmtir.

Wa xwiyaye birêzên me ku mala wan ava, bûn hander û sersebebê guftûgoya li ser romana kurdî, wek Helîm Usif dibêje, ”di îskanê de beşê vala dibînin” û bala wan di bêhnika nixandî û destnîşankirinan de, ne li ser aliyê dagirtî, ne li ser awantaj û pêşketinan, belê li ser dezawantaj û berhelistan e.

Dema şika me jê tune ku Bavê Nazê berî romanivîsiya Mehmet Uzun di romana ewil ”Tu” de bilaş û gewd bibe bi 6 salan, romana xwe ya ewil, bi navê ”Stockholmê te çi dîtiye bêje” nivîsiye, keseke ku aliyekî wî yê akademîk heye û Seydo Aydoğan jî hem romanivîs e û hem jî li cîhekî mîna Parîsê edebiyat xwendîye û em ji gotar û hevpeyvînên wî bi nivîskaran û yên rojnamevan û nivîskaran bi wî re zanin ku ji romana kurdî haydar e, wî çaxî dimîne ku em jî bifikirin ku herdû rexnegîrên me ji aliyê bervaja ji bo ku firk neye, çendî ji dest wan hatiye bitof avêtine û bi vê re xwestine bala giş partî, sazî û me herkesê hez ji Zimanê Kurdî û romana kurdî dikin bikşîne ser talûkeya bi rê de, bi vê mebestê dar ji binî de birîne.

Helbet ev birîna darê bi gotin e, lewra darên hene di cihê xwe de ne, xem nake, ev dibîranînek e, îkaz û hişyarkirinek e, bikelk e.

Raste, her roman naye xwendin, di nav romanên û romanivîsan de jî nemînahevî, diserhevreyî û dibinhevreyî hene. Ev ne bi tenê ji bo roma-

nên kurdî, belê ji bo roman û xelkên welatên din jî derbas dibe û bê dudilî dikare bê gotin.

Ji sala 1901'an û bi vir de Xelata Nobelê tê belakirin û heta niha bi dehezaran û dibe zêdetir nivîskar hatibin û çûbin, lê hejmara kesên xwedî xelat, yek zêde yek kêr, li dora sedhebekê ye.

Nîqaş baş e, pêwist e. Helbet wê Romana kurdî bê nîqaşkirin, belê ji mesela "tune ye" "heye" zêdetir ew bi xwe, rewşa wê ya îro û siberoja wê bê nîqaşkirin wê encamgirtir be.

Ya rexnê dixwaze zêdebûna tema û dabaşan û kêmbûna romanên e. Romanên baş û serketî, romanivîs, çîroknivîs û helbestvanên me yên serketî hene û em jî di heman bahweriyê de ne ku "romana kurdî ji nirxandînen tene kirin, mezintir, bilindtir û cûdatir e".

Romana kurdî di nav agir û barûdê de, şikence û qedexeyan de xwegihandiye îro, rewşa îro gelekî ji doh baştir e û şika me tune ku sibe jî wê ji îro baştir û serketîtir be.

Me kafen dirandiye, zîvarzîvarî kiriye, em êdî li ser piyan, zindî, bixwe bahwer û xwedî eşq û vîna jîyanê ne. Em bi îdîa ne û îdîa me mezin e.

Hêzeke ji îro û pêde hewil bide me bêdeng bike, têkeve nav û me û zimanê me, nav me û pêşketina me û me bêinsiyatîv û destgîrêdayî bike, wêje û romana me bend bike, gerek ne carekê sed caran kumê xwe deyne pêşîya xwe û bifikire.

Du-sê gotin jî ji bo lêkolîna hejmar 16'an

Lêkolîna me vê carê li ser romana kurdî ye. Naveroka vê hejmarê jî li ser pirs û bersivan ava bûye û hejmarek hevpeyvîn dihundurîne. Hevpeyvînen ji aliyê endama rêvberiya Instîtûta me nivîskar Rukiye Ozmen hatine kirin.

Pirs jî û bersiv jî têra xwe xwurt, bi sewiye û profesyonel in. Nivîskar û xwedîpênûsên bûne avakerên vê hejmarê, naskirî ne, xwedîpirtûk, roman, çîrok û gotar in û di cîhana me ya wêjeyî û afrênerî de ji kesayetiyên herî bi ezmûn in.

Sipas ji bo herkesî û herkese di vê hejmarê de keda wan çêbûye.

Instîtûta Kurdî
ji bo lêkolîn û zanist.

Hevpeyvî bi **Medenî Ferho** re

Hevpeyvîn: **Rukiye Ozmen**

Rukiye Ozmen: *Di dîroka romanê de qonax hene ku bi „îzmên“ corecor têne binavkirin û ev qonax ji destpêka xwe ber bi îro de bi hezaran roman di himbêza xwe de digre, ji vî cîhê derengmayî awantaj û dezawantajên me, şens û bêşensiya me, îro mirov rehet dikare xwe bighîne wan?*

Medenî Ferho: Romannivîsên Kurd; nikarin demjiyanên Robinson Crusoe bijîn. Robinson Crusoe, têkoşîna mirovekî bi serê xwe ye. Têkoşîna di himbêza xweza de... Di kesayetiya mirovekî de, ji bo tevahiya mirovahiye têkoşîna serdestiya xweza. Alavên Robinson Crusoe, li girava bi tenê încil û çend alavên biçûk in. Mirov dikare berxwedana Robinson Crouse ya di nava 4 salan de wek macera jî bi nav bike. Lê cîhana global, demjiyana teknolojiya pêşketî, derfetên wiha nadê Robinson Crouseyan. Ji ber ku fatura jiyanêke kifş û plankirî radestî me nake. Fatura bihatir û girantir e. Bêhtirîn lîstik, bêhtirîn dîplomasî, bêhtirîn aborî û kolektîvîzmê derdixe pêşiya me. Tenêtiya Robinson Crouse, nebûna jinê, nebûna evînê, nebûna lîstik û qîr teşqeleyên cîhanê, şer, kuştin, dagirkirin, kar û xebata romannivîs hêsa kiriye. Lê car din mirov dibîne ku, rojavayî, bi Robin Crouse fêrî xwendinê bûne. Bi xwe hatine. Hêviyên çînê burjuwazî bi hêz kirine. Di cîhanêke ku her şev, bi dehan stêrikên ezmanê gelê nivîskarên Kurd têne rijandin, mirov nikare behsa şans û avantajên bike. Belkî aliyekî avantajê heye, lê ji bo ku nivîskar dikarin avantajên demê û rijandina stêrikên ezmanê xwe bikarbîne. Alavên ku zarokên Kurd parçe dikin, ji încîl û çend alavên Crouse giringtir in.

Tîrsa nivîskarê Robinson Crusoe Daniel Defoe, dojah bû, ya nivîskarên Kurd xelasiya ji kuştin, koletî û dojahê abadanî ye. Daniel Defoe, încîl kire destê lehengê xwe; romannivîsên Kurd, ne dikarin Zend Avesta, ne

Qur'anê, ne Tewratê na jî Încîlê bikin destê lehengên xwe. Zend Avesta afaroz-mahrimono bûye. Rûpelên Qur'anê di serê şûrê dagirkerên Kurdistanê de çikandî ne, Tewrat ketiye xuloqa canê xwe, Încîl jî, hîna di çarmixê de ye û nikare xwe ji bawerî û hişkiya katolîktîzmê xelas bike. Di van baweriyên ku her hêzê, li gorî xwe „şerîet“ek sazkar kiriye û Xweda qewirandiye, cihê Kurdan nîne. Kurd têkoşîna cihekî, pêgiheke rûniştina di civata cîhanê de dikin. Kurd dibêjin, „ne rûniştineke çarmêrkî, li ser yek kabê jî, min qebûl e“.

Di rewşeke wiha de, bi gelê Kurd re, nivîskarên Kurd jî hatine lanetkirin. Gotina Omer Xeyam ku dibêje; „*tê bişewite, tê bişewite, tê temam bibe/ Tê di agirê dojecha ku te pêxistiye de bişewite...*“ çiqaşî li bejna me tê. Lê na, sîstema kapîtalîst ku berdewama xwe, di netew-dewletê de dîtiye û netew-dewleta li Rojhilata Navîn jî, li ser tunebûna gelê Kurd hatiye sazkar kirin, ne „şêrê ji kartonê ye“ û agirê ku gelê Kurd dişewitîne dadaye. Divê ku em xwe nexapînin. Yan dive ku, nivîskarên Kurd, bibin Çernîşevskî û awaza ciwanên Kurd biqîrin û program û stratejî-teoriyên têkoşînê biafirînin, yan jî bibin Şolohov û hêza neteweyî derbixin pêş, bibin malê gel û di herka şerê dijwar de, wek dilopên xwehdana dilê dayikan biherikin. Yan jî wê di lîsê xwe yê dirrî de bimelisin. Lê, dijmin dikare lîs jî xerab bike.

Ez, ji bilî vê şanseki din nabînim. Ji ber ku qonax û demjiyanên edebiyata cîhanê, qonaxa îro ya nivîskarên Kurd derbas kiriye û jiya ye. Veger nîne. Êdî girîşên kultura gelên cîhanê, wek firazeya sudmendiye ye. Ev qonax jî bi hêsanî ne hatine bidestxistin. Ne Shekespearê, ne Victor Hugo, ne jî Dostoyewsky û hwd. ji sergom û afaroz/mahrimono tirsîya ne. Em dikarin mînakên nivîskarên Emerîka Latînî jî bidin. Ji ber ku şans û avantaj, bêşansî û dezavantaj, li pêşîya wan jî hebû. Wan, bi berxwedana kolektîvîzma civakên xwe serketin bidestxist. Cogrfaya xwe kirin doşek û ezmanê welatê xwe kirin lihêf. Ne mîna romanên sedsala navîn ku „evîn“ kirin şûrê têkoşîna li dijî statuko û tabûwên hişk şikandin. Di romanên demjiyana sedsala navîn de, evîn her tişt meşrû dikir. Ev li dijî despotîzma katolîktîzmê, şer bû û şerê edebiyatê yê li dijî „ola hişk“ bû. Gelo çima Em Ehmedê Xanî têra xwe nebînin? Yan jî destanên dirêj yên gelê Kurd, erotîzm, îlîsyonîzm, efsûn û aşûfteyî û karhezaliya exlaqê pîroz yê Seyrê, romantîzma Melayê Cizîrî ku bi hevrişmê gotinan hatiye hûnandin, mîtolojî û qîrêna Promethous ku hîna li serê Çiyayê Zagrosê olan vedide... Her çirîska di bûyerên drametîk de dipekê dibine parçeyên „antrasît“ û dilê mirov parçe dikin, îro li cihê ku Promethous hate zincîrin dibine stêrik. Rewşa zarokên Kurd ya îro, bendera ku heya şazdeh nîfşan, nivîskarên Kurd li ser diraxeyan çêbikin û gêre bikin dike.

Jiyan bûye miştaxa bûyeran. Şans jî avantaj jî têkoşîn û berxwedana man û nemanê ye.

Nivîskarên Kurd nikarin li bendeyî şans û avantajan rawestin. Li dijî huquqê demê, li dijî sîstema demê û li dijî statukoya li ser tunebûna gelê Kurd hatiye avakirin, têkoşîn mercê sereke ye. Ji şans bêhtir berxwedan. Duyemîn şans nîne. Di cîhana global de, nasnameya lawîran jî çêbûye û bûrokrasiya cîhanê jî ev pejirandîye. Lê dewleta Suriye, nasnameya gelê Kurd, ji destê wan standîye. Dewleta Tikriyê, hebûna Kurd qebûl nake. Êdî şans li ku dimîne?

Nivîskarên Kurd, mecbur in du tiştan bikin. Yek: Nivîskarên Kurd, mecbur in romana xwendevanên romana xwe binivîsin. Du: Nivîskarên Kurd, mecbur in xwe bixwînin û romana xwe binivîsin.

Rukiye Ozmen: *Ji bo romaneke baş û serketî bê ku em bêjin dîro-kî, psîkolojîk yan jî bi coreyekî din, postmodern, çend pîvanên ferz binav bikin!*

Medenî Ferho: Ez ne di wê baweriyê de me, ku pîvanên romanê hatine kifşkirin û nivîskaran jî li gorî van pîvanan dest bi nivîsandina romanên xwe kirine. Biqasî hejmara cûreyên romanê, pîvan û şîroveyan romanê hene. Pêşketin bandorê li romanê jî dike. Lê edebî û edebiyat: Edebiyat, ji edebê tê... Gotineke erebî ye û bedena mirov, mêjiyê mirov û hestên mirov terbiye dike. Di her beşên edebiyatê de ev xisletên pîroz hene. Romanên di rêş û tarîtiya Ingilîstanê de hatine nivîsandin jî, „wampîr“ afirandine. Lê Shakespeare jî, Ingilîz e, bi ingilîzî nivîsî ye û gundiyên Ingilîstanê rakirine ser lingan. Yewnanîstan jî, hîna demjiyana „xetzerîna Yewnana klasîk“ dijî. Kevnarî û klasîzm û nûjenî li hevûdin hûnaye, wek tevna her demê pêşkêşî cîhanê kiriye. Edebiyata Rus, gelê nexweş û xwedî pîrsgirêkên parçebûyî, ji hevde-kefî aniye ziman. Freud, Dostoyewskî, li cihekî bi bêexlaqiyê gunehkar dike. Frensa, bi saya Balzac û Victor Hugo û hwd. gelê Frensa ji pejmurdetiya demsalên şermezariyê xelas kirine. Lewma roman, demjiyana xwe û hêvî, xeyal û xewngîriya dema xwe diragire. Dibe neynika dema xwe. Lewma pîvanên wê cûda ne û li gorî her nivîskarî, li gorî her rexnegîrî tê guhertin. Dostoyewskî psîkolojî girtiye destên xwe, lê Balzac bûye feylesofê sosyolojî... Xala sereke ku ez wek bingeh dibînim, exlaq e, sazûmakarî ye, kolektîvîzm e... Nivîskar berpirisyarê dema xwe û paşerojan e; berpirisyarê civaka xwe û tevgera civaka xwe ye. Binbarî û berpirisyariya nivîskar ew e ku, li ser cografya xwe û dibin stuna ezmanê cografya xwe de, dikaribe rabe û rûne, bibeze, qarîşkêşiyê bike. Dikaribe rêkûpêkiye maqul ya paşerojan bi hêvî bike û bide. Her nivîskar utopyayek e. Ne senaryoyên ku dawiya wan bi

bextewariyê xelas dibin û ne jî, çîrokên efsûnbazî... Na, jiyana heyî, lê avaker û plansazê paşerojan, hevkar, dilsoz, keddar, dost û dilpenah. Da ku, civaka bi sedsalan e, di nava qîrûteşqeleyên hejandina dagirkerî de melûl û perîşan bûye, dikaribe bi xwe werê.

Divê berî her endamê civaka xwe nivîskar, li xwe ewle be, li hespê kesayetiyê serbixwe suwar be û qamçiyê xwe li nav serûguhên demjiyana bexîl û kujer bide.

Di magazîna edebiyata Kurdî de, refên vala pir zêde hene. Ev hem şans e, hem jî bêşansî ye. Li gorî min şanseke e. Mêrî çê, wê van refên vala dabi-gre. Dema ku li meydana tiratê suwar nebin, mirov dikare li gorî dilê xwe hespê xwe bibezîne û li gorî dilê xwe pîkolê bike. Lê dive ku pêşî suwar li xwe ewle be û dikaribe cîwaniya xwe sîqal bike. Mijareke bêşansiye ew ku; cîhana global û pêşketî, hinek ji beşên pîroz yê edebiyatê kuştine. Wek nameyan. Namê neynika mirovan e. Ev neynika efsûnî, her aliyê mirov derdixê meydana, lê mixabin edebiyata Kurdî, ji vê beşa pîroz bêpar maye û wilo xuya dike ku wê bimîne jî. Heya vê kêlîkê min, tenê pirtûka Bekirê Soreklî, ku name ji bavê xwe re nivîsîne dîtîye. Yan jî aliyê çavdêrî û hevpyevinên çavdêrî... Ev teva, şansên neyînî ne û li pêşiya edebiyata Kurdî asteng in. Nivîskarên Kurd, dema di malperan de rastî van cûreyên wêjeyî nayên, pêça xwe jî nadin wan. Gelek nivîskarên Kurd, tenê nivîskarên malperan e, bêşansiya mezin ev e. Ji afirgeriya berheman zêdetir, bi gotaran mijul in û nebûna derfetên weşanê didine berxwe. Gotar, qinyata dilê wan e, xwe mijul û miştixul dikan. Ev, zexelî û lewazî ye.

Di demjiyana me de, mirov ne tenê bi xweza re şer dike. Mirov bi mirov re, bi teknoloji re, bi kujeriyê ku sedsala navîn radestî dema kiriye re, şer dike û pêdiviya fantaziyan jî nabîne. Lîstik, entîke, teşqele tîra mirov dikan. Pêdiviya macerê jî nabîne. Nema serî li lîstika hingulîskê dide û çîroka Hêtim û xurtî û jêhatîbûna Behrûzê Eyar jî nizanibe, yan jî ne bihîstibe, herî hindik di Şahnameya Firdewsî de, destanê Rustemî Zal, yan jî Bîts-stûnî Ferhad dide. Dema ku mirov hewqasî ji xislet, nîrx û pîroziyên civaka xwe dûr be, nîvê şansê xwe wînda dike û kine-rê lêdide û dixwaze bigihe encamê.

Dem ku mirov di vê çarçovê de li romanê binêre, nivîskar û vijdanê xwe, ji vijdan bêhtir, ew û hêza xwe dimînin. Lê min tucaran „postmodern“ qebûl nekiriye û naxwazim bikevim wê gerêneka xapînok jî. Post modernîzm, parçeyek ji lîstika sîstemê ye. Mirov dixirîne û mirov dike nava eniya li dijî exlaqê civakî. Roman bi xwe, karê ziman e, karê hûnandina bûyeran e. Roman bi xwe civak e. Bûyerên drametîk e... Di nava vê dra-

mê de, fantazî jî, evîn, eşq û meşk, exlaq, tore, folklor û hêvî, xeyal û utopya û daxwaz teva hene. Di postmodernîzmê de, ez teknîka bi tîlên elektrîkê ve girêdayî dibînim. Mekanîk û dejenerebûnek ku lîberalîzmê jî, dike bin piyan heye.

Eger romannivîsên Kurd barnête'kê li serê zarokên li kolanên Amedê bikin, yan jî klarnêtekê bikin destê şivanê Kurd, gelo wê dikaribin guher-tineke modern pêkbînin? Hingî, wê Mamê Şivan bibê têbayê şevê û li ser sebeta sînga wan nivîskaran rûne û Dayika Ferxan jî, wê ji lîlandinê bêhtir destê xwe deynê ser devê xwe û mitxeyriya „pepû, pepû gidvano“ ji wan re bitewirîne?

Nivîskarên Kurd nikarin piştî xwe bidin dewlemendiya xwe. Eger mirov ji firazeya bavûkalan qut bû, lingê wî li hewa dimînin û di xefka kujerî de, dîldikevê, dirize û pûç dibe. Di berhemên malbata mirovahiyê teva de, qutbûna ji paşerojan, ji binyata civaka xwe qutbûn nîne, çênabe. Kultur, girîşkirina nîşan û sedsalan e, lewma giring e û xezîna herî giranbiha, pîroz a civakan e. Gelê Kurd, bi saya vê kultura, bi binyata kûr û dûr, feylesofiyek bidestxistiye û wêjeya devkî jî xurt û bi hêz kiriye. Civaka Kurd, hem afirger, hem jî berhemê vê kulturê ye. Ev feylesofî û ev wêjeya devkî bûye keliha berxwedana hebûna gelê Kurd. Roman-nivîsên Kurd, biqasî bêşansiye, xwedî şansin jî. Bê çiqasî bêşansiya wan diyar be, şansê wan jî diyar e û li ber çavan e... Şansê wan ziman e, kultura kûr û dûr e, feylesofiya civakî ye, folklor e, dîrok e, cografya ye, destanên dirêj in. Zend Avesta ye, Rastemî Zal e, Ferhad û Şîrîn e, Manî ye, Nuh e, Êzdayetî ye, Prometeush e, heriya kozmîk e, Lebşêrîna Êzda ye, Kawayê Hesinker e, tevnên hevrişim û riya hevrişim û Ksenefon e... Cengaweriya hemdemî û destanên xwedawendî ne...

Kultura Kurdan, Tewrateke nenivîsî ye û bendeyî nivîskarên Kurd e...

Rukiye Ozmen: *Romana kurdî jî û çîroka kurdî herdû jî dereng ketine, sedemên dernegmayînê û heman pirs ji awurike bervaja û belkî hevdû temamkir, roman çawa bi pêş dikeve?*

Medenî Ferho: Gelê Kurd, sedsalek ku destîniyek/çarenûseke cografîk dijî.

Gelê Kurd, ji dema Nuh û vir ve tîkildarê „Xwedayê Semawî“ ye. Lê piştî ku olên „samîtîk“ hatin, gelê Kurd, ji her alî ve tengjandin. Pêşî fîzîkî êrîş kirin... Xelas nekirin û rastî dijbeiriyeke tund hatin. Lewma riya duyemîn ya herî dijwar dane ber xwe û êrîşî mêjî û „Ferhenga Kurd“ kirin. Bawerî û hebûna gelê Kurd, bi ŞEYTAN recimandin. Di lîteretura edebiyata Kurdî de, di ferhenga Kurdî de gotineke wiha nîne. Felsefa herî

dînamîk ya herêmê, ku rojava jî ronî kir, di nava diranên çerxa emperyalîzma kurturê de, fetisandin. Çerxa empertalîzma kulturê, hewqasî dijarbû ku, Kurdan bi tenêya serê xwe nikarîbûn bifikirin û biryareke bi serê xwe bidin. Dayika olan, Ezdayetî, yanî hebûna Xwedayê şevûrojê, hatibû kuştin û bi diranên çerxa emperyalîzma kulturî, qirkirina kulturî kirin pratîkê. Afirgerî û kesayetiya Kurd hate kuştin. Ji xwedûrbûnek çêbû. Di encamê de, kesayetiya Kurd, mêjiyê Kurd kete xizmeta dagirkeran, kete xizmeta olên dagirker. Xwedayê xwe ji bîr kir, bi Xwedayekî nû re rû bi rû hat û mecbûr ma, jê re secde bike. Niyaz û limêja bi ziman xwe berda, dest bi zimanekî wek şopa mîruwan kir. Ne fêhm kir, ne têgihişt. NASEkî ezbervan derkete holê. Di rastiya xwe de, ew Xwedayê nû jî, Xwedayê wî yê kevin bû, lê nav, yan jî „lugat/ziman“ hatibû guhertin û wek „NAS“ derkete holê.

Mirov dikare bêje ku, hişmendî û hewngirîya Kurd ketibû çarçoveya bîrûbaweriya BERGSON ku dibêje: „hişmendî, zîrekîtiya tevgera li gorî demê ye“. Lê rastiya jiyane ne wilo ye. Îro, berhemên Kurdan, lewendiya Kurdan teva bi hêzên dagirker re bûye yek. Lewma ez di gelek afirgeriyan de, gelê Kurd derengmayî nabînim. Derengmayin, di destpêka sedsalê bîstan de, ku bextê jiyane, lê hate qulibandin dest pê dike. Eger, dem û dewran bizîvirin, Gelê Kurd, bi rûmetdarî di nava malbata cîhanê de rûne, wê xuya bike ku, destpêka epopa cîhanê Exmedê Xanî ye û destpêka romantîzma cîhanê Meleyê Cizîrî ye. Hingî, cîhan wê rastî cîhaneke nû bibe û li ber ronahiya wê cîhanê govendê girêbide.

Eger em li ser çîrok û romanê rawestî, pêwîst e, em her du beşan jî hev cûda nekin. Çîroka Kurdî dereng nemaye. Her cûre çîroka Kurdî hatiye afirandin. Eger devkî jî be, çîrokên „fabl“, mîzaha reş, mîzaha spî, çîrokên mîtolojîk û serpêhatiyên bi fantazî û drama jiyana rojane dagirtî hene. Van çîrokan, utopya kurdasî diparast. Tiştêkî din, ku tenê li cem gelê Kurd heye, METELOK, ev beşê feylesofîk, di rengê fantazî û „hiciv“ de derkeitye pêş. Roj bibê roj, wê teqîneke volkan çîrokan derbikeve holê. Roman, berhemê çîrokê ye. Lewma Kurd hîna rêwitiya wê qonaxê dikin.

Dimêne romanê... Derengmayîn rast e. Lê destîni/çarenûsa cografîk, ev derengmayîn û bexîliya bêqudoş ku li ser bextê gelê Kurd rûniştiye afirandiye. Guman dikim ev bêqudoşî, ji nezanîn û xêşîmiya pêşengên gelê Kurd tê. Ji ber ku pêşengên gelê Kurd, dîrok di herka jiyane de ne nîrxandine û mîna Qeretacdîn, çûrê xwe avêtine gerênêka Gola Ava Bûnîsra. Lê têkoşîn û berxwedanên bê hejmar didine xuya kirin ku, xwe û paşerojên xwe, dahatuya xwe radestî destîni/çarenûsa kujerî nekirine.

Li cîhana rojava, sedsala 17'an, demsal û heyama serdestiya hişmendiye ye. Ji ber ku di vê sedsalê de zimanên neteweyî derketin holê. Ji bo vê jî, pêdivî bi, gotinê dîtin, pêdivî bi ferhangan dîtin. Gotin jî, nenasîna otorîtê ye. Lê di vê demsal û heyamê de, gelê Kurd, xwedî pêxember e, xwedî ferheng e, xwedî hişmendiyeke serdest e. Lê mixabin, gelê Kurd, bi bandora ola îslamî, edebiyat, lîstikek ziman û fantazî qebûl kiriye. Ev bûye, sedema dûrketina ji şaristaniya xwe. Şaristaniya xwe, di bexçik, kûwar, pazûbend û himayilan de veşartîye û şaristaniya nû ya îslamê girtiye destên xwe. Di vê demê de, -li ewropa- pîvana şaristaniyê bûye pirtûk. Gelê Kurd, ku di detpêka dîrokê de tablêt, piştire çermên xezal û karik û golikan, piştire papîrûs bikar anîye, di vê demê de, mîna ku biryara dardekirina xwe bide, pênuşa xwe şikandiye.

Kurd di hişmendiye de bûye Erebb, di helbestê de bûye Ecem, Zend Avesta di nava hêrik û şikêrên dîrokê de veşart, 6 pirtûkên Manî ku teva bi Zimanê Kurdî ne, di xêşimên reştarî de veşartine. Qewlên Êzdayetî yê, ku niyaz û hawar û gaziya mistizîmê û afirgeriya „heriya kozmîk“ di nava xwe de diragire, bi dizî, li cihê tarî xwendin. Di nava demê de, pirranî piştî netew-dewlet hatin sazkarîkirin, medreseyên xwe jî, winda kirine. Dijmin jî ev windakirin wek modernîtê nîşan da. Lê di binyata xwe de emperyalîzma kulturê/qirkirina kulturî didane destpêkirin. Di vê demjiyanê de, Rojava, Erebb, Faris û Tirkên, zindanên xwe, dogehên xwe dihêrivandin û ji holê radikirin, Kurd, zindanên xwe û dogehên xwe ava dikirin.

Ev dem û heyamên ku em behsa wan dikin, yanî li gorî temenê romanê, derdorê 200 salî dikin. Lê em dêhnê xwe didine hinek gelên ku destînin /çarenûsa bextewarî derketiye pêşîya wan jî, di romanê de qelsî, lewazî û bextreşîyê dijîn. Salên 1800 û sala 1832'an, edebiyata rojava li Frensa, Elmanya, Îtalya û Ingiltêra dijî. Di wê demê de jî, Ewropî li pey roman-tîzmê, helbest û xeyalan dibezin. Gelê Kurd, Faris û Yewnanî ev dem temam kiribûn. Piştî seferberiya bazirganî, rojava mabedên rojhilat, kevir li ser kevir nehiştin û birin. Heya hingî roman, çiqasî pêşketî bû? Bersiva vê pirsê, wê bibe bersiva romana Kurdî jî. Piştî Turgenyew, Baron de Vogue, Tolstoy, Dostoyewskî roman pêşdikeve. Piştî Balzac êdî sosyolojî dikeve romanê û roman dibe bavê hişmendî, dîrok û felsefê. Bi Gorkî jî, roman „îzmê“ tevî tevna hûnandina xwe dike. Lewma ez diakarim bêjim ku derengmayîna romana Kurdî, bi destînin/çarenûsa cografya Kurdistanê ve girêdayî ye.

Pîvanên romana serketî jî, ji aliyê rojava ve tênê diyarkirin. Lewma, romannivîsên ne ji xwe û li gorî hişmendiya wan tevnagerin, wek afirgerên

ku di şevê de digerin, bi nav dikin. Xelatan li gorî wê pîvanê bela dikin. Mînaka xelata Nobelê... Siyaset ji xelatdayina wan dibare. Rast e, siyaset û edebiyat ji hev nayên qutkirin. Lê du eniyên li dijî hev in. Siyaset dixwaze serdestiya xwe li ser edebiyatê sazkar bike; edebiyat jî dixwaze siyasetê bi çekê gotinê bîne ser riya rast. Di klîmatên li dijî hev in.

Roman, di sedsala 19'an de gihaye hêza xwe ya mezin. Destîniya romanê di vê sedsalê de û bi Balzac tê guhertin û di sedsala 20'an de jî, bi Proust destiniyaxwe diguhere. Di navbera romana Kurd û romana cîhanê de sed, sedûpêncî sal hene. Ez sedsala 19'an, ji bo romana Kurdî, ji bo edebiyata Kurdî, windahî nabînim. Ya 20 windahî ye û bûye sedema valahiyên fereh û kûr. Eger di lîteretura cîhanê de, destan, trajedî, ji serdema Roma, Stricon wek romanên destpêkê bîn qebûl kirin... Destanên dirêj yê Kurdî, trajedî û teatro, li Kurdistanê jî demsalên zêrîn jiyane. Bêguman valahiyên dîrokê, ev nîrxên girnanbiha di xêşim û hêrikên demsalên dijwar de winda kirine. Lê eger destînî/çarenûsa cografya Kurdistanê werê guhertin, ew hêrik wê werin wejartin û xêşim jî wê werin ronî kirin.

Lê valahiyên dîrokî, ne tenê li cem Kurdan hene. Binêrin Cerwantes, Don Quichotte di sedsala 16'an de nivîsî ye û destpêka romana rojava ye. Lê demeke dirêj, roman, wek çîrokên aşqûmeşkê û tenê ji bo jinan hatine nivîsandin. Jinên ku diçûne Qutsê, dibûne MAKSÎ, ew roman dixwendin. Lê cardin, divê ku em erê bikin ku pritûkê bandor li jiyana kesayetîya Kurd ne kiriye. Ev jî bûye sedema ku, hêzên dagirker, zû pêl kesayetîya Kurd bikin û mûrê mirovên Kurd bişikînin. Bêguman ev mijar hinekî bi aboriyê ve, bi detshialdariyê ve jî girêdayî ye.

Gelê Kurd hinekî zarok e û ji guhdarî kirina çîrokan hes dike. Destînî/çarenûsa bextreş derfetên têkiliya bi pirtûkê re nedaye. Ez ne behsa gundîyan bi tenê dikim. Bajar jî di nav de ne... Dema ku cografya Kurdistanê hate dagirkirin, kesayetîya Kurd, mêjiyê Kurd, ferhenga Kurd, beden û mêjiyê Kurd, gund û bajarên û alfabeya Kurd jî hate dagirkirin. Her tişt MULGA bû. Tune hate hesibandin, hate redkirin. Di hoy û mercên îro de, qonaxek hatiye bidestxistin û bijartina nivîskar û pirtûkan jî, êdî bi pîvan e. Civak jî hatiye guhertin. Lê ne bes e. Ji sedema ku kêşa navendî ya entelektueliya Kurd nîne, rêkûpêkiyek jî nîne. Eger rêkûpêkî nebe, xwedanasîn û nîrxandina li ser berhemana jî çênabe. Lewma rexnegîr nînin. Rexneyên tene kirin jî xesandî ne.

Heya ku şerê li Kurdistanê dewam bike jî, rewş wê neyê guhertin. Wê pêşbikevê, lê wê xesandî be.

Derengmayin ne di romanê de ye, di destînî/çarenûsa cografya Kurd de ye. Min lewma behsa xelata NOBELê kir. Her tişt bi xwedî. Eger şagirtên Îsa nebana û xwe di arêna Roma de neavêtibana devê şêran; Roma, ola Îsa fermî ne dikir û nedibû ola rojava teva. Hîna Xwedayê romana Kurdî û romannivîsên Kurdî nînin. Dema ku Xwedayê gelê nivîskaran nebin, Xwedayê nivîskaran û romana wan jî çênabin.

Ji bo ku derengmayin ji holê rabe, 4 tişt pêwîst in; niqutandina xwehdana li ser gotinan, têgihiştina dîroka dûr û nêzîk, sosoyolojî, aborî siyaseta û bûyerên rojana yên drametîk....

Rukiye Ozmen: *Pêwendiya roman û destanê li ser çi astêye?*

Medenî Ferho: Min li jor kin be jî behsa destan, trajediyên Yewnana kevin kir. Yanî berhemên demjiyana Yewnanîstanê ya helenîstîk. Di wê dema ku Yewnan ev demjiyanên tîr ronahî dijîn, Mezopotamya û tevahiya Kurdistanê, demjiyana zêrîn dijî û bi dehan destanên dirêj, ku bi gotinên efsûnî hatibûn hûnandin, di devê mirovên di rêzê de jî, di reng-epîkî de dihatin lorandin. Mîrateya demjiyana „destanê dirêj“ hîna jî, di malbatên Mala Kinê û Qewal û Feqîrên Êzdiyan dijîn. Ev mîrateyeke dewlemend e, lê bi dagirkirina cografya Kurdistanê re û bi qirkirina kulturê re, di nava ewrên reş de hate pêçan. Kete ezberê mirovan û bûne bingeha çîrokên endîrekt yên gelê Kurd. Îro, eger Begê Beglayê û efsaneya hespê wî Kerkidan, ji aliyê gelek kesan ve nayê zanîn, ev sedem e. Ji ber ku begê Beglayê di ziyareta Kêlo de razayî ye û hîrêna Kerkidanê wî jî li Şewlê Beglayê tê. Kes dengê wî nake.

Baş tê zanîn ku Roma, piştî bajarê Troya bi 8 salan hatiye avakirin. Ev tê wateya ku hingî Nisêbîn heye, Mêrdîn heye, Dara heye, Marîn heye, Riha û hwd. hene. Li gorî arkeologan, gundên li cografya Kurdistan û Mezopotamya, li qeraxên Çiyayên Zagrosan erebeyên hespan dibezandin û rimên duwazdeh weselî, mertalên ji çermên bablibeyan û gurzên neh ritilî, berî wê demê jî hebûn. Ji bo Semsurê, dîroka 40 hezar sal tê diki-randin. Erdîşêrî Destdirêj, di Tewratê de, pesnê xwe bi 77 dewletên bindestên hukumraniya xwe de, tîne ziman û pesindariya xwe dide. Navdariya dewlemendiya Kurdistan û Mezopotamya û hişmendiya pêşketî ya zanistê, bala Roma û mirovên weke Homeros jî kişandiye. Cîvak di aliyê aborî, civakî û exlaqî de serdestiyek dijî û kanalên avedanî û cenaniya zeviyan pêşketî bû.

Baş tê zanîn ku destanê Gilgamêş, berî Îlyada û Odysseia Homeros, bi 1300 salî hatiye nivîsandin. Berdewama Gilgamêş Rastemî Zal heye. Rastemî Zal dema Zihayê Mara di çavkaniya avam bajêr de dikuje, hîna

Rojhilat û Roma di daristanê de dijîn. Berî van teva, Destanê Tofana Nuh heye û mîratzedeyên Nuh jî Kurd in. Arkeologên ku nivîsandina bizmarî ya derbarê Tofana Nuh de dixwînin, heman çîrokê di Încîlê de jî dibînin.

Kêştiya Nuh, xelesa temam kirina armanca Prometheus e. Kawayê Hesinker jî, xelesa sêyemîn ya parastina nîrxên mirovahiyê û şerê li dijî tîrantiyê ye. Eger romana vî şerê dîrokî û watedar neyê nivîsandin, hingî şans wînda dibe û derengmayin dibê tovê waweylê.

Îro jî, li wargehê Prometheus, deşt û newalên Gilgamêş, cihê rawestandina kêştiya Nuhê Kal û cihê agirê Kawayê Hesinker, xelaka çaremîn ya azadiya gelên li herêmê û parastina nîrxên mirovahiyê, tê sazarkirin. Di armanca van teva de, armanceke entelektuelî û jiyana azad û bi rûmet heye. Jiyana azad û bi rûmet, bi pirtûk e. Ev destan teva, di nava dem û mekan de, di çarçoveya xwezahiya mirov û nîrxên mirovahiyê de hatine afirandin. Marduk, yan jî berî wê Tîamat ku hêzên cinên li Marînê bi cih kirine heman tişt in. Ev mijar di Qura'ana cenabê Mihemed de jî heye, lê navê Nisêbînê tê dikirandin. Yanî nivîs bûye bingeha şaristaniyê. Nûneriya nivîsê jî roman e. Îro roman serkêşiya nasnameya şaristaniyê dike. Civak eger ne xwedî girîşkirina kultur be û ji şaristaniyê payadariya xwe nestîne, nikare di nava malbata cîhanê de bibe xwed rûmet. Lewma roman, hinekî pîrozî û nîrxê civaka xwe ye.

Ev teva, ji bo nivîskarên Kurd binyat û çavkaniyên dewlemend in. Yanî nivîskarên Kurd, li ser çavkanî û xezîneya herî dewlemend ya cîhanê rûniştine. Mixabin, nivîskarên Kurd pirsan ji xwe nakin. Wek pîrsa, ez kî me, ez çi binivîsim û li ser kîjan binyatê biafirînim. Bêguman emê ji romana cîhanê jî sûdbigirin. Lê em copy nakin. Ji ber ku, romana Rusya ya klasîk dikare, nivîskarên Kurd bike nava şaşiyên ku bingeheke civaka nexweş ava bikin. Romana Ingilîzan jî, dikare nivîskarên Kurd, bike şatoyên bi ewrên reş pêçayî û bike qesr û qonaxên têr xêşim ku tîrêjen ronahiyê nabînin.

Divê ku nivîskarên Kurd, bi romanên xwe, bersivê bidin feylesofiya civaka Kurd.

Nivîskarên cîhanê, heya dawiyê ji destanên dirêj û mîtolojiya gelên xwe sûdgirtine. Em dikarin bêjin ku destanên gelên din û mîtolojiya gelên din jî kirine bingeha afirandina hişmendiya xwe. Lewma wek endam, nûner û pêşengên kultura cîhanşimûl hatine binavkirin. Wek mînak, Goethe evîndarê Rojhilat e û Yewnana kevin û Rojhilata Navîn dike bingeha hişmendiya xwe. Nietzsche bi Zend Avesta dibe feylesofê dema xwe. Victor Hugo, piştî ku li Espanya Grubekî Rojhilatî temaşe dike, di dilê wî de

evîndariya Rojhilat dipîşkive û di sala 1828'an de, „Les Orientales“ dinivîse. Victor Hugo, bi helbestên Rojhilata Navîn serxweş dibe.

Yewnanîstan humanîzmê ji Mezopotamya û Kurdistanê distîne û radestî Ewropa dike. Li gorî hinek sosyologan, piştî ku Zend Avesta bi zimanê Ewropî hate wergerandin, dergehê ronahiyê li ber rojava vedibe. Nivîskarên Kurd, îro jî, bi bûyerên wiha destanî, bi pexşan û helbestên jan û jînê re radizin û radibin. Dive ku zanibin muzîka van rojên bi nîrx, di nava senfoniya xwe de bihelînin.

Rukiye Ozmen: *Rewşa romana kurdî, heger mirov di qonaxan de binav bike çi ne ev qonax?*

Medenî Ferho: Gelê Kurd, di qonaxeke guhertinî de ye û ev qonax destpêka ronesanseke ye. Di tevahiya Rojhilata Navîn de jî dergehê şoreşekê vedibe. Dema ku mirov di vê qonaxa giring û dîrokî de li romana Kurdi dinêre, mixabin ji himbêz kirina civaka xwe dûr e û nebûye bersiva dema xwe. Nivîskarên Kurd, bi beden û mêjiyê xwe, bi xewn û xeyalên xwe, bi ziman û kultura xwe hina nebûne Kurd. Gelek ji nivîskarên Kurd, cûreyê pirtûkên xwe nizanin. Ev mijar di pirseke we de jî hebû, lê min şerm kir ku bersivê bidim. Nivîskarê ku cureyê pirtûka xwe nizanibe, hîna ji edebiyatê, ji kulturê, ji nivîskariyê jî dûr e.

Di qonaxa îro de, gelê Kurd bêhtirîn siyasî ye. Jiyan jî siyasî ye û debora rojane jî siyasî ye. Lê nivîskarên Kurd, ji vê pêvajoya dîrokî dûr in. Ji sedema ku jiyan siyasî ye, dîrok jî siyasî dibe. Mirovê ji siyasetê dûr be, ji jiyanê, ji tevgera civakê û gerênekên cîhanê, qîr û teşqeleyên cîhanê dûr e. Mirovê ku ji van gerênekan teva dûr be, çawa dikare bibê bersiva dema xwe? Nivîskarên Kurd, di her firsetê de, dûrbûna xwe ya ji siyasetê tînin ziman. Lê, rastî, ne wilo ye. Tenê bi dev dûr in. Di kiryar û nivîsên xwe de siyasetê dikin. Dema ku dibêjin, rewşenbîrî û nivîskarî ji siyasetê dûr e, xwe “cahil/xêşîm” dikin. Yan jî xwe dixapînin. Nivîskarê ku îro bêje “ez bê alî me”, li dijî hebûna xwe û li dijî rastiya gelê Kurd e. Dikevê bîreke bêbinî. Lê, rastiya wan nivîskaran cûda ye, hinek tîrs, hinek berjewendî, hinek bexilî ye. Bi van gotinan alîgiriya xwe jî vedişêrin. Bêguman kesî xêşîm jî nemaye.

Nivîskarên cîhanê, xwe ji siyasetê dûr nekirine, xwe ji partiyan dûr kirine. Gelê Kurd jî, îro, di nava çeqûberka kujeriya siyasî, kulturî û cîvakî de ye. Êrîşên li ser gelê Kurd jî, berxwedana gelê Kurd jî, pîrhêlî û berfireh e. Dijmin li dijî gelê Kurd seferberiyê berfireh û dijwar daye dest pê kirin. Ne tenê eskerî; kulturî, entelektuelî, psîkolojîk, aborî, civakî û hwd. Cîhana Global, vîjdan jî, hest û exlaq jî di wezna rîtîl û warîlên

petrolê de winda kirine. Di rewşeke wiha de, eger nivîskarên Kurd, di her hêlê de, nebin bersiva dema xwe û di şerê gotinê de nebin pêşengên gelê xwe, lewaz in û misrî ne. Lewma min got, di romana Kurdî de, hîna gelê Kurd ne hatiye himbêz kirin.

Roman gotin e. Gotin jî şûr û hêza entelektuelan e. Entelektuelê ku hêza xwe ji bo gelê xwe bikarneyîne, nîne. Romana Kurd di vê qonaxa giring de, di siya nivîskar û entelektuelên felcoyî de, berxwe dide. Sedema vê jî pirhêlî ye.

Aliyê din, nivîskarên Kurd teva li bajaran dijîn, lê hîna nebûna bajarî. Ez di pirtûkên nivîskarên Kurd de, giyanê pakrewanî ku dikaribe felsefê bike û bibe bersiva feylesofiya civaka Kurd nabînim. Tenê ziman û nivîsandina romanê, bi Zimanê Kurdî, ne bes e û nikare bibê bersiva demê. Ji ber ku dîrok û cografya, kultur û cografya girêdayî hev in. Dîroka ji cografya qut, nabe dîrok, kultura ji cografya qut, wek diraxa li ber baranê bê dêran e: ka, qesele, quncir û libên dextê teva di nava hev de, gelcoyî dibin, dibine gorîf. Lê car din ez nabêjim romana Kurdî nîne. Heye, ji qonaxa çalepkîtiyê derbas kiriye. Lê bê xwedî ye. Pêşi xwediyê romanê li romanê xwedî dernakevin. Redkirin, dijberî û ne erênî, karê herî hêsa ye û arzan e. Her kes li dijî her kesî ye. Kes kesî baş nabîne. Wek tolhildanê.... Ev jî ji kambaxiya feodalî te. Min berî niha gotibû, mirovê herî pêşketî yên Kurd hinekî feodal e. Rexnegirên me jî, di nava esar û perçiqandina feodalî de dinalin. Her kes, nivîskarê li dora xwe dibîne. Hevaldostikên hev.

Ji sedema ku nivîskarên Kurd, (pirraniya wan) bi kultura Kurdî mezin nebûne. Bi Zimanê Kurdî perwerdehî nedîtine, lewma nivîskarên ji çar parçeyên Kurdistanê, dibin bandora kultura dagirkerên parçeyên xwe de ne. Zarok bi dîlokan, bi lorandinê, bi çîrokên dayik û dayînan mezin dibin. Zarokên Kurd, di navbera mal û dibistanê de mabûn şelişî. Dema ji dibistanê vedigeriyan malê, rastî kultureke meddî dibin, lê ya manewî nabînin. Didîtin, lê nizanîbûn ya wan e, yan na. Eger zanîbûna ev kuştura manewî jî ya wan e, newêrabûn bêjin ya min e û pesnê xwe pê bidin. Zanyariya civakê jî, di çîrok û efsaneyên nepenî de bû. Ev hinekî tê wateya bêdengiyê. Bêdengiya civakê, tirs e û ev tirs jî, bandorê li beden û mêjiyê zarokan dike. Ew zarok jî, îro nivîskar in. Eger li welat bin, bête-refiyê dijîn û xwe pûç û felc dikin. Eger li penaberiyê bin, bêhtirîn xwe pûç û felc dikin. Mînaka van gotinên min, rewşa belabûyî, ne rêxistinîbûna nivîskaran e.

Nivîskar û rewşenbîrên Frensa, ji bo ku zimanê xwe pêşbixin, 3-4-5-6-7-8 kes hatine cem hev û li ser edebiyetê, li ser nivîs û pirtûkan axivîne. Lê

civînen xwe sistematîk pêkanîne. Ev civînen sistematîk wek „akademî” derketine holê. Li Frensa, her bajarekî 3-4-5 akademiye bi vî rengî haitine sazkar kirin û di destpêkê de, zimanê xitabetê/axaftina li hemberî girse pêşxistinê û di encamê de zimanê felsefê afirandine. Li Italya, nivîskaran bi heman rengî têkoşîn kirine û li dijî zimanê Latîni 350 salî şer kirine. Lewma, „gotin” li Ewropa pîroz hatiye dîtin. Hinek sosyolog, yan jî dîrokzan, pîroziya „gotin”ê li Ewropa bi şerê navbera çînan ve girêdidin û sedema wê jî, bi „îzm”an tînine ziman. Lê ez, ne di wê baweriyê de me: Ji ber ku, di heyamên ronahiya Kurdistan û Mezopotamya de, Ewropa di nava daristanên reş û tarî de dijî û dîtin ku Yewnana Klasîk, bi „gotin”ê gihaye qonaxa dayikîtiya dîrokê. Wan jî heman rêbaz bijartîye. Yanî gotin, kirine bingeha pêşkeftina xwe. Her hevok, her paragraf, her pexşan û pirtûk pîroz dîtine. Lê em, ji bo rêşkirina nivîsekê, pirtûkekê, ji sed çok û çemî, ji sed bêrm û deryayî avê tînin û bi serde dikanin, da ku li ber lehî û çapê biçe.

Rêxistinî kulturek e. Rêxisinî hêza hevreyî û dengê hevreyî ye. Hêza hişmendiyên cûda û xwedî derketina li nîrx û pîroziyan e. Mixabin nivîskarên Kurd, ji vî kulturê dûr in. Ji ber ku siyaset hewqasî pîroz e ku tenê ji siyasetmedaran re nayê hiştin. Nîrx û pîroziyên gelê Kurd, zarokên gelê Kurd, diber şîbaqa dagirkeriya hov û faşîzma „linckar” de ne. Nivîskarên Kurd li dijî van kiryanan dengê hevreyî û tifaqî dernayêxin. Helbet ev wê bibe sedema rexne û gazinan. Helbet ev rewş wê bandora xwe li nivîsên nivîskaran jî bike. Çend ciwanên ku dûçarî linca faşîstan dibin, ciwanên ku li dijî hêzên dagirker şerê destanî dikin, di çîrok û helbestên nivîskarên Kurd de cih girtine? Nivîs nîrxekî pîroz yê mirov û jiyanê ye. Eger nivîs, ji jiyanê qut bin, eger ji bûyerên rojane, ji mirovan, ji civakê qut bin, wê mîrateyeke çawa û çavdêriyeke çawa radestî nîfşên paşerojan werê kirin?

Nivîskarên Kurd tirsonek in. Gelê Kurd, di dîrokê de qurbanê birakujî û xiyaneî ye. Îro jî, ev birîna mûmarî bi idab û xwîn e û ha ha kirêtî û şermazariyê dimîze. Gelo çend pirtûk li ser vî birîna mûmarî hatine nivîsandin? Her nivîskarên Kurd, li herêma xwe, li herêma cîranê xwe, bûye çavdêrê bûyarên wiha dramatîk. Lê nanivîsin. Çima ji ber ku bêzirav in. Dema ku nivîskar bêzirav be û ji mahrimono/tertkirinê, afarozkirinê, ji dijberî û êrîşên dijmin û kesên xayin bitirse, nikare rol û misyona nivîskariyê bilîze. Nivîskar dikare direkt, kesane, malbatan nekê hedefa xwe, bi zimanê cewherê afirgeriyê, neşterê biavêje birînê, piştî derman bike.

Bi îdîayeke ku ez dibêjim Zimanê Kurdî, dayik, yan jî bingeha zimanên cîhanê ye û kultura Kurdistan û Mezopotamya û Hindistanê bingeha

kultura cîhanê ye; dibe ku gelek kes min rexne jî bikin. Lê îdîa min ev e. Em di qonaxa îddîayan de dijîn û romana Kurdî jî, di çarçoveya îddîayê de ye. Romana Kurdî, helbesta Kurdî, çîroka Kurdî, destînî/ çarenûsa cografya Kurdî dijî. Hinek ji nivîskarên Kurd, xwestin xwe bispêrin Tirkan. Hinekî serketin jî bidestxistin. Lê encam? Xwexapandin e. Îro jî heman xapandin dewam dike.

Magazîna edebiyata Kurdî, vala ye, bendeyî alavên di refên magazîna kultura Kurdî de werin nijandinin e. Pêwiste werê zanîn ku, her pirtûk nirxekî cûda ye, pîvaneke sosyolojîk a civaka Kurd e.

Roman kûrrîtiya (îştahya) dîrok, felsefê û sosyolojî ye. Romana Kurdî jî, li derfetên xwe digere. Eger romannivîsên Kurd, dikaribin romanê di van dabaşan de têr bikin, wê bersiva demê jî bidin û civaka Kurd jî, di her alî de himbêz bikin.

Romana Kurdî hîna li derfetên xwe digere.

Rukiye Ozmen: *Roman rolekî çawe ji bo civakê dileyîze?*

Medenî Ferho: Bi gotineke klasîk, roman civak e. Wateya romanê zimanê gel e û di “sedsala navîn” de, roman di wateya zimanê gel de hatiye bikaranîn. (Di sala 1840’î de, li Strasbourg jî, ji bo zimanê gel, ev gotina dihate bikaranîn.) Di destpêkê de, roman derî edebiyatê, zimanê kolanên bû. Piştî, berhemên ku bangî gel û cemawer dikin teva, bi navê romanê hatin binavkirin. Di destpêkê de, ji bo çîrokbêjan jî, roman dihate gotin. Lê îro, roman di wateyek din de tê bikaranîn. Roman, xwedî erka ku bî îddîa ye û civakê himbêzdikê ye. Îddîayeke mezin û cîhanşumûlî ye. Êdî, hişmendiya malbata mirovahiyê teva, di gotina romanê de veşartî ye. Lê, eger xwediyê wê îdea mezin, berê xwe ji dewlemendiya xwe, ji civaka xwe biguhere, lingê wê li hewa dimîne û di encamê de winda dimîne. Gotina Kurdan ku dibêjin, “riya gerdûnê ji devê pîpînkê deriyê mirov dest pê dike”, dikare bibe bersiva roman Kurdî. Kesên bi îdea mezin derkevin rê, pêwist e, li mîrateya civaka xwe xwedî debikeve û li firaza paşerojê bavûkalên xwe binêre.

Sedema bihêziya romanê, banga li gel e, mijar û dabaşa li ser qîr û teşqeyên cemawer e. Di sedsala navîn de, roman bûye evîn, bûye sewda û ji aliyê jinan ve hatiye himbêz kirin. Parêzvanê romanê jin e. Jin, nîvê civakê ye û xwedîtî li romanê kiriye. Lewna, min gotineke klasîk a “roman civak e” bi kar anî. Belkî ji sedema ku di destpêkê de, jin li romanê xwedî derketin, min ew gotin bi kar anî. Jina dayika civakê ye û pêşengê jiyanê ye. Bêguman hevparê mîr e û serdestiya mîr jî erê kiriye. Lê di rastiye de, parêzvanê civakê jin e.

Di nava demê de, efsûna romanê bi hêz dibe û şax û per vedide. Dest diavêje zanistên mirovaniyê. Ji jiyana rojane bigirin, heya bi qesrûqonaxên key û keybanûyan, şah û padîşahan digire nava xwe. Di romanê de, her mirov xwedî rolek e. Ev bûye sedema ku roman, îştah û îhtîrasa abadanî di nava xwe de ragire. Dem tê ku, roman bi romanê yariyên xwe dike, di nava romanê de, felsefe bi felsefê yariyên xwe dike. Ji bilî romanê tu baskên din yê edebiyatê nikare vê hêzê destnîşan bike. Romanê, di civaka rojavayîyan de şoreş çêkir û di evînê de, di eşqê de, di wekheviya jinê de şoreş çêkir. Di encamê de, li Frensa Rabelaîs derket û Gargantua nivîsî; Piştî li Espanya Cervantes derket û Don Qishotte nivîsî. Her du roman jî, fantastîk û rexnegîrî ne. Nivîskaran, rastiya civakê, ya demê, di nava hûnandin û zimanê romanê de veşartine. Rexneya demê û kultura demê ne. Pirranî Rabelaîs, di bin cilê de, despotîzma dêrê rexne dike. Rastiya di nava fantazî û mîzahê de didêje. Dêr, li dijî rastiya ye û Rabelaîs doktor e û piştî ku Gargantua nivîsî ditirse, dêr wî jî, pîşeyê wî jî afaroz/mahrumono bike. Cervantes jî, rexneya demê ye û hîna wek keliha rexnegîrîya her demê li ser lingan e.

Piştî Ehmedê Xanî û nivîsandina Mem û Zîn, jiyan qut bûye û valahiyek keitye navbera kultura nivîskî û jiyana civaka Kurd de. Divê ku em baş zanibin ku Destanê memê Alan, bi guhertina Mem û Zînê, destpêka şoreş, yan jî guhertina civaka Kurd e. Herî hindik Ehmedê Xanî, ew armanca daye ber xwe. Lewma Kurd dibêjin; Zîn jiyan e, Mem xwedîtî ye, Qeretacîn bextê mirovahiyê ye û Mîr jî erk e... Dema mirov li vê şîrovê dinêre, vekirî tê xuya kirin ku, Ehmedê Xanî, li dijî guvaştina erk û zordestiya olê, çekê gotinê û mertalê destanan bijartîye. Lê valahiya derketiye holê, ev destpêk daye rawestandî. Gotinên Birêz Abdulah Oclana ku dibêje, ew armanca û daxwaza Ehmedê Xanî tînine cih, hinekî ev e.

Di encamê de, romanivîsên cîhanê, dekora xwe ji welatê xwe bijartîye û berê xwe dane civaka xwe. Vê riyê jî, nîrxê pêşengiyê daye wan. Ev jî bû sedema ku di “romanê de destpêkek” hebe. Ev destpêk wek bûna zarokê ye. Rastiya ku “mîrov bi limêj û niyazan tenê nagihe deverêkê” ye. Ked û tevger, rêxistin û tîkilî pêwîst e. Eger mirov kar nekê, kedê nedê, berheiman derneyêxe, yan dibê tolaz, dibe sewtelî, dibe serserî û aware, yan jî wek mîrovê sewsî, ji civakê tert dibe. Ji sedema ku Casamîdo, lehengê Victor Hugo, zangoç û seorê dêrê ye, xwedî karekî ye, rola xwe jî di civakê de dilîze. Victor Hugo belaş ev rol nedaye Qasemîdo. Karkirin û ked, arîkarê civakê ye û di romanê de nayê tert kirin û welî kirin. Keda Qasemîdo ya ji bo Esmeral de giring e.

Di sîstema sosyalîst de jî roleke giring ji romanê re hatiye qaz kirin. Digotin: Berhemekî hûner, bê îdeolojiya gel, karker û cemawer bikare li ser lingan bimîne. Nivîskar jî, nikare ji pêşketinan, ji tevgera civakê, ji qîr û teşqeleyên civakê dûr bikeve. Ev tê wateya ku nivîskar, li hemberî objektîfiya bûyer û qerqesûnên civakê, nikare subjektîf bimîne. Bê çiqasî utopya mirovan heye, utopya civakan jî heye û romannivîs, di nava estetîzeyaya edebiyatê de, nîgarkêşiya asoyên wê utopya dike.

Roman, di dema me de, bûye Încîla civakan û li dijî kuştina bawerî û zimanê civakan mertalê parastinê ye. Bêhtir ji ansiklopediyê, bêhtir ji ferhengê, neynika dema xwe ye. Ji ber ku roman, pêşeng, yan jî rêzanê karwanê dîrokê, felsefê, sosyolojî, cofrafya, ziman, psîkolojî, û hwd. teva ye.

Roman, hişmendiya azad e û tevahiya hişmendiyan jî di nava xwe de diragire.

Rukiye Ozmen: *Pirsên mw ev in, zor spas!*

Medenî Ferho: Spas xweş!

Hevpeyvîn bi Lokman Polat re

Hevpeyvîn: Rukiye Ozmen:

Rukiye Ozmen: *Di dîroka romanê de qonax hene ku bi „îzmên“ corecor têne binavkirin û ev qonax ji destpêka xwe ber bi îro de bi hezaran roman di himbêza xwe de digre, ji vî cîhê derengmayî awantaj û dezawantajên me, şens û bêşansiya me, îro mirov rehet dikare xwe bighîne wan?*

Lokman Polat: Romana kurdî ji bo ku nû ye, îzm û ekolên edebî yên navnetewî hêj nû bandora xwe danîne ser edebiyata kurdî. Derengmayin bi xwe re dezavantaj anîye. Şans û bêşansiya kurdan jî ji ber konjuktura welat û rewşa civakî ye. Heger dewleta kurdan heba, kurd azad bana û di dibistanan de bi kurdî perwerde pêk bihata, dê rewşa edebiyata kurdî cudaba û dê gelek pêşketî ba.

Îzmên curbicur di nav edebiyata kurdî de bi şêweyeke xurt bi cih nebûne. Lêbelê berhemên kurdî yên edebî herweke çîrok, helbest û romanên kurdî li gor ”îzmên” edebî hatine afirandin. Wek mînak, romanên kurdî yên li gor realîzmê, romantîzmê, modernîzmê, post-modernîzmê, sembolîzmê, naturalîzm û hwd, hatine afirandin hene.

Ji bo xwe gihastina wan, pêwîst nake îla em bigîşin wan. Weke hejmar weşandina hejmara çîrok, helbest û romanên kurdî nemimkûne ku bigîşe wan. Lê, wek naverok, kalîte û hemû cure nîrxên edebî, berhemên ku nivîskarên kurd diafirînin bi qasê gelekên wan hene.

Rûkiye Ozmen: *Ji bo romaneke baş û serketî bê ku em bêjin dîro-kî, psîkolojîk yan jî bi coreyekî din, postmodern, çend pîvanên ferz binav bikin?*

Lokman Polat: Edebiyat bi hemû şaxên xwe ve dewlemendiyek e. Çawa ku gelek şaxên edebiyatê hene, herweha gelek cureyên romanê jî hene. Gelek roman li gor ekolên edebî yên navnatewî têne binavkirin. Di nav hemû ekolên edebî de romanên baş û serketî jî hene û yên qels jî hene. Başî û serketina romanê ji alî rexnegirên edebî ve li gor zanîstiya wêjeyî

têne nirxandin.

Ji bo romaneke baş û serketî nêrîna xwendevanan cuda ye. Romaneke ji bo xwendevanekî baş be ji bo yekî din nebaş e. Hinek xwendevan ji romanên realîst û hinek ji romanên post-modernîst hez dikin. Pîvanên ferz yê ji bo başî û serketina romanê, di encama nirxandin û analîza rexnegirê edebî de derdikeve holê. Zimanê romanê, lihevûdu honandina wê, skruktur û estetîka wê, teknîka nivîsînê û asta berhemê tê ravekirin û encama başî û serketina berhemê derdikeve holê.

Rûkiye Ozmen: *Romana kurdî jî û çîroka kurdî herdû jî dereng ketine, sedemên dernegmayîne û heman pirs ji awureke bervaja û belkî hevdu temamkir, roman çawa bi pêş dikeve?*

Lokman Polat: Edebiyata kurdî ya devkî kevnare ye, qedîm e û gelek dewlemend e. Çîroka kurdî a devkî jî xwedî dîrokeke dûrûdirêj e. Lê edebiyata kurdî a nivîskî û bi taybetî roman û çîroka kurdî ya modern a nivîskî hêj nû ye.

Ji bo pêşketina romana kurdî di serî de kar û xebat û keda nivîskarên pêwîst e. Hebûn û pîrbûna xwendevanan pêwîst e. Di hêla aborî de jî pêkanîna rewşeke baş pêwîst e. Heger nivîskarên kurd berhemkar bin, pir bixebitin û baş bixebitin, berhem biafrînin, heger weşanxaneyên kurd bikaribin romanên romannivîskarên kurd biweşînin û heger xwendevan romanên kurdî bikin û bixwînin, dê rewşa romana kurdî baş bibe û pêş bikeve.

Rûkiye Ozmen: *Dema ku berhemek tê weşandin carna nîqaşa ew berhema çîrok e an jî roman e, tê kirin, cudahiya romanê ji çîrokê çîye?*

Lokman Polat: Di navlêkirina berhemên edebî yê kurdî de hinek tevlihevî heye. Ez bawerim ew jî dê di pêşerojê de ji holê rabe. Belê hinek pirtûkên kurdî neroman in, lê li ser berga wan wek roman hatiye nivîsîn. Hinek roman in, lê nivîskar cesaret nekiriye û li ser bergê tiştek nenivîsiye û pirtûk çi ye, çi nîne, li benda xwendevanan hêştiye ku xwendevan wê binav bikin. Hinek pirtûk jî hene ku roman in, lê li ser novel hatiye nivîsîn.

Di pirtûkên teorîk yê li ser edebiyatê de, di analîz û nirxandina pirs û pirsgerêkên edebiyatê de cudahiya roman û çîrokê hatine ravekirin. Di van pirtûkên analîza peyv û berhemên edebî de roman çi ye? Çîrok çi ye? Û hwd, bi zanistiyeke edebî ji xwendevanan re hatine pêşkêşkirin. Her çiqas bi kurdî pirtûkên weha tunebin jî, di zimanên din de gelek pirtûkên weha hene. Divê kurd van pirtûkan bixwînin û fêr bibin bê cudahî çi ne.

Tevliheviya navlêdana pirtûkên kurdî yên curbecur bi fêrbûnê, bi zanîne dikare ji holê rabe.

Bêşansiya edebiyata kurdî yek jê ev e ku; Bi qasê ku ez zanim di nav edebiyatzanên kurdan de li ser edebiyata kurdî a nivîskî û di derbarê tesnîf û hilçinandina berhemên de, kîjan berhem romane kîjan nîne? Kîjan çîrok, helbest û şano ne, kîjan nînin? Analîzekî zanîstî nehatîye kirin û di derbarê vê mijarê de şîroveyên berfireh nehatine weşandin. Şîroveyên ku li ser berhemên hatine kirin, analîzên edebî nînin. Lewre jî di nav edebiyata kurdî de û di navlêdana berhemên edebî de keyfîyeteke pêk hatiye. Dilê kê çi xwestîye ew tiştî bi berhema xwe ve kiriye. Nivîskarekî ji xwe re çîrok nivîsiye û li ser berga wê gotîye roman e. Yekî roman nivîsiye û li ser berga wê gotîye novel e. Yekê çend diyalogên di navbera çend kesan de nivîsiye û bê beş, bê perde, bê sahne, navê şanoyê lêdaniye û gotîye ev şano ye. Yekê pexşan nivîsiye û li ser berga pirtûkê gotîye helbest. Hinek pirtûkên şanoyê şano nînin, lê wan gotine şano.

Gelek nivîsên nivîskarên helbestvan, gelek pexşan wek helbest hatine pêşkêşkirin, lêbelê helbest nînin. Zilam satîr dinivîse, yan jî bi şêweya ceribandîne vegotin û gotar dinivîse û dibêje ev helbest e.

Xwezî rojê edebiyatzanekî yan jî lêkolînvaneke jî derbiketana û tasnîfa berhemên edebiyata kurdî bikirana. Hinek xwendevanên kurd dizanin ku bi rastî kîjan berhem roman e, kîjan çîrok e, kîjan helbest e û kîjan şano ye. Lêbelê ew vê zanebûna xwe nanivîsin. Loma jî divê lêkolînvaneke edebiyathez û edebiyatzan dest biavêje vê mijarê.

Rûkiye Ozmen: *Di navlêdana berhemên de jî tiştên seyr hene, ne wisa ye?*

Lokman Polat: Belê, wisa ye. Hinek navên pirtûkan ecêb in. Hinek nav bala mirov dîkşînin. Min li Stenbolê romaneke xwerû bi kurdî kirî, navê wê "Mandalîn bû." Di navlêdana navê pirtûkan de carna tiştên ecêb derdikevin holê û navên ecêb li pirtûkan datînin. Nivîskar yan jî weşanxane navekî li pirtûkê datîne, ew nav yan herêmîye yan jî navekî wisa ye ku kes bi maneya wî navî nizane. Li navê pirtûka Serkan Birûsk binêrin. Navê wê "Mextel" e. Mextel çi ye kes nizane. Min ji deh nivîskar û bîst xwendevanên kurd pirsî ku peyva "Mextel" çi ye û tê çi maneyê? Wan nizanibûn. Min bi xwe jî ev peyv qet nebihistibû. Ez çûm di nav behra zanîstê de, an ku di înternetê de, min li malpera "Ferhenga Kurdî" mêze kir, di ferhengê de jî peyveke weha tûnebû. Di Ansiklopediya Wîkîpediyê de jî ev pirtûk weke roman hatibû binavkirin. Lê min ev pirtûk xwendibû û li gor min ew roman nebû. Di naveroka pirtûka ku navê wê "Mextel" e

de çîrok, helbest, vegotin, pexşan û hwd, tişt hene. Pirtûk bi naveroka xwe tevlihev e. Di berhemek de helbest, çîrok – novel – û nexşên kurteromanê hebin, ew berhem dibe çi? Pirtûka bi navê "Mextel" jî dibe ew tişt.

Rûkiye Ozmen: *Pêwendiya roman û destanê li ser çi astêye?*

Lokman Polat: Di edebiyata kurdî ya devkî û ya nivîskî de destan kevn e. Destana Mem û Zîn sêsed sal berê hatiye nivîsîn. Çîroka Siyabend û Xecê, Evdalê Zeynikê, Derwêşê Evdî, Şêxê Senan, Adûle û gelekên din jî di nav zargotina kurdan a gelêrî de weke çîrok û weke destan jî têne gotin.

Edebiyata kurdî a nivîskî ya nûjen ji edebiyata kurdî ya klasîk sûd werdigre. Romannivîser dikarin ji ber destanên kurdî romanên baş û serketî biafirînin. Hinek nivîskarên kurd romana Derwêşê Evdî, Siyabend û Xecê, Ker û Kulîlk, Binevşa Narîn û yd, nivîsîne.

Dema mirov li edebiyata cîhanê jî dinêre, gelek romanên modern li ser bingeha naveroka destanên qedîm yên cîhanê hatine afirandin. Bi min divê kurd jî destanên kurdî – ku hinek jê gelek varyantên wan hene – weke roman binivîsin.

Rûkiye Ozmen: *Rewşa romana kurdî, heger mirov di qonaxan de binav bike çi ne ev qonax?*

Lokman Polat: Romana kurdî di çend qonaxan de derbas bûye? Heger mirov romana kurdî ya bakurê Kurdistanê, ya li Swêdê û ya kurdê Kafkasyayê bi hev re bigre û binirxîne dikare behsa sê qonaxan bike.

Di derbarê rewşa romana kurdî ya li başurê Kurdistanê û ya li rojhilatê Kurdistanê de zêde zanîna min û agahdariya min tune. Bi qasê ku ez zanim li van herdu parçeyên Kurdistanê jî romana kurdî qels e. Niha jî romana kurdî li bakurê Kurdistanê ji hersê parçeyên din yên Kurdistanê pêşetire û wek hejmar jî ji wan pirtir e. Digel ku li başurê Kurdistanê rewşeke azad pêkhatiye û ji berê ve bi soranî di dibistanan de perwerde pêk hatiye jî, romana kurdî bi qasê bakur pêş neketiye. Wek hejmar jî romanên bi zaravayê soranî bi qasê yên kurmançî tunin.

Destpêka romana kurdî di nav kurdên Kafkasyayê de (Sovyetên berê) dest pê kiriye. Romana kurdî a yekem jî romana Arebê Şemo ye. Digel Arebê Şemo, gelek nivîskarên kurd yên li Ermenîstanê û tevahiya welatên Kafkasyayê bi kurdî roman nivîsîne û hê jî dinivîsin. Dema min bersîva van pirsên Xanim Rûkiye Ozmenê dinivîsand ez pê hesiyam ku nivîs-

karekî kurd ê Azerbeycanê bi kurdî romaneke nivîsiye û weşandiye. Roman û pirtûkên nivîskarên kurd yên Kafkasyayê, herweke roman û pirtûkên Areb Şemo, Eliyê Evdirahman, Eskerê Boyik, Heciyê Cindî û gelekên din li bakurê Kurdistanê ji nûve hatine weşandin û hinekên din jî li dorê ne ku werine weşandinê.

Li Swêdê jî gelek romanên kurdî hatin weşandin. Bi dehan roman-nivîserên kurd yên ku li Swêdê bi cih û war bûne, her yek sê, çar heta hinnekan heft, heşt roman nivîsîne. Hêj jî wek hejmar pîraniya roman, çîrok û cure pirtûkên kurdî ji alî nivîskarên kurd yên ku li Swêdê ne, tene nivîsîn û weşandinê.

Di van deh, panzdeh salên dawîn de romannivîserên kurd yên li Kurdistanê û Tirkîyê jî gelek romanên kurdî nivîsîne û dinivîsin. Niha her diçe hejmara romannivîserên kurd yên li welêt zêde dibe.

Bi min qonaxa yekem a romana kurdî weşandina romanên kurdî yên li Sovyeta berê ne. Qonaxa duyem weşandina romanên kurdî yên li Swêdê ne. Qonaxa sêyem jî weşandina bi sedan romanên kurdî yên li Tirkîyê – Stenbolê – û bakurê Kurdistanê –Amedê– ne. Niha em di vê qonaxa sêyem de ne.

Rûkiye Ozmen: *Dema gotin li ser romana kurdî ye, hinek behsa zaroktiyê dikin, hin dibêjin hê bi çar lepikan diçe, hinên din tena-tena dibêjin, hinek jî êdî zarok hesab nabe, zarokti di temen û di aliyê biyolojîk de tê zanîn kêma zêde, belê dema rewşa romanê bi îfade û tesbîtên li jor tê diyarkirin mebest çi ye, hûn çi dibêjin, çawa dibînin, romana me di rewşa kîjan kategoriyê ji van kategorîyan de ye û kîjan li rastiye nêzîk e?*

Lokman Polat: Di pêvajoya edebiyata cîhanê de jî diyare ku hinek nivîskar di bin bandora nivîskarên din de dimînin û teqlîda wan dikin. Hinek nivîskarên kurd jî di bin bandora nivîskarên cîhanê de dimînin û teqlîda wan dikin. Teqlîda ku hinek nivîskarên kurd dikin, teqlîdeke beloq e. Ew bi teqlîdeke nebaş dibîne wek karîkatur û kopîyeke xirab. Dema ew bi ser nakevin, zimandirêjiya berhemên kurdî dikin û romanên kurdî naecibînin heta bi êrişeke heqaretî romanên hinek romannivîserên kurd bi sîfetên nebaş tawanbar dikin. Heqareta herî dawî ya ji bo hinek romanên kurdî, navlêkirina “romanên beredayî” bû.

Helbet her kê li gor xwe rewşa romana kurdî dinirxîne. Hinek wê dikine zarok, hinek dikine ”beredayî” û hinek jî dikin mirî û dibêjin romana kurdî tune. Wana nirxandinên zanîst û objektîv nînin, nirxandinên tewşin. Psîkolojiya wan a nebaş û ruhiyeta wan a hest û ruhê koletiyê, menta-

lîteya xwebiçûkbûnê wan dixe rewşeke nebaş û lewre jî di derbarê romana kurdî de nirxandinên nebaş û tewşomewşo dikin.

Kurd ji neteweyeke vê cîhanê ne û ew jî wek însanên dinê insan in. Kêmaniya însanekî kurd ji yên din tune û wek însan, ne ji însanên din nizimtir e, ne jî bilindtir e, ji wan ne baştir e û ne xirabtir e. Nivîskarên kurd jî wek nivîskarên cîhanê nivîskar in û heryek li gor xwe berhem diafirîne. Çawa ku nivîskarên cîhanê berhemên edebî diafirînin, herweha nivîskarên kurd jî berhemên edebî yên li gor xwe diafirînin. Helbet hinek berhemên wan baş in, serketî ne û hinek jî qels in. Car heye nivîskarekî hem berhemeke baş û hem berhemeke qels diafirîne. Ev rewş ji bo nivîskarên cîhanê jî derbas dibe. Yanî bila kurd xwe biçûk nebînin û li pêşberê nivîskarên cîhanê xwe nizim nekin, xwe netewînin û nekevîne haletê ruhiyeta mentalîteya xwebiçûkbûnê. Zilam heyranê ewropiyan e, teqlîda wan dike, li pêşberê hinek nivîskarên fransî diçe secde, navê pirtûkek xwe dişibîne navê pirtûka nivîskarekî ewropî, navê pirtûkek xwe ê din weke navê rojnameyeke ewropî binav dike, teknîka nivîsîna hişmendiyê kopiye dike û berhemeke teqlîdî weke qarîkaturekî kopîyeyî ê xirab diafirîne, li ezameta berhemên nivîskarên ewropî dinêre û xwe li pêşberê wan ditewîne û di masmediya kurdan de pesnê wan dide û hinek roman-nivîserên kurd suçdar dike, wan bi gotinên bêedeb tawanbar dike. Nirxandinên kesan yan jî kesekî weha tu feydeyeke nagişîne edebiyata kurdî. Romana kurdî di rewşeke zaroktiyê de nîne, mezin e, temam e û her diçe dikemile. Bila kesên biçûk romana kurdî biçûk nebînin.

Rûkiye Ozmen: *Di nav romanên cîhanê de tu hez ji kîjan roman-nivîsan zêdetir dikî, ji bo kesekî romanxwîn û evîndarê romanan çend nav wê ne hesan be, belê herî zêde û di nav yên kurdî de?*

Lokman Polat: Ez ji berhemên romannivîserên klasîk yên cîhanê û bi taybetî jî ji yên Rusî û Fransî hez dikim. Herweha ez gelek pir ji şanoyên Shakespeare hez dikim. Min du pirtûkên Shakespeare bi wergera kurdî weşand. Min sê pirtûkên wî jî wergerandiye kurdî lê hêj neweşandiye. Herweha ez ji romanên Dostoyevskî, Tolstoy, Hugo, Zola û Balzac hez dikim.

Di nav romannivîserên kurd de jî ez ji romanên gelek nivîskarên kurd hez dikim. Lêbelê ez naxwazim navên wan bidim. Ez navên hinekan bidim û yên din nedim, dibe ku dilê wan ji min bimîne. Loma jî pêwîst nake ez nav bidim. Lê, ez vê bibêjim, bi rastî jî ez ji gelek romanên kurdî hez dikim.

Dema ez wek xwendevanekî romanên xwe dixwînim, ez ji wan jî hez

dikim. Piştî ku romaneke min tê çapkirin û belavkir in. Ez jî wek xwendevanekî kurd yekê dikirim û bi çavên xwendevanekî dixwînim. Di enca ma xwendinê de romanê –li gor zanîna xwe ya edebî – dinirxînim. Ji hêla hezkirinê ve jî, bi rastî jî ez ji romanên xwe hez dikim.

Rûkiye Ozmen: *Werger çendî ziman, stîl û formûlasyonêan bi pêş dixê?*

Lokman Polat: Yê ku ziman û edebiyata nivîskî dewlemend dike, yek jî jê wergerê. Ji bo pêşketina edebiyatê û dewlemendiya zimên werger xwedan roleke girîng e. Gelek zimanên qels, ji xêra wergerê re dewlemend bûn, pêş ketin. Li Tirkiyê piştê damezrandina komarê nivîsingehên wergerê yê fermî hatin damezrandin, bi navê “Tercume Burosu – Nivîsingeha Wergerê” vekirin û dest bi wergerê kirin, edebiyata cîhanê ya klasîk hemû wergerandin zimanê Tirkî. Hêj jî ji aliyê dewleta tirk ve her sal bi sedan pirtûkên klasîk û yê modern dihêne wergerandin. Tirkan ji xêra wergerê re zimanê xwe pêşve birin, dewlemend kirin.

Rûkiye Ozmen: *Romanên hatine wergerandin çendî serketî ne, Zimanê Kurdî çendî di bin barê wergerê de radibe.*

Lokman Polat: Di serîde ez vê bibêjim, Zimanê Kurdî zimanekî dewlemend e û bi hêsanî dikare di bin barê wergerê de rabe. Heger wergêr jîr be, zana be, erbabê karê xwe be û bi rastî hûnera wergerê bizanibe dikare romaneke bi hêsanî wergerîne kurdî.

Hinek berhemên edebî yê ji edebiyata cîhanê li kurdî hatine wergerandin û ew werger gelek baş in. Wek mînak wergêra pirtûka Shakespeara ya bi navê “Romeo û Julîet – Weşanên Helwest”, romana Xelîl Cibran ya bi navê “Baskên Şkestî – Weşanên Helwest” û gelek pirtûkên din ku bi kurdî hatine wergerandin gelek baş in.

Rûkiye Ozmen. *Werger çiqasî cewhera berhema ku tê wergerandin diparezê.*

Lokman Polat: Heger wergêr di berhema ku werdigerînê de tehrîfat çêneke, guhartinên biloq pêk neyne, dikare cewhera berhema ku werdigerîne biparêze. Lê, çi heyf ku hinek wergêr li gor dilê xwe di wergerê de guhertin çêdikin û cewhera berhemê naparêzin, wê xirab dikin. Ev jî tişteke nebaş e.

Werger bi serê xwe hûnerê û yê ku vê hûnerê bizanibe dikare wergerên baş bike. Werger divê li gorî qaîde, rêziman û rastnivîsîna wî zimanê be. Xweşî û başiya wergerê û her weha pêdiviya wergerê gelek heye. Werger zanîna mirov zêde dike, zimanê mirov dewlemend dike.

Rûkiye Ozmen: *Hûn bi xwe hez ji kîjan celebê romanên dîkin, nî-vîskarekî romanên bêşik hez kirina wî wê fireh be, wê bi kategori û çend kategoriyan ne sînorkirî be, belê cardî jî meyla mirov zêdetir bi ser hinan e, hûn xwe di kîjan kategoriye de dibînin, nêzîkî kîjanê ye ji wan ?*

Lokman Polat: Ez ji romanên evînî, romantîkî, dîrokî û keleşanî – macerayê – hez dikim. Wek qategorîya êkolên edebî jî ji berhemên realîst û surrealîst hez dikim. Navbera min û berhemên post-modernîst ewqas tune. Min xwendina gelek romanên post-modernîst nîvco hiştiye. Romanên post-modernîst zêde bala min nakşînin ser xwe û xwe bi min nadin xwendin, lewre jî ez nikarim xwendina wan temam bikim û ez nîvco dihêlim.

Ez xwe di kîjan kategorî de dibînim? Yan jî berhemên min aîdê kîjan kategorî ne? Ez bi nav nekim. Ev karê analîzker û rexnegirên edebî ne. Bila ew bibêjin ku berhemên min aîdê kîjan kategorî ne yan jî nînin.

Rûkiye Ozmen: *Roman rolekî çawe ji bo civakê dileyîze.*

Lokman Polat: Roman û bi taybetî edebiyat roleke sereke ji bo guhertin û pêşveçûna civakê dilîze. Ziman, çand û edebiyata neteweyekî hebûna wî neteweyî ne. Neteweyek ku zimanê xwe, çanda xwe, edebiyata xwe wenda bike, ew bi xwe jî wenda dibe, di nav neteweyên din de dihele, asîmîle dibe. Yê ku neteweyan li ser lingan dihêle ziman, çand û edebiyata wî neteweyî ye.

Di dema ronasansê û reforman de çanda gelên rojava bi romanê formeke nû stend. Roman bi vî forma xwe ya nû hû haceta guherandina civakê. Roman hû xwediyê fonksiyoneke girîng. Ev fonksiyona wê ya girîng hê jî didome.

Weke ku romannivîser Marîo Vargas jî dibêje: ” Hesasiyet û azadiya cîhana pêşerojê girêdayî edebiyatê ye. Edebiyat garantiya azadiyê ye, ji ber ku ew weke her tiştê din nikare were birêvebirin û kontrol kirin.

Edebiyat bingeheke hem ji bo zindîhiştina rexneyan li hemberî rastiya cîhanê û hem jî ji bo nûkirin û parastina ziman e.”

Rûkiye Ozmen: *Hayê we çendî ji romanên perçe û zaravayên din yê kurdan heye?*

Lokman Polat: Ji bo ku li başûrê Kurdistanê û li rojhilatê Kurdistanê alfabeya Mihemedî anku tîpên arebî / farisî bikar tînin û ez bi vî alfabeyê nizanim, lewre jî zêde hayê min ji romanên kurdên başûr û rojhilat ewqas tune. Dema romanên wan bi kurmancî û bi alfabeya latînî/kurdî têne

weşandin ez dikirim û dixwînim. Bi qasê ku ez zanim di wan herdu parçeyên Kurdistanê de romana kurdî (çi soranî çi kurmancî) bi qasê romana kurdî (kurmancî û zazakî) ya li bakurê Kurdistanê pêş neketiye.

Ji bo ku kurdên binxetê (başurê biçûk ê rojavayê Kurdistanê) bi alfabeya latînî/kurdî dinivîsin haya min ji hemû berhemên wan yê edebî û bi taybetî haya min ji romanên wir heye. Ez weke xwendevanekî kurd romanên Helîm Yusiv, Bavê Nazê, Jan Dost û yd, dikirim û dixwînim. Min ji başurê Kurdistanê romana Hesên Silîvanî û ji rojhilatê Kurdistanê romana Rehîm Qazî xwendiyê.

Rûkiye Ozmen: *Demek dirêj di ser berhema firîniya romanê re derbasbûye, roman jî form û hûnandina xwe bide me re diguhere gelo?*

Lokman Polat: Roman her diçe xwe nû dike. Form û teknîka roman-nivîseriyê tê guhertin, şeweyên nû derdikevin holê û di romanê de hertim pêşveçûn heye. Di romanê de pêşketin û guherînên nûn çêdibin. Dinya diguhere, roman jî diguhere. Teknîka nivîsîna romanê diguhere, nûjen dibe. Romanên Tolstoy, Dostoyevskî, Vîktor Hugo, Balzac û yê Susan Tamaro, Paulo Cuelho û Aleksandro Barîco ne wek hev in. Romanên berê her cildê wê 300 - 400 rûpel bûn, yê niha bi piranî wek cild nîn in û piraniya romanên niha ji 150 rûpelî nabûre. Hinek romanên nivîskarên Îtalî 100 rûpel in. Civak çiqas pêş bikeve, modern bibe, ji hêla îlm û teknîkê ve çiqas pêşketin çêbibin di romanê de jî dê herweha pêşketin çêbibe. Yanê pêşveçûnên di Fîzîk, Astronomî û hemû şaxên îlmê de pêk tên, li ser romanên felsefîk û dîtinên edebî tesîreke mezin dike. Dîtin û romanên felsefî û edebî jî li ser civakê tesîr dike.

Rûkiye Ozmen: *Xelatata Nobel û dîroka destpêkirina wê gelekî ji dîroka romana kurdî kevintir e. Ji romannivîsên gelên herêma Rojhilata Navîn Necîb Mehîfûzê Misrî, Orhan Pamûkê Tirk xelat girtin, rojeke xelatgirtin bibe dora me jî mimkûn e, pêşbînîyên we, fantazyên we?*

Lokman Polat: Di dayina xelata Nobelê de helwesta siyasî roleke girîng dilîze. Gelek xelatgirên cîhanê ji ber rewşa siyasî û konjuktura welatê wan bûn xwedî xelata Nobelê. Di xelatgirtina Orhan Pamuk de jî rola siyasî pêk hat. Heger li Tirkiyê li Orhan Pamuk doz nehatana vekirin, ji alî hêzên tarî ve bi mirînê nehatiba tehdîtîkirin, wî beyanê qetlîama ermenî û kurdan neaniyaba zimên, lobiya cihuyan piştigiriya wî nekirana, tenha ji bo berhemê xwe wî yê nikaribûya xelata Nobelê bigirta. Bi min ji Orhan Pamuk pirtir xelata nobelê heqê Yaşar Kemal bû. Îro jî ji Orhan

Pamuk pirtir heqê Ahmed Altan e.

Heger ji ber rewşa siyasî û konjuktura nû ya rojhilata navîn nivîskarekî kurd jî xelat bigre, divê mirov qet şaş nebe. Dema ez li hemû xelatgirên Nobelê dinêrim – ku min heryekê miheqeq pirtûkek wan xwendiyê – li gor rewşa wan a wê dema xelatê ya siyasî û civakî na, lê li gorê berhemên wan mirov binirxîne, çend nivîskarên kurd hene ku berhemên wan jî bi qasê yên xelatgiran bi nirx in û di asta wan de ne û wan jî xelata Nobelê heq kirine.

Rûkiye Ozmen: *Pirsên me evbûn, zor spas!*

Lokman Polat: Spas xweş!

Helîm Yûsiv

GOTAR

1: Qeyikên romana kurmancî di nav pêlên siyasetê de

Destpêkê, zelalkirina çend xalan:

Mebesta min ji nîfşê nû, nîfşê me ye, ew nîfşê ku di navbera salên 1990 heta 2010'an de bi nivîsandina roman, çîrok û helbesta kurmancî re mijûl e.

Zarokê bêjî, ew zarok e yê ku diya wî tê naskirin, lê bavê wî nayê naskirin, anku "bê bav e." Di civaka me de, ev peyv wekî dijûn, sixêf, tê bikaranîn.

Jixwe di civakeke nexwendî û ji zimanê xwe dûrketî de, nivîskarê wî zimanê "ku bi kêrî tiştekî nayê" wê mîna bêjiyekî ku bi kêrî tiştekî nayê, bê nîrxandin.

Mebesta min ew e, ku "dê" ya me, dikare wêjeya kurdî an jî Zimanê Kurdî be, anku diyeke naskirî ye. Lê "bav", bi gotineke din, pişt, xwedî li meydanê nîn e. Ew bav dikare dewlet be, dezgeh be, partî be, an jî aliyek xwedî îmkanên aborî be, dibe jî ku xwendevan be.

Ji bo vî nîfşê ku bi nivîsandina romana kurmancî -ku mijara me ya vî nivîsê ye- mijûle, yek ji van "bavan" heye yan tune ye?

Em ê di vî nivîsê de, bi mînak û şîroveyan, li bersiva vî pîrsa wêjeyî û siyasî bigerin.

Romanivîsên destpêka pêvajoyê (1930 – 1980)

Dema mirov li pêvajoya wêjeya kurdî ya van sed salên dawiyê binêre, yekemîn xala ku bala mirov dîkşîne ew e ku ev wêje bi temamî ji nav kûrahiya siyasetê derketiye, wisa jî heta qirikê di nav siyasetê de maye. Ev diyarde mirov vedigerîne çavkaniyên xwe ku ew jî paşxaneyê dîrokî, cografî, civakî û siyasî ya ku rewşa kurdan ya siyasî û parçebûna Kurdistanê di nav çar dewletan de bi xwe re anî. Bi awayekî ku kurd di nav dewlet, millet, welat û zaravayên cuda de hatin parvekirin. Hemû hewil-

danên wan yên civakî, siyasî û wêjeyî, roman jî di nav de, xwe dispêrin yek çavkaniyê ew jî ev e, têkoşîna kurdan ya siyasî ji bo bidestxistina mafên xwe yên rewa. Girîngtirîn rûdanên siyasî yên vê demê li Rojhilat damezrandina Komara Kurdistanê li Mehabadê bû, 1946 û hilweşandina wê ya piştî yazdeh mehan. Li Başûr jî şoreşa rezbera 1961'ê heta 1975'an ya bi serokatiya Mela Mistefayê Barzanî bû. Ji bo kurdên li Kafkasyayê jî bandora ramanên Şoreşa Oktobera 1917'an û damezrandina Sovyetê bû.

Ji ber vê, eger em li jînanîgarî û berhemên romanivîsên damezrênerên vê pêvajoyê hûr bibin, her sê navên sereke yên ku di navbera salên 1930 heta 1980'an de tên beramberî me ev in: Erebe Şemo, Rehîmê Qazî û Îbrahîm Ehmed.

Erebê şemo: Endamê Komîta Navendî ya Partiya Komonîst ya Ermenistanê bû.(1)

Rehîmê Qazî: Endamê Komîta Navendî ya Partiya Demokrata Kurdistanê-Îranê bû.(2)

Îbrahîm Ehmed: Yek ji Serokên Partiya Demokrata Kurdistanê - Iraqê bû.(3)

Hêjayî gotinê ye ku naverokên her sê berhemên wan jî heta radeyeke mezin di bin bandora vê mijûliya wana siyasî de mane.

Wekî tê zanîn yekemîn romana kurdî “Şivanê Kurmanca” ya Erebe Şemo ye ku di navbera salên 1930 û 1935'an de hatiye nivîsandin û weşandin. Ew wekî bavê romana kurdî tê binavkirin.

Li pey wê qonaxê, di navbera salên 1950 û 1970 an de li Kurdistanê, li Başûr romana “Jana gel” (4) ya Îbrahîm Ehmed û li Rojhilat romana “Pêşmerge” (5) ya Rehîmê Qazî wekî romanên wê qonaxê têne naskirin. Her wisa romanên **Eliyê Evdirehman**, “**Xatê**” (1959) û “**Gundê Mêrxasan**” (1968) (6) û romana Heciyê Cindî “**Hewarî**” (1967) di wan salan de li Yêrîvanê-Ermenistanê hatin weşandin.

Xalên hevbeş di navbera her sê romanên (**Şivanê Kurmanca**, **Jana Gel**, **Pêşmerge**) û her sê nivîskarên wan de ew in ku hem berhemên wan, ji hêla naverokê ve, di bin siya siyasî de ne û hem jî ew bixwe di pileya herî jor ya hêzên siyasî de cih digirtin. Bi gotineke din, roman di jiyana wan de ji pirojeyeke wêjeyî bêhtir mîna alaveke siyasî dihate nixandin. Di ber karên xwe yên siyasî re dest davêtin nivîsandina romanê. Bi awayekî ku bîr û baweriyên xwe yên siyasî rasterast li romanên xwe bar dikirin. Di vê çarçovê de, hinekî rewşa Heciyê Cindî û Eliyê Evdirehman cuda ye. Malbata Eliyê Evdirehman ji wanê bar dike Qafkasyayê. Li wir

li Yêrîvanê xwendina mamostetiyê diqedîne. Ew wekî leşkerekî di nav refên artêşa sor de tev li şerê cîhanê yê duyem dibe. Li Bakuyê jî xwendina pedagojiyê diqedîne. Ji 1955'an de heta mirina xwe 1994 wekî redaktorê rojnameya Riya Tezeyê dixebite. (7). Wisa xuyaye ku, beşa mezin ji jiyana xwe wekî rojnameger kar kiriye. Jiyana **Heciyê Cindî** jî ku malbata wî ji aliyê Qersê barkiriye Kafkasyayê û li wir pedagojî û filolojî dixwîne û jiyana xwe bi karê rewşenbîrî û çandî derbas dike. Ji rojnamegeriyê hetanî bi karê radyo, hetanî bi amadekirina alfabeya kirîlî ji bo kurdî û her wisa.

Xala hevbeş di nav van her pênc berhemên dîrokî yên girîng de ew e ku hemû piştî salên heftêyî (1970) bi kurmanciya tîpên latînî derketin. Tev ku yekem çapa “Şivanê Kurmanca” bi kurmanciya tîpên latînî hatibû weşandin (9), lê bi alfabeya kurdên Sovyeta berê derketibû ku hinekî ji alfabeya me ya niha cuda ye.

Di van salan de çend romanên din yên Erebe Şemo derketin: “Jiyana bextewar” (1959), “Dimdim”(1966) û “Hopo”(1969).

Rawestgeheke girîng: Hawar:

Girîngtirîn rûdana dîroka kurmanciyê derketina kovara Hawarê 1932 – 1945 û berhemên nivîskarên wê bûn. Mîr Celadet Elî Bedirxan jî di nav de, hema hema hemû nivîskarên wê birêveber û çalakvanên siyaseta kurdî bûn û piştî şikestina şoreş û serhildanên kurdên bakur berê xwe dabûn Binxetê – Sûriyê-. Li wir jî gelek ji wan dîsa bûn serok û birêveberên tevgera siyasî, bi taybetî Osman Sebrî û Nûredîn Zaza ku serokatiya tevgera siyasî ya kurdên (Sûriyê) kirin. Yan jî ji Binxetê beşdarî tevgera siyasî û çekdarî ya kurdên Bakur dibûn. Wekî mînak, piştî şikestina Serhildana Şêx Seîdê Pîran ya 1925'an bi her awayî hewildan ku tev li Şoreşa Agirî ya Îhsan Nûrî Paşa ya 1930'î bibin. Di vê çarçovê de rêxistina Xoybûn 1927-1947 ya serxwebûna Kurdistanê dixwest bi destê wan hate damezrandin. Bi têkçûna hewildanên wan ên siyasî re dest bi karê wêjeyî û çandî kirin. Ji bo hinekan ji wan jî ev karê wêjeyî şêweyek ji şêweyên berdewamiya karê siyasî bû. Anku tenê ji bo pêkanîna armancên siyasî dest davêtin karê wêjeyî. Bi vî awayî wêjeya kurmancî, bi helbest û çîrokên xwe, bi nivîs û serpêhatiyên xwe, bi ziman û alfabeya xwe, li ser destên wan rewşenbîrên ku ji qada siyasetê dihatin, hate holê.

Wisa tê xuyakirin ku ne tenê roman, belê wêjeya kurdî bi giştî, bi taybetî ya kurmancî, berhemek ji berhemên siyasetmedarên kurd û siyaseta kurdî bû. Heta dawiya vê qonaxê jî wêjeya kurmancî mîna balindeyeke birîndar

di nav derbên dagîrkerên Kurdistanê de, bi zor û zehmetî, bi destê têkoşerên kurd ji mirinê dihat rizgarkirin. Rast e, dihat rizgarkirin, lê ji ber ku ew rizgarkirin û berdewamî bi destên têkoşerên qada siyasî bûn, ne bi destên têkoşerên qada wêjeyî bûn, ev wêje hem lawaz, hem jî ji sûdwerigirtina ji pêşketinên teknîkî yên girêdayî form û honandinê yên di wêjeya cîhanê de hatibûn holê, bê par mabû.

Mirov dikare bibêje ku siyasî roleke du alî lîst. Ji aliyekî de roleke erênî bû ku, di parastina ziman û damezrandina alfabe û nivîsandina berhemana de bi dîmen dibe. Aliyê neyênî yê mijarê jî ew e ku wêjeya kurdî mabû dîl û hêsa mijarên siyasî û bi çavê alaveke siyasî lê dihat nêrîn, ne ku bi çavên wêjeyî û hûnerî. Tunebûna pisporên wêjeya kurdî, yên ku karê rêxistinî û siyasî yên rojane nekin, zirareke mezin gihande asta hûnerî ya berhemên wêjeya kurdî. Her wisa ev bandor li cem salên heştêyî jî nehate rawestandin. Rola siyasî her ku çû zêdetir bû, lê reng û awayê xwe guhert. Ji bo ev nirxandin zelal bibe, divê mirov vê pêvajoyê, bi taybetî di warê romanê de, bişopîne.

.....

Nifşê bêjî (2): Romannivîsên navbeynkar an yên “pir” 1980 – 1990

Dîmenê parçebûn û belavbûna kurdan çawa ye, wisa jî romana kurdî xwe dispêre wî dîmenê belawela. Ka em li gor sala weşanê, bi mînakên çend romanên vê qonaxê destnîşan bikin:

- Romana **Kurdê rêwî** ya **Seîdê Îbo**-1981.
- Romana **Xanê** ya **Birîndar** – 1982.
- Romana **Soro** ya **Birîndar** - 1983.
- Romana **Pala bêşop** ya **Xemgînê Temê** – 1983.
- Romana **Hêlîn** ya **Mahmûd Baksî** – 1984.
- Romana **Tu** ya **Mehmed Uzun** – 1984.
- Romana **Dê û Dêmarî** ya **Egîdê Xudo** – 1986.
- Romana **Stokholmê te çi dîtîye bêje** ya **Bavê Nazê** -1987.
- Romana **Wendabûn** ya **Şahîne Soreklî** – 1987.(10)
- Romana **Zeviyên Soro** ya **Nûrî Şemdîn** – 1988, ku ew bi xwe Nacî Kutlay e.

Ev deh roman mînakên vê qonaxê ne. Di nav van nivîskaran de hinek hebûn ku tenê ew roman nivîsandin û rawestiyar, mîna Nûrî Şemdîn. Hinek jî hebûn ku berdewamkirin û hejmara romanên xwe bilind kirin heta heftan, mîna Mehmed Uzun. Hinekên din jî mîna Bavê Nazê û Şahîne Soreklî li kêleka nivîsandina çîrokan, nivîsandina xwe ya di warê romanê de jî berdewam kirin.

Di vê qonaxê de, ji bo naskirina paşxaneyê siyasî ya romana kurmançî, mirov neçare ku ji Derbeya Leşkerî ya 1980'yî li Tirkîyê dest pê bike. Di encamê de, piranî yan jî hemû siyasethêderên kurd ku vê dawiyê, wê wekî nivîskar bêne naskirin, berê xwe dan Ewropa û Îskandînavyayê. Li wê derê, di encama têkçûna partî û rêxistinên xwe yên siyasî de, bi temamî berê xwe dan qada wêjeyê. Li bakurê Kurdistanê jî, bi taybetî bi destpêkirina şerê çekdarî re, dîmena siyasî ya kurdan jî hêdî hêdî zelal bû. Rêxistin û partî hinek hiliyan û neman, hinek jî mezin û berfireh bûn.

Di nav vê xirecira siyasî de, piraniya van siyasethêderên berê yên bakurî, ku niha nivîskar in, li Swêdê bi cih bûn û bi alîkariya derfetên ku qanûnên wî welatî ji bo zimanê dê, li hember koçberên xwe vedike, kurdan jî karîbû, heta radeyekê, wan derfetan ji bo zimanê xwe bikar bînin.

Bi vî awayî, ji bilî Sovyeta Berê, pencereyeke din jî li zimanê qedexekirî vebû û ew ava romana kurdî ku li Ermenistanê bi ser hev de kom bûbû û di bin qeşa Kafkasyayê de sar mabû, li Swêdê û Ewropayê ji xwe re cihokeke nû dît û dîsa ew pêvajoyê bi destên wan navên ku me li jor hejmartin dîsa herikî.

Di nav vê gelemşeya siyasî de û bi germbûna şerê azadiyê yê dijwar ku kurdan li dijî dagirkerên welatê xwe dikirin. Bi bilindbûna dengê kilaşnîkof, tang, top û firokên şer re û bi bilindbûna hejmara qurbaniyên ku kurdan ew di riya azadî û serxwebûna xwe re didan, deng bi temamî ji qada wêjeyê biliyabû.

Ji nişke ve, di medya û çapemeniya tirkî û ya kurdan de jî, her gava ku qala wêjeya kurdan, yan jî romana kurdî dibû, navê bi tenê yê dihat gotin her Mehmet Uzun bû.

Ev çi qewimî gelo ku nivîskariya Zimanê Kurdî, wêjeya kurdî û romana kurdî di navê Mehmed Uzun de hat qurmiçandin û qedandin.

Çawa û çima ev rewşa dûrî rastiyê hate holê, di riya vê şîroveya jêr re, em ê hewil bidin ku li bingeha vî dîmenê çewt û yê ku romana kurdî di hûndir wî de hatibû asêkirin de, bigerin. Çavkanî jî, bê guman, siyasete.

Mehmed Uzun, romannivîsê kurd, yan siwarê hespa boz ya dewleta tirk?

Bi têkçûn û vemirandina Şoreşa Êlûnê ya 1961'ê ku li başûrê Kurdistanê bi rêberiya Mele Mistefayê Barzanî dest pê kiribû û siya xwe hetanî 1975'an avêtibû ser her çar parçeyên Kurdistanê, tevgera siyasî ya kurdan li Bakur, bi kekekeke germ dest bi rêxistinbûnê û livandinê kir. Her çendî destpêk di nav refên çepgirên tirk de be, lê dîsa jî di nav çar pênc

salan de, bi dehan rêxistin û partiyên kurdan hatin damezrandin. Di nav van rêxistinan de, bi her awayî şer, pevçûn û nakokiyên mezin hebûn. Lê, hemû di yek xalê de digihiştin hev du, ew jî bikaranîna zimanê tirkî bû. Bi gotineke din, li Bakur, zimanê siyaseta yê kurdan ji destpêkê heta niha her tirkî bû. Li aliyê din ê sînor, li Binxetê (Sûriyê) ku bi temamî kurmancîaxêv in, rewşa rêxistinên siyasî yên kurdan hinekî cuda bû, lê zimanê siyaseta kurdî yê nivîskî yê hemû rêxistinên kurd li Rojava erebî bû. Ji rawestandina Hawarê û hetanî 1968'an ku Cegerxwîn kovara Gulistan derxist yek belavok bi kurdî dernediket. Anku zimanê siyaseta kurmancîaxêvan li her du aliyên sînor ne kurmancî bû.

Bi hatina salên 1980 û bi Derbeya Leşkerî re, rê û qedera van rêxistinan û siyasatmedarên ku vê dawiyê wê bibin romannivîs û nivîskar hêdî hêdî zelal dibû.

Hinek ji wan berî wê demê û piraniya wan piştî wê demê berê xwe dan Binxetê, ji wir jî çûn Ewropa û Îskanîdavyayê. Gelek ji wan di girtûgehên dewleta tirk re derbas bibûn û serborîyeke siyasî ya têkçûyî li pey xwe hiştibûn.

Piştî ku, di nav wan partî rêxistinên pir de, Partiya Karkerên Kurdistanê dest bi şerê çekdarî kir, bi derbasbûna demê re, ligel rêxistin û dezgeh û partiyên derd û dora xwe serkêşiya tevgera siyasî ya kurdên Bakur kir û heta niha, dema amadekirina vê lêkolînê. Ew rêxistin û partiyên bakurî yên din, yan biçûk bûn, yan jî hiliyan û bêhêz û bêkes man, yan jî serok û rêberên wan bûn xwedî malper, bûn rojnameger û nivîskar.

Wisa jî di 26'ê adara 1985'an de, li dijî hêzên gerîlayên kurd, dewleta tirk hêzên cerdevanên (Kurd) ava kir û kurdên xwe berdan pêxêla kurdên azadîxwaz. Pê re jî, di qada wêjeyî û rewşenbîrî de, dest bi amadekirina zemîna çêkirina (Kurdên spî) kir. Tabloya siyasî ya wê demê li Bakur ev bû.

Vê yekê çi bi xwe re anî?

Çi têkiliya vê kurteşîroveya siyasî bi romana kurmancî re heye?

Ez ê bêm ser bersiva van pirsan.

Di nav salan de, bi taybetî piştî salên 90'î li Tirkîyê û li bakurê Kûrdistanê, di dîmena wêje û romana kurdî de tenê Mehmed Uzun hate xuyakirin. Ne dîrok ji romana kurdî re ma, ne jî nûnerên ziman û wêjeya kurdî man. Ji bilî çend navên "mirî", ne kesek berî Mehmed Uzun hebû û ne jî kesek piştî wî. Gelo ev rewş çawa hate holê? Bi rastî rewş wisa bû?, yan jî ev rewş aliyekî rastiye bû, ku bi dilê hin aliyan bû û aliyên din yên vê

rewşê bi israr dihate binaxkirin û veşartin?

Çend gotinên giştî di der barê romanên Mehmed Uzun de:

Mehmed Uzun heft romanên kurdî li pey xwe hiştin. **(Tu-1984, Rojek ji rojên Evdalê Zeynikê-1987, Mirina kalekî rind-1989, Siya evînê-1991, Bîra qederê-1995, Ronî mîna evînê, tarî mîna mirinê-1998, Hawara Dîcleyê-2001-du cild.)** Di nav nîşê xwe de, siyasetmedarê herî zêde guh da aliyê xwe yê nivîskariyê. Yê xwedî hejmareke herî pîre ji romanên. Piraniya romanên wî biyografîk in, anku jiyana kesayetiyên naskirî yên dîroka kurdan in. Mîna Celadet Bedirxan, Memdûh Selîm Beg, Evdalê Zeynikê, dengbêj û her wisa.

Wekî tê zanîn, ev şêwe, nivîsandina romanên li ser jînenî kesaye dîrokî û naskirî, hêsantirîn şêwe ye. Ev hêsanî pala xwe dide van her du sedeman. Yek jê ew e ku ev kesayetên navdar li cem xelkê gelekî hezkirî û naskirî ne, wiha jî her kes mereqa jînanîgariya wan dike. Di nav xelkê de, berî ku bîne nivîsandin, xwendevanên van romanên hazir in. Navekî wekî yê C. Bedirxan, yan jî Evdalê Zeynikê bi serê xwe dikare bibe sedema bi-destxistina romanê. Nexasim li cem kurdan û di vê dema hişyariya neteweyî û bilindbûna asta tekoşîna siyasî de ku tîbûneke mezin ji nas-kirina dîrokê re bi xwe re anîbû.

Sedema din jî ew e ku, ji bo nivîskarê romanê meteryal û melzeme hema hema li ber dest hazir in. Piştî lêkolîneke biçûk mirov dikare bibe xwedî agahî û zanebûnên berfireh li ser tevna romana ku tê nivîsandin. Anku mijar û melzeme amade ne, nivîskar bi hesanî dikare wan bîne cem hev û romaneke (qalind) binîvisîne.

Dema mirov van romanên bi hûrbîrî dixwîne, mirov bê kedeke mezin li dehên şaşîti û kêmasiyên girêdayî naveroka romanên, wisa jî li likuman-dinên mezin di awayê honandina tevnên van romanên yên sist û dirêjkirî û jihevvezilandî, rast tê.

Lê, heta mirov li paşxaneya siyasî ya vê mijarê nekole, mirov nikare bigihêje bersîveke zelal ji wan pirsên me yên ku me li jor kiribûn re. Ev paşxaneya siyasî hem xwe dispêre kesayetiya Mehmed Uzun û xisletên wî yên takekesane û helwestên wî, hem jî xwe dispêre pirojeya demdirêj ya dewleta tirk û bandora dewletê di çêkirina zihniyeta kurdan a siyasî de. Bi awayekî ku tevgera kurdan a siyasî, bi taybetî di mijara ziman û wêjeyê de, dibe kopiyeke berevajî ji zihniyeta wê dewleta ku li hember wê şer dike.

3: Qeyikên romana kurmançî di nav pelên siyasê de

Romannivîsên ku di qonaxa 1990 – 2000 de derketin

Ez dixwazim di destpêkê de, li Bakur û Rojava, dîmenekî giştî ji rewşa siyasî re, ragihînim. Ew dîmenê ku di pencereya ziman, çand û wêjeya kurdî re, tê dîtin.

Li bakurê Kurdistanê û Tirkîyê, di van salan de, pêşketinên dîrokî hatin holê. Pêşketinên di dema Ozal de û piştî rakirina qedexeya li ser kurdî, bi awayekî berbiçav rûdan. Heta radeyekê be jî, lê têkoşîna kurdan ji bo bidestxistina mafekî bingeşên ji mafê mirovan, bi vê yekê encam da. Rojnameya heftane "Welat" di 22'ê reşemîya 1992'an de, bi kurdî hate weşandin, bi "Welatê me" berdewamkir û "Azadiya Welat" wekî yekeyên rojnameya rojane 15'ê gelawêja 2006'an de dest bi weşanê kir.

Dezgehên kurdan yê mîna Enstîtû û navendên çandê hatin vekirin. Kovarên mîna Rewşen, Jiyana Rewşen û Rewşenname derketin û bi derxistina kovara W'yê berdewamkir. Weşanxaneyên kurdan dest bi weşandina pirtûkên kurdî kirin, li Stenbolê destpêkir û li Amedê dewam kir. Têvgera Ziman û Perwerdeya Kurdî (TZPKurdî) hate damezrandin û ji bo kurdî bibe zimanê perwerdeyê kurd daketin meydanan. Li derveyê welêt jî yekemîn televizyona kurdî ya satelît MedTV di 15 gulana 1995'an de, dest bi weşanê kir, bi MedyaTV, MezopotamyaTV û bi Roj berdewam kir. Ji bilî vê têvgera medya û weşanê ya organîzekirî, bi dehan kovar û rojname û çalakiyên ziman û çanda kurdî hatin holê. Ev aliyekî meselê bû.

Li aliyê din jî, ev hemû hewildan di warê guherandina zimanê siyaseta kurdan ji zimanê serdestan ber bi kurdî de, biserneket û di qada siyaseta kurdan de, ew zihniyeta ku zimanê serdestan dide pêş her û her ma desthilatdar.

Li aliyê dinî sînor, li Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê têvgera siyasî roj bi roj dibû piçûk û parî. Her partiyeke kurdan bû du û sê û çar partî. Zimanê siyasê yê nivîskî erebî bû, lê geşbûneke berbiçav di derxistina kovarên kurdî de çêbû û hêdî hêdî vê geşbûnê cihê xwe da çilmisandin û sistbûnê. Bi awayekî fermî Zimanê Kurdî qedexa mabû û pirtûkên kurdî, bi çapeke xerab, bi dizî û bi zehmetiyên mezin dihatin çapkirin û belavkirin.

Li her du aliyên sînor dijwarî li dar bû. Li Bakur şerê çekdarî, gihîştê asta xwe ya herî bilind û bi avakirina rêxistinên çete û kujerên rewşenbîr û welatperwerên kurd re dewletê rûyê xwe yê herî qirêj û gemar diyar kir. Li aliyê din ê sînor jî jenosîda spî di asta xwe ya herî bilind de bû. Bi bilindbûna asta berxwedana kurdan ya dijî dagîrkerên welatê wan re, asta

berhem û karê wêjeyî yê kurdî, roman jî di nav de, kete asteke din û nîşa-nên xwe avakirin û pêşdeçûnê li ber çavan zelal bûn.

Mirov nikare vê qonaxê wisa bi temamî ji qonaxa berî wê cuda bike, ne jî ji ya piştî wê. Piraniya romanivîsên ku di van salan de derketin, bi taybetî yên di salên dawiya vê qonaxê de, bi awayekî çalak beşdarî berhem-dayîna qonaxên pêşiya me bûn, wisa jî berdewam dikin. Mebesta me jî vê dabeşkirinê, danasîn û destnîşankirina xalên hevbeş yên van nîfşên romannivîs yên ku beşdarî pêşdebirina pêvajoya romana kurdî bûne. Ez dixwazim destpêkê, wekî danasîn, navên hemû romanivîsên ku di vê qonaxê de derketin, ligel navên berhemên wan û sala weşandina berheman, li gor demê, rêz bikim:

1-Azad Ehmed (Bavê Şîhîn)

- 1- Yên Perîşan – Beyrût – 1991.
- 2- Berxikê kesk - Semakurd-2008

2-Medenî Ferho

- 1- Berxwedan Jiyan e – AbeCe - Belcîka-1994
- 2- Mîza Mihemed - Nûdem-1995
- 3- Xaltîka Zeyno - Doz-1998
- 4- Marê di tûr de - Pêrî-1999
- 5- Xewnên pînekirî – pêrî – 2001.
- 6- Dora Bacinê bi dare - Tevn – 2007
- 7- Çîroka me - do – 2009.

3-Bûbê Eser

- 1- Gardiyan - Roja Nû-1994
- 2- Jiyanek- Bajar – 2004.

4 - Hesenê Metê

- 1- Labîrenta Cinan – Welat-1994.
- 2- Tofan -Apec - 2000.
- 3- Gotinên gunehkar - Avesta – 2007.

5-Xurşîd Mîrzengî

- 1- Sînor – Jîndan-1995.
- 2- Ristemê Zal – Rewşen – 1999.
- 3- Belqîfî - Komal - 2004

6- Mihemed Dehsiwar

- 1- Çirîskên Rizgariyê – Newroz-1995

7-Ihsan Colemergî

- 1- Cembelî Kurê Mîrê Hekarî - Apec-1995

8-Silêman Demîr

- 1- Sorê Gulê - Nûdem-1997
- 2- Koç - Roja Nû-1998
- 3- Piştî bîst salan - Doz – 2007
- 4- Kassandra – Avesta – 2010.

9-Mustafa Aydoğan

- 1- Pêlên Bêrîkirinê - Nûdem-1997

10- M Beşîr

- 1- Sofî Remo – Medya-1999.

11- Lokman Polat

- 1- Kewa Marî - Helwest-1999
- 2- Fîlozof - Helwest-2002
- 3- Rojnamevan – Pêrî – 2002
- 4- Robîn – veng – 2004.
- 5- Kodnav viyan – Helwest – 2006.
- 6- Parola operasyonê – Helwest- 2008.

12- Zeynel Abidîn

- 1- Binefşên Tariyê – Doz-1999
- 2- -Girava stêrkên vemirê – Evra Velag-Berlin – 2004.
- 3- Bigrî heval- Evra Verlag-Berlin- 2007.

13- Îbrahîm Seydo Aydoğan

- 1- Reş û Spî - Doz-1999
- 2- Leyla Fîgaro - Mîr-2003

14- Fêrgîn Melîk Aykoç

- 1- Mamosteyê Zinaran – Rewşen-1999.
- 2- Dîlên li ber pûkê – rewşen- 2002
- 3- Rondikên Hêviyên Wenda-Do-2009
- 4- Siya Dema Borî- Do-2009

15- Laleş Qaso

- 1- Se şev û sê roj - Nûdem-1999
- 2- Wêran – Pelda- 2002
- 3- Xezeba Azadiyê - Pelda-2000
- 4- Ronakbîr - Pelda-2003

16- Helîm Yûsiv

- 1- Sobarto – Avesta-1999.
- 2- Tîrsa bê diran – Avesta- 2006
- 3- Gava ku masî tî dibin – Lîs- 2008.

17- Bavê Nazê

- 1- Çiyayên bi xwînê avdayî – 1978
- 2- Stockholmê te çi dîtiye bêje - Förtattores Bokmaskin-1987
- 3- Dara pelweşiyayî – Duhok 2002- Lîs 2010.
- 4- Miriyê heram - Lîs - 2009.

18- Şahînê Bekirê Soreklî

- 1- Wendabûn - Instituya Kurdî Beşê Elmanî-1987
- 2- Veger - yekîtiya nivîskarên Duhokê – 2006

Ji bilî Mehmed Uzun û Mehmûd Baksî ku her du çûne ber dilovaniya Xwedê, berhemên Bavê Nazê û Şahînê Bekirê Soreklî, li kêleka çîrokê, di warê romanê de jî berdewam kirin. Ji ber vê yekê, me navên wan jî li navên vê demê zêde kirin. Wisa jî, ne bi navê Nûrî Şemdin, ne jî bi navê Birîndar nema tu roman derneketin.

Taybetiyên vê qonaxê di pêvajoya romana Kurdî de

- Romana Kurdî ji qonaxa ku mîna alaveke siyasetê be, derbasî qada wêjeyê bû. Bi her awayî ber bi xweseriyê de çû. Ji nav lepên mijarên siyasî û jînanîgariya kesayetên dîrokî xwe berda qada civakî û derûnî ya kurdan. Ji siyasetê naveroka xwe ber bi rengîniya jiyanê ve ajot.

- Ji hêla teknîk û honandinê de, cudayî û sûdwegirtina ji teknîka romana nûjen ya zimanên din, hêdî hêdî, diyar dibû.

- Piraniya nivîskarên vê qonaxê hewldan ku nebin qurbanên siyaseta dewletên dagîrker, wisa jî nebin alavên piropagandaya siyaseta kurdan.

- Zimanê romanê ber bi resenî û asteke bilindtir de çû û bi demê re, kêr zêde dikarîbû li ser Kurmanciyê Standard bê axavtin.

- Her çendî hinek ji van nivîskaran berdewamiya qonaxa berî xwe bin, hinekên din jî bi awayekî çalak beşdarî qonaxa ku wê bê de bûn. Vê yekê rê, bi temamî, li ber wan dîtînin ku romana kurdî nedidîtin, girt. Roman Kurdî bû rastiyeke wêjeya kurdî ku, hêjayî nirxandin, rexnekirin û diyarkirina astên cihê û cudaye.

5: Qeyikên romana kurmançî di nav pelên siyasetê de**Romannivîsên qonaxa salên 2000 heta 2010'an**

Ji bo binavkirina nîfşekî, mirov nikare wî di nav deh salan de asê bihêle. Dibe ku dabeşkirina navan û berhemên li gor demê, an ku di hûndirê deh salan de, alîkariya me ji bo pêvajoya lêkolînê û zelalkirina danasînê bike, lê ji bo binavkirina nîfşê nû yê romana kurmançî, divê mirov nav û berhemên her du qonaxên dawiyê bîne cem hev:

1-Adil Zozanî

1. Kejê (Pêrî-2001)
2. Mişextî (Lîs-2009)

2-Reşad Akgül

1. Veger (Rewşen-2001)
2. Evdalkovî (Mezopotamya- 2004)

3-Newroz Saîdpour

1. Viyan (Sî-2002)

4-Remezan Alan

- 1- Saturn (Avesta-2002)
- 2- **36. Perwîz Cihanî**

5-Mezher Bozan

1. Av zelal bû (1-2-3-4, Pêrî-2002 -2004- 2006-2008)
2. Zêna (Nûbihar - 2007)
3. Zarokên me (Pêrî - 2005)
4. Asim (Pêrî - 2007)

6-Torî

- 1- Mendik (Berfîn-2002)

7-Kemal Orgun

- 1-Li Qerexa Şevê Hivron (Sî-2002)

8-Omer Dilsoz

- 1- Hêviyên Birîndar (Aram-2003)
- 2- Bêhna axê (Berçem - 2005)
- 3- Neynika dilî (Aram - 2009)

9-Jîr Dilovan

- 1- Zenga Zêrîn (Mezopotamya-2003)

10- Menaf Osman

- 1- Girê Şêran “Serhildan” (Aram-2003)

11- Eyup Kiran

- 1- Dewrêşê Evdî (Mîr-2003)
- 2- Pilingê Serhedê (Elma, 2005)

12- Jan Dost

- 1- Mijabad (Belkî - 2003)
- 2- 3 gav û 3darek. Şeva dawî di jiyana Şêx Seîdê kal de. (Avesta-2007)
- 3- Mîrname (2008. Avesta)

13- Abbas Abbas

- 1- Xewnên siyarî (Pêrî - 2004)
- 2- Şivanê berxan (Pêrî - 2004)
- 3- Dengbêjê picûk (Pêrî - 2005)
- 4- Helbestvan (Pêrî - 2005)
- 5- Neviya ciyayekî (pêrî - 2006)

14- Mîran Janbar

1. Ardûda (Lîs - 2004)

15- Riza çolpan

1. Serhatiyên Rustem û nemerdiya namerdan (Veng - 2004)

16- Lokman Ayabe

1. Jar lê Sermest (Belkî - 2004)
2. Gava jiyan (Belkî - 2007)

17- Mehdi Zana

1. Ay dayê (Tevn - 2005)

18- Yaqob Tilermenî

- 1- Kitim-Sêbareya Mêrdînê 1 (Lîs - 2005)
- 2- Qerebafon- Sêbareya Mêrdînê 2 (do - 2009)
- 3- Bavfileh- Sêbareya Mêrdînê 3 (do - 2009)

19- Dilawer Zeraq

1. şevên winda wêneyên meçhûl (Lîs - 2005)

20- Firat Cewerî

1. Payiza Dereng (Nûdem - 2005)
2. Ez ê yekî bikujim (Avesta- 2008)

21- Atilla Barişer

1. Mandalîn (Elma 2005)

22- Sabrî Akbel

1. Evîna Pînhan (Nûbihar - 2006)

23- Diyar Bohtî

- 1- Gul bişkivîn (Mezopotamya - 2006)
- 2- Mexmûr (Mezopotamya - 2007)
- 3- Soryaz (Do - 2008)

24- Serkan Birûsk

1. Sê Terîş (Apec - 2006)

25- Nesîp Tarim

1. Xezal (Belkî – 2007)

26- Yunus Eroglu

1. Nameyek ji Xwedê re (Lîs - 2007)
2. Otobê (Lîs - 2010)

27- Arîn Zîn

1. Ez stêrka sîpan im (Bercem – 2007)

28- Aram Gernas

1. Toqa Lanetê (Doz - 2007)

29- Îlhamî Sertkaya

1. Kilama Sîlanê (Pêrî - 2007)

30- Îbrahîm Osman

1. Evîna mêrxasekî (Lîs - 2008)

31- Edîb Polat

1. Ristemê Zal (Evresel - 2008)

32- Mîr Qasimlo

1. Wêneyên keserê (Pêrî - 2008)
2. Giyanên bahozi (Do - 2009)

33- Şener Ozmen

- 1- Rojnivîska Spînoza (Lîs - 2008)
- 2- Pêşbaziya çîrokên neqediyayî (Lîs - 2010)

34- Hesen Huseyin Deniz

1. Hêvî herdem heye (Do - 2008)

35- Zarife Demir

1. Kela Bilind (Apec- 2008)

36- Ali Huseyn Kerim

1. Şopa Rojên Bihurî (Rewşen - 2008)

37- Hesenê Alê

1. Sêwiyên Rojhilat (Stîl-offset- 2009)

38 - Newaf Mîro

1. Keleşê reş (Pêrî - 2009)

39- Cîhan Roj

1. Gîtara bê têt (Do – 2009)

40- Abdullah Pertev Işık

1. Mirinên bêwext (Astare - 2009 -Istanbul)

41- Mehmet Yilmaz

1. Doktor Dîno (Ava - 2009)

42- Ozgur Kiyak

1. Rêwîyên Bêwelat (Do - 2009) (32)

43- Yusuf Bilgiç

1. Evîna me Welatê Birîndar-HAN-Grafik Verlag-2010

Di nav van her du qonaxên derbasbûyî de, hin nav û berhem hene ku wê bandora xwe li pêvajoya romanê ya salên pêşiya me jî bikin. Dijwariya karê vî nîşî, ligel tunebûna piştgiriye, rewşa wî nêzîkî rewşa bêjiyan kiriye.

Nîşê ku bi keda xwe ya takekesane, bi tenê, bêxwedî, bêpişt, bê „çape-menî“, bêreklam, bêwerger, bēpere, bêxwendevan, bēdewlet, bêxwedî û bêxwedan, rahiştîye barê pêşxistina wêjeya miletekî parçebûyî û bê dewlet. Her wisa bilindkirina asta zimanekî qedexekirî ku bi hêzên çar dewletên pişaftinkar hatiye dorpêçkirin, ji xwe re kirine mijûlî û erk.

Taybetiya vî nîşî ya sereke ew e, ku bi zimanên dewletên serdest, pêzanînên xwe yê di derbarê romanê û çawatiya nivîsandinê bidest xwe ve anîn û bi zimanê xwe -kurmancî- nivîsandin. Ne derfet hebû ku bi kurdî pirtûkên li ser teoriya romanê, şêwe û metodên teknîkî yê nivîsandinê û dîroka pêvajoya wê, bixwînin. Ne jî romanên kurdî, yan bi kurdî, bi wê hejmara ku tê xwestin, li ber destan hebûn, ku xwe bi zimanê xwe ava bikin. Çend navên girîng, di wê navê re, bēn mal û milkê zimanên serdest. Ji bilî peyva "regezkurd" ku di vê çarçoveyê de ji danasînê pê ve tiştekî nabêje, nikaribû li ser van romanivîsan bē gotin. Ew jî tiştekî li wêjeya kurd zêde nake. Mirov dikare vê rewşa neasayî ya romannivîsên kurd bi du awayan şîrove bike. Aliyê erênî ew e, ev nivîskar ên ku bi zimanekî din xwendin û bi zimanê xwe nivîsandin, man dilsozê zimanê dayikê û bi fedakarî û kedeke mezin xwe gihandin radeya romanivîsandinê. Wisa, ji bo berhemê bixwe jî, zemîna serkeftinê hate amadekirin.

Di romanên li ser rewşa kurdan de, zimanê resen yê kesên romanê bixwe kurdî ye, wisa jî di dema nivîsandinê de, kurdî dimîne. Vê rese-niyê, rê li ber bidestxweveanîna kûrahiya rihê civaka kurd û êşên wê yê xedar de jî, vekir. Di romanên ku bi erebî, yan bi tirkî, li ser kurdan tene nivîsandin, nivîskar bixwe neçarî wergera zimanê kesên xwe yê romanê dibe û ev yek bandoreke xerab li asta romanê û ya karakter û zimanê wê

dike. Ji bilî wê, romanivîs bixwe dibe şîrîk û hevparê talankirina çanda xwe û guheztina hin taybetiyên civaka kurd ber bi zimanê serdestan ve ku di encamê de ji wêjeya wan re dibe mal.

Aliyê neyênî yê vê rewşa "düzimanî" ew e, ku nivîskarê kurd nikaribe xwe bi temamî ji bin siya zihniyet û mentelîteya zimanê dewleta serdest rizgar bike. Forma zimên û awayê avakirin û sazkirina hevokan ya zimanê din, carinan ji bo zimanê romanê yê kurdî dibe sedema zirareke mezin. Bi vî awayî, roman mîna romaneke wergerandî tê xuyakirin. Carinan jî vê bandorê xwe berdida kûrahiya mejî û ramanên nivîskêr. Her çendî nivîskarekî wiha, bi kurdî binivîsîne, lê dîsa jî bi hişmendiya dewleta xwedîya zimanê xwendina xwe, tevdigere. Vê bandorê xwe di hin mînakên de nîşan dida, wekî biçûkxistina ziman û wêjeya kurdan, reva ji binavkirina Kurdistanê û xwepêşkêşkirina wekî nivîskarekî pirzimanî an jî niştimanî. Ango bi kurdî dibin alîkarên pîlanên dewletên ku kurdî qedexe dikin.

Tevlihevkirina mijaran û pêdiviya têgihiştinê:

Yek ji sîmayên vê rewşa me behs kir tevlihevkirina mijaran e. Mînaka wê, di danûstendinên li ser romanê de, diyar dibin.

Li cîhanê, piştî şerê cîhanê yê duyem û bi avakirina dewletên neteweyî re, danûstendinên li ser romana berî û piştî dema dagirkirin û kolonyalîzmê dest pê kirin. Pêre jî romana nûjen, modern û vê dawiyê jî "post-modern" û piştî wê û her wisa... Bi hevgirêdanek di navbera naverok û formên romanê de hebû. Bi taybetî li cîhana Rojava ku roman wekî serencama "bajaran" û pêşdeçûna çîna birjuwaziyê ve hate girêdan. Şaştiya mezin di qada wêjeya kurdî de, ew bû ku kesên hatin û behsa romana kurdî kirin, ew nîrxandinên ku li ser romaneke din hatibûn holê, ji xwe re kirin pal û pişt. Kesên ku xwestin behsa romana kurdî bikin, hatin û behsa çend klîşeyên hazir kirin û her ew klîşe hatin dubarekirin. Geh qala tunebûna romana kurdî dibû, geh jî rastiya rewşa romanê dibû qurbana nîrxandinên kesên bê agahdarî ku piraniya wan romanên nexwendine.

Di vê derbarê de, divê mirov çend xalên girêdayî taybetiya pêvajoya romana kurdî bibîr bîne:

1- Di demekê de ku li her deverê behsa qonaxên piştî dema dagirkeriyê "kolonyalîzmê" dibû, Kurdistan, wê çaxê û heta niha jî, mêtîngeheke "koloniyêke" di nav dewletan de, parçebûyî ye. Jixwe, wê ev rewş bi her awayî ji welatên din cuda, siya xwe bavêje ser romana kurdî jî.

2- Her çendî roman wekî berhemeke "Burjuwaziyê" an "bajarvanîyê" û li Rojava ji dayik bûbe, lê dîsa jî ji bo hemû mirovayetiyeke bûye mal. Ro-

mana nûjen, modern, xwe nema dispêre wan mercên destpêkê yên ku roman derxistin holê. Bi vî awayî, roman ji bo her miletî çi be, ji bo kurdan jî ew e.

Bindestî û parçebûna kurdan û welatê wan, wisa jî qedexekirina zimên, di riya nivîsandina romaneke kurdî ya nûjen de ku di asta romana zimanekî, an miletêkî din de be, nabin asteng.

Berevajî wê, rewşa aloz ya kurdan, dikare bibe çavkaniyeke dewlemen-diya mijaran, wisa jî ji bo afirandina romanê, bibe zemîneke alîkar.

3- Balkişandina ser taybetiya pêvajoya romana kurdî, nayê wê wateyê, ku romana kurdî ji derveyî pêvajoya romanê ya cîhanê ye.

Balkêş e, her gava ku beramberiyeke wisa çêdibe, bi her awayî, wêjeya kurdî, romana kurdî, pêre ji romanivîsên kurd, têne biçûkxistin.

4- Divê ev her du alî ji nav hev du bête derxistin, aliyek ev e: paşdemayîn û bindestiya kurdan, parçebûna welêt û tunebûna dewleteke neteweyî, bi yek peyvê "paşdemayîn" a civakî û siyasî.

Aliyê din jî ev e: Rewşa romana kurdî. Ango paşdemayîna kurdan nayê wê wateyê ku romana kurdî jî paşde bimîne. Têkilî heye, lê dibe têkiliyeke berevajî be. Civakeke paşdemayî dikare bibe xwediya wêjeyeke "pêşdeçûyî".

Divê ev rastî, bi awayekî zelal, bête fêmkirin. Dewletên dagirker dikarin rê li ber hemû projeyên siyasî û civakî yên kurdan bigrin, lê tu artêş û dewlet nikarin rê li ber nivîsandina romaneke xweşik bigrin.

Siyaseta kurdan, heta niha, bi girîngiya wêjeya nivîskî nehisiyaye û bi awayekî ku tê xwestin, dest dirêjî ziman û wêjeya kurdî nekiriye. Vê dawiyê, dewlet, bi girîngiya vê meselê hesiyane û dest avêtin qada ziman û wêjeya kurdî. Hem hewildan ku "nivîskarên xwe yên "kurdînivîs" çêbikin, hem jî mentelîteya xwe, bi kurdî, derbasî wan deverên civaka kurd bikin, ewên ku bi hemû hêza çek û zordariya xwe ya giran nikarîbûn xwe bigihînin wê derê.

Yek ji sedemên girîng yên bêjîbûna nîfşên nû yê wêjeya kurdî jî xwe dispêre vê bêtalîhiya siyaseta kurdan û birêvebirina vê siyaseta bi zimanê dewletên dagirker.

Dewleta kurdan nîn e. Gelo kurd û tevgera wanî siyasî, ji bo geşbûna romana kurdî, çi dikin?

Pirseke bi vî rengî, hinekî komedî û hinekî jî bi mirov xerîb tê. Ji ber ku tiştek bi vî navî "Romana kurdî" di nav kar û bar û pîlan û mijûliyên

siyaseta kurdan de, bi hemû dezgehên xwe ve, tune ye.

Girîngtirîn xal, di vê der barê de, tunebûna projeyan e. Anku, dema pîlan û pirojeyên "çand û hûner û kultûrê" têne danîn, raman û xeyalên birêveberên siyaseta dezgehên kurdan ji lidarxistina festîvalan, her ji çend salan carekê, an çend rojên ji bo semîner û xwendinên wêjeyî, an jî konferansekî zimên bi wêdetir naçe. Du, sê rojan, bi dehên nivîskar û wêjeyanan têne cem hev. Yan di nav xirecira muzîk û stiranên re dengê wan naçe tu kesî, yan jî wan çend rojan hev du dibînin, biryar û ramanên xwe ji hev re dibêjin û vedigerin malên xwe û çalakî li wir diqede.

Heta niha haya min jê tune ye ku "butçeyek" biçûçik be jî ji bo romaneke kurdî hatiye veqetandin. Ne ji bo nivîsandinê, ne ji bo belavkirinê, ne jî ji bo wergerandina bo zimanên din.

Heta niha xelateke binirx ji bo wêjeya kurdî, ne li çar parçeyên Kurdistanê, ne jî li derve, nehatiye terxankirin.

Hemû xelatên ku di rojên wêjeyê de têne belavkirin, yan kaxet maxetin ji bo dilxweşkirinê ne, yan jî tiştik miştikên sembolîk û erzan in. Ev yek jî nîşaneke berbiçav e ji nîrxdayîna kurdan ji bo berhemên wanî wêjeyî.

Di vê der barê de, ji bilî hewildanên "donkîşotî" yên romannivîsên kurmancî, tiştek li meydana nayê dîtin.

Bi keda xwe, bi îmkânên xwe yên takekesane, romanivîsê kurmanciyê, mîna bêjiyekî, di nav civakeke ji ziman û rihê xwe yê resen hatiye dîrxistin, li ber xwe dide û bi zimanê dayika xwe yê qedexa dinivîsîne.

Her "bêjiyek" bi tena serê xwe, li deverê romana xwe, bi kedeke mezin, digihîne ber destê weşangerê kurd. Bi vî awayî "bêjiyek" li vir, "bêjiyek" li wir, bi dilsoziyeke mezin, her yek ji hêla xwe de, taseke av ber dide cihoka romana kurmancî, ya ku êdî rê li ber herikandina ava wê nema dikare bê girtin.

Ji 1995'an û vir de, ew "bêjî" yên belawela, dikarin mîna nifşekî nû, bêne dîtin.

Ew cihoka romana kurmanciyê, hêdî hêdî, dibe çem. Ew çem, roj bi roj, ber xwe fireh dike û berê qeyikên romana kurdî ber bi deryaya mezin ya wêjeya cîhanî ve dajo.

Çend encamên giştî:

- Sal bi sal, hejmara romanivîsên kurmanc zêde dibe. Nîşanên vê yekê jî, hejmara romanivîsên her qonaxekê ji qonaxên ku me behskirine. Diyar e ku wê ev hejmar, di salên li pêşiya me de, hîn zêdetir bibe.

- Zêdebûna hejmara berheman, zêdebûna teknîk, şêwe û awayên honandinê bi xwe re anîn.

- Bi giştî, ev roman nebûn film û rêzefilm. Derfeta belavbûna berfireh ya van romanên, heta niha, çênebûye. Hem ji girseyên mezin dîr mane, hem jî, dîrî rexne û nirxandinên berfireh man. Nimûneyê awarte hebin, dîsa jî pir hindik in. Wekî mînak, divê meriveke yê romannivîs di asta jina serokomar de be, heta ku romana wî bibe film. Li Başûr, bi îmkânên keça Îbrahîm Ehmed, Hêroxan, ku xanima Serokê Yekîtiyê Nîştîmanî Kurdistan (YNK) û serokomarê Iraqê C. Talabani ye, romana bavê wê "Jana gel" wekî film hate kişandin.

- Hema hema tunebûna jinên romannivîs di kurmanciyê de, ji bilî navekî yan diduyan, nîşaneke ji nîşanên rewşa xerab ya civaka kurd û rewşebîriya wê ye.

- Tev hemû guhertinên ku rewşa cîhanê ya nû, ji piştî salên nodî de, bi xwe re anîn. Tev hilweşandina kelehên îdeolojî û ramanê li seranserê cîhanê û eşkerebûna girîngiya ziman û wêjeyê ji bo her miletî, dîsa jî nivîskarê kurd bi hewildanên xwe yê şexsî û takekesane re, bi tenê, hate hiştin. Romannivîsê kurd jî bi romana xwe ya ku (naye) xwendin û (naye) firotin re tenê ma. Wekî mînak, hemû karên ji bo pêşdebirina ziman û wêjeya kurdî, li benda biserketina sosyalîzmê diman. Bawerî ew bû ku wê sosyalîzm hemû pirsgrêkan çareser bike û her wiha, li şûna wê niha "demokrasiyê" cih girtiye...

- Di vê dinyaya global de, ji berê bêhtir, berjewendiyên dewletên dagirker bi hêzên mezin, wekî Amerîka û Ewropayê, re dibin yek. Dibe ku kurd, di eniya pêşdebirina ziman û wêjeya xwe de jî, hemû dinyayê li hember xwe bibînin. Pencere, li her derê li hewildanên pêşdebirin û vejandina ziman û wêjeya kurdî bîne tengkirin.

Wekî mînak, demekê Yekîtiya Sovyetê pencereyek bû, demekê jî hin dewletên Ewropa û Îskadînavya, lê niha...dibe ku dewletên Ewropayê ji bo kurdî, mîna Tirkiyê û Sûriyê tevbigerin. Ev yek li şûna ku kurdan bi-tirsîne, divê wan li zimanê wan, wêje û çanda wan, germ bike. Kurd, ji bo ziman, wêje û çanda xwe çî bikin, ew e. Ev rastiya giştî, ji bo romanê jî derbas dibe.

- Tev hemû astengiyan, ew deriyê romana kurdî ku li gor rewşa siyasî, geh vedibû û geh jî dihate girtin, ji niha û pê de dê vekirî bimîne û wê tu rewşên siyasî nema karibin wî derî li afirandin û nûkirinê kilît bikin. Ev yek ji bo romannivîsên kurd ezmûneke giran e. Serkeftina di vî warî de ji bo wêjeya me pêdiviyêke bilez e.

Ji bo dîmena romana kurmançî, bi temamî zelal bibe, pêdivî bi agahiyên li ser rewşa vê romanê di nav kurmançên rojhilatê Kurdistanê û kurdên Sovyeta berê de, heye. Her wisa romanên herêma Behdînan li başûrê Kurdistanê. Ev jî mijarên lêkolîneke taybet in, ku wê piştî demekê encam bide.

Zelalkirina mijarê:

Ji 1984'an de têkoşîn û berxwedana kurdan, sal bi sal, dewleta tirk ber bi dîtina gihayê rastiya kurdan yê di bin kevîrê kolonyalîzmê de, ajot û ew neçar kir ku piştî salên 1991'ê hebûna kurdan, wekî kurd, bi awayekî "dekorîstîk be jî" bipejirîne. Vî rêzefilmî ji wir dest pê kir û wisa dewam kir,

- Kurd hene, lê zimanê wan tune ye
- Zimanê wan jî heye, lê devoke û ne zimanê nivîsandinê ye
- Zimanê wanî nivîsandinê jî heye, lê yê dema Osmaniyanê û çend kilasîkên wan hene ku ew kilasîk jî yên me, yên "Turkiyê" ne.

"Vê dawiyê serokwezîr û serokê dewleta Tirk jî doza xwedîderketina li Ehmedê Xanî jî kirin"

- Bi berdewamiya berxwedanê re, di vê dema me ya destnîşankirî de, gihîştin vê pêpelûkê ku bibêjin, dibe ku zimanê wan ê nivîskî û wêjeya wan jî hebe, lê dîsa jî dikarin van romanên xwe yên hemdem bi zimanê dewletê bixwînin û mînakê vî zimanî û vê wêje û romana modern jî Mehmed Uzun ê ku "Yê Turkiyê hemûyî ye."

Çima Mehmed Uzun ?

Bê guman, berhemdarî û xwedîderketina li romanê û berdewamiya di nivîsandina wê de, yek ji faktoran e. Eger mesele li cem sînorê romana kurdî bimaya û rê li ber bikaranîna wî ya ji bo projeyê dewletê bihata girtin, dê niha nixandinên me jî ji wî û ji helwestên wî re û ji paşxaneya siyasî ya berhemên wî re, bi awayekî din bûya.

Di van salên "dijwar" yên dewleta tirk de, ku şerê çekdarî yê kurdan berfireh bûbû, pê re tevgera siyasî ya kurdan xurt û berfirehtir bûbû.

- Ji bo sererastkirina agahiyên di der barê romanivîsan û berhemên wan de, daxwaz ji hemû xwendevan û nivîskaran ew e ku alîkariya me bi sererastkirina agahiyên şaş bikin, her wisa agahiyên nû heta dawiya 2010'an, eger hebin, ji me re bişînin.

Li aliyê din, rewşa siyasî ya cîhanê hate guhertin û hewildanên Tirkîyê jî ber bi ketina nav Yekîtiya Ewropayê re germ bûn û bi her awayî dewletê dixwest ku xwe ji kirîterên “Ewropayê” nêzîk bike. Ji ber têkilbûna berjewendiyên aborî, dewletê karîbû bi Ewropayê jî tevgera kurdan ya siyasî wekî tevgera terorê bide qebûlkirin û wisa binav bike. Êdî, kurdên nema dibû sûc. Li şûna wê, têkiliya bi tevgera kurdan ya siyasî re bû sûc. Anku tu dikarî kurd bî, bi kurdî biaxivî, binivîsînî, lê dijberî û dijminayîya “Terorê” şert e. Di vê çarçoveyê de, pirojeyê “spîkirina” kurdan berdewam kir.

Ji lew re, derdorên dewleta tirk yê birêveber û çêkerên “Kurdên spî”, ev yek ji xwe re kirin armanc, bihêzkirin û qezenckirina “rewşenbîr û nivîskarên” ku yan têkiliya wan bi tevgera “terorê” re tune be, yan jî dijberî wê tevgerê bin. Xala giring ev bû, ji ber wê jî eger ev derdor ji nav girtiyên siyasî yê berê bin, yan jî ji bermayiyên rêxistin û partiyên biçû-çikmayî û heliyayî bin, dîsa xemnake.

Bi vî awayî nivîskar, rewşenbîr, çapemenî û dezgehên tirk ketin dewrê.

Yek ji taybetmendiyên balkêş yê wê dewletê ew e ku li hember azadî û serxwebûna kurdan hemû alî û derdorên neteweya tirk bi çep û rastên xwe, bi general û sîvîlên xwe, bi dezgeh û çapemeniya xwe, bi nivîskar û rewşenbîrên xwe, dikevin nava tevgera harmonî. Ji bo vê armanca pîroz, rêlibergirtina azadiya kurdan, hemû dibin yekdest û yekdev û yekbawerî.

Ji bo xurtkirina eniya kurd ya dijberî “tevgera terorê” li xelekên qels gerian. Yek ji wan xelekên pêdiviya dewletê pê hebû dikarîbû bi hesanî di nav kurdên li Siwêde de bê dîtin. Baştirîn nivîskarê ku ew kirasê spî li bejn û bala wî dihat, li gor derdorên dewletê, “Mehmetçîk” Uzun bû. Hem bi rastî nivîskarekî xwedî berhem bû, hem jî dilsoziya xwe ya bi dewletê re, di dema gurbûna şerê li dijî “Tevgera terorê” re ji Swêde rê girt û hat bû “Mehmetçîk”, an leşkerî ji artêşa dewleta tirk re kir. (11)

Herwisa ji rêxistineke têkçûyî û li ber helandinê “Rizgarî” hatibû, ku bi her awayî dijberiya „tevgera terorê“ dikir. (12)

Lê, her çendî ew ji hemû romanivîsên kurd çalakî û zîrektir be û xwedî berhem be, lê dîsa jî divê di bin sîwaneke maqûl û cihê baweriyê de derbasî vî dergehê mezin yê wêjeya hemû Tirkîyê bibe. Ji bo bê şubhe kari-be derbas bibe, pêdivî bi hinek tedbîran hebû. Divabû Yekîtiya Nivîskarên Tirk wî hemêz bike û wî xelat bike û hate xelatkirin. Divabû romanên wî bi tirkî û li weşanxaneyên mezin yê Tirkîyê bêne çapkirin û belavkirin û wisa bû. Divabû ku ew ji hêla xwe de, xwe wekî nivîskarekî

cîhanî û pîrzimanî bide nîşandan ku milkê hemû Tirkîyêye û dijî terora û cudaxwazîyê ye û wisa bû. Ji bo balkişandina çapemeniya Tirkîyê û ya cîhanê divabû ku ji bo romaneke kurdî doz lê bê vekirin û dûre jî, ji bo ku îsbat bibe ku Tirkîyê wekatekî nêzîkî kirîterên Ewropayêye, divabû dozê qezenc bike û ji ewropîyan re diyar bibe, bi zimanê kurdekî ku, Tirkîyê welatekî cihê azadiya raman û derbirînê ye û bi kurdî û ...her wiha.

Ka em guh bidin çend helwestên Mehmed Uzun yên ku di 19.04.2002'yan de, ji dadgeha ewlekariya dewleta tirk re, dibêje:

“Peywira min cihêxwazîkirin nîn e, pêkanîna yekîtiyê ye. Ji bo min tiştê bîngehîn ne dabeşkerî (cihêxwazî) ye, pêkanîna yekîtiyê ye. Ez dabeşkerîyê (cudaxwazîyê) ne tenê wekî ehmeqîyê dibînim, di heman demê de wekî ramanê xetere jî dibînim.”(13)

“Ne ji bo cihêtiyê bîafîrînim, ji bo tiştê heyî dewlemend bikim, dinîvîsînim.”(14)

“Min mafên kêmetewa tirk a Bulgaristanê parast û ji bo van mafan çî ji destê min hat, min hemû pêk anî.”(15). Ew dixwaze ...“ ..xwe bigihîne Tirkîyeke şareza, murefeh û demokratîk.”(16)

Her wisa ew dibîne ku demeke dirêj di ser ketina Tirkîyê ya rîya parastina wîjdanê mirovan re, derbasbûye:

“Tirkîyeya ku ji zû ve ye ketiye rîya piyarî û wîjdana mirovî...”(17)

Ev nimûneyeke ji dehên nimûneyan, bi taybetî di hevpeyvînên bi rojnâmevanên tirk re, ku Mehmed Uzun xwe ji nivîskarekî kurd bêhtir wekî nivîskarekî ku bi gelek zimanan dinîvisîne ku yek ji wan zimanan kurdî ye dide pêşkêşkirin, wisa jî qala “integerekirina kurdên Tirkîyê” dikir.!. Ew hêleke, ji hêla din de jî xwe wekî afirînerê zimanekî pêşkêş dikir. Dema ji bo peyva xwe ya “Min zimanek afirandîye” dikete tengasiyê, mebesta xwe, ne Zimanê Kurdî, lê wekî zimanê romanê şîrove dikir. Bi vî awayî jî rê li ber nivîskar û rewşenbîrên tirk vedikir, da ku ew nezanî û tunebûna agahiyên wan yên li ser ziman û wêjeya kurdî bibin derew û li her derê, wekî ku rastiyên dîrokî bin, belav bibin. Projeya dewletê jî, ji bo bê şubhe û bi selameti biçe serî, hewcedarî wergerandina van derewan bû. Berztirîn mînak di vê çarçovê de Yaşar Kemal e, ku li ser wêjeya kurdan û Tirkîyê her dem Mehmed Uzun wekî wêjewanê kurdan yê bi tenê pêşkêş dikir:

“Li Tirkîyê gelek wêjenas derketin. Nazim Hikmet derket, Sait Faik derket. Gelek mirovên din jî derketin. Lê di kurdî de tenê Mehmedekî wê heye.”(18)

Derewên Yaşar Kemal yên li ser Mehmed Uzun û li ser romana Kurdî:

“Îro Zimanê Kurdî bi Mehmed dest pê dike.”(19)

Li vê derê mebest ji peyva “ziman” çibe bela bibe, mebest Zimanê Kurdî be yan jî zimanê romanê be, bi her du wateyan jî, ev gotin ji rastiye dût in.

Yaşar Kemal, mîna her nivîskarekî din, di bîr û baweriyên xwe û di nîrxandinên xwe de, azad e. Ew ji kê hez bike yan jî neke, ew derdekî wî ye. Lê, ne ew, ne tu nivîskar, ne xwediyên wî mafî ne ku, nîrxandinan li ser romanivîsandin û wêjeya zimanekî bikin, ku ne bi wî zimanî dizanin, ne jî di der barê wêjeya wî zimanî de, xwedî agahî ne. Yaşar Kemal nivîskarê zimanê tirkî ye û kurdekî ku nîzane bi kurdî bixwîne û binîvisîne, vî mafî ji ku tîne ku nivîskarekî bîne û wî bike yekem kesê ku zimanê me ji wî dest pê bike.

Yaşar Kemal ê tirkînivîsê vê wêrekiyê ji ku tîne ku derewek e wisa mezin, wekî rastiyeke dîrokî, ji me re pêşkêş bike?

Jixwe bi vê qayîl nabe. Mîna ku ji hemû berhemên romana kurdî jî agahdar be, dîsa wî mafî dide xwe û romana Uzun wekî yekemîn romana kurdî, an jî “romana pêşî” binav dike:

“Gava min romana Mehmed Uzun xwend ez şaş mam, çawa di zimanekî de romana pêşî ew qasî pêşketî, dewlemend û bi hosteyî dikarîbû bihata nivîsîn...”(20)

Yaşar Kemal û pê re jî çapemeniya tirk û derdorên rewşenbîriya tirkan û kurdên spî bi hev re mîna “koralekê” ev derew dubare û dehbare kirin, hetanî ku bû baweriyeye hevbeş ya gelek kurdan jî. Vê yekê hinek ji nivîskarên nîfşê nû jî xiste bin bandora xwe, wekî mînak, Yaqob Tilermenî, M. Uzun wekî maratonvanê bi tenê yê wêjeya kurdî bi nav dike ku ne li pêş û ne jî li paş wî kesek tune ye:

“Mehmed Uzun, di qada wêjeya kurdî de maratonvanê tenya ye ku di pêşbaziya sed metreyî de, ne li nik wî, ne li pêşiya wî, ne jî li paşiya wî tu maratonvanên din tune ne.”(21)

Yaşar Kemal li ser gora Uzun jî heman derew dubare kirin:

“.. Kevirê yekemîn ê esasî yê Zimanê Kurdî daniye.”(22)

Ev pêlên deryaya derewên ku bi her awayî li ser kurdan dihatin ferz kirin, nema rê didan qeyikên rastiya ku dema dihat gotin jî ne deng diçû kesekî, ne jî rê li ber wan dangan vedibû ku ev dîmenê çewt yê wêjeya kurdî

hinekî sererast bibe.

Hetanî bi rexneyên cidî yên nivîskarên mîna Remezan Alan, bi her awayî dihatin paşguhkirin û ji hêla van derdorên siyasî hem yên tirk û hem yên kurd- vê dawiyê- tune dihatin hesibandin. Rexne carinan li zimên bû:

“...wî bi domdarî digot: “Min ji bo romana kurdî zimanekî nû afirandiye, lê di eslê xwe de ew ji sînoren vegotineke çîrokbêjî derneketibû...”(23)

Carinan jî van rexneyan wisa bal dikişandin ser çewtî û nenormalbûna rewşa pêşkêşkirina berhemên wî yên di kurdî de lawaz û bi tirkî bi awayekî din bûn:

“...Yanê pirtûkeke ku di tama edebiyatê de pênc hevokên wê nîn in, bi nivîsên A.Omer Turkeş û Muhsin Kizilkaya rûspî dike, ya rast saziyeke wisan li pêşiya me ye ku bi van nivîsan, me amade dike...”(24)

Berevajî wê, piştî 1999'an û guhertinên ku destpêka sedsala nû di siyaseta azadîxwaz ya kurdên Bakur bi xwe re anîn, êdî ev dîmen bi destê tevgera kurdan ya siyasî hat rûniştandin û Mehmed Uzun ê nexweş, mîna qehremanekî ku serkeftinî mezin bi dest xistibin, li welatê xwe, li Amedê, hate pêşwazîkirin û hembêzkirin û bi temamî ev derewên ku bi salan e dewlet û rewşenbîrên xwe û kurdên xwe dixwestin bikin rastî û nikarîbûn, êdî ew armanc bi temamî pêkhat.

Balkêş e ku hin der û dorên siyaseta kurdan bi dewletê û der û dorê wê re kete pêşbaziya spîkirina navê Mehmed Uzun û ketin nav hewildanan, da ku hin rastiyan bi kurdan bidin jibîrkirin û li hember nivîsên dijî projeyê dewletê di çapemeniya xwe de sansûr bikin, wekî mînak, kovara W'yê, ku niha ji Weşanê Enstîtuya Kurdî ya Amedê ye û berê bi alîkariya Şaredariya Bajarê Mezin ya Amedê derdiket, di hejmara xwe ya 13'yan de, di dosyeya li ser Mehmet Uzun de, gotara Mahabad F. Arda ya ku vê diyardeya mijara me rexne dike, sansûr kir, ew neda weşandin û li şûna wê hejmarek tijî nivîsên ku ji tirkî hatibûn wergerandin li ser M. Uzun derxistin. Di vê hejmarê de 48 wêne û portreyên M. Uzun hatibûn bicihkirin. Arda di nivîsa xwe ya sansûr kirî de wisa nivîsandibû:

“Birêz Uzun 10 sal li ser navê nivîskariyê ji swêdiyan pere wergirt ku ji bo li ser wêjeya kurd kar û xebat bike. Piştî deh salan eger pêwîst bê dîtin, deh salek din an demek kintir carek din tê dirêj kirin. Piştî ku Uzun fam kir dê êdî pere nedinê, di wê demê de ‘lîsteyek’ derket ku PKK'ê navê 200 kesî kiriyê ku dê 200 kesî bikuje û navê Mehmet Uzun jî di nav de ye. Di nav van ‘200 kesan’ de, bi tenê navê Uzun hat zanîn û derket pêş û propoganda wî hat kirin. Wî bi xwe ji çapemeniya tirk û swêdiyan re digot ‘navê min di lîsteyê de ye’ di Roj TV de jî derdiket digot:

‘masmedya swêd û tirkan derewan dikan’. Heman tiştî di Ozgur Politikayê de jî nivîsand.

Gelo bi nexweşketina Mehmet Uzun re ev dokument hemû winda bûn an jî ji bîr bûn?”(25)

Ez ê li cem vê mînakê rawestim û vegerim ser nîrxandinên Yaşar Kemal yên ji helwest û kirinên siyasî yên Uzun re, ku di dema koçkirina Uzun de gotibûn:

“...Ev mirov di polîtîkayê de jî li ser xwe rawestiyaye. Li wir jî tu xeletî nekirine, herdem lanet li tundiyê aniye..”(26)

Ez bawer dikim, mebesta wî bi “xeletî nekirine” ew e ku tu caran pişt-giriya “tevgera terorê” nekiriye.

Bi vî awayî, ew dîmenê ku li ser dihat karkirin û xebitandin, da ku bi her kesî bê qebûlkirin ev bû. Y. Kemal rola xwe heta dawiyê bicih anî. Ji wir û pê ve piroje êdî berdewam dike û “kandîdatên” nû têne amadekirin. Anku “kevîrê esasî” yê romana kurdî, piştî M.U tên amadekirin. Pê re jî TRT 6 tê vekirin û dibe platformeke geş ji bo ku ew piroje ber bi serkeftinên din de here.

Roman û dagîrkerî (kolonyalîzim)

Gelo rast e ku M. U. ew “xeletî” nekiribû?

Tev ku romana wî ya “Ronî mîna evînê, tarî mîna mirinê” li ser şerê li Kurdistanê û Tirkîyê bû. Anku çawa “xeletîyeke” wisa dikare nebe, tev ku nivîskarekî kurd romanekê li ser şerê di navbera artêşa dewleteke dagîrker û şervanên azadiyê yên kurd de binîvisîne. Ew “xeletî” bibû yan nebibû?. Ez ê hewl bidim piştî vê kurteşîroveyê, li gor xwendina xwe ya ji romanê re, hinekî nêzîkî bersivê bibim.

Di dîroka wêjeya cîhanê de, mirov li gelek mînakan rast tê, ku welatê nivîskarê xwediyê romanê ji hêla artêşeke dagîrker ve hatibe bidestxistin û li hember wê artêşê şer tê kirin. Nêzîktirîn mînaka vê yekê romana “Bêdengiya deryayê” ya Vircor e. Ev roman li ser dema dagîrkirina nazî-yên elman ji Frensayê re. Nivîskarê romanê Jean Marcel Bruller e. Cara yekem romana wî di bin navê Vircor de, di sala 1942’yan de derket. Vircor jî navê cihekî ye ku sembola berxwedana frensîyan bû dijî nazîyên almanên dagîrker.

Çîroka romanê bi kurtayî wilo ye, serbazekî artêşa dagîrker ya nazî bi navê Werner von Ebrennac dixwaze li cem malbateke frensî ku ji kalik û keçeke ciwan ku biraziya wî ye, pêk tê. Serbazê alman bi her awayî dixwaze têkiliyê bi keçikê yan bi apê wê re deyne. Roman hemû li der-

dora awayê berxwedana vê keçikê, an vê malbata ku welatê wê hatiye dagirkirine û li hember vê dagirkeriyê bêdengî hilbijartine. Hemû rengên têkiliyê bi vî serbazê dewleta dagirker re red dikin û xwedyên helwesta xwe dimînin. Serbazê alman dixwaze xwe ji wan nêzîk bike û bi xwe re diaxive ku ew dixwaze her du çand, ya firensî û ya elmanî, bi hev re bijîn û...lê ji ber ku ew serbazê artêşa dewleteke dagirkere, hemû gotinên wî li hewa dimînin û têne redkirin. Ev helwest dibe sedem ku yê serbaz di xwekustîna de bifikire û ...heta dawiyê.

Em niha vegehin ser romana „Ronî mîna evînê, tarî mîna mirinê“, di nav romanên M. U. de ev tenê li ser şerê li Kurdistanê yê dijî artêşa tirk nivîsandiye. Di romanê de navê Kurdistanê derbas nabe. Ew wekî welatê çiyayan û Tirkîyê wekî welatê mezin têne binavkirin.

Beramberiyeke biçûk:

- Welatê ku hatiye dagirkirin: li wir Frensa ye – li vir Kurdistan e“ nayê binavkirin”
- Artêşa dewleta dagirker: li wir artêşa alman e – li vir artêşa tirk e.
- Serbazê artêşa dagirker: li wir Werner von Ebrennac e- li vir Baz e.
- Jina ku yê serbaz dixwaze pêre têkiliyê deyne: li wir keçikeke frensî, bi apê xwe re dijî.- li vir keçike kurd e, şervaneke bi navê Kevokê ye.
- Stûnê bingehîn yê romanê: li wir awayê têkiliya serbaz û keçika frensî ye. - li vir awayê têkiliya yê serbaz û keçika kurd e, ji hev du hezdirin û roman çîroka evîna wan vedibêje.

Encam:

Nivîskarê frensî M. Bruller, keçekê ji welatê xwe yê dagirkirî tîne û li hember serbazekî artêşa dagirker ya alman wê bêdeng dike. Bêdengiyeke wisa ku mîna bêdengiya deryayê ye, ji derve de hêdî û ji hûndir de tijî qêrîn û protestokirin û redkirina dagirkeriyê ye.

Nivîskarê Kurd M. Uzun, keçike şervan ji welatê xwe yê dagirkirî tîne û li hember serbazekî artêşa dagirker ya tirk dixîne deryaya evîneke kûr. Şervana keç ya kurd dike Kevok û serbazê artêşa tirk dike Baz û wan ber dide nav pêlên hezdirin û evînê.

Tev ku serbazê alman nerm e, kulturhez û diltenik e, lê dîsa jî, ji ber ku dagirkirina welatê wê li wê navê ye, ji hêla keçika frensî ve tê redkirin.

Serbazê artêşa tirk yê M. Uzun xwîn mij, kujer û qesasê serê şervanên kurd e. Dîsa jî keçika kurd dibe evîndara wî û ew evîn dibe mijara roma-

na M. Uzun ya ku ew bi tenê li ser dagîrkirina Kurdistanê û şerê azadiya kurdan ku heta niha lidare nivîsandibû.

Hêjayî gotinê ye ku ev “serkeftinên M. Uzun yên di warê romannivîsandinê de ku berî her tiştî yek ji encamên wî projeyê demdirêj yê dewleta tirk e, wisa jî ji hêla tevgera siyasî ya kurdên bakur re hate qebûlkirin û “efsane”kirin, bûn sedem ku ji bo hin “nemzetên”din yên vê “rol”a nepîroz bidin ser riya wî. Bi hêviya ku teqlîdkirina wî, wan jî bigihîne wê radeya M. U. xwe gihandê.

Çavkanî:

10) Hinek agahiyên li ser nav û dema weşandina romanên, yên di van nivîsan de derbas dibin, ji lîsteya romanên kurmançî ya ku Ibrahîm Seydo amadekiribû, hatine girtin.

11) Di salên 90’î dema herî xerab de ku gund dihatin şewitandin, her roj mirov dihatine kuştin, serîhildan dibûn û qiyamet bû... Birêz Mehmed Uzun 15.000 ewro pere da dewleta tirk û bi ser de jî çû mehekê li Egeyê eskerî kir. Ji malbata wî bi xwe jî şehîd ketin, ew qasî felaket bi serê kurdan re hatin. Ev helwesta Uzun bû skeç (şano) û di Med-TV de hat lîstin.

Mahabad F.Arda: ji amidakurd.com/15 çile 2007.

<http://www.amidakurd.com/kevin/modulesc420.html?name=Niviskar&op=viewarticle&artid=489>.

12) Weku têbîniyekê li ser çûna Mehmed Uzun ya leşkeriya Turkiyê, ez dixwazim vê xalê zelal bikim. Eger M. U. li Turkiyê an li bakurê Kurdistanê bûya, bê guman wê nirxandina çûna wî ya leşkeriyê jî bi awayekî din bûya. Anku ev rexne nikare bi vî awayî li nivîskarekî Kurdî ê din bibe ku ji neçarî, ji ber mana li welêt, biçe leşkeriyê. Mesele ew e ku ji Siwêdê, bi qîm û reza xwe, rê bigre û here ji artêşa Tirk re bibe leşker.

13-17) pirtûka planet ya Bienalle 2009, rûpel 23 – 30.

18-19) Kovara W, hejmar13, zivistan-2007. Rûpel 91.

20) Romana Ronî mîna evînê, tarî mîna mirinê, avesta 1998, rûpel 351.

21) Kovara W, hejmar 13, zivistan-2007. Rûpel 28.

22) Ji A.Welat 14.10.2007

<http://www.rojaciwan.com/haber-29086.html>

23-24) Bendname, Remezan Alan, Avesta-2009, rûpel 14.

25) Jiamidakurd.com-15.çile.2007.

<http://www.amidakurd.com/kevin/modulesc420.html?name=Niviskar&o>

p=viewarticle&artid=489

25) Mahabad F.Arda: ji amidakurd.com/15 ç ile 2007.

26) Ji A.Welat 14.10.2007

<http://www.rojaciwan.com/haber-29086.html>

Hevpeyvîn bi Fêrgîn Melîk Aykoç re

Hevpeyvîn: Rukiye Ozmen:

Rukiye Ozmen: *Di dîroka romanê de qonax hene ku bi „îzmên“ corecor têne binavkirin û ev qonax ji destpêka xwe ber bi îro de bi hezaran roman di himbêza xwe de digre, ji vî cîhê derengmayî awantaj û dezavantajên me, şens û bêşensiya me, îro mirov rehet dikare xwe bighîne wan?*

Fêrgîn Melîk Aykoç: Rast e, çawa çîrok berhemeke koçberiyê bû û li Rojhilata Navîn destpêkir, ji ber ku roman vegotin û berhemeke civaka dema bajarwanî û endustirîyê ye, wê jî li Ewropê destpêkir. Bêguman ji dema Balzac ê realîst, Emile Zolo yê Natûralîst, B. Andre yê suralîst hetanê Joyces James ê modernîst bêhejmar roman hatine weşandin. Di vê pêvajoyê de hima bigire tu dengê me tune. Sebebên vê tê zanîn, bi kurtî egera wê; welatê me yê parçe û dagirkirî, zimanê me yê qedexekirî û nebûna bazara zimanê me ye.

Her çendî hin kesên dixwezin her tiştî di xwe de bidin destpêkirin, bi gotinên vala wêjeya tunebûnê derdixin pêş û seriyan tevlihev dikin jî, di vê dema me de gelek romanên kurdî bi taybetî kurdî-kurmancî hatine weşandin. Bi dîtina min di nava van romanên de romanên serkeftî gelek in.

Eger em bikanin sentêza mînakên cihanê û dewlemendiya çand û jiyanî kurdî pêk bînin, dê emê bikanin di romanê de rêya hizir û hestên hê geştir û dewlementir vebikin. Lema her çendî dereng mayî di qada navnetewî de hin dezavantajan jî derxe pêş me, Avantajeke azmûnên cihanî jî dide me.

Di rastiye de pîrsgirêka herî mezin serketina polîtîka kurdî û bi wê ve girêdayî bazara kurdî-kurmancî ye. Li başûrê Kurdistanê tenê bazareke ji

bo zarava soranî û bi tipên aramî-erebî heye. Ev jî sudeke mezin nade me. Dema mirov behsa bêşansiyê bike. Bêşansî tenê ev e.

Rukiye Ozmen: *Ji bo romaneke baş û serkeftî bê ku em bêjin dîrokî, psîkolojîk yan jî bi coreyekî din, postmodern, çend pîvanên ferz binav bikin?*

Fêrgîn Melîk Aykoç: Serkeftina romanê ne bi forma romanê, ango, realîst, natûralist, sûralîst û modernîzmê ve girêdayî ye. Serkeftin, bi tevî, ziman, mijar û ristina romanê, hest û hizrên ew roman dide ve girêdayî ye. Pîr frotina romanekê jî ne pîvaneke serkeftina romanê ye. Lewra gelek caran frotin bi reklam, derûdor û popelîzmê ve girêdayî ye.

Di nava me kurdan de hin pîrsgirekên taybet jî hene, wek hembajarîparêzî, meyla polîtîkî, nebûna dezgehên belavkirinê, nebûna rexnegirîyeke bijûn û hwd.

Rukiye Ozmen: *Romana kurdî jî û çîroka kurdî herdu jî dereng ketine, sedemên dernegmayînê û heman pîrs ji awirike bervaja û belkî hevdû temamkir, roman çawa bi pêş dikeve?*

Fêrgîn Melîk Aykoç: Ji ber ku çîrok îro di du wateyan de tê bikaranîn, divê mirov berê van wateyan ji hev cûda bike. Yek çîrokên bav û kalan, çîrokên pîrikan, yê pêkhatina wan derê rastiye ne, xwedanê hêzên serxwezayê re ne. Ya duyem jî çîrokên dikane di rastiya jiyana de pêk werin. Yan jî kêliyeke jiyana vedinivîsîne ne.

Di nava gelek gelan de ev cuda ne, wek mînak; di almanî de, ji bo çîrokên bav û kalan „Märchen“ ji bo yê momenteke jiyana vedinivîsîne jî „geschichte“ yan jî „novel“ (ev peyv italî ye) tê gotin. Mirov dikane hin navan li forma ku hûn dipirsin bike. Wek mînak û pêşniyar „nûrok“ (dîrok > çîrok > nûrok) yan jî „jînborî“ bibêje. Dibe naveke din jî were bikaranîn, yan jî wek çîrok bimîne. Belê rast e, nûroka (çîroka) kurdî jî dereng maye. Lê dîsa jî gelek serkeftî ye. Bêguman pîvana serkeftinê li gor vejînê û nîrxandêran diguhere. Lê gava ez nûrokên kurdî bi yê almanan re dirûberînim, dibînim ku ji yê almanan ne kêmtir in.

Rukiye Ozmen: *Dem a ku berhemek tê weşandin, carna nîqaşa ew berhema çîrok e an jî roman e, tê kirin cudahiya romanê ji çîrokê çî ye?*

Fêrgîn Melîk Aykoç: Min di bersiva pîrsa berê de gotibû; nûrok kêliyêk, yan jî momenteke jiyana ye. Lê roman jiyana bi giştî ye. Yan jî, gava mirov bersiveke kilasîk bide. Roman wekî darekê ye, nûrok (çîrok) jî wek şaxên wê darê ne.

Bi zimaneke din mirov dikane bibêje: Roman ji berhema ku li ser bingehên xewneroşk yan jî rastiya jiyanê hatiye rastin, tê de rawestana mirovan, hawîrdor û karakterên wan bi kûrahî tên nirxandinê, serguzeştîyên wan bi zimaneke herikbar vedibêje, li ser veristina hest û hizrên wan karakteran kûr dibe, re tê gotin.

Di nûrokan (çîrok) de çalakî ne zêde ne, li pey hev rêz nabin, bi giranî li dora çalakî, rûdan û rawestaneke kûr dibe. Lê di romanê de çalakî û rûdan wek xelekên çorozê li pey hev rêz dibin. Bêguman ji mijara bingehîn jî qut nabin, tim bi mijara bingehîn ve girêdayî û di nava yekitiyê de ne.

Rukiye Ozmen: *Pêwendiya roman û destanê li ser çi astêye?*

Fêrgîn Melîk Aykoç: Destan; vegotîneke helbestî ye, ji çend çarekan, yan jî beşan pêk tê. Bi şêweyekê bi coş serenceyên gernasên xwedanê hêzên yêzdanî bi awayekî delîndezî vedinivîsîne. Tê de kûrbûna romanê nîne. Li aliyê din roman ne helbestî ye, pexşanî ye.

Destan formeke gelek kevn e. Mirov dikane wek pêpilika yekem ya helbest, nûrok û romanê jî bibîne. Lê di warê form, tevn, naverok û rastîyê de ji hev cûda ne.

Rukiye Ozmen: *Rewşa romana kurdî, heger mirov di qonaxan de bi nav bike çi ne ev qonax?*

Fêrgîn Melîk Aykoç: Di vî warê de ta niha tenê nirxandinên kesî hene. Hîna bi awayekî hûrkolînên zanistî ev qonax ji hev nehatine cûdakirin.

Çend berhemên kevin hene. Wek mînak; Romana gorbihuşt Erebe Şemo „Şivanê Kurmancan“ (1935)

Ji wê demê hetanê salên heştêyî tenê çend romanên bi kurdî (zaravayên cuda) derketine. Ji salên heştê heta nodî jî hejmara romanên kurdî bi qasê hejmara tiliyên destan e. Lê ji nodî û pê ve, her çû zêde bûn. Ji wê mirov nikane wek qonaxên bingehîn ji hev cûda bike.

Rukiye Ozmen: *Dema gotin li ser romana kurdî ye, hinek behsa zaroktiyê dikin, hin dibêjin hê bi çar lepikan diçe, hinên din tena-tena dibêjin, hinek jî êdî zarok hesab nabe, zarokî di temen û di aliyê biyolojîk de tê zanîn kêma zêde, belê dema rewşa romanê bi îfade û tesbîtên li jor tê diyarkirin, mebest çi ye, hûn çi dibêjin, çawa dibînin, romana me di rewşa kîjan kategoriyê ji van kategorîyan de ye û kîjan li rastiya nêzîk e?*

Fêrgîn Melîk Aykoç: Bêguman em di nivisandin û pêşxistina forma romanê de li gor gelên din dereng mane. Romanên kurdî ji salên nodî û vir

ve zêde bûne. Ji bo me diyardeyeke nû ye. Dibe qelsiya hin romanen, bandora devokan, hikariya romanên biyanî lê hebe, lê disa jî li gor romanên dagirkerên wek tirk, faris û erebên ku welatên me dagirtine, ne kême, ji yên wan çêtir nebin jî, xirabtir nînin.

Di nava me kurdan de hin hobûnên gelek şaş hene, wek mînak „wêjeya tunebûnê.“ Tu ji kîjan kurdî bipirsî, hima dibêje; „filan tiştê me tune, bêvan tiştê me tune.“ Hin rewşenbîr jî ji bo ku bikanin hin tiştan di xwe de bidin destpêkirin, bi wêjeya tunebûnê dest pê dikin. Mixabin ku ev jî kêseyeke derûniya me ye.

Li hin welatan ji sed salî zêdetir e ku roman tîn nivisandin, yê me di van bîst salên dawiyê de berfireh bû. Ji ber wê jî mirov dikane bibêje ku romana kurdî ciwaniya xwe dijî. Wê hê bi awayeke gelek bihêz û xwirt bikemile. Lewra mijareyên li welatê me bê mînak in.

Rukiye Ozmen: *Di nav romanên cîhanê de tu hez ji kîjan roman-nivîsan zêdetir dikî, ji bo kesekî romanxwîn û evîndarê romanan çend nav wê ne hesan be, belê herê zêde û di nav yên kurdî de?*

Fêrgîn Melîk Aykoç: Ji ber ku ez nexweşekî xwendinê me û ji salên şêst û şeşan vir ve bê navber dixwînim. Di salên heftîyê de jî me wek pêşbirk roman dixwandin, me ji giştan jî hez dikir. Ji nivisakarên fîransîz bigire ta yên rûs min xwendine. Wer rasterast nikanim bibêjim, ev zêdetir bala min dikişînin. Li gor mijare û herikbariyê diguherin.

Di nav nûserên kurdî de ez tu cudahî nakim. Min bi dehan romanên kurdî jî xwendine. Ha yên bi destên min ketine, ha yên min li ser E-pirtûk xwendine.

Rukiye Ozmen: *Werger çendî ziman, stîl û formûlasyonêan bi pêş dixê?*

Fêrgîn Melîk Aykoç: Her ziman bi serê xwe di proseseke pêşveçûnê re derbaz bûye, lema jî mirov dikane bibêje; her ziman li gor rastiya xwe nixandî û têgihiştineke cihanî ye. Ji ber vê karakterê jî her ziman xwendanê form, têgîn û peyvên cûda ne. Di wergerandinan de venivisandina van cudahiyan bi serê xwe dewlemendiya form, têgîn û peyv bi xwe re tîne. Ji bo van venivisandinan asoyên ziman berfireh dibe, rê ji bo awayên din a bikaranîna peyv û têgînan re vedike. Ji ber vê egerê jî werger di peşxistina zimanan de roleke gelek girîng werdigire.

Lê hinek xeteriyên wergerandinan jî hene. Divê kesên karê wergerandinê dikin, haya xwe ji rastiya ziman hebe. Bi serê xwe, li gor mantiqa xwe peyvyan neafirîne. Peyv afirandin jî bi serê xwe zanyariyeke taybetî

dixwaze. Divê ev tenê karê komisyonên zanistî be. Yan jî divê mirov peyvên ji zaravayên kurdî yê din werbigire. Wek mînak; hin aqilpîjan peyveke bi navê „metirsî“ afirandine. Ev wergerandina peyva tirkî „korkular(imiz)“ de ye. Ji bin ve şaş e, ser û binkirina rêzimana kurdî ye. Pêşgîna „me“ berlêkera nerênî ya fermanê ye. Gava mirov bibêje „metirse“ yanê „netirse!“ tirkîya wê „korkma“. Ango gava mirov bibêje „Metirsiyên me hene.“ Bi tirkî tê wateya „korkmamalarımız var“ Kurdiya peyva tirkî „korkular“ Jêtirsîn e.

Ev mînak jî gelek baş zelal dike ku xeteriyên wergerandinê çi ne.

Rukiye Ozmen: *Romanên hatine wergerandin çendî serketî ne, Zimanê Kurdî çendî di bin barê wergerê de radibe?*

Fêrgîn Melîk Aykoç: Li ser mijara wergerandinê gelek nîqaşên berfireh çêbûn. Ji zimanê orjînal wergerandinê bigire, hetanê ji zimanê duyem wergerandinê, gişt hatin nîqaşkirin. Ez naxwazim careke din têkevin nava wê nîqaşê

Mijara pirsê we jî mijara lêkolîneke kûr û berfireh e. Ji ber ku min ta niha lêkolîneke wiha nexwendiyê, û bê çend wergerandinan, yê din di destê min de tune, ezê nikanibim, bersiveke têr bidim.

Rukiye Ozmen: *Werger çiqasî cewhera berhema ku tê wergerandin diparezê?*

Fêrgîn Melîk Aykoç: Dema kesê wergerê pêktîne, bi azmûn be, herdu zimanan di warê wêjeyê de baş têbigihîje. Naverok û wateyê bi her aliyê ve fêm bike, dikane wergereke gelek baş pêkbîne. Wê naverok û cewhera romanê jî di zimanê lê tê wergerandin de bide. Ango ev kareke azmûn û pisporiyê ye.

Rukiye Ozmen: *Hûn bi xwe hez ji kîjan celebê romanê dikin, nîvîskarekî romanê bêşik hezkirina wî wê fireh be, wê bi kategori û çend kategoriyan ne sînorkirî be, belê cardî jî meyla mirov zêdetir bi ser hinan e, hûn xwe di kîjan kategoriye de dibînim, nêzîkî kîjanê ne ji wan?*

Fêrgîn Melîk Aykoç: Ezê nikanibin rasterast bersiva wê pirsê we bidim, ji ber ku çîrokbêj û dengbêjiya Serhedê ji romanên cihanê zêdetir bandor li min kiriye. Di zarokatiyê de tûrikê bîra min bi wan hatiye dagirtin. Her formên romanê jî xwedanê taybetiyên xwe ne, Lewma ez bi hez û xweşdiliyê dixwînim. Bi bawerîya min ez hinek realist im. Kesên din min çawa dibînin, ez wê nizanîm. Ez bi xwe jî gelek forman, gelek caran jî, gelek li gel hev bikartînim.

Rukiye Ozmen: *Roman rolekî çawe ji bo civakê dileyîze?*

Fêrgîn Melîk Aykoç: Bêguman roman dikanin di guhertin û pêşketina civakan de hin rolên girîng bilîzin. Lê rastiya civaka me ji civakên din gelek cûda ye. Berê her tiştî ji sedî nod û nehê civaka me nikane romana kurdî bixwîne, lew re xwendin û têgihiştina romanê jî bi polîtîka perwerda netewî, serdestbûna ziman û bazara ziman ve girêdayî ye. Ev derfetê gelê me nîne.

Di warê politikî de di nava xetereyê hebûn û nebûnê de ye. Azadiya li başûrê Kurdistanê jî tu sûdekê nade romana kurdî-kurmancî.

Li aliyê din çanda xwendinê jî, di nava civaka me de gelek melûl e. Divê berê derfetên rûniştina çandeke wiha werin afirandin.

Di vê dema me de romanên kurdî li gor gotinan (ji ber ku statîstîk nînin) li dor 300 hetanê çend hezaran tê firotin. Heta li gor hin nêrînan ev ji sêsedî jî derbaz nabin. Wê bandora romana kurdî jî li gor xwendina wê be.

Rukiye Ozmen: *Hayê we çendî ji romanên perçe û zaravayên din yên kurdan heye?*

Fêrgîn Melîk Aykoç: Du alfabeyên cûda tîn bikaranîn, ev jî, ji bo me kurdan pirsgirekeke mezin e. Bi giştî em ji hev bê hay in. Belê di destê min de du sê romanên bi soranî hene, lê ji ber wê alfabeya aramî-erebî min hîn bi giştî nexwendine, Ez wê alfabê gelek giran dixwînim, lewma gelek xemgîn im. Ji ber xetereyên wê alfabê carnan hinek peyvan çendbare dikim ku bikanim rast bixwînim û têbigihîjim, lema cardin datînim.

Lê yên kirmanckî(zazakî) xwendin ne pirsgirêk in, ji ber ku kirmanckî(zazakî) ji zarava soranî zêdetir nêzîkê kurmanci ye û bi alfaba latînî hatine nivisandin, mirov dikane bi hesanî bixwîne û têbigihîje. Xwendina kirmanckî (zazakî) jî çêjeke taybetî dide mirovan. Wek mînak romana Munzûr Çem ya bi navê “Hotay sera Usivê Qurkizî”. Lê soranî gelek zehmet e. Pir peyvên li gor semantîka erebî hatine çêkirin û ji ruhê kurdayetî hatî dîrxistin, têda hene. Zimaneke çêkiriye.

Rukiye Ozmen: *Demek dirêj di ser berhemaafirîniya romanê re derbasbûye, roman jî form û hûnandina xwe bi demê re diguhere gelo?*

Fêrgîn Melîk Aykoç: Bêguman her tişt di nava pêşketin û pelvedanê de ye. Hin hewldanên cûda hene. Ev mijareyêke polemîk e. Ya duyem jî mijareyêke siberojê û dahatû ye. Mirov nikane ji niha ve tiştek zelal bibêje.

Rukiye Ozmen: *Xelatata Nobel û dîroka destpêkirina wê gelekî ji dîroka romana kurdî kevintir e. ji romannivîsên gelên herêma Rojhilata Navîn Necîb Mehfûzê Misrî, Orhan Pamûkê Tirk xelat girtin, rojeke xelatgirtin bibe dora me jî mimkun e, pêşbîniyên we, fantazyên we?*

Fêrgîn Melîk Aykoç: Li ser mijara Nobelê nirxandinên cûda hene. Hin derdor vê wek xelatkirineke di xizmeta pergalê de dibînin. Wek mînak ji bo çi xelata Nobelê ya Aştiyê dan Barak Obama, ne zelal e. Xelata dan Orhan Pamûk jî ne ji ber berhemên wî, ji ber helwesta wî ya polîtîkî bû. Eger Yaşar Kemal jî kanîba ew helwest nîşandayîba, dê bidana wî jî. Yanî di nava vê mijara Nobelê de berjewendiyên pergalê heye.

Lê dîsa jî mirov dikane bibêje, dibe ku sibe li gor berjewendiyên xwe nivisakareke/î kurd jî layîqê wê xelatê bibîn. Lê di vê rewşê de ji ber têkiliyên bi dewletên dagirker tirk, faris û ereb re wê xelatê nedin kurdan. Xeyaleke wiha ne realîst e jî.

Rukiye Ozmen: *Pirsên me evin. zor spas!*

Fêrgîn Melîk Aykoç: Spas xweş!

Hevpeyvîn bi **Adîl ZOZANÎ** re

Hevpeyvîn: **Rukiye Ozmen**

Rukiye Ozmen: *Di dîroka romanê de qonax hene ku bi „îzmên“ corecor têne binavkirin û ev qonax ji destpêka xwe ber bi îro de bi hezaran roman di hembêza xwe de digre, ji vî cihê derengmayî awantaj û dezawantajên me, şens û bêşensiya me, îro mirov rehet dikare xwe bighîne wan?*

Adil Zozanî: Beriya her tiştî em gelekî ku bi derengî balixbûyî ne. Em derengî haydar bûn ku zimanê me yek ji gencîneyên herî mezin ên lîteratûra/wêjeya cîhanê ne. Heta îro jî haydarbûn û têrneydarbûn jî mijara dabeşeyê ne. Kêmasî be jî tekstên ku bendava peyvên kurdî li ber wêjeya cîhanê vedikin hene. Êdî em dikarin vê yekê bi rehetî bêjin. Me-seleya derengmayînê, ji bo çu qewman nabe ku wekî awantaj bê binavkirin. Lewre her derengmayînek di vî warî de windabûneke. Windabûnên me piralî ne. Beriya her tiştî, me gelek pênûsên xwe yên nazdar ji bo zimanên serdestên xwe bexşandine.

Bi kurdî nivîsîn di encama înadeke siyasî de pêkan bû ye. Ji ber hindê jî teksên destpêkê yên kurdî serdema nûjen siyasî ne. Tam û çêşa serdema klasîk di wêjeya kurdî de nîn e. Mînak, em hêj jî hewl didin ku bi qasî Ehmedê Xanî bibin melevanê Zimanê Kurdî. Hêj jî reqsa me ya bi peyvên û hevokan re dûrî reqsbazîya Ehmedê Xanî ye... Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Celale Xanim... hêj jî melevanên serkêş ên Zimanê Kurdî ne.

Kevnaretiya wêjeya kurdî di heman demê de; dibe ku wekî awantajekê jî bê dîtin. Lê rastî ew e ku xîmê wêjeya kurdî qedîm e, dîwarê tê honandin di warê keviyên goşeyan de qels e. Mesela Celale Xanima Loristanî ku Meryemaya wêjeya kurdî ye, heke hayê me jê hebûya niha li ser navê wê stargehên wêjeyê ji bo wêjeya cîhanê hatibûna bexşandin.

Wisa bifikirin ku gelek wêjevanên kurd îro jî cara yekemîn e ku navê Meryemaya wêjeya kurdî Celale Xanima Loristanî dibihîzin. Celale Xanima di sedsala 9'an de diwanên êl û eşîrên Loristanê de helbest xwendine, di heman demê de bîjê xwe 'Şa Xweşîn' wekî zarokê rojê bi civakê daye qebûl kirin. Gelo di çend zimanên ku xwedî wêjeyeke giranbûya de mîna keke bi vî rengî heye. Ji ber hindê, em derengmayî ne, ji ber derengmayîna xwe dûrî bingehe wêjeya xwe bûne û avjeniya me ya di nava pêlên ziman de qels bûye. Zimanê me zêr e, zêr jengarî nabe. Bi hewldanên Kurd piştî demeke din ev zêr dê dîsa bibirîqe.

Rukiye Ozmen: *Ji bo romaneke baş û serketî bê ku em bêjin dîrokî, psîkolojîk yan jî bi cûreyekî din, postmodern û hwd, çend pîvanên ferz hûn dikarin bi nav bikin?*

Adil Zozanî: Ez di wê baweriyê de me ku wêjeya kurdî qonaxa vê pîrsê borandiye. Gelek romanûsên Kurd ên xwedî qalib hene. Xîmek ji bo xwe danandiye. Dem, têgeh, ziman, tevn û terz ji bo gelek romanûsên me bûne qalib êdî. Di vî warî de serkeftinek çêbûye. Lê pîrsgirêkeke me heye. Romana me li ser kîjan bingehe ava dibe? Zelal nîn e. Romanûsên me piraniya wan terzê jiyanê bajarvaniyeke biyanî Kurdistanê li romanê tînin. Lezgîniyeke ji bo hevşibîna romana pêşketî ya cîhanê heye. Dema fîkara hevşibîna romana pêşketî ya cîhanê derdikeve pêş, stûn û qanonên esasî yên wêjeya kurdî tînin jibîr kirin.

Romanûsiya kurdî ji ber ku li dîasporayê dest pê kir, xwedî dezavantajekê ye. Romana li dîasporayê hatiye nivîsîn, ji bilî ku bi kurdî hatiye nivîsîn avjeniyekê di nava jiyana kurdî de nake. Ne ku romanûsên Kurd ên li dîasporayê bidim ber pêla dabaseyê. Bêşik ev tercîha wan jî nebû. Rastiya me ev e. Kolanên Swedê û yên Amedê heman têgehan li ser tevnê romanê nadin rûniştandin.

Rukiye Ozmen: *Roman û çîroka kurdî herdû jî dereng ketine, sedemên dernegmayîne û heman pîrs ji aiwreke bervaja û belkî hevdu temamkir, roman çawa bi pêş dikeve?*

Adil Zozanî: Derengmayîn ne bi destê me ye. Di serdema 21'an de hê jî di warê netewebûnê de em balix nebûne. Nû, ber bi zîpikên biharê ve diçin. Av di giyanê neteweya me digere. Xwe nas dikîn. Vebêjiya giyanê me yê nû teşe digire, dê di nava şevûrojekê de pêk neyê. Heta ez dibêjim, em pir lezgîn gelek tiştan bi hev re didin ber xwe. Ev lezgîniya me çu fayde nade me... Jixwe em derengî mane. Telafîbûna vê derengmayîne bi destsivikiya wêjeyê ne pêkan e. Wêje ji hêmayên destgiran pêk tê.

Rukiye Ozmen: *Dema ku berhemek tê weşandin carna nîqaşa ew berhema çîrok e an jî roman e, tê kirin cudahiya romanê ji çîrokê çi ye?*

Adil Zozanî: Erê gelo, em çima dikevin nava dabaşeya ji hev cudakirina roman û çîrokê? Pirsê ku bersiva wê bê dayîn ev e. Ji salên 70'yê şûnde li Kurdistanê dabaşeya 'Kurdistan îlhak e' yan jî 'mêtîngerî ye' da destpêkirin. Sedemê vê dabaşeyê teza Lenîn a 'qewmên şivan' û 'qewmên cotkar' bû. Li gorî Lenîn qewmên şivan nikarin erkdariya xwe bikin û divê bêne îlhakkirin. Qewmên cotkar dikarin erkdariya xwe bikin û ji ber hindê jî dibe ku serbixwe bin. Heta îro jî şopên vê dabaşeyê hê jî di nava me de mane.

Romanûs û çîroknûsê kurd divê biryarekê bide. Ji bo ku bikaribe biryarê bide jî divê sosyolojiya civaka xwe bizane. Ji bo nimûne bêjim, tevne sosyolojiya civakên rojhilatê li ser xîmê çîrokbêjiyê hatiye danîn, tevne sosyolojiya civakên rojava jî li ser xîmê destanbêjiyê hatiye danîn. Ev du çandên ji hev cûda ne. Lê sosyolojiya civaka kurd li her du cureyan jî nayê. Çavkaniya me ya sereke dengbêjî ye. Formê dengbêjiyê ne tam çîrok e, ne jî destan e. Senteza herdu cûreyan e. Ji ber hindê jî formên me yên çîrokê û yên destankê tevlihev in.

Rukiye Ozmen: *Pêwendiya roman û destanê li ser çi astê ye?*

Adil Zozanî: Destan ji bo romana me singê dîwar e. Lê qetareya me kin e. Tozgevizka wêjevanê Kurd a li ber dîwarê wêjeyê qels e. Wêjenasê Kurd di nava demê de dê biryara xwe bide û li gorî biryardariya xwe dê qetareya xwe ya di nava tozgevizka wêjeyê kurdî de destnîşan bike. Lê beriya wê divê em tev biryarekê bidin. Gelo serekaniya romana me ji ku ye. Li gorî min ligel tespîta ji bo 'romana yekemîn a kurdî' me serêkaniya xwe şolî kiriye. Erebe Şemo kesayeteke nazdar e ji bo Zimanê Kurdî. Lê romana destpêkê ya Zimanê Kurdî wî nenivîsandîye. Dema Erebe Şemo wekî bavê romana kurdî tê navkirin, neheqî li kurdî tê kirin. Gelo dibe ku teksteke nediyar e ku destpêka wê ji avjeniya Zimanê Kurdî ye, wekî maketeksta Zimanê Kurdî bê qebûlkirin?

Dem, têgeh, ziman, tevî û terz... heke hêmayên esasî yên romanê bin; wê demê Erebe Şemo ji bo romana 'Şivanê Kurdan' vê pênaseyê heq nake. Li gorî tevahiya van hêmayan 'Mem û Zîna' Ehmedê Xanî vê pênaseyê heq dike.

Rukiye Ozmen: *Rewşa romana kurdî, heger mirov di qonaxan de binav bike çi ne, ev qonax?*

Adil Zozanî: Romana kurdî hêj jî di qonaxa bûyînê de ye. Divê gelek tenûrên din bêne hilkirin û nanpêjên xurt pêdivên. Mînak, di romana kurdî de hêj jî jin nebûye serbaza nivîsê. Çend romanûsên jin hene?.. Helbestvanên hene lê romanûsên jin nîn in... Romana kurdî ya di bindestiya zilam de. Dibe ku bê gotin, li tevahiya cîhanê ev qad pirtir, bûye tozgevizka zilaman. Lê heta destê jinê nekeve nava vî karî, qonax nayên derbaskirin. Bi gîştî çend romanên kurdî hene. Hêj jî îndeksa wan jî nîn e. Di demên dawî de hejmar tên dayîn. Lê ev hejmar jî nehatine pesendkirin. Lewre dema qala romana kurdî tê kirin, romanûsiya bi alfabe ya latînî tê bîra herkesî. Li gorî min di romanûsa kurdî de hêj jî bingehe qonaxa bûyînê tê avêtin. Lê nivîskarên Kurd ên rikberiya romana nûjen bikin hene. Bes ev nayê wateya ku romana kurdî qonax derbas-kirine.

Rukiye Ozmen: Dema gotin li ser romana kurdî ye, hinek behsa zaroktiyê dikin, hin dibêjin hêj bi çar lepikan diçe, hinên din tenatena dibêjin, hinek jî êdî zarok hesab nabe, zaroktî di temen û di aliyê biyolojîk de tê zanîn kêma zêde belê dema rewşa romanê bi îfade û tespîten li jor tê diyarkirin mebest çi ye, hûn çi dibêjin, çawa dibînin, romana me di rewşa kîjan kategoriyê ji van kategoriyan de ye û kîjan li rastiye nêzik e?

Adil Zozanî: Wa ye ez jî dibêjim romana kurdî di qonaxa bûyînê de ye. Dema vê gotinê dibêjim, ne ku romana kurdî kêmast dikim. Berovajî hindê, nêrîna min ew e ku romana kurdî di asta xwe ya heyî de Zimanê Kurdî ji sikratê derxistiye û gav bi gav ber bi deriyê mezin ê wêjeyê ve dibe.

Bitenê mînakê bidim. Zimanê Kurdî yek ji zimanên ku bi paşek û pêşekan tê avakirin e. Wêjevanekî Kurd ê li ser peyva ‘hil’ avjeniyê bike; dikare çend peyvên nû ava bike? Hil... hîlbûn... hîlgirtin... hîldan... hîlnebûn... hîlatin... serhildan... pêdahehin, peyvek bitenê çiqas avjeniyê bi mirov dide kirin. Zimanê Kurdî ev e. Ji bo wêjeyê gencîneyeke wisa dewlemend e. Ev rast e. Lê ev rastî rê nade me ku tiştên ku me nenivîsandiye wekî ku nivîsandî qebûl bikin. Li gorî min meylkariyeke bi vî rengî hebe; divê bê terikandin.

Rukiye Ozmen: Di nav romanên cîhanê de tu hez ji kîjan roman-nivîsan zêdetir dikî, ji bo kesekî romanxwîn û evîndarê roman çend nav dê ne hesan be, belê herî zêde û di nav yên kurdî de?

Adil Zozanî: Yaşar Kemal, Tolstoy, Dostoyevskî, Balzac... Li gorî min hemû romanûsên Kurd divê serpişkên romanhezên Kurd bin. Xwende-

vanê romana kurdî ji ber ku herî kêr bi du zimanan wêjeyê dişopîne, heke romanûsê Kurd bixwîne û vegeê li romanûs bike, dê bandoreke mezin li ser pêk bîne.

Rukiye Ozmen: Werger çendî ziman, stîl û formûlasyonanê bi pêş dixê?

Adil Zozanî: Wergêrên ji zimanên biyanî bo Zimanê Kurdî hatine kirin nîşandaye ku Zimanê Kurdî kêr zimanên din nîn e. Lê wergêr kêr in. Ligel wergêra ji zimanên biyanî bo kurdî, ji kurdî bo zimanên biyanî jî divê wergêr çêbibin. Ligel vê yekê em ê ji ziman, stîl û tevne hev sêdewer bin. Ji bo her zimanekî wergêr bo pêşxistina ziman, stîl û tevne romanê sêdewer e.

Rukiye Ozmen: *Romanên hatine wergerandin çendî serketî ne, Zimanê Kurdî çendî di bin barê wergerê de radibe?*

Adil Zozanî: Ji bo min bersiva vê pirsê hinekê zor e. Lewre, yên ku bersiva vê pirsê dide di heman demê de divê li ser teknîka wergêrê xwedî fikrekê be. Ez bitenê bi çavê xwendevanekî dikarim nêrîna xwe bêjim. Ji bo min teksta ji zimanên biyanî wergêrandî kurdî bûye, beriya her tiştî, herî kêr herikbariya zimanê tekstê yê resen bide mirov. Bila yên li ser teknîka wergêrê pîspor bersiva vê pirsê bidin. An jî bila gotina wan esas bê girtin.

Rukiye Ozmen: *Wergêr çiqasî cewhera berhema ku tê wergerandin diparezê?*

Adil Zozanî: Berhemeke wêjeyî ne mimkûn e ku ji sedî sed heman tam û çêşê bi zimanekî din bide mirov. Lewre avjeniya nivîskar a di nava peyvên de; têkildarî xusletên ziman in. Ê ku wergerê dike, çiqas serkeftî be jî ev rewş naguhere. Tu romana îngilîzî, fransî, rûsî dema werdigerînê kurdî, bi her awayî tu wê berhemê dikî aydê kurdî. Loma di wêjeyê de hêmaya esasî ziman e û heta ku mirov serdestî ziman nebe, nikare berhemeke wêjeyî ya xurt biafirîne.

Madem gotin li pey hat, li vir li ser mijareke hêjayî dabaşeyê nêrîna xwe bêjim. Wêjekariya du-zimanî mimkûn e gelo? Li gorî nêrînekê mimkûn e. Li gorî min ne mimkûn e. Nivîskarek di heman demê de nikare di nava têgehên du zimanên cuda de avjeniyê bike. Nivîskarek dikare bi du zimanan tekstan binivîse. Wisa jî be hevsenga di nava her du zimanan de dê çawa li astekê bigire, hêjayî nîrxandinê. Em Kurd ji bo ku kul û derdên xwe bêjin, xwe didîn ber çeperê vê dabaşeyê. Lê ne mimkûn e. Zimanê wêjeyê yek e. Ew jî ew ziman e yê wêjevan tede serdest e.

Rukiye Ozmen: *Hûn bi xwe hez ji kîjan celebê romanê dîkin, nivîskarekî romanê bêşik hez kirina wî dê fireh be, dê bi kategori û çend kategoriyan ne sînorkirî be, belê cardin jî meyla mirov zêdetir bi ser hinan e, hûn xwe di kîjan kategoriye de dibînin, nêzîkî kîjanê ji wan in?*

Adil Zozanî: Em di nava ceribandineke mezin de ne. Ji bilî romana post-modern hemû cureyên din bala min dikişînin. Ez li pey sentezekê me. Ahengsaziya diyalog û vebêjiyê kêfa min xweş dike. Dema xwe di qalibekî de sînorkirî hîsnakim, dibînim ku melevaniya min a ji bo wêjeyê xurtir e. Ez di wê baweriyê de me ku ji romana kurdî ya ku çiyayên Kurdistanê hembêz dîkin; dê cureyekî xweser derbikeve.

Rukiye Ozmen: *Roman rolekî çawa ji bo civakê dileyîze?*

Adil Zozanî: Roman li ser kesê ku romanê naxwîne jî xwedî bandor e. Ji ber ku roman vebijêrka jiyanê xweser ên ku bandora wan li ser jiyana kolektîf e, bandorê li kesê ku di heyata xwe de qet roman nexwendîye jî dike. Lewre wî vedibêje. Ew kesê hez kirineke wî jî bo wêjeyê neyî jî yek ji aktorên bingeîn ên wêjeyê ye.

Rukiye Ozmen: *Hayê we çendî ji romanên perçe û zaravayên din yên kurdan heye?*

Adil Zozanî: Nizanim, çend nivîskarên kurd dê tiliya xwe danin ser birîna me hemû nivîskaran. Mînak min ji bilî çend berhemên wêjeyî yên zaravayên din ên kurdî hatine wergerandin, derfetê xwendinê nedîtîye. Bitenê pirsgirêk zarave bitenê jî nîn in. Di heman demê de pirsgirêka me ya alfabeyê jî heye. Heta pirsgirêka me ya herî bingeîn e. Mînak tekstên soranî bi alfabeya latînî bêne weşandin, dê wêjenasên ku biyanî alfabeya erebî ne jî jê sûdê bigirin û hewlbidin ku bixwînin. Lê mixabin ev pirsgirêk ketiye ber qada siyasî ya kurdistanî û zûbizû çareser jî nabe. Heta çareser dibe wêjenasên Kurd ên bi zaraveyên xwe dinivîsînin jî bi ber hev ve bîne.

Rukiye Ozmen: *Demek dirêj di ser berhemafirîniya romanê re derbasbûye, roman jî form û hûnandina xwe bi demê re diguhere gelo?*

Adil Zozanî: Ji bilî hewldanên dejenerekirina romanê, form û tevînên romanê yên klasîk hê jî serdest in. Jiyanê dikevin ber romanê jî kîjan serdemê bin, bandorê li ser terz û vegotina romanê jî dike. Mînak di romana îro de pirtir teknoloji heye. Romana îro bivênevê dê li gorî rewşa îro tasfîrekê pêk bîne. Îro jî yek rabe, şert û mercên sedsala 19'an a Rûs-

yayê bîne berçavên xwe û binivîse, bivênevê dê li gorî wê serdemê bifikire. Rûsyaya wê demê bîne berçavên xwe.

Rukiye Ozmen: *Xelatata Nobel û dîroka destpêkirina wê gelekî ji dîroka romana kurdî kevintir e. ji romannivîsên gelên herêma Rojhilata Navîn Necîb Mehîfûzê misrî, Orhan Pamûkê tirk xelat girtin, rojeke xelatgirtin gelo bibe dora me jî mimkûn e, pêşbî-niyên we, fantaziyên we?*

Adil Zozanî: Wêje ji bo xelatgirtinê neyê kirin. Mixabin, vê dabaşeyê zend û bendên hin nivîskarên Kurd dan badan. Hûr û kûr lêbinêrin, nivîskarên me yên ku îro li ser vê ihtîmalê rikberiyê dikin hene.

Nabe ku em Kurd xelatgiriye ji bo wêjeya xwe bikin hedef. Necîp Mehîfûzê misrî û Orhan Pamukê tirk xelat girt; çiyê me ji yê wan kêmtir e? Ez vê dabaşeyê wekî xemilandina kirasê nîjadperestiyê teşe digire, dibînim. Pêdiviya Zimanê Kurdî bi vê dabaşeyê nîn e. Li dewsa em vê dabaşeyê bimeşînin, em xwe bidin ber afirênêriya wêjeyê baştir e. Belê yekî ereb û yekî tirk jî xelata Nobelê girtibe, lê heta niha çu romanên ne hatine nivîsîn xwediyê xwe nekirine wezîrê qadê...

Ji ber hindê jî wêjevanê me divê li dewsa lezgîn tevbigere, xwe bi nas e. Wisa bifikirin ku em hêj jî serdema balixbûnê dijîn, lê hestên me yên serdema pîratiyê ne. Di xeyalên neji de avjeniyê dikin. Hê jî zewaca bi peyvê re çênebûye, em pîr bûne, neviyên me çêbûne û heta hinan ji me derazîna deriyê mezin ê wêjeyê jî bezandiye. Xeyalên me ewqas dewlemend in ku em li ser romana nehatiye nivîsîn dabaşeya Xelata Nobelê jî dikin...

Rukiye Ozmen: *Pirsên me ev in. Zor sipas!*

Adil Zozanî: Spas xweş!

Hevpeyvîn bi Ömer DISOZ re

Hevpeyvîn: Rukiye Ozmen:

Rukiye Ozmen: *Di dîroka romanê de qonax hene ku bi „îzmên“ corecor têne binavkirin û ev qonax ji destpêka xwe ber bi îro de bi hezaran roman di himbêza xwe de digre, ji vî cîhê derengmayî awantaj û dezawantajên me, şens û bêşensiya me, îro mirov rehet dikare xwe bighîne wan?*

Ömer Dilsoz: Bersiva vê pirsê her di nav pirsê de bi xwe ye. Her qonax, bi serê xwe bi tecrûbe û serhatiya salan, xwedan serborî û ceribandînen kûr û dirêj e. Her qonax, di heman demê de, bi dawîhatin an jî bi sentez hin gavan jî, wekî antîteza rewta pêşiya xwe hatiye pê. Ango, her qonax di agirê xwe de keliyaye, dûre di xweliya xwe de xewiniye û piştî jî gihîştîye û xwe daye der.

Helbet, em, wek tecrûbe û ezmûn, di vê gerdûna nivîsandîne de, di hemû qonax û pêpelîngên vê pramît û derenca wêjeyê, yanî, di vê meydana hiş û jêrhişê kulturî-çandî ya nivîskî de, gelek û gelek dereng mane.

Meydana edebiyata me xirt û xalî maye ji nivîsê, di kîsê me çî berhev bûye, hema bêje ew du sê dilopên devkî ên zargotinî ne. Helbet, di ber vê bagera guherîn, pêlavêtin û rewtvedana jiyana medeniyet û şaristanîyê de, ji dûr ve dûr ve be jî, “edebiyata me ya devkî” bi tîna wan “izman” hesiyaye û di pêvajoyê û heyamên kemilîna binhişîna neteweyî û giştî de, ez dibêjim qey binaxe dagirtiye, lê pirs ew e ku çu rêzedîwar li ser vê binaxê nehatine danîn/nijinandin/nimandin.

Ez, gel hindê me ku di van meseleyên weha de, li şûna ku mirov tûkê birînê hilxepêre û wê bixurîne, çêtir e, ku mirov guhê xwe bide gotina pêşiyana a ku dibêje, “Tiştê çu nede dû”. Ango, heke îro, me, ji ber bêşansiya tarîxa xwe, nikaribe ji xwe edebiyateke nivîskî ya xwedan kevneşopîya bi sedan salan bi dest bixin (ku tunebe) gelo, ma qey em rabin

benzînê bi serê xwe dakin û ji qehra xwe bişewitînin. Ma hema em rabin, vê valahiya ku encama bi sedan salan e, û di vir de, çu guneha me nifşê nû nîne, ma qey em, hemû hêviyên xwe binax bikin û ji ber ku tune(bû)ye, qey xwe jî tune bikin?!

Li gorî min, pirsê me ya sereke ev e. Helbet, em ê zû bi zû nikaribin bi xelkê re qayîşa edebiyatê bikêşin û rabin “berhemên” xwe, bi yên wan re, li gorî giraniya wan, biwezinin. Ev, ji binî de, xwetunekirin e, xwepûç-kirin e, û a herî kambax jî, xwe avêtina nav lepên bêhêviyeke bêdawîn e.

Ji bo wê ye, ez dibêjim; hûner, edebiyat, an jî hêza peyvê, şiyana gotinê ji wê derê dest pê dike, gava tu ji (tu)nehiyê bibînî heyiye...

Pirs, ew e ku çu zeman, ji bo çu tiştî dereng nîn e, hindî ku di wê cuhê de, av-jîyan biherike...

Belkî, em ê nikaribin, dîrokê biqulipînin û hemû qonaxan bi hemda xwe bijîn û tê de tovê edebiyata xwe li zeviya hişê milletê xwe bireşînin, erê, jixwe ev ne mimkûn e jî, lê em dikarin tişteki bikin... sibe, bo sibê û îro, îroya xwe, li cihê ku edebiyata cîhanê gihîştîye, ji xwe re çalekê, derzekê, kulekekê vekin û tê re biçin ber bi asoyên ronak ve...

Ango, di nav van çend dezavantajên mezin de, a rastîn em hinekî jî bi avantaj in, ku ew jî, îro, em li ser behr û deryaya nekeşkirî ya nivîsê ne... xelkê, zeviya xwe çandiye û berê xwe jî hilaniye lê zeviya me beyar e, em dikarin, tovekî wisa lê bireşînin ku li ser (tu)nebûnê, bibin xwedan hebûneke bêhempa...

Ango, mesela me bikaranîna potansiyelê ye, ji bo vê jî divê berî her tiştî em bi wê bihesin...

Rukiye Ozmen: *Ji bo romaneke baş û serketî bê ku em bêjin dîro-kî, psîkolojîk yan jî bi coreyekî din, postmodern, çend pîvanên ferz binav bikin?*

Ömer Dilsoz: Ez dibêjim qey ev mijar, ji min pirtir a mamosteyên edebiyatê ye. Ez, çu pîvanan destnîşan nakim, ji ber ku, pîvana ku ez ê li ber dilê xwe bikin pîvana “serkeftinê” tenê dê encama qenaeta min a di vî warî de be. An jî, divê ez vegerim nav teknîka vî karî, ji şareza û pîspore-n edebiyatê yê cîhanê, çend gotin û ‘pîvanan’ neqil bikim, bi ya min, ez şêwe nêzîktêdayîna ku nivîskar, gelek caran bi palpiştan ve dadikeve meydana gotarê, meydana axaftin û analîzê, nêzîktêdayîneke gelekî bixwebawer, jixwepiştast û xweser nîn e. Ev şêwe nêzîktêdayîn, pirtir karê akademisyenan e, pîspore-n edebiyatê, jixwe pîvanên hema bêje “giştî” destnîşan kirine.

Lê, ku pirs weha be, “gelo kêfa min, qinyata min bi romaneke çawa tê?” wê demê, ez dikarim, ji we re, behsa hin tiştên ku ji romanekê, tekstekê, çîrokekê, filmekê, şanoyekê, fotografekê, dûmenekê zindî, kêfê dide min û di hiş û dilê min de, velerzînên heyecanê tîne pê, darêjim.

Heke di vê xelekê de, em romanê bidin ber tava nimûneyê; ez ê xwe li “kelecanê” bigirim. Ango, mesele, kelecanepekêtin e, ma heke, berhem, wekî porteçaleke av jê doû, sar û bêtehm be, heke zimanê wê wekî guveguva kermêşan li hişê min bilikume, heke karakterên wê, li ber çavên min zindî nebin û ez lê negirim li kolanan, heke ez nebin xemxurê dûv-kêşa wê û tê de wekî surfkerekî ber bi şepol û pêlên wê wer nebin; heke, tişt û tiştine ji min, ji bo min, nasê min, tê de tune bin û dinyayek tê de – çi binasim çi nenasim- bi ber çavên min zindî û bi giyan nekeve, wê demê, ew roman, ne dibe mêvanê ramanên min ne jî xweşî û tehm, kelecane û aqilekî, hêviyekê, ji tecrûbeyan dersekê dide min...

Wê demê, ez ê wê nexwînim... Ew, bi kîjan ziman û bi kîjan “etîketê” be jî, qet û qet ferq nake... Ji bo wê jî, berhemêke edebî, belkî di serî de, ji bo “navekî naskirî” têtê kirîn, lê piştê ji bo “naverokeke petî” têtê xwendin, naskirin û an herî girîng jî hezkirin.

Jixwe heke te hezkirin ji navê rakir, çu tişt tê de namîne... Ez ji “divê”yan hez nakim, lê heke îla jî pêwîst be divêyekê bêjim; bo romanê, berî her tiştî divê Roman bi her awayê xwe bi HEZkirinê bête hevîrkirin. Bi zimanê xwe, bi karakterên xwe, bi narînî û spehîtiya xwe, bi nazikî û hûgiliyên xwe û bi HEZkiriya xwe...

Rukiye Ozmen: *Romana kurdî jî û çîroka kurdî herdu jî dereng ketine, sedemên dernegmayîne û heman pirs ji awurike berrava û belkî hevdu temam kir, roman çawa bi pêş dikeve?*

Ömer Dilsoz: Roman çawa paşve ma, ez dikarim bi vê pirsê bersiva we bidim. An jî, “romaneke çima paşve dimîne?” Ez, dibêjim qey, gava em behsa romana milletekî dikin û wê radixe ser berika analîzê û didin ber kêş û neşteran, em, zikê tarîxa wî zimanî, wî milletî jî diqelêşin û pirsgrîrêkê di perspektîfê gelekî berfirehtir û bi topyekûnî werdigirin nav lepên xwe... nexwe, em ê tê de bimînin û dê li şûna nîrxandin û têgi-hîştina bi rastiya meseleyê, serûguhên hev bixwin û ji hev re bêjin, difna te xwar e.

Roman, bi ronahîdîtina xwe pêş dikeve. Bifikire, tu di binê çaleke kûr de yî û hemû derî li ser te girtine, xwarina te hinde bi qasî ku tu pê nemirî, ma tu yê çawa bi pêş bikevî, helbet pêş nakevî... Ji bo wê, divê Zimanê Kurdî, ji çalên man-nemanê derkeve, di qatên perwerdehiyê ên bilind de

bikemile û bi bejn û bal bibe, bi dû re, romana me jî, ramana me jî, kultura me jî, dê “riya xwe” bibîne. Gelo ev rê, dê çend pahn û fireh be, ez bawer nakim bibe TEMa kurdî lê dîsa jî dê her cure barhilgir, mirovhilgir û ramanhilgir bikarin tê re bimeşin...

Ango, romanek ji bo ku bi pêş bikeve, divê bi ser bikeve û bibe xwedan rû û siyanet, hela ji aliyê çend xwendevanan ve bête xwendin, nirxandin, rexnekirin (em kurd rexneyê carina wek rîxne têdigihin mixabin) piştîrê dê jixwe riya xwe bibîne, em hewl bidin rawestînin jî ew guhê xwe nade tu (çu) kesî.

Ji bo wê jî, ez wisa bawer dikim, bi reşbînî û xwexuriyê, çu tişt bi pêş nakeve. Tiştêk li ber me heye, zimanek, em di asoyên wî zimanî de li xewnên ronahî digerîn. Ew, amûrê me yê derbirînê ye, em pê, tevn û tejbê ramanên xwe dijenin û hêvî û xweziyên xwe dihûnin. Dinyaya me di wê derê de ye. Îro, divê em nekevin xema hindê ku ev ziman, va ye ber mirinê ye û ma ez çima xwe pê biwestînim û ew piçeka mayî bî, hema di yek carî de bikujin. Naxêr, a rast, berevajiyê wê ye, ne li ber mirinê, li ber zayînê ye û tarîx, ji bo me, ji îro ve dest pê dike... tarîx, belkî di qeydên me de, tenê deng e /dengbêjî ye, lê tarîx li ba me ZINDÎ ye.

Her weha roman jî zindî ye. Belkî, wekî xeyalekê bê, lê ev ne xeyal e, pêşbînî ye belkî, ez berevajî her kesî dibêjim; Kurdî û edebiyata wê, li ber teqîneke mezin e...

Rukiye Ozmen: *Dema ku berhemek tê weşandin carna nîqaşa ew berhema çîrok e an jî roman e, tê kirin, cudahiya romanê ji çîrokê çiyê?*

Ömer Dilsoz: Li gorî min, ev nîqaşên wisa gelekî beyhûde û pûç in. Roman, aşkere ye, çîrok jî... Lê dîsa, ji bo ku merema min bête fêmkirin, tasvîreke gelekî berbelav ez dixwazin parve bikim:

Bifikire, tu di rê de diçî, te mirovek dît; di çîrokê de, tu wî kesî dibînî, diçî balê, silavekê didî, pê re dixwî, vedixwî, tiştê bo te pêwîst jê distînî û di riya xwe de dewam dibî... Lê di romanê de, tu wî kesî, dibînî, diçî balê, pê re rûdinî, diaxivî, her liv û tevgera wî dinimînî, li wir dimînî, dikevî hişê wî, dibî tirs û fantaziyên û ji balê naçî... aha, ferqa roman û çîrokê ev e.

Rukiye Ozmen: *Pêwendiya roman û destanê li ser çi astê ye?*

Ömer Dilsoz: Li gorî çejna wê ye. Roman, heke romaneke dîrokî be, jixwe dê ava xwe ji destanan vexwe, lê heke romaneke modêrn be, dibe ku qet çu têkiliyê bi destanan re çêneke.

Rukiye Ozmen: *Rewşa romana kurdî, heger mirov di qonaxan de binav bike, çi ne ev qonax?*

Ömer Dilsoz: Bi rastî ez “miriyê” vê pirsê me. Çima? Ji ber ku em ne mecbûr in, îla rewşekê ji romana xwe re peyda bikin. Em ne mecbûr in, nîrekê deynin ser stûyê romana xwe û li ber “(ga) ya xelkê” dabênin. Nexêr, bihêlin, romanê neêşînin, wek di meseleya zimên de, em wê nekin xwêya her girarê.

Romana me, bila di tu qonaxan de nebe û bila di testa tu “izman” de nehatibe hevîrkinin, gelo, ma ku wisa ye, qey em rabin xwe bikujin!? Ez ténagihim, çima em zimanê xwe, ramanên xwe, romanên xwe, hestên xwe, jiyana xwe, “xwe” û dilê xwe, HEZkirina xwe, hinde/evçend tepe-ser dikin, ev çend diêşînin, ev çend diguvêşin û her wekî em li bendê ne ku xelkek bê, bo me çend gotinan li ser “me” bêje, da ku em bi ya xwe bawer bin, da ku em ji xwe Hez bikin, da ku em piştrast bibin ku “Em” bi ya xwe ve, HENE...

Gelo, ev çi derûniyeke hinde li ser “Ne” yê sing kutane û hinde xwe bi “qenaetên yên derveyî xwe ve” radigire.

Ma ku nava me vala, xelk hemû bibêjin tijî ye dê bibe çi, an jî berevajiya wê...

Li gorî min, romana ku em wek “romana kurdî” dikarin behsa wê bikin, ji vir de, ji vê kaosa civakî mimkûn e, wekî volkanekê bi ser cîhana edebiyatê de biteqe. Bihêlin, bila biteqe...

Ango roman, şoreşeke zihnî ye, ji bo wê jî, ne ji qenaetên derve ve, ji qenaeta xwe ve, li bûyerê, helkeftê, demê, jiyanê, hezkirinê, mirovî, jinê, şerî, mêrî, zarokan, mafan, îdeolojiyê, siyasetê, ramanê, cîhanê, xewnê, eşqê, fantaziyê, hevşabûnê DINÊRE...

Rukiye Ozmen: *Dema gotin li ser romana kurdî ye, hinek behsa zaroktiyê dikin, hin dibêjin hê bi çar lepikan diçe, hinên din tena-tena dibêjin, hinek jî êdî zarok hesab nabe, zarokti di temen û di aliyê biyolojîk de tê zanîn kêma zêde belê dema rewşa romanê bi îfade û tesbîtên li jor tê diyarkirin mebest çi ye, hûn çi dibêjin, çawa dibînin, romana me di rewşa kîjan kategoriyê ji van kategorîyan de ye û kîjan li rastiyê nêzîk e?*

Ömer Dilsoz: Helbet, ev encamên hin qinyatan in. Ma nexwe, mirov çi, çawa dibîne, wê dide der. Di warê hejmar û reqemî de, ev tespîtên li jorî mimkûn e bîr pejirandin. Hema bêje ez jî di kategoriyên we diyar kirî de,

dikarim texterewana romanên “çavbelek” rakim û lê danim. Lê pirs ne ev e, texmîna min.

Vêca qey, em ê heta çend salan li benda mezinbûna wê bisekinin!... An jî, gava ew romanê bi çarlepki didin meşandin û hêdî hêdî diranên şîrî lê tînin, heta carina hinek di ber re dibêjin, “aaa wettê” jî, ka serencama kîjan psikolojîyê derdibirin? Li gorî min pirs ev e. Dibe ku nexweşiyek be, hin xwe li “tunehiyê” radigirin, hin xwe li “çarlepki” radigirin û hin jî di arafa xwe û xelkê de, ji qehra xwe dikujin.

Ez, di vî warê de, gel hindê me dest ji êşandina vê romanê berdin. Çi be û li ku be, bila li wê derê be, bihêlin, bela xwe jê ve kin, nexwe hûn ê hem xwe û hem jî wê tune bikin.

Rukiye Ozmen: *Di nav romanên cîhanê de tu hez ji kîjan roman-nivîsan zêdetir dikî, ji bo kesekî romanxwîn û evîndarê romanan çend nav wê ne hesan be, belê herî zêde û di nav yên kurdî de?*

Ömer Dilsoz: Ji cîhanê gelek kes heyecanê didin min. Bi kurdî jî, hema bêje, çi romana Kurmancî bi destê min dikeve dixwînim. Hinek bêtehm in jî, hinek wek ziman, wek teknîk dibe ku zêde kavik bin jî. Yê me bi xwe jî dibe ku wisa bin. Serkeftin û serneketina wan, bi ser zimanê pê tê nivîsandin nîn e helbet, bi ser şarezayîya wî karî ye. Wekî nav, dostên min ên hêja hene ku gava ez wan dixwînim, tehmê didin min, Şener Ozmen, Mîr Qasimlo, Dilawer Zeraq, Jan Dost, Helim Yusif pirtir di çîrokên wî de min heyecan dît.

Rukiye Ozmen: *Werger çendî ziman, stîl û formûlasyonêan bi pêş dixê?*

Ömer Dilsoz: Helbet, lê ev mijareke cuda ye. Bi wergêrekî re baxivin dê çêtir be. Ez di wê hizrê de me, divêt her pirs li her kesî neyêne kirin. Nivîskar, dibe ku di karê xwe de baş be, lê ew nayê wê wateyê ku derbarê her pirsê de dê bersiveke wî hebe.

Rukiye Ozmen: *Hûn bi xwe hez ji kîjan celebê romanan dikin, nivîskarekî romanên bêşik hezkirina wî wê fireh be, wê bi kategorî û çend kategoriyan ne şînkirî be, belê cardî jî meyla mirov zêdetir bi ser hinan e, hûn xwe di kîjan kategoriye de dibînin, nêzîkî kîjanê ne ji wan ?*

Ömer Dilsoz: Bawer ke ew jî li ser gavê ye. Li ser psîkolojiya min a wê demê ye, wê heyamê ye. Car tê, kêfa min bi romanên fantastîk tê, carina jî ez xwe li romanên dîrokî digirim. Te dît, hişê mirovî, ruhê mirovî wê pêlê, tîyê çi be, ew mirovî bi xwe re dibe. Lê wekî jênegerekê, romana ku

bi evîn û HEZkirinekê pehtî be, her tim, tercîha min a pêşîn e. Ji dema tê de hez dikim. Romanên dema me, serdema îro, ên herika hişîn hestên min xweş dikin.

Rukiye Ozmen: *Roman rolekî çawe ji bo civakê dileyîze?*

Ömer Dilsoz: Roman, danezanên siyasî nînin, belkî bi serve serve xwe gelekî têkilî civakê nakin, çimkî, civak bi xwe tê de ye. Roman, hespê troya yê binhişê mirovî ye, keleyê ji hûndir ve vedigire. Ji bo wê jî, roman, civakê na na, civakekê ava dike... (helbet heke ew roman raman be)

Rukiye Ozmen: *Hayê we çendî ji romanên perçe û zaravayên din yên kurdan heye?*

Ömer Dilsoz: Dibêjin, di Soranî de hin hewldanên nivîsandinê hene, lê ji ber ku ez elfabeya wan nizanîm, ez nikarim tiştêkî bibêjim.

Rukiye Ozmen: *Demek dirêj di ser berhemafirîniya romanê re derbasbûye, roman jî form û hûnandina xwe bide me re diguhere gelo?*

Ömer Dilsoz: Helbet. Roman jî zindî ye, diguhere, belkî li formên nûtir digere, hûnandineke cudatir, lê, sînor hene. Çarçove û dîsîplîna ku romanê dike roman...

Rukiye Ozmen: *Xelatata Nobel û dîroka destpêkirina wê gelekî ji dîroka romana kurdî kevintir e. ji romannivîsên gelên herêma Rojhilata Navîn Necîb Mehîzûzê Misrî, Orhan Pamûkê Tirk xelat girtin, rojeke xelatgirtin bibe dora me jî mmikun e, pêşbîniyên we, fantazyên we?*

Ömer Dilsoz: Tiştê xwe ew e ku mirov dikare bi xeyalên xwe dinyayê biguherîne. Tiştê nexweş jî ew e ku mirov bi guhertina xwe bawer neke. Helbet, xelatkirin, bo zimanekî cihê serfiraziyê ye, lê ez dibêjim derdê me yê nivîsê, ne bo xelatên nobelê ne, derdê derbirîn û xwenasînê ye. Ez, dibêjim, Nobel bo me kurdan, belkî xeyalek gelekî zû be. Lê mimkûn e.

Rukiye Ozmen: *Pirsên me ev in. Gelek spas.*

Ömer Dilsoz: Ez jî gelek spas dikim.

Hevpeyvîn bi **Diyar BOHTÎ** re

Hevpeyvîn: **Rukiye Ozmen**

Rukiye Ozmen: Di dîroka romanê de qonax hene ku bi „îzmên“ corecor têne binavkirin û ev qonax ji destpêka xwe ber bi îro de bi hezaran roman di himbêza xwe de digre, ji vî cihê derengmayî awantaj û dezawantajên me, şens û bêşensiya me, îro mirov rehet dikare xwe bigihîne wan?

Diyar Bohtî: Di bawerîya min de bi qasî dîroka civakê dîroka romanê jî kevin e. Civak ti caran bê roman nemane. Çima? Lewre roman jiyana bi xwe ye, rastiya jiyana ye. Di roja me ya îro de hinek tiştên di nava du bergan de hatûn nivîsîn, ji wan re tê gotin roman. Ji bo îro dibe ku rast be. Lê ji bo her demê ne rast e. Bi sedê salan heta bi hezarê salan roman, geh bi navê efsaneyan, geh bi navê destanan, geh bi navê ceng û şeran, geh bi navê çîrokan, geh bi devkî, geh bi nivîskî civak, jiyana civakê û serhatî û serboriyên civakê hatine ziman. Heta carna roman bûne stiran jî. Derbarê xwegihandina rastiya romanê de, bi ku qasî şansê civakên Mezopotamya, -di serî de gelê Kurd- heyî şansê ti civakê ewqas nîne. Çima? Eger qonaxa neolotîk, li vê herêmê dest pê kiriye û li vê herêmê rûniştîye, eger civakê li vê herêmê dest bi jiyana rûniştî kiriye, eger li vê herêmê şaristanî li derdor belav bûye, wê demê ev herêm bûye dergûşa nîrxên miriovatîyê yên din jî. Erdê Mezopotamya, ji bûyerên dîrokî, şer û ceng, xweşî û nexweşî, eşq û dildarî, serhatî-serborî, pêşketina civakê û bûyerên di nava civakê de diqewimin, tijî ye. Çawa ku stiranbêj dikare ji vê kaniyê para xwe bigire, dîroknas li vê herêmê li rastiyan bigere û bibîne, senarîst senaryoyên xwe ji vir bigire, romannivîs jî dikare vê herêmê bike çavkaniya romanên xwe. Eger îro romannivîsên Rojavayî çavkaniya romanên wan yên binavûdeng ev herêm e, ne bêsedem e.

Rukiye Ozmen: *Ji bo romaneke baş û serketî bê ku em bêjin dîrokî, psîkolojîk yan jî bi coreyekî din, postmodern, çend pîvanên ferz binav bikin.*

Diyar Bohtî: Ji bo romaneke serkeftî di serî de pêwîst e berhem ji felsefeya civakê ne dûr be, ji çanda civakê ne dûr be. Eger roman dîrokî ye, divê ji rastiya dîrokê ne dûr be û ew dîrok jî ne li gora zêhniyeta serdestan be. Lewre dîroka heta niha hatî nivîsîn dîroka serdestan e û bi navê serdestan hatiye nivîsîn. Eger roman çandî ye, divê çanda civakê neyê berûvajîkirin, ka rastî çi ye wisa werê ziman. Eger roman serhatiya kesekî ye, divê derdora serhatiyê ji her alî ve bê ronahîkirin. Eger roman berhemeke xeyalî ye, romannivîs dixwaze xeyalên xwe bi derdorên xwe re par ve bike, xeyalî jî be divê ne xeyalên ziwa bin. Romaneke serkeftî divê ne sirf ji bo nivîsandin û zemanderbaskirinê be, pêwîst e tiştekî bide xwendevanê xwe. Divê romaneke serkeftî bikare hem nivîskarê xwe hem xwendevanê xwe biguherîne.

Rukiye Ozmen: *Romana kurdî jî û çîroka kurdî herdû jî dereng ketine, sedemên dernegmayîne û heman pîrs ji awureke bervaja û belkî hevdû temamkir, roman çawa bi pêş dikeve?*

Diyar Bohtî: Ji bo romanê dibe ku mirov bêje dereng maye, lê ji bo çîrokê mirov nikare heman tiştî bêje. Lewre civaka Kurd weke xezîneya çîrokan e, bi sedan sal, bi hezaran sal şevên zivistanan tev bi çîrokan derbas bûne. Eger ne li gora pîvanên romana îro bin jî, di heman demê de ev çîrok roman in jî. Çîrokên Kurdî hem çîrok in, hem dîrok in, hem roman in. Roman xwe bi xwe pêş nakeve. Bi pêşketina civakê roman jî pêş dikeve. Civakek çiqas azad be, çiqas pêşketî be, çiqas bi dîroka xwe ve girêdayî be, çiqas ji bo paşerojê bi hêvî be û çiqas bi nirxên civakê ve girêdayî be, ewqas pêş dikeve. Eger civakek bi dîroka xwe, bi çanda xwe, bi baweriya xwe, bi hêviya paşrojê pêş dikeve, romana civakê jî bi heman nirxan pêş dikeve. Û xala herî girîng jî bi heskirina civak û jiyanê roman pêş dikeve.

Rukiye Ozmen: *Dema ku berhemek tê weşandin carna nîqaşa ew berhema çîrok e an jî roman e, tê kirin cudahiya romanê ji, çîrokê çi ye.?*

Diyar Bohtî: Di serî de ez dixwazim vê bêjim: Bêguman çîrok û roman ji hev cuda ne. Eger ji hev ne cuda bûna wê navê yekê ne çîrok, navê yekê ne roman bûya. Efsana, çîrok, dîrok, destan, serhatî, serborî, roman li gora naverokê têkiliya tevan jî bi hev ve heye, xalên tevan jî yên hevbeş hene. Lê ka çawa xalên hevbeş hene, wisa xalên ku wan ji hev

cuda dikin jî hene. Bi taybetî xalên çîrok û romanê ji hev cuda dikin zirav in. Xalên hevbeş ji xalên cuda pirtir in. Xala cudabûnê ya li ber çavan tê dîtîn ew e ku çîrok serhatiya kesekî an çend kesan e û sînorê wê ji yê roman tengtir e. Roman hem ji aliyê kesan ve piralî ye, hem ji aliyê naverokê ve, hem ji aliyê mijaran ve.

Rukiye Ozmen: *Pêwendiya roman û destanê li ser çi astê ye?*

Diyar Bohtî: Bêguman pêwendiya destan û romanê bi hev re heye. Çawa ku xalên wan yên ji hev nagirin hene, her wisa xalên wan yên hevbeş jî hene. Di her duyan de jî dîrok heye, leheng hene, zeman û mekan girîng in, di her duyan de jî çand heye, wêje heye, hûner heye. Mirov dikare wiha jî bêje; roman berfirehiya destanê ye. Destan dibe çavkaniya romanê, dibe bingehe wê, destan cewherê romanê ye, roman jî xemla destanê ye.

Rukiye Ozmen: *Rewşa romana kurdî, heger mirov di qonaxan de binav bike çi ne ev qonax? Dema gotin li ser romana kurdî ye, hinek behsa zaroktiyê dikin, hin dibêjin hê bi çar lepikan diçe, hinên din tenatena dibêjin, hinek jî êdî zarok hesab nabe, zarokti di temen û di aliyê biyolojîk de tê zanîn kêma zêde belê dema rewşa romanê bi îfade û tesbîten li jor tê diyarkirin mebest çi ye, hûn çi dibêjin, çawa dibînin, romana me di rewşa kîjan kategoriyê ji van kategoriyan de ye û kîjan li rastiye nêzik e?*

Diyar Bohtî: Di baweriyê min de li şûna ku mirov bêje romana kurdî di kîjan qonaxê de ye, ku mirov bêje nivîskarên Kurd û Zimanê Kurdî di kîjan qonaxê de ne, dibe ku rasttir be. Eger roman bi zimanê nivîskî ve girêdayî ye û eger nivîs jî bi nivîskar ve girêdayî ye, wê demê divê mirov li ser bikaranîna ziman û nivîskar raweste û li gora wan diyar bike ka roman di kîkan qonaxê de ye. Çawa di bersiva pisên borî de jî hatî diyarkirin, romana Kurdî ji nû ve nayê destpêkirin, romana Kurdî jixwe bi hezarê salan e heye. Eger nehatiye nivîsîn, eger bi devkî hatiye gotin, eger bi rengê çîrok, stiran û destanan hatiye gotin, eger bi teknîka îro ya romanê nehatiye gotin ev nayê wê wateyê ku heta niha Kurd bê roman bûne. Çîroka Rostemê Zal di heman demê de roman e, destana Mem û Zînê di heman demê de roman e, Derwêşê Evdê, Siyabend û Xecê hem destan in hem roman in. Û gelek berhemên din yên wisa hene. Kurdistan çavkaniya romanê ye. Xezîneya romanê ye. Kî bixwaze dikare têra xwe jê bigire. Li şûna romanê mirov dikare bêje nivîskarê Kurd nû dest pê dike.

Rukiye Ozmen: *Di nava romanên cîhanê de tu hez ji kîjan roman-nivîsan zêdetir dikî, ji bo kesekî romanxwên û evîndarê romanan çend nav wê ne hesan be, belê herî zêde û di nav yên kurdî de?*

Diyar Bohtî: Ji romannivîsan pirtir, ez romanên hildibijêrim. Di nava romanên de jî yên bala min dikişînin romanên dîrokî ne. Ji romannivîsên Kurd ez naxwazim navekî, an çend nava tenê nîşan bidim. Lê ez dixwazim vê bêjim, her ku ez dibihîzim romaneke Kurdî derketiye, çawa ku min xezîneyek dîtibe ewqas keyfa min xweş dibe.

Rukiye Ozmen: *Werger çendî ziman, stîl û formûlasyonêan bi pêş dixe?*

Diyar Bohtî: Werger weke şûrê du dev e. Eger rast bi kar were, werger ji du alîyan ve sûtê dide. Ya yekê, civakên dinyayê, jiyanê civakên cuda, çandên cuda bi xwendevanê xwe dide naskirin. Xwendevanê xwe ji mala wî, ji gundê wî, ji bajarê wî, ji welatê wî derîne û bajar bajar, welat welat digerin. Dinyayê pê dide naskirin. Ya duduyan, ziman dewlemend dike. Romannivîs neçar dibe li peyvan bigere. Bi riya gera xwe rasta gelek tiştan tê û peyvên hatî jibîrkirin, peyvên tenê li hinekî deverên bikaranîn, dikevin ferhenga Kurdî. Lê aliyekî wê yê bixeter jî heye, eger baş neyê bikaranîn, dibe ku ziman xira jî bike. Lewre gelek caran hinek wergêr li gora qalibên wî zimanê qalibên Kurdî jî ava dikin û ev jî dibe sedemê xirabûnê.

Rukiye Ozmen: *Romanên hatine wergerandin çendî serketî ne, Zimanê Kurdî çendî di bin barê wergerê de radib?*

Diyar Bohtî: Di vê mijarê de ji ber ku romanên hatî wergerandin ne pir in û di vê mijarê de ti lêkolînên min jî çênebûne ezê nikaribim bersiva vê pirsê bidim. Bêguman ev jî kêmayiyeke min bi xwe ye.

Rukiye Ozmen: *Werger çiqas cewhera berhema ku tê wergerandin diparezê?*

Diyar Bohtî: Jixwe navê wê li ser e; em dibêjin werger. Ji sedî sed pirtûka hatî wergerandin ne ew bi xwe ye. Ne Zimanê Kurdî tenê, roman bi kîjan zimanê bê wergerandin bila bê wergerandin, hinek ji cewherê wê dikeve. Ew jî li ser xurtbûna zimanê wergerê û li ser hosteyiya wergêr e. Ka çiqas wergêr û zimanê wergerê xurt be, ewqas nêzîkî cewherê wê dibe.

Rukiye Ozmen: *Hûn bi xwe hez ji kîjan celebê romanên dikî, nivîskarekî romanê bêşik hezkirina wî wê fireh be, wê bi kategorî û çend kategoriyan ne sînorkirî be, belê cardî jî meyla mirov*

zêdetir bi ser hinan e, hûn xwe di kîjan kategoriyê de dibînî, nêzîkî kîjanê ye ji wan?

Diyaar Bohtî: Min bersiva vê pirsê li jorê daye.

Rukiye Ozmen: *Roman rolekî çawe ji bo civakê dileyîze?*

Diyaar Bohtî: Ev pirseke pir girîng e. Destpêkê mirov dikare bi pirseke wiha bersivê bide: Ma çi dike û çi nake? Bêguman eger romaneke baş be. Ji ber ku piralî û rengîn e, bi qasî ku roman bandore li mirovan dike ti tişt ewqas bandorê nake. Lewre di romanê de dîrok heye, zanebûna xwendevan zêde dike; çand heye, çandên cuda bi xwendevan dide naskirin; wêje heye, di warê ziman de pêşketinê bi xwendevanê xwe re çêdike; felsefe heye, fikir heye, bawerî heye, şîret û perspektîf hene, peyam hene; ev tev dibin sedem ku xwendevan xwe di ber çavan re derbas bike û xwe biguherîne. Roman xeyalên xwendevan xurt dike, mejiyê xwendevan dide xebitandin. Lê bi qasî ku roman xwendevanê xwe diguherîne ewqas jnivîskarê xwe jî diguherîne. Bi kurtayî mirova dikare bêje ji civakê re rêbertiyê dike.

Rukiye Ozmen: *Hayê we çendî ji romanên perçe û zaravayên din yên kurdan heye?*

Diyaar Bohtî: Bi qasî ku ez bikarim şîroveyeke baş bikim, di wî warî de derfetên min yên fireh çenebûne. Bêguman ev jî kêmayiyek e.

Rukiye Ozmen: *Demek dirêj di ser berhemaafirîniya romanê re derbasbûye, roman jî form û hûnandina xwe bi demê re diguhere gelo?*

Diyaar Bohtî: Bêguman form û qalibên romanê jî weke her tiştî tên guhertin. Ji ber ku roman nivîs e, nivîs bi ziman ve girêdayî ye û ziman jî weke heybereke zindî ye, çawa ku her zindî tê guhertin, roman jî li gora demê û li gora pêwîstiyên tî guhertin. Çawa ku guhertina her tiştî li gora demê û li gora pêwîstiyên e, eger li gora demê û li gora pêwîstiyên roman xwe neguherîne wê jî qîmetê xwe bikeve. Lê em bixwazin nexwazin wê xwe biguherîne. Çawa ku nivîskarê wê û xwendevanê wê xwe diguherîne. Ti tişt weke romanê bi jiyanê ve ne girêdayî ye. Ji ber wê çawa ku jiyan her tim bê sekin û bê rawestan di nava guhertinê de ye, romana heta niha hatî jî her tim xwe guhertiye. Roman bi serhatî û serborîyan, bi qalibê efsaneyan derketiye; xwe guhertiye bûye çîrok, bûye dîrok, bûye stiran, bûye şano, bûye filîm û herî dawî xwe gihandiye qalibê ku em niha jê re dibêjin roman. Dibe ku li gora demê û li gora pêwîstiyên naveroka wê jî, navê wê jî û form û qalibên wê jî bîn guhertin. Û pêwîst e, bîn guhertin jî.

Rukiye Ozmen: *Xelatata Nobel û dîroka destpêkirina wê gelekî ji dîroka romana kurdî kevintir e. ji romannivîsên gelên herêma Rojhilata Navîn Necîb Mehîûzê Misrî, Orhan Pamûkê Tirk xelat girtin, rojeke xelatgirtin bibe dora me jî mikun e, pêşbîniyên we, fantazyên we?*

Diyar Bohtî: Weke her tişta biserkeftî roman jî layîqî xelatê ye. Xelatdayîn tişteke pîroz e. Nirxdayîna kedê ye. Ji ber ku di serê pîroziyan tevan de ked tê, xelatkirina kedê cihê rûmetê ye. Lê ez dixwazim li ser xelatdayînê vê jî bêjim: Xelatên di roja me ya îro de tîn dayîn, ne tenê yên di warê romanê de, yên di her warî de bi giranî xelatên siyasî ne, ji zêhniyeta hêzên serdest ne dûr in. Weke din kesên xelatê heq dikin, ne şert e ileh xelata Nobelê bistînin. Di baweriya min de pêwîst e, yên ji zêhniyeta hêzên serdest dûr, ew jî bikarin di nava xwe de bi navên cuda xelatan bidin. Weke din xelat ne malê bavê ti kesî ye, xelat bi kedê ve girêdayî ye. Kî dibe bila bibe yê kedê bide, xelat heqê wî-wê ye.

Romannivîsên Kurd; nikarin demjiyanên Robinson Crusoe bijîn. Robinson Crusoe, têkoşîna mirovekî bi serê xwe ye. Têkoşîna di himbêza xweza de... Di kesayetiya mirovekî de, ji bo tevahiya mirovahiyê têkoşîna serdestiya xweza. Alavên Robinson Crusoe, li girava bi tenê încil û çend alavên biçûk in. Mirov dikare berxwedana Robinson Crouse ya di nava 4 salan de wek macera jî bi nav bike. Lê cîhana global, demjiyana teknolojiya pêşketî, derfetên wiha nadê Robinson Crouseyan. Ji ber ku fatura jiyanêke kifş û plankirî radeştî me nake. Fatura bihatir û girantir e. Bêhtirîn lîstik, bêhtirîn dîplomasî, bêhtirîn aborî û kolektîvîzmê derdixe pêşiya me. Tenêtiya Robinson Crouse, nebûna jinê, nebûna evînê, nebûna lîstik û qîr teşqeleyên cîhanê, şer, kuştin, dagirkirin, kar û xebata romannivîs hêsa kiriye. Lê car din mirov dibîne ku, rojavayî, bi Robin Crouse fêrî xwendinê bûne. Bi xwe hatine. Hêviyên çînê burjuwazî bi hêz kirine. Di cîhanêke ku her şev, bi dehan stêrikên ezmanê gelê nivîskarên Kurd tîne rijandin, mirov nikare behsa şans û avantajên bike. Belkî aliyekî avantajê heye, lê ji bo ku nivîskar dikarin avantajên demê û rijandina stêrikên ezmanê xwe bikaribîne. Alavên ku zarokên Kurd parçe dikin, ji încil û çend alavên Crouse giringtir in.

Rukiye Ozmen: *Pirsên me ev in. Zor sipas!*

Diyar Bohtî: Spas xweş!

Hevpeyvîn bi **Yaqob TILERMENÎ** re

Hevpeyvîn: **Rukiye Ozmen:**

Rukiye Ozmen: *Di dîroka romanê de qonax hene ku bi “îzmên” curbecur têne binavkirin û ev qonax ji destpêka xwe ber bi îro de bi hezaran roman di himbêza xwe de hewandine. Ji vî cihê derengmayî awantaj û dezawantajên me, şens û bêşensiya me çi ye?*

Yaqob TILERMENÎ: Ger dê mirov romana kurdî li gora dîroka qonaxa romana cîhanê binirxîne û ji vê nirxandinê weke parekê şens û bêşensiyê derxe, hingê pêdivî bi veçirandina armanca nivîsandina romannûsiyê derdikeve. Lewre nivîsandina romanê tenê ne afirandina cîhaneke xweser û nîgaşî ya nivîskêr e. Di heyama xwe de roman bûne pêngavên avakirina netew û civakên netewewariyê jî. Çinku mirov dikare ji romanekê gelek taybetiyên netew-dewletekê hîn bibe. Weke Moretti gotiye, “Netew-dewletê roman afirandiyê; berovajiya wê jî rast e: Romanê jî netew-dewlet afirandiyê.” Îcar di vê destnîşankirinê de bêşensiyê me kurdan heye ku em hîna nebûne xwedî dewleteke xweser û weke kurdên li çarnîkarê dinyayê hişmendiyeke yekpar a netewîtiya kurdî jî bi me re çênebûye. Ji vê hêlê ve gelek bêşensiyên me hene.

Rukiye Ozmen: *Ji bo romaneke baş û serketî ku em bibêjin dîroka, psîkolojîk an jî bi cureyekî din postmodern, em dikarin çend pîvanên ferz bi nav bikin?*

Yaqob TILERMENÎ: Ger dê mirov romanekê li gora rêbaz û rêçikên romana cîhanê li pîvanê bixe û jê re bibêje serketî an jî binketî, hingê pêdivî pê heye ku mirov ji pencereyeke gerdûnî li rabirdûya pêvajoya romana kurdî binihêre. Û destnîşankirinên romannûs û rexnegirên gerdûnî di ser guhên xwe re nevêje. Weke Henry James gotiye, roman “çeşnê nivîsînê yê herî serbixwe, herî vezelokî û herî baqilane ye.” Weke H. G. Wells gotiye, roman “navgîneke fêmdariyê ye.” Weke Michel Butor goti-

ye, roman, “teşeyeke vegotinê ya taybet e.” Weke Schellinger gotiye, roman, “rêya herî guncav e ku jiyana nûjen dişayesîne.” Îcar mirov ji van raveyan hin rastiyan derxe û romana kurdî binirxîne, dê bibîne ku îroj bi kêmasî be jî li ser bingeha jiyanê nûjen romanên bi Zimanê Kurdî têne nivîsandin. Bêşansiya kurdan ew e ku ev romanên kurdî li erdnîgariyên cuda yên dinyayê têne nivîsandin û her kurdek nikare xwe bi hêsanî bigihîne hemû romanên. Ji ber hindê nirxandinên bi ‘hişmendiya giştî’ ku tê gotin, ‘romana kurdî qels e, tune ye, bi çarpiyan dimeşe û hwd’, ne nirxandinên di cih de ne û bê bingehe in. Lewre kesên ku vê nirxandinê dikin, ne gengaz e ku hemû romanên kurdî xwendibin jî.

Rukiye Ozmen: *Romana kurdî û çîroka kurdî her du jî bi derengî ketine. Sedemên derengmayîne -heman pirs ji awireke berovajî û belkî hevdu temam kir- çi ne û dê roman çawa bi pêş bikeve?*

Yaqob TILERMENÎ: Bi giştî pexşana kurdî li gora helbesta kurdî weke nivîskî derengmayî ye. Sedemên derengmayîne dîsa dixwazim bi nebûna dezgehên kurdî ve girê bidim. Dema ku li Ewropa û hin deverên din çîrok û roman serdemên xwe yên herî serketî dijiyan welatê kurdan di nava lepên netewên cuda de dinaliya. Kurdan bi tenê ji bo pesendkirina nasnameya xwe û parastina parçeyek axa xwe her û her li ber xwe didan. Lewre derfetên xwendin û xwepêşxistinê çenedibûn. Serdestan jî bi her awayî rê nedidan ku Zimanê Kurdî li qadeke berfireh were bikaranîn. Rojname û kovarên kurdî li Şam, Beyrûd, Qahîre bi hezaran kîlometre dûrî Kurdistanê dihatin çapkirin. Di rojnameya Kurdistanê (1898), Şarq û Kurdistan, Kurd Teavun û Terakkî de, di Jîn, Rojî Kurd, Yekbûn û kovar û rojnameyên berî sedsalê de her û her nexwendewariya kurdan, tunebûna aboriyê, zext û zordariyên serdestan her wekî mijarên sereke dihatin nivîsandin. Em îro jî dinîhêrin heman pîrsgirêk bi tûmî nehatine çareser kirin û dibin mijarên pexşana kurdî. Weke nivîskarê kurd Helîm Yûsiv jî gotiye, ez jî heman gotinê diparêzim ku hewcedariyeke mezin pê heye ku divê welatekî yekgirtî û serbixwe yê aydî kurdan hebe. Bi vê minasebetê dê hemû rê li ber wêjeyê netewî ku ji teref netewên din were pejirandin, li ber wêjeya kurdî vebin. Ji hêla dîtir ve, digel heta îroj ew daxwaz pêk nehatiye jî, çîrok û romanên kurdî hatine/têne nivîsandin. Dema ku nivîskarên ku bi hişmendiyeke netewî hatin qebûl kirin û berhemên wan bi kêfwerigirtineke kurdayetî hatin xwendin, hingê dê pexşana kurdî cihê ku heq dike bigihîje.

Rukiye Ozmen: *Dema ku berhemek tê weşandin, carna nîqaşa ku ew berhem çîrok e an jî roman e tê kirin. Cudahiya romanê ji çîrokê çi ye?*

Yaqob TILERMENÎ: Di serdema ku em tê de dijîn çêşnên wêjeyî gihîştine qonaxên serbixwe û çiyawaziyên roman û çîrokê bi hêsanî têne zanîn. Hewcedarî bi peyitandin û binavkirinan nemaye. Kurteçîrok heye, dirêjeçîrok heye û roman heye. Rêbazên van çêşnan jî li gora teşe, dirêjbûn û şêweyê ji hevdu cuda ne. Ger hîna jî kesên ku çîrok û romanê ji hev dernaxin hebin, hingê em bihêlin bila ew kes lêkolînê li ser vê mijarê bikin û weke xwînerên pêşketî bersiva xwe bibînin.

Rukiye Ozmen: *Rewşa romana kurdî, heger mirov di qonaxan de bi nav bike, çi ne ev qonax?*

Yaqob TILERMENÎ: Romanên kurdî —qesta min kurmancî- yên destpêkê li diasporayê hatine nivîsandin. Mirov dikare vê diasporayê weke du qonax bi nav bike. Serê pêşîn kesên weke Erebe Şemo, Eliyê Evdirrehman, Heciyê Cindî li Yekîtiya Sovyetê romanên xwe nivîsandine. Jê û pê ve piştî salên 1980'yî li bajarên Ewropayê kesên weke Birîndar, Mehmed Uzun, Mahmûd Baksî roman bi Zimanê Kurdî nivîsandine. Hem ji hêla naverokî hem jî ji hêla serdemê ve qutbûneke dûdirêjî di navbera her du qonaxan de heye. Îcar piştî qonaxa li Ewropa, qonaxa sêyemîn -ew jî ne yekgirtî ye- derdikeve pêş. Ev qonax bi têkoşîna li dijî serdestên Bakurê Kurdistanê re dest pê dike, geş dibe û digihîje radeyekê. Qonaxa sêyemîn ne yekgirtî ye, çinku domana wê li Kurdistana Rojava, Bakurê Kurdistanê û Ewropayê bi hev re dimeşe. Lê ji hêla geşedana romana kurdî ve mirov dikare weke qonaxeke biserketî bi nav bike. Çinku çi romanên li kû derê bi kurdî têne nivîsandin hebin, bi awayekî digihîjin ber destên xwîneran û di refikên pirtûkxaneyê kurdî de cihê xwe digirin.

Rukiye Ozmen: *Dema gotin li ser romana kurdî ye, hinek behsa zaroktiyê dikin, hin dibêjin hê bi çarpîkan diçe, hinên din tenate-na dibêjin; li gora hinekan jî êdî zarok jî nayê hesêb. Dema rewşa romanê bi îfade û tesbîten li jorê têne diyarkirin, mebest çi ye?*

Yaqob TILERMENÎ: Li gora fikra min, rave û nirxandinên bi vî awayî bê bingeş in û ji hişmendiya zanistî jî dûr in. Lewre heman gotin û biçûkdîtin di serê salên 1990'yî de jî dihatin dubarekirin û piştî salên 2000'yî jî. Ger dê li ser romana kurdî tesbît bêne kirin divê ev li gora rêçikên hûnerî û bi pîvan be. Tenê gotinên hamasetî çu tişteki îfade nakin. Mirov dikare bibêje rexnegiriya wêjeyî ya kurdî qels e, lê mirov nikare bibêje rexne tune. Ji ber ku hin kes hene romanekê bi giştî dinirxînin û baş û qelsiyên wê li gora rêçikên rexneyê bi nivîskî araste dikin. Hin kes jî hene ku li ser malperên kurdî darê ji kokê de dibirin bêyî ku hemû romanên bi kurdî xwendibin. Ji hêleke dîtir ve mirovek bi navê Haşim Ahmedzade bi navê “netew û roman” berhemekê amade dike û wêjeya

vegotinî ya zimanê farisî û ya Zimanê Kurdî beramberî hevdu dike; rêçik û rêbazên nirxandinî di ser guhên xwe re navêje, romana farisî ya ji zimanê dewletekê û romana kurdî ya bê dewlet dide ber hev. Mirov ji hêla objektîfî di vê berhemê de dibîne ku romana kurdî serdema çarpîkan û zaroktiyê berî bi salan li dû xwe hiştiye. Nirxandinên li ser tunehesibandinê bi hişmendiya oryantalîstên cîhanê nihêrîna li berhemên kurdî ye. Ji lewre oryantalîst bi armanca ku hemû pêşketinên mirovan aydî wan in van awiran didin rojhilat û xwendeyên kurd jî ku bi perwerdeya ewropiyan haşir û neşir bûne, hemû heyînên netewa xwe ji nedîtî ve tên. Ne wiha bûya qey dê romanên kurdî bi awayekî analîtîk bihatana nirxandin û başî û qelsiyên wan bihatana kategorîzekirin. Hingê mirov dikarîbû ew gotinên mezin û berhewa cidî bidîta.

Rukiye Ozmen: *Di nav romanên cîhanê de tu zêdetir hez ji kîjan romannivîsan dikî? Ji bo kesekî romanxwîn û evîndarê romanan çend nav wê ne hesan be, lê belê herî zêde û di nav yên kurdî de?*

Yaqob TILERMENÎ: Helbet ez ji romanên cîhanê kîjan romannûsan bi-bêjim dê navên min negotine kêr bimînin. Vegotina Virginia Woolf, seqaya Kafka, derûniya Dostoyevskî, şeweya Paul Auster, naveroka Saragomago, helwesta Don Delillo, zimanê Hasan Ali Toptaş, kurdewariya dirrokî ya Jan Dost, Beckett, Milan Kundera, Orhan Pamuk... Dema mirov nav dibêje jî, nayê wê wateyê hemû romanên wan ji bo min çêjdar in. Di kurdî de jî çî romanên ku xwe digihînimê dixwînim. Di serî de ji bo ku bi kurdî ne, bêtir ku ciyawaziyê di navbera wan xim, hemûyan dixwînim; dû re ji bo rêbaz û rêçikên romana cîhanê şopandine min romanên Hesenê Metê, Helîm Yûsiv, Jan Dost, Mehmet Uzun, Şener Özmen, Yunus Eroğlu, Şahînê Bekirê Soreklî, Dilawer Zeraq, Ereş Şemo, Heciyê Cindî, Eliyê Evdirrehman, Bavê Nazê, Firat Cewerî bi baldarî xwendine...

Rukiye Ozmen: *Werger çendî ziman, stîl û formûlasyonêan bi pêş dixê? Romanên hatine wergerandin çendî serketî ne? Zimanê Kurdî çendî di bin barê wergerê de radibe?*

Yaqob TILERMENÎ: Helbet pêwendiya zimanên cuda û têkîlîdanîna mirovên ji netewên cuda bi rêya wergerê pêş ketiye. Di serî de pirtûkên olî Încîl, Qûran û Tewrat li hemû zimanên cîhanê hatine wergerandin. Heman tişt jî bo romanên cîhanê jî karîger e. Ji lewre stîlên romanên ku weke 24-27 hatine diyarkirin dema nimûneyên wan di Zimanê Kurdî de hebe, dê teqez ji bo ew qas hejmar stîlan di kurdî de hewldanên nivîskarên kurd jî çêbibe û dibe ku stîlînan cudatir jî werin nivîsandin. Lê ji ber ku hejmareke tîr ji romanên cîhanê li kurdî nehatine wergerandin, kurdên li çarnîkarê dinyê ji zimanên wekî dîtir wan romanên dixwînin û gelek

caran jî xwendineke bi kêrhatî pêk nayê. Her çiqas îro hin hewldanên wergerandinê hebe jî, ez nikarim bibêjim ev hewldan bi giştî û bi ser ketî ne; ji lewre ne sazî, bêtir kes bi karê wergerê re mijûl dibin. Ger ne wiha bûya, Zimanê Kurdî ji bo wergerê zimanekî têra xwe dewlemend e.

Rukiye Ozmen: *Hayê we çendî ji romanên parçe û zaravayên din yên kurdan heye?*

Yaqob TILERMENÎ: Li Bakurê Kurdistanê û Tirkîyê romanên destpêkê yên li Kafkasyayê heta niha hatine çapkirin û li ber dest hene. Romana Janî Gel, romana Pêşmerge, romana Viyan, romanên li Ewropayê hatine nivîsandin, romanên nivîskarên Başûrê Rojavayê Kurdistanê dîsa bi zaravayê kurmançî li ber destê me hene. Heta hin roman ku weke berhem negihîştîye me, li ser înternetê derfeta xwegihandina wan heye; weke romana tekane ya ji teref nivîskareke jin hatiye nivîsandin a Zerîfe Demîr'ê.

Rukiye Ozmen: *Xelatata Nobel û dîroka destpêkirina wê gelekî ji dîroka romana kurdî kevintir e. ji romannivîsên gelên herêma Rojhilata Navîn Necîb Mehîfûzê Misrî, Orhan Pamûkê Tirk xelat girtin. Gelo rojekê minkun e ku xelatgirtin bibe dora me jî; di vî warî de pêşbîniyên we, fantazyên we çi ne?*

Yaqob TILERMENÎ: Ji bo wergirtina xelatên navnetewî yên wêjeyî, di serî de pêdivî bi xelatên netewî hene. Pêdivî bi dehan kovar û rojnameyên kurdî hene. Pêdivî bi mafdayîna telîfa nivîskêr heye. Pêdivî bi hezaran xwînerên Zimanê Kurdî heye. Pêdivî bi qîmetdayîna siyasethêderên kurd heye û hwd... Yanî dam û dezgehên kurdan divê bi awayekî dirust û kurdewarî tevbigerin. Yanî divê hêzeke kurdan a navnetewî di nava welatên ewropa û cihên din ên dinyayê hebin ku bikaribe bazareke navnetewî ji wêjeya kurdî re ava bikin. Ger ev tiştên min jimart û gelek hêmanên dîtir bi cih werin, dê hin mirov jî rabin û romanên kurdî bikin berendamên xelatên fena Nobelê. Ez dixwazim ji xwe re hin xeyalan saz bikim ku rojekê romaneke min bibe xelatgira Nobelê ango xelateke dîtir; lê devjenî, pevçûn û nepejirandina hevdu ya nivîskarên kurd vê xeyala min di cih de sar dike û nahêle ez dilê xwe jî bibijînim. Weke pêşbînî dikarim bibêjim ku di deh salên pêşiya me de dê romana kurdî balê bikişîne ser xwe û dê li gelek zimanên cîhanê werin wergerandin.

Rukiye Ozmen: *Pirsên me ev in. Gelek spas.*

Yaqob TILERMENÎ: Ez jî gelek spas dikim.

Hevpeyvîn bi **Hesenê Metê** re

Hevpeyvîn: **Rukiye Ozmen**

Rukiye Ozmen: *Di dîroka romanê de qonax hene ku bi „îzmên“ corecor têne binavkirin û ev qonax ji destpêka xwe ber bi îro de bi hezaran roman di himbêza xwe de digre, ji vî cîhê derengmayî awantaj û dezawantajên me, şens û bêşensiya me, îro mirov rehet dikare xwe bighîne wan?*

Hesenê Metê: Ev êkolên ku bi gotina te ya ku dibêje bi „îzman“ dest pê kirin... ew ne tenê qonaxên romanê, di her warê jiyana wan deman de rûdan: muzîk, resamî, edebiyat, rabûn û rûniştin... bi gotineke din, êkolên jiyana bûn. Bêguman kurd û kurmanc jî di wan deman de jiyane, lê şop an jî bermayiyên lu em bibêjin di warê muzîk, resamî û edebiyatê de di kurmanciyê de ne zêde ne. Çend klasîkên me ne. Ev yek di edebiyat û jiyana me ya îro de têra me neke jî em wan êkolan dikanin ji zimanên din jî fêr bibin bê çî bûn, çawa bûn.

Rukiye Ozmen: *Ji bo romaneke baş û serketî bê ku em bêjin dîrokî, psîkolojîk yan jî bi coreyekî din, postmodern, çend pîvanên ferz binav bikin?*

Hesenê Metê: Naxwazim receteyek hebe, naxwazim bibe şîret jî lê çî di romanê de, çî di novelê de û çî jî di helbestê de... gotin xweş e ku ji dil be. Hîsên nivîskarekî weke hîs û ruhiyeta Mesîh e, samîmî û ji dil û can e. Dema ku nivîskarek berî hertiştî bi xwe re, bi gotinên xwe re, bi qehremanê xwe re samîmî be, tiştê ku were afirandin jî, di wê baweriyê de me ku ew ê tiştêkî di asteke baş û bilind de be. Ez ê bahsa teknîk, stîl, hûnandin û zimanekî xas î nivîskar nekim, ne pêwîst e, ji ber ku nivîskarek baştir bi xwe û bi van tiştan dizane.

Rukiye Ozmen: *Romana kurdî jî û çîroka kurdî herdû jî dereng ketine, sedemên dernegmayîne û heman pirs ji awurike bervaja û belkî hevdû temamkir, roman çawa bi pêş dikeve?*

Hesenê Metê: Ez di wê baweriyê de me ku pêşketina edebiyatê ne bi nivîskar û berheman bi pêş dikeve. Hinek xisûsiyetên cîvakî pêwîst in: civakek xwediyê kultureke xwendin û nivîsandinê, dezgeh û îdareyên qedir û rûmeta edebiyatê dizane... ev dikanin edebiyatê bikin pêwîsiyeke jiyana rojane. Lê ku xwendin weke pêwîstiyekê di civakekê de rûne-nîştibe, nivîskarekî çiqas jîr dibe bila bibe, roman û helbesteke di asta xwe de çiqas bilind dibe bila bibe, ew ê cîhê xwe di roja îro de nebîne. Lê ez di wê baweriyê de me ku roman jî, novel jî û helbesta kurdî jî bi têra xwe de asteke bilind de ye. Bi gotineke din me berhemên pêşketî hene, me nivîskarên serketî hene... lê di roja îro de ne serok û siyaseta kurd, ne jî cemaata kurd rûmeteke pêwîst didin evê yekê.

Rukiye Ozmen: *Dema ku berhemek tê weşandin carna nîqaşa ew berhema çîroke an jî romane tê kirin cudahiya romanê ji çîrokê çiy?*

Hesenê Metê: Hinek xisûsiyetên roman û novelê, bi gotina te çîrokê heta salên 1800 diyar bûn. Weke ji aliyê struktura xwe ve, ji aliyê cîh û wexta xwe ve û nemaze li gor forma kurt û dirêjahiyê ve navê roman an jî novelê li berhemekê dikirin. Ji Giovannî Boccaccio 1350 heta salên 1800 welê hat. Lê piştî 1800 ev forma kurt û dirêjahiyê deforme bû, novelên bi qasî romanekê qelew û romanên bi qasî novelekî jî kurt çêbûn. Evê yekê ne tenê serê weşanger, rexnegir herweha nivîskar jî ji nav evê aloziyê derneketin, hîn jî welê ye. Lê tiştêkî berbiçav heye ku hînanîna novelê întensîv e, konsantre ye, tiştên ji bilî qest û mebesta nivîskar zêdetir di novelê de çênabe. Ku di novelê de tiştên ji qest û mebesta nivîskar zêde hebe, ev tê wê maneyê ku novel bi ser neketiye. Lê di romanekê de gelek caran rê heye ku nivîskar tiştên ji qest û mebesta xwe zêdetir jî li mijar û qahremanê xwe bar bike. Belbî jî ferq ev be. Ku ez nimûneyeke weha bidim: Ji bo ku meriv darekê, kulîlkekê bibîne ne pêwîst e ku tu tevayiyê laşê xwe çerx bikî ji bo ku bibîn. Ji ber ku tiştê di laşê me de dihêle em wê darê an jî kulîlkê bibînin bînahiya çavê me ye. Têra me dike ku em tenê hustuyê xwe bizivînin, serê xwe çerx bikin an jî tenê di ser milên xwe re mêze bikin. Lê di gelek romanên de jî ev pîvanên întensîvîtet û konsantreya text heye ku em dibêjin nivîskar di qest û mebesta xwe de baş bi ser ketiye. An ne roman dibe romaneke sist. Û novel evê sistiyê qet nahebîne. Ev dîtina min e.

Rukiye Ozmen: Dema gotin li ser romana kurdî ye, hinek behsa zaroktiyê dikan, hin dibêjin hê bi çar lepikan diçe, hinên din tena-tena dibêjin, hinek jî êdî zarok hesab nabe, zaroktî di temen û di aliyê biyolojîk de tê zanîn kêma zêde belê dema rewşa romanê bi îfade û tesbîten li jor tê diyarkirin mebest çî ye, hûn çî dibêjin, çawa dibînin, romana me di rewşa kîjan kategoriyê ji van kategorîyan de ye û kîjan li rastiye nêzîk e?

Hesenê Metê: Ez bi xwe nizanim qest û mebesta ji kategoriyên pirsê çî ne. Ez nizanim qest û mebest kalîteya berhem û niviskaran e an bi tevayî kultura nivisandin, xwendin û pêwîstiya edebiyatê ye. Lê tiştekî berbiçav heye: Heta nuha welatê me, dezgehên me, jiyana xelkê me ne weke wan dewlet û milletên din bûye. Ev rastiye e. Ji aliyê kultura jiyane ve weke kurd em di kîjan kategoriyê de ne bila herkes li gor xwe bipêve. Lê ku qest û mebesta ji pirsê kalîteya edebî be, me nivîskar jî û me berhemên gelekî baş û bi astên bilind jî hene.

Rukiye Ozmen: Zor spas!

Hesenê Metê: Spas xweş!

Hevpeyvîn bi **Perwîz CÎHANÎ** re

Hevpeyvîn: **Rukiye Ozmen**

Rukiye OZMEN: *Di dîroka romanê de qonax hene ku bi „îzmên“ corecor têne binavkirin û ev qonax ji destpêka xwe ber bi îro de bi hezaran roman di himbêza xwe de digre, ji vî cihê derengmayî awantaj û dezawantajên me, şens û bêşensiya me, îro mirov rehet dikare xwe bighîne wan?*

Perwîz Cihanî: Ez dixwazim bersiva pirsîyara te ya yekem, bi êşek giran weha bidim: Rewşa tore wate edebiyata her neteweyekê li pileya yekem de bi reşwa wê ya ramiyarî û desthelatdarîya wê ve girêdayî ye. Dema ku mirov berê xwe dide rewşa kurdistanê û bindestîya wê, mêjûya wê, cênigarî û sînorên wê yên destkir û rewşa sazîyên wê yên ramiyarî ji bo mirovî baş ronahî dibe, ku ne tenê li pêvajoyê rewenda pêşketina toreyê de, - ku yek ji pişkên wê yên here giring ya îroyîn roman e, - em ji gelek „îzman“ qut bûn û me gelek îzm û îsm „nav“ jî wende kîrine. Gava ku neteweyek bê dewlet û hukûmet be, dema ku neteweyek li nav pênc, şeş sînorên destkir de ji hevdu biqete, dema ku zimanê gelekî di hemû waran de hatibe berbendkirinê, dema ku zaraveyên curbicurên zimanekî ji ber hegerên nebûna navendeke ramîyarî û toreyî, nebûna hukûmetekê, nebûna perwerdeya bi wî zimanî roj bi roj ji hevdu dûr bikeve, dema ku ji sedî nod û pêncê wî gelî nizanibe bi zimanê xwe bixwîne û binivîse, dema ku zimanê sazî û desthelatderên wî gelî ne zimanê xoyî be, hînga em nikarin çavniherîya wê hindê bikin, ku em di tore û zimanê xwe de xudanê hemû „îzmên“ toreyî bin.

Ev êşa ne tenê li romana kurdî û toreyî îroyîna kurdî de li ber çavan e, belkû li toreyî kilasîk de jî, ew kêmasî bi curekî zeq xwe dinimîne. Li toreyî me ya kilasîk de jî tenê çend mesnewî û hindek xezel û qesîde gihane destên me. Li qalibên dî yên toreyî de hema hema bêje, destê me

vala ye. **Ehmedê Xanî** çendsed salî berî niha ev êşa ku em îro jî dikişînin, bi reh û pehên xwe ve hest kirîye. Dema ku li dijî mîrê kurd de dibêje: mîrê me ku navê wî Mîrza ye, dikare bi avirrekî sed bar paryên qelp û misên sor bike zêrrên zer, lê nîvavirrek neda me û toreya me. Eger ewî he nîvavirrek jî bida min, minê alaya toreya kurdî bigehanda asta asimana. Ew rewşa kambax ya gûna Xanî ta roja me jî her berdewam e. **“Namûse li hakim û emîran, tawan çîye şair û feqîran”**

Toreya bêxudan û torevanên bê piştîvan nikarin li asta cîhanî de hebûna xwe binecî bikin. Dema ku hukûmetek me ya dilsoz û serbixwe çêbû, dema ku zimanê me bû zimanê saziyên me yên ramiyarî û neramiyarî, dema ku zimanê me bû zimanê debistan û xwendingeh û zanistgehan, dema ku xwênerên romana me peyda bûn, hûnga ne tenê bextê me, belkû bextê romana me jî dê ji xewê hişiyar bibe û emê bikaribin nebûna wan îzmên toreyî, ku neçarîya mêjûyê li me bar kirîye, ji nû de biafirînin.

Rukiye OZMEN: *Ji bo romaneke baş û serketî bê ku em bêjin dîrokî, psîkolojîk yan jî bi coreyekî din, postmodern, çend pîvanên ferz binav bikin?*

Perwîz Cihanî: Gelek kesan li bara romanê de û çawanîya dariştin û vehûnana wê de babetên cur be cur nivîsîne û hindek merc denîne. Ez naxwazim wan gotinane wek destûrekê li vir de dupate bikim.

Ez bixwe romanê diwekînim saxtuman yan xanîyekî mucellel, ku peyv kevir û kelpûçên wê ye. Herkes dizane ku xanîyekî mucellel tenê bi kevir yan kelpûçan ava nabe. Roman jî tenê bi rêzkirina peyvan û hevokên nexemilandî pêk nayê.

Bi dîtina min xîm û şengistê her toreyekê û roman jî di nav de, li pileya yekem de ziman e. Romana ku zimanê wê lawaz û rêzimana wê çewt be, li yekimîn avirê de xwênerê xwe dilsar dike, bila afirînerê wê li pileya mezintirîn romannivîsan de be jî. Ji bilî ziman û dariştian toreyî, ev xalana jî ji bo romanekê pirr pêdivîne: Roman debê vegotina rastîya nerast be. Di romanê de weke wateya navê wê debê nûbûn û xemil û ciwanîya toreyî hebe. Roman debê xwênerê xwe ber bi pirsîyaran biajo. Çimayî û çirayî ku xîmê felsefê ye, debê li romanê de jî hebe, dena romana ku xwênerê xwe nehizirîne û pirsîyaran li mejîyê xwênerên xwe de neçîne, romanek serketî nîne.

Roman debê neynûka jîyana rasiîn be, lê xîmê wê li ser derewê ava bibe. Gotina Nizamîyê Genceyî ya li bara helbestê de, li bara romanê de jî durust e. Nizamî dibêje: “Baştirîne helbestan, derewtirîne wan e.” Roman jî wisan e. Roman debê derewek logik ji ispênaya jîyana rasiîn be.

Rukiye OZMEN: *Romana kurdî û çîroka kurdî jî herdû dereng ketine, sedemên dernegmayîne û heman pirs ji awurike bervaja û belkî hevdu temamkir, roman çawa bi pêş dikeve?*

Perwîz Cihanî: Pişkek ji bersiva vê pirsiyarê li yekimîn bersivê de hatîye. Digel wê hindê ku zimanê me zimanekî berbendkirî ye û ji hêza ramîyarî bêpar e jî, lê gava ku mirov roman û çîroka kurdî digel roman û çîrokên gelên dewr û berên me dide ber hev, mirov dibîne, ku roman û çîroka kurdî digel hemû astengiyên afirîner û xwênerên xwe, eger li ser yên gelên hevhesî ra nebe jî, ji wan kêmtir nîne.

Em nikarin romana neteweyek bindest, ku hê zimanê wê neteweyê nebûye zimanê debistan û xwendîngeh û dengeberên giştî, ku hê nivîskarên wê bi zimanê xoyî perwerde nebûne, bi romanên gelên serdest ra bidin ber hev. Min li jorê got yekimîn pêdivîti û şengista toreyê, çi roman, çi kurteçîrok yan helbest û dîtir celebên toreyî, bi zimanî tene afirandinê. Dema ku afirînerê romaneke kurdî, bi kurdî perwerde nebûbe, dema ku firşkê xwe yê toreyî bi toreyê xwe venekiribe, çi demê ew nikare, berhemek toreyî ya serketî bi wî zimanî binivîse. Ez kude badi-dim, dîsan tîm ser xala yekem, ya nebûna hêza ramîyarî, nebûna dewlet û hukûmeta kurd. Nebûna dezgehên kurdî yên netewî û serbixwe û azad.

Rastîyeke tal ya dî jî heye. Eger mirov baş dîna xwe bide rewşa afirînerên toreyê kurdî, mirov dibîne, ku pişka here zore nivîskar û aferînerên toreyê me li rewşeke pir aloz de dijîn û jîyan e. pişka zor ji bilî nivîskariyê bi neçarî karên dî, karên ku hîç mafên wan bi tore û torevanîyê ve tune, dikin. Ma mirovek çendê dijî? Mirovek şerojekê çend demjimêran dikare bixebite? Pişka zor ji vê qata civata me, nivîskari karê wan yê duwem e. Ew ji bo jîyana xwe ya rojane, ji bo bijîva xwe karekî dî dikin, û dema xwe ya vehesiyên û gerîyan û agdarîdestvehînanê didin nivîsînê.

Ne tenê hîç destmizdek ji bo karê nivîsînê nagîje nivîskarên me, lê nivîskarên me pişka zor ji berîka xwe pareyekê jî didine weşanxaneyan, daku berhemên wan biweşînin. Ca nivîskarekî/e weha belengaz û xudêlêxistî, ku ne dema wî/ê heye pirtûkên toreyî bixûne û ne dema wî/ê heye li ser mijarek toreyî baş bihizire, ne dema wî/ê heye bi bêhnêk fire binivîse, ne sudek madî û meînewî ji karê xwe bi dest dîxne, berhemên wî/ê debê çi bi??? Nizanim ev cure nivîskara yê çawa bikaribe berhemek cihanî biafirîne?

Hê ez gerrîyan û seferên zanistî û nasiyarîya digel tore û ferhenga civa-kên curbicur ku li rêka gerr û rêbwarîyên zanistî destve tên, nedîtû digirm.

Rewşa her toreya ne tenê bi afirînerên wê ve girêdayî ye, belkû bi rewşa bazara wê û bikirbirên wê ve jî girêdayî ye. Ez bawer nakim li seranserê kurdistanê de, hejmara romanxwanên kurmanç li ser 300- 400 kesî ra be. Lê li navê hejmara romanxwanan de hejmara romanxwanên kûrbîn, dûrbîn, rewşenbîr û torevan belkî hind kêm be, ku mirov fedî dike, hejmarek wisan biçûk destnîşan bike. Hejmara romanxwanan jî tîraja romanên kurmançî ra dîyar e.

Ji bilî van kêmasîyên ku min destnîşan kirin, tiştekî zor tal, xemhîner û pêkenî jî heye, ku gotina wê zor pêdivî ye. Gava ku em bera xwe didin rewşa teblîxat wate ragehandin û agadarîyên li ser toreya kurdî, em dibînin ku her kom û sazî û partîyek kurdî tenê li ser berhemên hevalbend û endamên xwe agadarîyan didin. Eger li nav civaka kurdî de nivîskarekî/e bêalî û serbexwe hebe, êdî malik lê çol û hol bûye. Ne tenê hîç sazî û partîyek li ser berhemên wê çî agadarîyan nadin, belkû dana agadarîyan jî li ser wê berhemê berbend dikan.

Yanê bi gotinekê di em hê li êwirgeha eşîretî û partîtîyê derneketine. Hê sazîyên me berjewendîyên gel gorîyê berjewendîyên partî û sazîyên xwe dikan. Hê hizra netewî li nav sazîyên me de çê nebûye. Hemû li ser berjewendîyên sazîyên xwe dihezirin. Kes di hizra netewî de nîne. Min romanek wek Bilîcanê nivîsî. Ez nabêjim ew romanek çawa ye. Lê çunku ez ser bi hîç sazî û partîyan nebûme û nînim jî, hîç sazîyekê agadarî li ser wê romanê nedan civaka kurdî. Lê tenê du kes têkoşîn, ku li ser wê romanê agadarîyan bidin. Ew jî agadarîyên wan weha bûn. Karimendekî Kurdistan TVyê xwest li ser wê romanê bi min ra hevpeyvînekê saz bike, lê ji layê Sero Qadir berpîrsê giştîyê dengeberên Başûrê kurdistanê ve gefê ji karderêxistênê lê hate xwerinê û belengazî hew karî bi min re peywendîyê danê.

Yekî jî nivîsî: „Romana Bilîcan, romana kurdî ya here qalind (istûr) e. Wate pîvaneya wî ya hêlengandin û toreyî istûr û ziravîya romanê bû. A, em li rewşeke weha kambax de dijîn. Emê li vê rewşa kambax de çawa bikaribin berhemên toreyî yên li asta toreyî cîhanî da biafirînin. A eve ye rewşa me û romana me.

Rukiye OZMEN: Dema ku berhemek tê weşandin carina nîqaşa ew berhema çîroke an jî romane tê kirin, cudehiya romanê ji çîrokê çîye?

Perwîz Cihanî: Li zimanê me de çîrok tê bi du wateyan. Em hem ji çîrokên gelêrî yên ku afirînerên wan dîyar nînin, wate yên anonym ra çîrok dibêjin, hem jî ji kurteçîrokên toreya, yên ku nivîskar û afirînerên wan dîyar in ra çîrok dibêjin. Lê li lêre mebesta me ji çîrokê ya toreya ye. Bi giştî tişta ku romanê ji celebên dî yên çîrokan vediqetîne, bi zimanekî sade mezinî û pirnaverokî û dirêjîya wê ye. Li toreya nûjen ya îroyîn de, gava ku axiftin tê ser veqetandin û celebên toreya çîrokî, çar celebên çîrokên toreya tên binavkirinê:

1. çîrçîrok (kurtîleçîrok), 2. kurteçîrok 3. nowel yan çîroka dirêj, 4. roman.

Evana hemû jî çîrok in. Ne naverok, ne hejmara qehremanan, ne şêweya vegotinê, ne cîh û dem, ne darêjk û tewina wan, lê tenê kurtî û dirêjîya wan sînore wan destnîşan dike. Lê eger mebesta me lêre ji çîrokê, çîrokên gelêrî be, li pileya yekem de, tişta ku çîrokê ji romanê vediqetîne, ewe ku roman çîrokek nivîskî, lê çîroka gelêrî çîrokek nenivîskî yanê zarkî ye. Ji bilî wê hindê ku naveroka çîrokên gelêrî sade û dariştina wan hind toreya nînin, lê roman berewajî wê ye. Em ji bîr nekin hindek çîrokên me yên gelîrî hene, ku ji gelek romanên dirêjtirîn û çîrokbêjan bi şevan ew li ode û dîwanxaneyan de vedigêrran û li bara bîr û hizr û qehremanbazî yê de jî çî ji romanên kêmtir nînin. Tiştên ku romanê ji wan vediqetîne, nivîskîbûna romanê, hizr, nûbûn, ciwankarîyên toreya ye.

Bi kurtî roman babetek nivîskî ye, mijara wê wek navê wê nû ye, kesekî/ê bi navê romannivîs ew nivîsîye, wate xudan û afirînerê/a wê dîyar e. Xudanê pileyek toreya ya bilind e. Lê çîrokek gelêrî ji pişkeke zore van pesnan bê par e.

Rukiye OZMEN: *Pêwendîya roman û destanê li ser çî astê ye?*

Perwîz Cihanî: Çunku destanê gelek wateyên xwe yên dî jî hene, eger mebesta me ji destanê çîrokên hemasî wate çîrokên qehremanîyê yên nivîskî yên weke Îliad û Odyse ya Homer û Şahnameya Firdewsî be, mirov dikare peywendîya roman û destanê weha şirove bike: Herdu jî çîrok in, wate xîmên wan li ser derewan hatine avakirinê. Em ji bîr venekin, roman gêraneweyek derew e li ser jîyana qehreman yan qehremanan. Li herduyan de jî du hêzên dijber li hember hevdu de radiwestin. Li hindêkan de jî du hêzên hevber yên ku herdu jî hêzên xoyî ne, li ber hevdu radiwestin, ku dijberîya wan tirajêdîyekê diafirîne. Lê du tişt hene ku wan, wate roman û destanê (çîrokên qehremanîyê) ji hevdu vediqetînin. Hemase yan jî destan debê li qalibê helbestê de hatibe vehûnanê, ku roman helbest nîne û piroze ye. Roman celebek ji celebên çîrokî, toreya ya

serdema me ye û temenê wê ji 300 salî nabihore, lê hemase pir kewnin û temenê wan û dema peydebûna wan diyar nînin û li binêşa xwe de zarkî bûne, li dû ra kes yan kesaneke ew di qalibê helbestê de vejandine. Li destanan de hêz û qehremanên derveyî suruştê wate dêw û pîrhepok û cin û perî hene û qehremanên destanan xudanê hêza derveyî suruştê ne. Lê di romanê de wisan nîne, qehremanê romanê mirovên asayî ne.

Em ji bîr venekin ku reh û rîşeya romanê jî diçe ser destanan, çi destanên qehremanî, çi jî yên evîndarî, civakî û ayînî. Wate roman li jêr kartêkirina destan û çîrokên gelêrî de peyda bûne, lewra gelek kes hene, ku ji destanên vehûnandî ra, çi qehremanî (hemasî) û çi jî evînderî û civakî û ayînî, helbesterman dibêjin.

Rukiye OZMEN: *Rewşa romana kurdî, heger mirov di qonaxan de binav bike, çi ne ev qonax?*

Perwîz Cihanî: Mirov dikare romana kurdî li sê êwirgehên demanî û cîhanî (zemanî û mekanî) de parveke. Yekimîn êwirgeha peydebûna romana kurmançî Sovyêta berê û bi taybetî Ermenistan e, ku li saya şorişa Oktobê û peydebûna Sovyetê berbeşî li ser gelan û zimanan rabû û Zimanê Kurdî jî wekî zimanê dîtir gelên li nav sînorên sovyetê de serbest bû û nivîskarîya kurdî jî ji kurdan ra bû karek ji karên pêjîyanê û bû karekî dîwanî. Evê derfendê hêla, ku xîmê romana kurdî bête danan û yekimîn romana kurmançî bi qelema Erebê Şemo çav li cîhana ronahî vekir. Evê êwirgehê ta belawbûn û jêkweşiyana Sovyetê dewam kir. Li vê êwirgehê de ne tenê yekimîn, belkû baştirîn romanên kurmançî bi wateya ku romanê bi hemû hel û mercên wê şirove bike, hatin afirandinê.

Li dû vê êwirgehê û digel wê, êwirgeha penaberîyê ye, ku li salên heftêyî ra dest pê dike. Gelek kurdên me, ku ji welêt helatibûn û weke penaber li Awropayê de dijîyan û hindêk ji wan hê jî dijîn, li saya serbestîya li wan welatan de, hel û merc ji wan ra saz bû, ku hem Zimanê Kurdî hîn bibin û hem jî bikaribin bi kurdî binivîsin. Li wan welatan de bi giştî û li Swêdê de bi taybetî ew bext ji kurdan ra çê bû, ku dest bi nivîsîna romanê bikin. Lê mixabin pişka here mezin ji van nivîskarên me, yan qet kurdî nizanîn û bi kurdî perwerde nedîtibûn û li dervayî kurdistanê Zimanê Kurdî fêr bibûn, yan jî kurmançîya wan hind aloz û lawaz û têkepêkel bû, ku têra nivîsîna romanê nedikir. Lawaztirîn romanên kurmançî (du sê roman jê der) li vê êwirgehê de hatine nivîsînê.

Sêyemîn êwirgeha romana kurdî, ez êwirgeha welatî nav lê dikim. Ew jî li salên heştêyî ra li hindêk pişkên kurdistanê de azadîya nivîsîna bi kurdî dest pê kir û muxabin ev azadî bi formalîte be jî, li pişkên dî yên kurdis-

tanê li salên 90 î ra mirov dikare bêje dest pê bûye. Romanên vê êwirgehê ji yên êwirgeha duwem baştirin, lê hê jî negehîştine êwirgeha yekem.

Bi giştî dema ku mirov van hersê êwirgehan dide ber hev, mirov dibîne ku hê jî digel hemû kêmasîyan, dîsan jî romana kurmançî li dîtir êwirgehan de negehîştîye romana êwirgeha yekem, wate êwirgeha Sovyêta berê. Ew jî ho û hegerên xwe hene. Ku serekîtirîn heger dizivire ser rewşa jîyana romannivîsan. Em ji bîr nekin, ku em bi curekî giştî diaxivin. Hebûna romanek yan du romanên baş li dîtir êwirgehan da nabe sedema başbûn û serratîyan. Bi gotina pêşînan, **“bi gulekê buhar nayê/ bi gulekê nabe buhar”**.

Rukiye OZMEN: Dema gotin li ser romana kurdî ye, hinek behsa zaroktiyê dikin, hin dibêjin hê bi çar lepikan diçe, hinên din tena-tena dibêjin, hinek jî êdî zarok hesab nabe, zarokî di temen û di aliyê biyolojîk de tê zanîn kêma zêde, belê dema rewşa romanê bi îfade û tesbîtên li jor tê diyarkirin mebest çi ye, hûn çi dibêjin, çawa dibînin, romana me di rewşa kîjan kategoriye ji van kategoriyan de ye û kîjan li rastiye nêzik e?

Perwîz Cihanî: Bi giştî wek diyardeyekê romana kurdî heye û eve demeke xurt e ku roman bi vî zimanî hatine nivîsînê. Lê gotinek heye, ku dibêjin: bihîster axêverî dihîne coşê. Yek ji kêmasîyên romana kurdî nebûna xwênerên wê û nebûna bazara wê û nebûna rexnegirên wê yên bêalî ye. Eger em bi vê berçavkê dîna xwe bidin romana kurdî, belê ew taze çarlepîkan bi rê ketîye û gelek caran jî dilikume. Lê eger em li bara mêjûyî, li bara tewn û dariştina romanê li romana kurdî digel hemû kêmasîyên wê mêze bikin, erê romana me nêzikî bi sedsalîyê kirîye û nêzîke bibe çiqek bitew ji çiqên dara toreya kurdî.

Rukiye OZMEN: Di nav romanên cîhanê de tu hez ji kîjan romannivîsan zêdetir dikî, ji bo kesekî romanxwîn û evînderê roman çend nav wê ne hesan be, belê herî zêde û di nav yên kurdî de?

Perwîz Cihanî: Bersiva vê pirsê te pir dijwar e. Hem pir diware ku mirov li nav wê deriyaya romanê de çend liban gulbijêr bike û hem jî ez naxwazim serbestîya helbijartinê ji xwêneran bistînim. Bihêla bila xwêner bixwe romana xwe ya here bijare, ji nava romanê de helbijêrin. Li kovar û rojnameyên toreyî de, gelek caran li ser romanên bi nav û bang yên cîhanê agadarî têne dan. Lê zewq û selîqeya mirovan nabe yek. Herkes xudenê zewqek taybet e. Diqewime ew romana ku ji bo min balkêş be, ji kes yan kesanên dî ra hind balkêş nebe. Yek jî çunku kes nikare

wan hemû romanên heyî bixûne, anîna navên çend romanên ku bala min kişandiye, dê bibe sitem ji romanên dî ra, yên ku min nexwendine.

Li nav romanên kurdî de jî, muxabin li ber rewşa heyî li nav nivîskarên me de, mirov nikare romanekê wek nimûne bide dîyar kirinê, çunku li wê demê de debê mirov xwe ji şer û neyartîya yên dî ra amade bike. Lê gotinek me kurdan heye, em dibêjin, “*kurd zindîkujên mirdîperest in*.” Ez jî kurd im, bihêle ez bêjim, li nav romanên kurmacî yên ku min xwendine de, Dimdim ya Erebe Şemo li hemû baran de li ser hemû Romanên kurdî ra ye.

Rukiye OZMEN: *Werger çendî ziman, stîl û formûlasyonêan bi pêş dixê?*

Perwîz Cihanî: Werger li hemû baran de alîkarîya pêşdebirin û zengînkirina zimanî dike. Lê bi wî mercî ku wergêr bi herdu zimanan jî baş bizanibe. Kesek dikare îdia bike ku zimanekî dizane, ku agaderîya wî/ê li hemû baran de li ser wî zimanî hebe û li ser îdyom û gotinên pêşîya û biwîjên toreyî yên wî zimanî de zal be. Zanîna zimanî tenê peyv û rêziman nîne. Muxabin mirov vê kêmasîyê li pişka zore wergerên kurmacî de dibîne. Bi dîtina min Zimanê Kurdî ji nivîsînê zêdetir hewcedarê wergerê ye. Xwezî kes yan kesane hebana, ku berhemên **Şoloxof, Tolostoy, Destayoviskî, Balzak, Romian Ronald, Gabriel Garsîya Marks, Kafka, Necîb Mehîfûz, Yaşar kemal, Sadiqê Hidayet**, û yên dî, ji zimanê makê wergerandana ser Zimanê Kurdî.

Rukiye OZMEN: *Romanên hatine wergerandin çendî serketî ne, Zimanê Kurdî çendî di bin barê wergerê de radibe?*

Perwîz Cihanî: Muxabin hejmarek pir kêm pirtûk ji zimanên bîhanî bi kurdî hatine wergerandinê. Ewên ku hatine wergerandinê jî, wergera wan pir lawaz û têkelpêkel e. Pişka here zore wergêrên ku min berhemên wan yên wergerandî xwendine, kurdî ne tenê zimanê wan yê perwerdê nebûye, lê kurdî zimanê wan yê yekem jî nîne. Ewan pêş de zimanekî dî hîm bûne, li dû ra kurdî ne ku li xwendixane yan zanistgehan de xwendine, belkû virde wêde hîm bûne. Ca ev cure wergêrana nikarin li bin barê girane wergerê da derkevin û karê wan jî nikare bandor û kartêkirineke baş li ser afirandina berhemên bilind bike.

Di wan wergeran de can û kakilê Zimanê Kurdî pir lawaz û çewtomewto ye. Di wan wergerana de gewhera Zimanê Kurdî nehatîye parastinê. Mirov dibîne ku ew wergêrên me yên rêzder, ne tewanka zimanê me nas dikin, ne haya wan ji ergatîva kurmacî heye. Û gelek caran mirov dibîne ku herdu desteyên cînavên kurmacî jî ji hevdu dernaxin. Hê em li ser

îdyomên zimanî, biwêjên toreyî, bikarbirina ciwankariyên toreyî û zimanê toreyî naaxivin. Ew bila pêşkêşî wan be.

Zimanê Kurdî yek ji zimanê herî zengîn yê rojhelata navîn e. Ne ku ez kurd im, ez wê hindê dibêjim, na. Ez ewê hindê bêy demargirî dibêjim û dikarim bi rê û destûrên zanistî ewê yekê binecî bikim. Zimanê kurmançî gelekî ji zimanê turkî û farsî zengîntir e. Di kurmançî de, di rêziman û peyv sazîya wî de hêzek heye, ku mirov dikare bi arîkarîya pirtikên (afixên) zimanî û rîşala navan û lêkeran bi dehan peyvên destûr helgir biafirîne. Lê muxabin em û zimanê me, bêxudan û bêpiştevan in. Zimanê erebî ku eva çarde sede ye bûye zimanê dîwanî û dînî yê cîhana îslamê û bi sedan peyv ji sedan zimanên dî vergirtîye û li nav xwe de pişaftîye, û kurmançî ya ku ta roja îro jî nebûye zimanê dîwanî û zimanê perwerdeyê, dikare pê li pêyê wî ziman bide û ez dikarim bi dilnîyayî bêjim, eger kurmançî ji erebî zengîntir nebe, qet ji wî lawaztir nîne. Eger bi şêweyek zanistî li ser vî zimanî xebat bêne kirnê, ev zimana dikare bibe yek ji zimanên here zengîne cîhanê.

„Lê çi bikim ku qewî kesade bazar, nînin ji qumaşî ra xerîder

Kurmanç ne pîr di bê kemalîn, emm di yetîm û bê mecalîn

Fîlcumle ne cahil û nezanîn, belkî di sêfil û bêxudenin“

“Xanî”

Rukiye OZMEN: Werger çiqasî cewhera berhema ku tê wergerandin diparezê?

Perwîz Cihanî: Çend cur û çeşnên wergerê hene. Ji wan wergerandina peyv bi peyv, û ya serbest. Wergerandina peyv bi peyv karê wan kesan e, yên ku tazekarin û kêmasîyên wan li herdu zimanan de, zimanê mak û zimanê wergerê de heye. Lê eger wergêr li ser herdu zimanan de zal be. Têra xwe haya wî/ê ji biwêjên toreyî yên herdu zimanan, gotinên pêşînan, îdyom û hevokên toreyî, toreyaya gelîrî û toreyaya nivîskî ya herdu zimanan hebe, wergera serbest serketîtir e. Durust e, kêma wergeranek dikare tam û mirç û çêja xwe ya binêşeyî bide, lê wergerandina romanê ne wekî ya helbestê ye. Çawa ku min got, eger wergêr bi hemû reh û pehên zimanî, li ser herdu zimanan de zal be, dikare kakilê babetê biparêze û babetek sedî sed wek binêşe jî nebe, sedî nod û neh wek xwe raberî xwêneran bibe.

Rukiye OZMEN: Hûn bi xwe hez ji kîjan celebê romanên dîkin, nivîskarekî romanên bêşik hez kirina wî wê fireh be, wê bi kategorî û çend kategoriyan ne sînorkirî be, belê cardî jî meyla mirov

zêdetir bi ser hinan e, hûn xwe di kîjan kategoriyê de dibînin, nêzîkî kîjanê ye ji wan in?

Perwîz Cihanî: Wekî hûn jî dibêjin dijwar e, mirov tenê çiqekê ji çiqên romanê wek romana balkêş helbijêre. Lê dîsan jî zortir meyla min li ser romanên populism û mêjûyî de ye. Bêgotin romana ku romantîk û evînek jî tê de nebe, kêşîşa wê kêm e.

Rukiye OZMEN: *Roman rolekî çewa ji bo civakê dileyîze?*

Perwîz Cihanî: Civakek pirtûkxwan, bêgotin li serdema me de û ew jî ji neteweyek wek netewa kurd ra, xewnek e. Bêguman xwendin bi her awayî û li her êwirgehê û her celebê de kartêkirinek mezin li ser komelê dike. Roman jî wek dîtir pişkên toreyê qenc û xirabên wê hene. Bi her cureyî xwendina romanê civakê hişiyar û agader dike. Di romanê de mirov rastî gelek hevraz û nişîvên jîyanê tê, ku diqewime mirov ew hevraz û nişîvî li jîyana rojane de neazimandibe. Roman dikare karî li ser çawayîya bîrkinê, çawayîya jîyanê bike. Romana ku bi hostatî hatibe afirandinê, dikare hest û hizrên xwênrên xwe biguhore û rêyek nû bide ber.

Rukiye OZMEN: *Hayê we çendî ji romanên perçe û zaravayên din yên kurdan heye?*

Perwîz Cihanî: Vê gavê li nav şeş zaryveyên Zimanê Kurdî de, tenê bi du zaraveyan roman hatine nivîsîn û tene nivîsînê. Eger bi zaraveyên dî hatibin nivîsîn jî, bêguman taze dest pê bûye û haya min jê nine. Lê bi zaraveyê soranî yekimîn carê Îbrahîm Ehmed Romana “Janî gel” ne li ser gelê kurd, lê li ser gelê Elcezayirê nivîsî. Ew yekimîn romana Soranî bû. Li dû wî ra gelek kesan romanên baş bi zaraveyê soranî nivîsîne, ku hanîna navê wan hemû romannivîsan dê bibe hegera dirêjdadirîyê. Lê tiştê ku pêdivîye bête gotin, ewe ku, soranîyan berî nivîsîna romanê dest bi wergera wê kirin. Bo nimûne xudêlêxweşbûyî Şukur Mustefa bi dehan roman ji kurmançî û dîtir zimanan wergerande ser zaravê soranî û bi wan wergeran dergehekî nû li ser zaravê soranî vekir.

Rukiye OZMEN: *Demek dirêj di ser berhemafrîniya romanê re derbasbûye, roman jî form û hûnandina xwe bide me re diguhere gelo?*

Perwîz Cihanî: Bêgotin her berhem û babetek toreyî bi bihorîna sal û deman ra form û şeweya xwe diguherr. Gava ku mirov li yekimîn romanê (Don kîşot) ê dinihêre û ewê digel romanên vê serdemê yên realîstên cadûyî dide ber hev, mirov dibîne ku roman çend hatîye guhortinê û çend bi pêş de çûye. Tinga (şeneya) romanê ya hînga, îro bûye derek bi hejal û pejal, ku bi dehan û sedan çiq û pelg jê çê bûne.

Rukiye OZMEN: Xelatata Nobel û dîroka destpêkirina wê gelekî ji dîroka romana kurdî kevintir e. Ji romannivîsên gelên herêma Rojhilata Navîn Necîb Mehfûzê Misrî, Orhan Pamûkê Tirk xelat girtin, rojê xelatgirtin bibe dora me jî mikun e, pêşbîniyên we, fantazyên we

Perwîz Cîhanî: Berî her tiştî pêdivîye bêjim, wekî hemû xwêner jî dizanin, roja îro xelata Nobelê zortir ketîye jêr sîbera seyasetê. Belkû jî ew kesên ku xelata nûbelê werdigirin ne hêjayî wê xelatê bin, belkû kes yan kesaneke hebin, ku berhemên wan ji yê xelatgiran bilindtir bin, lê kar û barên siyasî û saxt û paxtên seyasetmederan gelek tiştan diguherin. Gelek caran zor hemû qebalan betal dike. Bo nimûne Yaşar Kemal ji bona nivîsîna Memedê Zirav berendamekî vegirtina xelatê bû, lê kar û barên ramîyarî ew maf ji wî istandin.

Çima ku na? Tiştê nebûye nine. Rojê ku ne dûr e, berhemên me jî dê bigehin wê astê. Rojê emê jî bibin xudenê wî mafî û hemû mafên mirovanî yê dî. Lê berî her tiştî avakirina dewletek serbixwe ji me ra jî hemû tiştî, ji nan û avê jî pêdivîtir e. Yanê xelata me jî bi hebûn û nebûna dewleta me ve girêdayê ye.

Rukiye Ozmen: Pirsên me ev in. Zor sipas!

Perwîz Cîhanî: Spas xweş!

Hevpeyvîn bi Tengezar Marînî re

Hevpeyvîn: Rukiye Ozmen

Rukiye Ozmen: *Di dîroka romanê de qonax hene ku bi „îzmên“ corecor têne binavkirin û ev qonax ji destpêka xwe ber bi îro de bi hezaran roman di himbêza xwe de digre, ji vî cîhê derengmayî awantaj û dezawantajên me, şens û bêşensiya me, îro mirov rehet dikare xwe bighîne wan?*

Tengezar Marînî: Qonaxên ku roman tê re derbas bûne, ji xwe piraniya nivîskarên me, yên romanivîs dinasin û pêdiviyê binasin. Şêwe avakirin, hûner û konseptên romanê jî pêdiviyê binasin. Rast e me kurdan bi zimanê xwe nexwendiyê, lê em bi zimanên çî serdest û çî zimanên rojavayî serwestê edebiyatê bûne. Ev jî tê wê wateyê, ku qonaxên têne behskirin, pêdiviyê nivîskarên kurd gelekî li ser ranewestin û berê xwe bidin ciwanî û hûnera romanê ya ku dikare asoyan li ber vî zimanê qedexekirî û parçekirî veke.

Rukiye Ozmen: *Ji bo romaneke baş û serketî bê ku em bêjin dîrokî, psîkolojîk yan jî bi coreyekî din, postmodern, çend pîvanên ferz binav bikin?*

Tengezar Marînî: Ji bo romaneke serketî —çi şêweyê romanê be— dive, dîrokî, simbolîk, derûnî, kultûrî tbd. Pêdivî bi zimanekî rewan, bihêz, aso li ber vekirî heye. Ji bilî wê jî, pêdivî ye, di konseptên nivîsa romanê de, yekanebûn biçûk û mezin bûnê pîlankirin, leheng û kesayetî, dem û cih, marîfet û şêweyê hûnandinê, û bikaranîna teknîkê bête berçavkirin û tevîr bo wan bûnê girtin, beriya dest bi nivîsa romanê bibe. Bêguman, eger dîrokî be, divê belgeyên dema romanê de dibe, bûnê peydakirin. Bo nimûne (Orhan Pamuk û romana Berf)

Rukiye Ozmen: *Romana kurdî jî û çîroka kurdî herdû jî dereng ketine, sedemên dernegmayînê û heman pirs ji awurike bervaja û belkî hevdû temamkir, roman çawa bi pêş dikeve?*

Tengezar Marîni: Pexşan bi giştî, çîrok û roman bi taybetî pêdivî rewşeke stabil û aram e, pêdivî rewşeke, ku derfet bo pêşkeftina zimên vekirî bin. Em dizanin, zimanê me, nasnameya me û kultûra me bi giştî ta demeke nêzîk qedexe bû. Di van çend sal ên dawî de, hinek derfet peyda bûne, em dibînin, roman û pexşana kurdî di geşebûnê de ye. Sedemeke din jî heye, ku nivîsîna kurdî—berê bi 3 tîpên/niha 2 tîpên cuda—kartêkirineke neyêne li rewşa nivîsîna romanê û çîrokê kiriye. Ji xwe em dizanin, dema şer, ceng, ne azadî, û ne aramî li devereke hebe, tenê helbest rola xwe dikare bilîze û dibe alavekî xwederbirînê. Ew helbest jî bo guhan tête nivîsîn, daku zû rola xwe bibîne û bête ezberkirin.

Rukiye Ozmen: *Dema ku berhemek tê weşandin carna nîqaşa ew berhema çîroke an jî romane tê kirin cudahiya romanê ji çîrokê çiyê?*

Tengezar Marîni: Çîroka kurt xwe nêzîkî romanê dike, karekî wêjeyî pexşan e, ji çend rûpelan pêk têt. Kesayetî û lehengên wê hindik in. Buyer jî di demeke kurt de ye, dikare flaş be, an jî ji nişka ve bêt. Ev curewêje kevintirîn cure ye ji şêwazên wêjeyî, ku 3000 salan berya zayînê mîna çîrokên faronan û an jî yên Vîdan „hezar û yekşev“. Lê çîroka dirêj jî heye, ku ew jî buyerê e, lehengên wê jî kêr in û di tevna xwe de, bi vebêjerekî ve girêdayî ye.

Roman, berhemkî encama bajarvaniyê ye, wate keça bajêr e. Berhemkî pexşanî dirêj e. Ev curewêje, xwedî hêzeke mezin e, bo vekêşana xwendevanî bi ser xwe de. Roman, gelek çîrokan hêmbêz dike û bi şêweyên cuda wan vedibêje. Nivîserê Romanê di rêya lehengên xwe re, babetên hizrî di giriftarên civakî, felesefî, zanistî, rewîşt û sincî de pêşkêş dike, bi mebesta guherînan di wan waran de. Roman ên xeyalî, bo çêj û xweşiyê jî hene. Romanên realîte hêza xwe berdidin li ser bikaranîna kesayetiyên heyî wek xwe, buyerên heyî dokumente dikin. Romanên derûnî bala xwe berdidin li ser raman û hestên lehengên xwe. Çend sîma û xesletên romanê hene, ku wê ji zayendên toreyê yên din cuda dike.

1. Şêwazekî toreyî vebêjeyî ye.
2. Dirêj e, ji 50rûpelî dest pêdike. Dema wê dirêjtir ji ya çîrokê ye û kesayetî û lehengên wê pirtir in.
3. Zimanekî pexşaneyî ye.

4. Pala xwe dide xeyalê, li vir jî ji dîrokê û jînengeriyê cuda dibe. Roman dikare dîrokî an jî jînengerî be, lê şeweyê vebêjanê cuda ye.

Rukiye Ozmen: *Pêwendiya roman û destanê li ser çi astê ye?*

Tengezar Marîni: Romana nû dikare hemî coreyên toreyê himbêz bike û destan jî di nav de, lê xisletên romanê jiyawaz in ji wan zayendên din. Şeweyê avakirina romanê ku pexşaneyî ye, cuda ye ji şeweyê destana ku helbestî ye. di cih û demê de jî û di naverokê de jî, roman dikare zewiyên berferêh bide berxwe. Romana dîrokî dikare dema Destanê, an jî lehengê destanê bike bingeş û naverok, lê pêdivî ye, li wan belegeyan bigere, ku derfêhê pirsan, an jî şiroveyan li ser demek an jî warekî veke.

Rukiye Ozmen: *Rewşa romana kurdî, heger mirov di qonaxan de binav bike çi ne ev qonax?*

Tengezar Marîni: Çi qonax be, negiring e, lê çawa tête avakirin û nivîsandin û dikare çi rolê bibîne giring e. Raste, ku nivîsîna romanê li def me kurdan nû ye, lê şeweyên cuda hatine nivîsîn. Piraniya romanên kurdî, balê dikşînin, li ser rewşa millet û gelê kurd di cih û dema tê de. Gelek romanên ku hatine nivîsîn jî, an li ser jiyana gundiyan, jiyana pêşmerge û têkoşeran û li ser jiyana kurdan ya penaberiyê. Nizanim, gelo dê rast be, eger em behsê qonaxan bo romana kurdî bikin! Lê ez dibêjim, Romana kurdî şopa xwe hêdî hêdî çêdike. Wate Romana kurdî ji zarokatiya xwe derbas bûye.

Rukiye Ozmen: *Dema gotin li ser romana kurdî ye, hinek behsa zaroktiyê dikin, hin dibêjin hê bi çar lepikan diçe, hinên din tena-tena dibêjin, hinek jî êdî zarok hesab nabe, zarokti di temen û di aliyê biyolojîk de tê zanîn kêma zêde belê dema rewşa romanê bi îfade û tesbîtên li jor tê diyarkirin mebest çi ye, hûn çi dibêjin, çawa dibînin, romana me di rewşa kîjan kategoriyê ji van kategorîyan de ye û kîjan li rastiye nêzîk e?*

Tengezar Marîni: Di bersiva 7an de, destnîşan bûye, ka romana kurdî di çi qonaxê de ye, lê kategorîdanîn bo romana kurdî hîn zû ye. tenê dizanim, ku gelek ji wan nivîskaran, yê bi nivîsîna romanê ve mijûl in (M. Özun, Hesenê Metê, Helîm Yûsiv, I. Seydo Aydogan, Dilawer Zerraq, Sidqî Hirorî, Omer Dilsoz, Tehsîn Tavşkî û ..) serwextê romanê ne û pêzanînen wan jî hene. Eve bo min ya giring e, dema hostayê karekî ji karê xwe fehêm bike.

Rukiye Ozmen: *Di nav romanên cîhanê de tu hez ji kîjan roman-nivîsan zêdetir dikî, ji bo kesekî romanxwên û evîndarê romanan çend nav wê ne hesan be, belê herî zêde û di nav yên kurdî de?*

Tengezar Marîni: G.G. Marquez, Borxês, Heinrich Böll, Herta Müller, Pamuk, Yaşar Kemal, Hoşeng Gulşîrî, dariusz Morsza, Marcel Proust, Selîm Berekat, Seher Xelîfa, Selman Ruşdî, AlTaib Salih, Bin Celûn, M. Şukrî, Edwara Alxerat, Heyder Heyder. Û ji ber ku kurd jî li vê cîhanê ne, yên Kurd, Hesenê Metê, Bextiyar Elî, Helîm Yûsiv, Ibrahîm Seydo Aydoğan.

Rukiye Ozmen: *Werger çendî ziman, stîl û formûlasyonêan bi pêş dixê?*

Tengezar Marîni: Bi wergerê mirov kêmasî û hêza zimanê xwe yê zikmakî dinase, ji bilî wê jî pêzanîn û serpêhatî yên nivîseran pirtir dîkin. Werger pira di navbera çand û kultûran de ye. Bi wergerê şewazê pêra-man û pêzanînen xwendevanî pir û dewlemend dibin.

Rukiye Ozmen: *Romanên hatine wergerandin çendî serketî ne, Zimanê Kurdî çendî di bin barê wergerê de radibe?*

Tengezar Marîni: Em hemî dizanin, ku romanên hatin wergerandin kêman in, ji bo serketin û neserketina wan jî hîn zû ye. Lê ez vê bê şek û şubhet dibêjim, Zimanê Kurdî têra wergerê dikê, çunkî zimanekî nerim û guherbar û dewlemend e. Bo nimûne, romana navê Min Sor e, ya Orhan Pamuk, ku rêzdar Mustafa Aydoğan wergerandiye, çêja kurdîniyê jê tê û mirov dikare bêtirs bibêje, ku wergervan di wergerê de bi ser ketiye û Zimanê Kurdî jî rewan û bi qalîteyeke toreyî bilind bi kar hatiye.

Rukiye Ozmen: *Werger çiqasî cewhera berhema ku tê wergerandin diparezê?*

Tengezar Marîni: Eger werger cewhera berhem neparêze, ji xwe newerger e. Pêdivî ye, ku em bibêjin, wergerandin, nivîsandineke nû ye. Pêdivî ye, di berhemên edebiyatê de, cewher, metod û çêja berhema bingehîn (orîgînal), neyête guhertin, lê hevok û idiomên civakî dikarin bibin, yên zimanê armanc.

Rukiye Ozmen: *Tu bi xwe hez ji kîjan celebê romanên dikî?*

Tengezar Marîni: Ez bi xwe hez ji wê romanê dikim, ku hêzê berde li ser ziman û bi ziman vebêjî û babetên xwe berbi asoyên nû ve bibe. Wate, ez nebendewarê romaneke bi babeteke giring im, belê ez bendewarê romaneke me, ku ziman babetê giring bike û neberovajî.

Rukiye Ozmen: *Roman roleke çawa ji bo civakê dileyîze?*

Tengezar Marîni: Di demên Kevin de, romanê kartêkirineke mezin, li civatê dikir. Bo nimûne, dema Goethe romana xwe “azariyên Werter yê genc= Leiden des jungen Werthers” nivîsî, gelek xort û keçên nûgihayî xwe kuştin û bû diyardeyek û derûnnasan dest bi gera li sedemê bûn. Romana Selman Ruşdî, ya bi nave Ayetên şeytanî” hişt û ku cîhana older û ya ya sermiyandar li bin guhê hev bikev in. Ew civaka older û rojhilatî, bi emotion e û hiş bi kar naîne û civaka sermiyandar, ruh li def nemaye û civakeke li ber buhujînê ye. Lê bo me, berya hertiştî, bo me kurdan, rola romanê bo zimên giring e û dema zimanê me dewlend bibe, hişmediya kurdan bi kurdî mezin û dewlemend dibe, êdî kesayetî û nasnameya kurd bi hêz dibe. Dema ev peyda bibe, civateke saxlem ava dibe û dema civat saxlem be, dikare xalên bihêz û yê qels di xwe de (wek takekes û komel) binase. Civata xwe binase, dikare rêzê li xwe û li ya din bigre. xwe û yêdinnasîn pêşveçûnê bi xwe re tîne.

Rukiye Ozmen: *Hayê we çendî ji romanên perçe û zaravayên din yê kurdan heye?*

Tengezar Marîni: Ez li gor hêza xwe berhemên kurdî yê deverên cuda bi dest dixim û ta radeyekê –nabêjim gelek-, lê nexerab min agahî li ser berhemên toreyî yê bi zaraveyê kurmanciya xwar(soranî) hene

Rukiye Ozmen: *Demek dirêj di ser berhemaafirîniya romanê re derbasbûye, roman jî form û hûnandina xwe bidemê re diguhere gelo?*

Tengezar Marîni: Eger nivîskar nikaribe xwe digel pêşkeftinên cîhanî bihûncîne û serwest bike, dê nikaribe afirandineke baş û serketî bike. Bêguman romana kurdî şeweyê xwe guhertiye, eger em li gundê Dono, Hêlîn, Yê perîşan û berî wan şivanê Kurd temaşe bikin û yê Nû, mîna, Bîra Qederê, Gava masî tî dibin, Leyla Fîgaro û Tofan bînerin, dê baş bo me diyar bibe, ka çawa Romana kurdî qonax derbas kirine.

Rukiye Ozmen: *Xelata Nobel û dîroka destpêkirina wê gelekî ji dîroka romana kurdî kevintir e. ji romannivîsên gelên herêma Rojhilata Navîn Necîb Mehfûz ê Misrî, Orhan Pamûk ê Tirk xelat wergirtin, rojekê xelatgirtin bibe dora me jî? mikun e? pêşbîniyên we, fantazyên we?*

Tengezar Marîni: Ez nizanîm, ka dê Xelata Nobêl mercên wê bîne guhertin an na?, Lê Kurd jî divê jiyanê û wê meydanê de ne. Belkî kêmasiya me, ku bizava wergerê kême û cîhanê gelek agahî li ser toreya me nîn e. Me kurdan jî çu startîjî bo pêşvebirina toraya xwe nîne, ji bilî

wê jî me bi project û konsept kar nekiriye, daku em bikaribin toreya xwe bi cîhana derve bidin naskirin û xwendin. Eger derfet bibe û merc baştir bibin, bo çî wê nivîserê kurd xelat ên edebiyatê wernegerin?

Rukiye Ozmen: *Pirsên me ev bûn, zor spas!*

Tengezar Marîni: Spas xweş!

Lokman Polat

GOTAR

HÊVIYA ÇEKDAREKÎ BIRÎNDAR

Romana kurdî her diçe bi hejmar zêde dibe û bi naverok dewlemend dibe. Ev pêşveçûn keyfa min tîne. Dema ez dibînim li romannivîserên kurd yekî din jî zêde bûye, ez zûbizû romana wî romannivîserê kurd diki-
rim û dixwînim. Li bakurê Kurdistanê hêj yek romannivîsera jin tune, ev jî ji bo min xemgîniyeke û herweha ji bo edebiyata kurdî kêmaniyeke. Bi hêviya ku roj were xwendevanên kurd romanên kurdî yên romannivî-
serên jin jî bixwînin.

Romannivîserê nû Hesên Huseyin Denîz bi romana xwe ya bi navê "Hêvî her dem heye" ket nav refên romannivîserên kurd. Dema min navê Hesên Huseyin Denîz li ser romana kurdî "Hêvî her dem heye" dît, rojnamevanê kurd ku her tim bi kurdî dinivîsî û navê wî Huseyin Denîz bû hate bîra min. Di salên nodî de Huseyin Denîz di rojnama "Welat" de tim bi kurdî dinivîsand. Di wan salan de kuştinên qesasên nediyar (lê ji alî kurdan ve diyar bû) gelek pêk dihat. Bi sedan kurdên welatparêz, rewşenbîr, siya-
sedmedar, rojnamevan, nivîskar, bazirgan û hwd bi destê hêzên dewleta kûr –herwekî "tît", "jîtem", "ergenekon", "xizbûllah" û yd) ve hatine kuştin. Rojnamevanê kurd Huseyin Denîz jî bi şêweya qesasê nediyar hate kuştin. Ew şehîd ket, lê navê wî û nivîsên wî dijî.

Hesên Huseyin Denîz birayê wî ye û ew jî bo navê wî bide jiyandin vî navî li xwe daniye? Baş kiriye. Xwezî kurtejiyana anku jînegeriya ro-
mannivîser Hesên Huseyin Denîz di pirtûkê de hebana. Weşanxaneyên kurdan hêj jî bi şêweyeke amatorî û bêzanîna pîvanên weşangeriyê û bê-
zanîna karê bazirganiyê, bazirganiya weşangeriyê dikin. Dema weşan-
xaneyeye kurdî pirtûkeka nivîskarekî kurd a yekem diweşîne, divê kurte-
jiyana nivîskar jî li pêş yan li paşîya pirtûkê, yan jî weke ku xelkên din
dikin li paşîya berga pirtûkê biweşîne. Divê di pirtûka yekem a
nivîskarekî de kurtejiyana nivîskar û wêneya wî/wê hebe.

Min di nivîseke xwe yê derbarê romanê de gotibû nivîskarên kurd yên
romannivîser gelek in, lê yên ku rêzeroman dinivîsin hindik in. Wek hej-

mar rêzeromanên kurdî jî hindik in. Romana nivîskarê kurd Hesen Huseyin Denîz weke rêzeromanê ye. Ew dê çend cîld be nediya. Di dawiya romanê de hatiye nivîsîn "dawiya berga yekem". Yanî ew dawiya cîlda yekem e û berdewama wê heye. Weşanxanê yan jî nivîskar di şûna cîld de peyva berg bi kar aniye. Yanî di şûna ku bibêje "cîlda yekem" yan jî "pirtûka yekem" gotiye "berga yekem". Berg navê kapaxa pirtûkê ye, lêbelê diyare dibe ku li şûna cîld jî bê bikaranîn.

Navê romanê jî navekî balkêş e. Ev pirtûk romane, ceribandî –deneme – yan jî vegotin – anlatî – nîne. Herweha gotarên siyasî jî nîne. Navê "Hêvî herdem heye" ji bo pirtûkeka ceribandî, gotarên siyasî, vegotinên rojane û bîranînê navekî baş e, lê ji bo romaneke edebî ev nav lê naqunce. Xwezî navê vê romanê weke sernavê vê nivîsa min bana. Yanî navî "hêviya birîndarekî çekdar" yan jî "hêviya çekdarekî birîndar" bana. Ji xwe naveroka romanê û bûyera ku di romanê de tê ravekirin li vî navî diqunce.

Beriya ku ez behsa naveroka romanê bikim û romanê bi xwendevanên kurd bidime nasîn, ez dixwazim bi çend gotinên gelemperî bala xwendevanan bikişînim ser şerê çekdarî ku ev bîst û pênc, sî salin bi şeweya şerê gerîllatîyê û bi metoda çalakiyên partîzanî tê meşandin. Ev şerê çekdarên – gerîllayên – kurd ku 25, 30 sal in bi hezar zor û zahmetiyan dimeşe û heta niha hatiye domandin. Şer hêj jî didome û diyare heta ku pîrsgirêka doza netewî a kurd çareser nebe dê şer her berdewam be.

Çekdarên – gerîllayên – kurd canfîdan e, fedekar in, xwedî bîrûbawerî ne û vîneke wan a bêpayan heye ku ewqas sal li serê çîyan, di jiyaneke zor û zahmet de, tî û birçî, di sar û sermayê de dijîn û li gor îمكانên xwe çalakiyên leşkerî pêk tînin. Yekî ku canê xwe dayne holê û mirina xwe bide berçav û biçe qada şer û di nav şer û têkoşînê de cihê xwe bigre, ji wî/wê fedekartir tune. Ew, anku çekdar digel min û digel gelê kurd bi qîmet û rûmet in.

Niha ezê behsa naveroka romana nivîskarê kurd Hesen Huseyin Denîz ya ku navê "Hêvî her dem heye" bikim. Her însan nikare bibe gerîlla. Gerîllatî pir zor e, zahmet e, karê herkesî nîne. Wek min berê jî gotibû, fedekarê herî mezin kesên ku bûne gerîlla û li çîyan dijîn û şerê çekdariyê dimeşînin û herweha jiyana herî zor dijîn. Mirin hergav li pêşberê wan e. Însanê ku mirina xwe bide ber çavên xwe û bibe canfîda, ji vî fedekartir tişteke din tune. Kesên ku bi rîza dilê xwe, ji bo bîr û baweriya xwe, ji bo azadiya gel û rizgariya welatê xwe jiyana xwe dayne holê, bibe çekdar /pêşmerge, gerîlla-, mirinê bidin ber çavên xwe û bibine canfîdayê doza gel û welatê xwe, ew kesên bi qîmet û rûmet in û divê hurmeta herkesî,

ya tevahiya gel ji wan re hebe. Gelê kurd li bawermendên fedekar, canfîda anku li çekdaran xwedî derdikeve, piştgiriya wan dike.

Min hinek pirtûkên bîranîn û serpêhatiyên çekdaran – gerîllan – xwend û min hem li ewropayê û hem li başurê Kurdistanê hinek gaziyan kurd –ku di şerê çekdarî de birîndar bûbûn – dît. Min bi çekdarên kurd ku li çiyên di şerê gerîllatîyê de birîndar bûbûn re xeber da, ez bi wan re axifîm. Wan behsa jiyana li çiyên û behsa birîndarbûna xwe kirin. Jiyana heryek çekdarek dikare bibe romanek.

Di qalkirina wan gaziyan kurd de tişteke din ku bala min kişand ev bû ku; dema ew birîndar bûne, bi halê xwe î birîndar gelek zahmetî kişandine, di berxwede dane, bi rojan tî û birçî mane û weke mucîzewî xilas bûne. Bîrûbawerî, vîn û îradeyeke ewqas qihîm bi mirov re tunebe, mirov nikare ewqas diberxwede bide. Çekdarekî birîndar digot ”Ez birîndar bum, sê roj li ser piştê di nav cuwek –cuwa avê – de li erdê mam. Piştî heft rojan hêj hevalan ez dîtîm û ez xilas bum. Di wan heft rojan de zor û zahmetiya ku min dît, tî û birçîbûnî, tîrsa girtinê û mirinê û jiyandin wisa hêsan nebû.”

Romana Hesên Huseyin Denîz jî bi ravekirina gerîllayekî birîndar dest pê dike. Di navbera leşkerên ordiya tirk a dagirker û çekdarên kurd de şer derdikeve. Lehengê romanê birîndar dibe. Ew ji alî helîkopterên kobra ve tê birîndar kirin. Gelek çekdar jî tene kuştin. Ji bo ku ew ji lingê xwe birîndar bûye, li erdê ye û nikare rê biçe. Ew du roj li erdê tî û birçî dimîne. Başê ku li erdê berf heye û ew berfê dixwe. Yê birîndar cixarekêşe, lê paşê tituna wî diqede. Birîna wî nêem digre. Ew birîna xwe – ku gelek diêşe – paqij dike û dipêçe, birînê girê dide.

Lehengê romanê bi halê xwe î birîndar li benda hevalên xwe ye ku bêne û wî bibine. Lê hevalên wî nayên. Xewa wî tê, ew dibe xilmaşê xewê. Hinek radize, xewn dibîne. Dîsa şiyar dibe. Xewn û xeyal dibine misaletê wî. Dilê wî diçe cixare kişandinê, lê titun, cixare tune. Birçîbûnê jî bandora xwe daniye ser. Ev şev jî wexta wî bi xewn û xeyalan derbas dibe.

Piştî sê rojan du hevalên wî yê çekdar di wir de derbas dibin, wî dibînin. Lê, ji bo ku cihê ew li wire asê ye, nikarin wî ji wir derxin. Ew wî li wir dihêlin û jê re dibêjin”em î di vegerê de bi gelek hevalan re bên û te ji wir derxin û bibin.”

Lehengê romanê î birîndar dîsa li erdê, li ser piştê, tî û birçî ye. Bi herdu hevalên wî re nan û cixare tunebû ku bidinê. Ew bê nan û bê cixare li wir di nav xewn û xeyalên xwe de dimîne.

Naveroka vê romanê bi tevahî li derdora î birîndar derbas dibe. Ji xwe

roman ji xêra meraqa gelo gerîllayê birîndar dê çawa xilas bibe xwe dide xwendin. Roman di atmosfereke monoton de bi zahmetî tê xwendin. Romaneke sekane ye, herîkbar nîne û ravekirina wê pir giran dimeşe. Mirov nakşîne nav xwe û xwe bi mirov bi hêsanî nade xwendin. Ji xeynê meraqê tişteke din ê balkêş têde tune. Xewn û xeyalên ê birîndar tiştên virde wêde ne û bala mirov nakşîne, mirov bi romanê ve nade girêdan.

Roman di hêla taswîran de, di ravekirina cih û waran de, di qalkirina dar û beran de dewlemend e. Nivîskarê romanê di ravekirina taswîra xwezayê –natur, tabîat-, heywanên xwezayî, qalkirina kurm, dar û ber, devî û newal, birîn, xwîn, nêr û herweha taswîra gelek tiştan de biserketiye. Wî jî weke romannivîser Yaşar Kemal (nivîskarê zimanê tirkî ê kokkurd) taswîra tiştan gelek dirêj kiriye. Ji xwe diyare ku di hêla ravekirina taswîran de bandora Yaşar Kemal li ser heye. Wek mînak; taswîra ku birîn nêr digre, kurm dikeve birînê, paqijkirina wê û ji berfa mayî çawa kurm çêdibe, taswîreke gelek baş e û balkêş e.

Tişteke din ku bala mirov dikşîne û mirov bi vî halî diêşe, birîndarbûna li serê çiyar e. Dema li serê çiyar leşkerên ordiya tirk birîndar dibin, helîkopter tene wan hildigrin û dibine nexweşxaneyê. Dema ku çekdarên kurd li serê çiyar birîndar dibin, gelek êş û zahmetî dikşînin. Rêxistina hêza çekdaran ji ber bêmkanî, ji ber şert û şûtên zahmet, nikarin alîkariyekî lojîstîk pêk bînin. Çekdarên serê çiya bi rojan li çiyar tî û birçî dimînin, lêbelê ew xwedî bîrûbawerî û vîneke bêpayan in û lewre jî li serê çiyar wek şêran dijîn. Helbet her însan newekhev e û weke ku di romanê de tê qalkirin, hinek çekdar –gerîlla- ku nikarin di şertên zor û zahmet yê li çiyê de bijîn, direvin û diçine teslîmê hêza dijmin dibin.

Di romanê de lehengê romanê ê birîndar, gelek fîgur, dixtor –bijîjk- û gelek çekdar – gerîlla – û fermandarên gerîllan hene, lê navên wan tunin. Ev roman weke romana bînavan e. Di nav hêza çekdaran de lehengên bînav pirin. Lê, xwezî lehengekî bi nav jî hebana. Ez hêvîdar im ku di cîlda duyem de, êdî lehengên binav jî derkevin holê.

Bi xeyalî be jî, divê lehengên çekdar yê bi nav bêne afirandin. Hinek nivîskarên ku heta niha li ser çekdarên serhildêr –gerîlla- çend pirtûkên çîrok û roman nivîsîne, bi xeyalî be jî yek lehengekî bi nav –bi nav û deng – neafirandin. Heger wan weke Robîn û Vîyan – du lehengên rêze-romanên kurdî yê ku min nivîsiye û di van herdu romanên min ên bi navên ”Robîn” û ”Kod Nav Viyan” de serlehengin” – du lehengên çekdar bafirandana dê gelek balkêş bana.

Belê, romana bi navê ”Hêvî her dem heye” ya nivîskarê kurd Hesen Hu-

seyin Denîz bi birîndarbûna çekdarekî dest pê dike, çekdarê birîndar hêj nehatiye xilaskirin cîlda wê ya yekem diqede û hêj jî çekdarê birîndar li şûna xwe ye û li benda hevalên xwe ye ku bêne wî bibin.

Roman, romaneke ravekirina şer û têkoşîna çekdaran – gerîllan – e û rengê wê yê siyasî heye. Lêbelê di hêla siyasî, felsefî, metodên şerê çekdarî, ramanên îdeolojîk û polîtîkî û herweha ravekirina bûyerên sosyal civakî û jiyana gerîllatîyê ve romaneke qels e. (Ez hêvîdarim ku di cîlda duyem de qalsiya di van hêlan de ji holê bê rakirin û bi şêweyeke serketî bêne ravekirin.) Romanên siyasî, ramanî divê di hêla felsefî de xurt bin. Romanên şerê çekdariyê, têkoşîna gelêrî û xebatên rêxistinî û çalakiyên partîzanî divê bi hareket bin, tê de heyecan û macera hebe. Leheng û fîgurên romanên weha bî hareket bin, xwîngerm bin, di serê wan de macerayên curbecur derbas bibin, dê bi herikbariya xwe xwendevanan bikşînin nav xwe. Monotonî û gerîllatî bi hevûdu nakeve.

Bi hêviya ku di pirtûka duyem a berdewama cîlda yekem de hareket, macera, heyecan, şer û pevçûn, xebat û têkoşîn û herweha lehengên bi nav hebin.

Mihemed Çelkî

GOTAR,

Avvirek bo roman a kurdî li başûr

Nivêsin li ser diyarde û her livînek a civakî, evca ew diyarde çî di wêjeyî, civakî, ramyarî, olî, felsefî û sincî de bin. Gereke mirov li sedem û bin-waşên wan bikole, da mirov bikarit, kevaleke xweşik û tekoz bo bikêşît, eger ne mirov dê kevit pêla tem û mijiya mijarê û rastî wê berze bibin û mafê wan afrandkaran û bilîmetan wê hinda bibit. Ji ber hindê gelek ya fere, ku mirov li sedemên bûyne palder û hander bigerhit.

Wêjeya Kurdî, mîna wêjevaniya cîhanê, di nawskên perestgehan da şaperên xwe lêkdane û beref asmanê afrandinê firîne. Sewdaliyên peyvên nazik û dilveker li ber kiziya çira yên perestgehê peyvên xwe li hev anîne û helbestên nazik vehûnanadine, kirine diyarî bo dilgermên evînê û kela dilî pê hêwir kirine. Her li ber kiziya çirayê mizgeftê bû, mîrê helbest-vaniya Kurdî Melayê Çizîrî, helbest vehûnanandiye û paşî bûye diyarde û li her aliyakê Kurdistanê, mela û şêxên Kurdan keftine ser rêça Melayê Çizîrî û mala wêjevaniya Kurd avakirine. Helbestê ciheke pîroz bo xwe di nav qada çanda Kurdî da girtiye, û heta radek baş kariye, derbirîne ji hest û nestên mirovê Kurd biket û gelek diyarde û rûdanên dîrokî, civakî bo me nemir biken û mîna dîdevanek bîrtûj, wan rûdanan û werçerxên dîrokî bo nivşên paş xwe bihêlît. Ji wan rûdanên dîrokî, rûdana Kela Dimdimê ya ku helbestvanê Kurd yê mezin Feqiyê Teyran nivêsi û ev lehengiya azadîxazên Kurd yê tucarî nîrê zordariyê nepejirandî û napejirînît, beramaberî leşker kêşiya Şah Îsmaelê Sefewî. Kanê çewan wan şêre mêran di Kelê da li ber xwe dida û ta dûmahiya dilopa xwîna xwe berxwedan kirin û şûrhe û diwarên Kelê bi xwîna xwe nexşandîn û bi çî awayî radestî nepejirandî. Ew êş, azar û kovan Feqiyê Teyran bi awayek lîrîkî (strankî) vehûnandiye û gelek bi hêsanî dihêt xwendin û ezberkirin û deme evro jî mirov dixwînît, keke girî henasa mirovî dibirit û çav dibin

kaniyên firmêskan û rû dibît zevyeka bêav ya qeşavî. Bivê soz û hest saziyê helbestê kariye bo xwe cihek taybet li cem Kurdan biket û mirovên helbestvan mîna mirov çak û xweştiviyên Xwedê dihatin niyasî û xwedî rêzek gelek giran bûn di nav civaka Kurdî da, her jiber vê yekê ye helbestê kariye heta evro jî cihekê taybet bo xwe dinav qada wêjevanîya Kurdî da bigrît û hêj ev dil germî û rû soriya xwe ji dest nedaye û teşîya wê hêj gelek ya şaryaye û libaye, eger çî gelek guhertin û werçerxên bi bahoz keftine tevne jiyarê û xolkê hertiştî nemîna caran hêlaye û gelek hizir, boçûn, diyarde, ol, sincên civak, rewîş, tîtal... hd, di kotela wan bahoz û guhertinan da berba kirine.

Xortiya pêla van guhertinan bûye sedem ku wêjevanên Kurd di nav van gêleşokan da li hindek alavên din bigerin, da bikarin serederiyê di gel van mijarên ku heta dûhî li civaka Kurd de havî bûn, biken. Ew alav jî rojname bû ku bûye penageha wêjevanên(rewşenbîrên) Kurd. Helbet, mirovî ew şîyan nînin ku gişt laperên rojnamê bi helbestkî dagirît û serderî di gel lêşawa mijaran biket, ji lew rêk bo pexşanê hate raxistin û ew baladestîya helbestê ku heya wê rojê hebû û gişt koçkên malan, mizgeftan pê rewşen kiribûn, ala ji dest hate daxistin û pexşan bo mîra alava derbirînê û cihê xwe di nav qada wêjevanîyê da bi şengistên qayîm û xwerist danan.

Serkêşê ev guhertine anîn nav qada çanda Kurdî û li gor dîtina gelek zana û bisporên Kurd ku eger em destpêka çerxê hişyarbûn Kurd û modernizim di çarçovê kultorê Kurdistanê diyar û dest nîşan bikeyn, wî demî hemî derwaze û rêk diçine ber dergehê Rojname Kurdistan (22.04.1898-1902) û binemala Bedirxaniyan. Bêgomane, ku Rojname Kurdistan binwaşê rojnamegeriya Kurdî û nûjenkirina hizra Kurd kiriye û her ji ber wê yekê ye ku roja 22.04 bûye, roja cejna rojnamegeriya.

Piştî vê werçerxan a pir bi wate û şengiste qayîm a çanda Kurdî, nûjen bûn û moderenizimê hemî layên civaka Kurdî vegirtin û li pêşîya giştan jî wêje bû. Weke dihêt zanîn, berî derkeftina Rojname Kurdistan, sîmayê çanda Kurdî helbest bû, û cihê pexşanê û texlîtên din yên derbirînê, gelek yê berteng bû, lê piştî rojnamegerî hatiye nav qada çandê, ev cihe, anku serkêşîya çandê ji helbestê hate wergirtin û sedemên nuh bû texlîtên din ên derbirînê hate cih û mewdayê derbirînê berfireh bû çanda Kurdî wekî ya piraniya milletên rojhelatî, kefte çerxa gohertinê, û birêka rojnamegeriyê rewşenbîr û wêjevan bihevî hatine girêdan û hay ji hev hebûn û pêk gohertina hizir û raman bû sîmayê kultorê Kurdî. Ev werçerxa ho gerim û tewjimdaz heta dawîya şerê yekê ye Cîhanî, berdewam bû. Lê piştî Kurdistan ji layê hêzên kolonyalistên Bîrîtanî û Ferensî ve hatiye

parve kirin li ser dewletên Îraq, Turkiya, Îran û Surya, ev gohartine hate singe pê kirin, û bivê yekê çanda Kurdî gorzek gelek giran xwar û rewşenbîrên Kurd ji hev hatine veqetandin û zêdebarî fermanên qedexekirina Zimanê Kurdî, ku van dewletên taze çêkirî bi hemû hêza xwe, pêkolên qerisandin, jinav birin, berteng kirin, keşefirêt kirin, bêtam kirin, hejar kirin... li dijî ziman, dîrok û wêjeya Kurdî dane xebitandin. Salên piştî şerê yekm yê Cîhanî, mirov dikarî bêtî, salên singepê ya çanda Kurdiye û şokek gelek mezin bi rewşen hizrên Kurd keft, ew dilgermî, vîn û hesta pêşvebirina miletê Kurd ji hemû layan ve, bi parve kirina Kurdistanê, hate xtimandin û dirbek giran bivê bizava moderinxaz keft.

Beramberî vî gorzê ho yê giran, we ne bît, ku rewşen hizrên Kurd dest-dahêlay mabin û nîrê keftinê, pejirandibit! Nexêr, belku jiberê rijdtir keftine ser qada kêferatê û ew çirayê Mîr Mîqdad Bedirxanî helkirî, her ew çira Li Sûleymaniyê, Bexda, Beyrut û Şamê hateve helkirin û Hawar, Stêr, Ronahî, Jîn û Gelavêj û...helbûve û ew şevtarî kirine şevçira û baxê çanda Kurdî rewşenkirin.

Roman li başurê Kurdistanê.

Weke dihêt zanîn, ku Roman berhem û nîvişkê çerxê rewşengeriyê ye, û çerxê rewşengeriyê hê li Kurdistanê bala dest nebûye û sedemên vê yekê jî parve bûna Kurdistanê û ew qedexeyên li ser çand û Zimanê Kurdî, ku ji layê dagîrkerên Kurdistanê ve bi yasayê hatîne mohir kirin, wekiriye ku rêka moderenizmê bi awayek asayî nekvît rê, û werbike ku rewşen hizrên Kurd barapitir ji şîyanên xwe terxan bikin bo xebata ramiyarî (siyasî) û tevî partiyên ramiyarî bûn û sergermî xebata çekdarî bûn li dijî hêzên dagîrker.

Me berî niho got ku piştî şerê yekê Cîhanê û parvebûna Kurdistanê li ser çar dewletên ji hev cuda, êdî xebatên çandî jî ji hev hatin veqetandin û xoseriyek taybet bo sîmayê her parçekê û peyvên Bakur, Başor, Başurê rojava û Rojhelatê Kurdistan hatine nav baxê çanda Kurdî, û her parçekê sîmayê xwe yê taybet yê wêjeyî girt, bivê yekê şokek mezin li rewşen hizrên Kurd keft û ev şoke bo sedem ku hinekî xebatên çandî li Kurdistanê bikevin kotel û zivrokan û renga xetimînek lê xûya bibit.

Di ser van sedemên li jor anîn ziman, çerxê rewşengriya Kurdî li her parçek li gor mewday û derfetên hey eger bigavên kûsî be jî lê her ya berde wame û ew çirayê pêşengên vî karwanî helkirî maye geş û hel, Kurdistan bêy çevçira nehiştine.

Li başurê Kurdistanê ev şevçira tim maye geş, heya evro jî hê yê geşe û çirîskênvî çirayî sinorên bixortî hatîne kişandin, diçirînit û silavî Meha-

bad, Amed û Qamîşlo diket. Di jiyara her miletek û netewekî de, hinek qonax didiyartir û bala berztir dixûyên û li başurê Kurdistanê jî ev yek gelek bi zeqî diyare, ew jî qonaxa salên 1930 heta destpêka şoreşa 11.09.1961ê ye ku bi qonaxa hişyariya netewî û çandî dihêt niyasîn. Ev qonaxe di dîroka çanda Kurdî de li başurê Kurdistanê bi qonaxa damezrandin a hîmên çanda Kurdî dihêt naskirin û nexisme piştî belavbûna Kovara Gelawêj (1.12.1939-1949)ê ya ku sernivîser wê nivîsevan û siyasetmedarê Kurd Îbrahîm Ehmed (1914-09.04.2000)bû. Kovara Gelawêj gelek pûte dida wêjeya Cîhanî û gelek berhemên nivîsevanên Cîhanî li wêjevanên Kurd aşina kirin û bandorek erînî li ser wan dihişt û ev diyarda gelek di berhemên wêjevanên wê demê da xûya dibit. Helbestvanên mîna Fayîq Bêkes, Abdullah Goran, Dildar, Şêx Nurî Şêx Salih û.... li ser laperên vê Kovarê berhemên belav dikirin. Îbrahîm Ehmedî çîrok û helbestên di Kovarê de belav dikirin, lê nahêt zanî kanê sedemên nebelav kirina ronama xwe ya yekê Awat û Nahumêdî ku li sala 1933ê nivêsbû li ser laperên Kovara Gelawêjê belav nekir, dibe ku sedemên wê yekê ramyarî bin û wî nexstibe Kovarê bêxe tengezariyan, ewî berdewamiya Gelawêjê bi fertir dîtî bit.

Îbrahîm Ehmed ji nivîsevanên here bijartê yê wê demêye û gelek bi germî mijûlî xebatên wêjevanî bû û çîroknivê û helbestvanek desthel bû, lê mixabin xebata ramyarî ev şahsiwarê wêjeyî bo layê xwe rakêşaye û nivîsîn li ba wî bûye lawekî û tev şîyanên xwe êxistine warê ramyarî û Kurdperwriyê.

Bo cara yekê roman xo Janî Gel li sala 1972ê belav kir û ev sale, sala ji dayîkbûna romana Kurdî li başurê welatî dihêt hejmartin û ev romane hatiye wergerandin bo gelek zimanan.

Herçende berî romanên din jî hebûn ku berî Janî gel nivêsbûn mîna romana Awat û Nahumêdî ku li sala 1933ê nivêsbû, Dirk û Gul (Histî û Gul) sala 1961, Jîyan û Xebat sala 1961, Herzekarî û Hejarî sala 1972.

Piştî van hewildanên Îbrahîm Ehmedî, hêdî, hêdî romanê cihê di nav mêrga çanda Kurdî li başur girt û ji salên 1980ê virde slane bireka baş roman dikevin piyasa wêjeya Kurdî navên mîna Hisên Arif, Mehemed Mewlud (Mem), Şêrzad Hesên, Heme Mukrî, Abdullah Serac û... ji salên 1990ê vidre jî mirov dikarit bêjît ku romanê li başur ser ji gişt texlîten din yên wêjeyî standiye û bala destiya xwe diyar kiriye û navên mîna Bextiyar Alî, Ceza Çingiyânî, Muhsin Ebdulrehman, Sebrî Silêvaney, Hesên Silêvaney, Tehsîn Navişkî û.... navên geşin li başurê Kurdistanê.

Mirov dikarit pişt rast bêjît ku niha li başurê Kurdistanê roman û nivîsîna

romanê bûye diyarde, cihê hejiyê xwe di nav wêjevaniya Kurd de girtiye û ne bi awayek berdayî hatine nivêsin û bûye diyardek xoser û xwediye sîmayek Kurdewariye û ji layê tîm û forman ve jî hîç ji romanên hevsû û Cîhanê kêmtir nîne û belkî mirov bê dudilî dikarît bêjît ku romana Kurdî jî ya hevsû yê me pêşdetire û yê gilyan dikin û kêlinciyên jehrîn li kêleka romannivêsen Kurd didin, kulewariya wan û kêmzanîna wan berû dibit, di der mafê romana Kurdî da.

Îbrahîm Seydo Aydogan

GOTAR

GUMAN¹

Pîrozî û avakirina neteweyan û wêje

Herçend di netewebûyina civakekê de xwedan dewletbûyîna ne şertê bingehîn be jî, dewlet di wê netewebûyinê de xwedan cihekî girîng û sereke ye. Gava ku milletek him bê dewlet be û him jî di nava dewletên milletên din de bi sînoran hatibe dabeşkirin û bindestkirin, û ji parçeyên xwe yê din hatibe cudakirin û di ser de jî, nasnameya wî û zimanê wî hatibe redkirin û bi qasî sedsalekê di siyaseteke asîmîlasyonê ya tûnd re hatibe derbaskirin, divê pêvajoya netewebûyinê jî li ser bingehine din were avakirin. Di rewşa milletekî weha yê parçekirî de netewebûyin li ser bawerî an jî bîrdoziyeke hevpar tê avakirin. Di rewşeke weha de, netewebûyina wê civakê bi xwe jî bi pirsgerê e, lewre li parçeyên cuda û di nava bandora siyaset û ol û bîr û baweriyên cuda de avakirina bingehê hevpar ne hêsan e.

Di nava civakên ku hê netewebûyina xwe temam nekiriye de, her tiştê nû cîhê gumanê ye. Ji xwe di zanînê de *guman* pêvajoyeke gihîştina rastiyê ye. Civakeke di rewşa ku me li jorê behs kir de, ji ber talankirina *bîra giştî* û tahrîbkirina nîrxên hevpar an jî yê ku dikarin bibin hevpar, bi demê re, dikare bi kesên ku wê ava dikin ve jî ji eslê xwe, bingehên xwe

¹ Mijara ku di vê nivîsê de behsa wê dibe, meha bihurî di konferans û semîneran de li Colemêrg û Dihok û Mêrdînê jî bi awayekî devkî hatiye vegotin û bi dû re hatiye berfirêhkirin.

û herweha, bi rêya van bingehan ve, ji parçeyên xwe yên din bi dûr bikeve. Ji ber ku ew bindest e, ne weke xwe dimîne û ne jî dişibe serdestê xwe; hingê dikare zû *dejenere* bibe. Ev dejenerebûyin him di warê çandî û him jî di warê takekesî de ye.

Gava ku li ser civakekê xetereya dejenerebûyinê hebe û ev dejenerebûyin dikare xwe bera nava kesên wê civakê bide, hingê berhemên wan kesan jî divê bi tevdir werine nirxandin. Heger em bibêjin ku wêje jî berhemeke takekesî ye ku di nava civakekê de û bi çand û zimanê wê civakê ve tê avakirin, hingê di wêjeya zimanê civakeke bi vî rengî de, *guman* dê helwêsta me ya yekem be. Pirsên ku di bingehe wêjeyê de hene, mîna “çi, çima, çawa û ji bo kê”, ji bo civakeke mîna ya Kurdan divê tim di bîra mirov de be, lewre civaka me ji civakên dora xwe û yên dûrî xwe bêtir dûrî çandeke homojen e.

Em vê homojeniyê di warê çandî de fahm dikin, lewre, em dizanin ku civakeke bi temamî homojen nikare peyda bibe, heger sistemeke diktatoriyal ne li dar be; lê dîsa jî bi awayekî çandî, çi di warê wêjeyê, çi di warê zimanî, çi di warê hunerî an jî mîmariyê de, kêm zêde homojeniyeye nisbî dikare were avakirin ku mirov bikare behsa hin taybetmendiyên berhemên milletekî bike ku ew jî ji taybetmendiyên wî milletî bi xwe tî.

Herçi Kurd in, di nava axeke çar perçeyî û warekî şeş perçeyî (teva Kafkasya û Rojavayê) yê weha de ku bandora welat, çand, ol, ziman û siyasetên cuda li ser heye, civak nikare di tu waran de homojen be. Ji xwe di dema bîdewletiyê de mirov nikare ji binî ve behsa homojeniyê bike. Heger mirov pîrsgirêkên civaka Kurdan yên dirokî û siyasî û takekesî jî li van ramanên jorê zêde bike, sînorên gumana ku em datînin ser karên wêjeyî û rewşenbîriya Kurdan dê berfirehtir bibin.

Di nava civakeke weha de ku ji aliyê çandî, siyasî, civakî û olî ve dûrî homojeniyê ye û herweha di zimanî wê de jî, ji aliyê zarava û alfabeyan ve, bi rêya qedexeyên dîroka wan be jî, dabeşkirin û cudahiyên xurt hene, behskirina wêjeyeke neteweyî jî cihê gumanê ye.

Li welatên ku Kurd lê dijîn, sistemen siyasî yên cuda li dar in. Her sistemekê, li gora xwe siyaseteke pîrsgirêka kurdî jî bi rê ve birîye. Di rewşeke weha de ku li Bakurê Kurdistanê perwerdehiya kurdî tunebe û nivîskar xwe bi xwe fêrî xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe dibin û hejmara pirtûkên ku bikarin bi zimanê xwe bixwînin ewçend kêmtir e, mirov divê ji bo peydabûna wêjeyeke baş, gellekî bi sebr be. Lê belê, divê em çarçoweya vê sebrê jî diyar bikin. Lewre, ev sebr û bêhnfirehiya ku tê xwastin,

divê nebe sedem ku mirov xwe ji hertiştî re kerr bike. Lewre gava ku sînorê vê sebrê zêde fireh be, hingê wateya peyva wêjeyê û rewşenbîriyê jî dikare were guhertin û hertiştî dikare li ser navê wêjeyê were çapkirin û herkes dikare bibe rewşenbîr ku aloziyeke weha ya cîhana zimanekî ya bîrdoziyê dikare bibe sedema karesatên çandî yên mezin ku rêlibergirina wan gellekî dijwar e û tahrîb û encamên wan jî gellekî giran in.

Kamilî

Ji bo peydabûna wêjeyeke baş, kamilî pêwîst e. Em vê kamiliyê di warê nivîskariyê, di warê zimên û di warê formê de bi kar tînin. Lewre heger ev kamilî nebe, mirov nikare hêviya berhemên xurt bike. Gava ku guman jî weke bingehe têgihiştina me ya wêjeyî were fahmkirin, û heger em rewşa Kurdan ya ku me li jorê behs kir jî bi bîr bixin, hingê kamiliya ku em behsa wê dikin jî ancax dikare di warê takekesî de û bi bandoreke xweser ve peyda bibe. Belawelabûyina civaka Kurdan jî, dê tim rêyê li ber bigire ku ew kamilî xwe li nava civakê belav bike û bigihîje asta civakî. Hingê, civak dê kesan ava neke, lê belê, kes dê berê xwe û bi dû re jî civakan ava bikin, herçend bi niherîneke diyalektîk dijberê vê yekê jî rast be jî.

Civakên rojavayî ku berî sedsala 19'an gihiştin qadeke kamiliyê ya destpêkê, îroj ew kamilî kêma zêde bi awayekî homojen di nava xwe de li civakê belav kiriye. Milletên ku bi dû re be jî gihiştin qeraxên vê kamiliyê, bandora xwe li milletên din jî kir, lê belê, berî wê, xwe ava kir. Ji ber wê ye ku em dikarin behsa binavkirinên mîna “romana rûsî, sînemaya fransî, felsefeya almanî, mîtolojiya yûnanî û mîmariya japonî û hwd” bikin.

Yê Kurdan, netewebûyinê hê di qada destpêkê de ye, lewre heta ku mirov nebe serdestê axa xwe, mirov nikare behsa netewebûyinekê bike. Guman di vira de li ser netewebûyinê jî heye. Ji ber wê ye ku her milletê ku di vê pêvejoyê re derbas bûye, hewil daye ku dîroka xwe bigihîne heylo dema ku hê fikra millet û neteweyan peyda nebûbûn. Heger di dîrokê de weha be, di warê çandî û wêjeyî de guman zêdetir dibe. Lewre, ji ber kompleksa nebûna netewetiyê, hewildana îspateke bêkêr dê bandora xwe li karên wêjeyî jî bike.

Ji ber wê ye ku nivîskarekî kurd ku hê derfetên zimanê xwe nû kişî kiribin, dikare bibêje ku wî bi xwe ev ziman ava kiriye û ji ber wê ye ku siyasatmedarekî kurd ku hê nû di civaka xwe de dibe serdest, dikare bibêje ku wî bi xwe ev millet ava kiriye û ji ber wê ye ku di civakeke weha de herkes dikare yê berî xwe û yê dora xwe tunne bihesibîne. Guman di

civakeke weha de berî hertiştî li ser “avakirin”ê, yanî li ser destpêkê ye. Her millet dixwaze ji xwe re dîrokekê û mîtolojiyekê ava bike ku pir-raniya van avakirinan li ser îddiayan in û behsa zayina milletan dikin. Ji ber wê ye ku Kurd carinan zayina xwe digihînin mîtolojiya Newrozê. Lê, heger em bala xwe baş bidinê, di eslê xwe de di vê çîrokê de behsa zayinê bi tenê nabe, lê belê behsa netewebûyinekê dibe. Sedem jî ew e ku “qedereke hevpar” ji wan re bi destê serdestan tê avakirin û ev qeder wan tîne cem hev, dike hêz û bi dû re jî bi awayekî xwezayî dike serdest.

Qewm û millet û netewe, ji xwe re tim mîtolojiyan ava dikin, lewra heger ew nebin, dê ji dîroka xwe hez nekin. Ev hezkirin û serbilindiya bi dîroka xwe ve, ji bo parastina siberoja neteweyên herî mezin jî girîng e. Di vê dîrokê de tim kesayetiye weha hene ku ramana serdest dixwaze ku mirov ji wan hez bike û xwe bike weke wan. Taybetmendiyên wan kesan yên baş bi pêş ve derdixin û taybetmendiyên wan yên din (yên însanî û xwezayî) didin jibîrkirin. Bi vî awayî robotan ava dikin û li dibistanan jî dîroka van robotan tê xwendin. Ji bo xurtkirina îmajê van kesên robotî jî di gellek waran de çalakiyên yekem li wan bar dikin û behsa xizmeta wan a li doz û çand û rewşenbîrî û dewlemendiya wî milletî tê kirin. Gellek caran dikarin wan kesan weke rewşenbîr, weke fîlozof û vîzyoner nîşan bidin ku mirov tucarî nikaribe xwe bide ber wan û wan weke kesên pîroz bihesibîne. Yanî, milletên bindest ji bo parastina xwe tim pêxemberan ji xwe re ava dikin.

Ji bo parastina van iddiayan jî *perdeya pîroziyê* li ser destpêkê tê vegirtin. Ji bo parastina vê perdeyê jî, gellek berhemên sîmulasyoneke wêjeyî dikarin di xizmeta pîrozan de werin avakirin û li nava civakê werin belavkirin. Berhemên ku li pêş vê perdeya ava bûne, bi tenê demkî ne, bi demê re ew ê wenda bibin, lewre nikarin bersiva pirsên “çi, çima, çawa û ji bo kê” bidin. Bersiva wan dê li gora demê û li gora pêvajoyê be û, ev jî diyar dike ku, dê siyasî be. Siyaset bi xwe, li ser fikir û ramanên demkî tê avakirin. Wêje nikare li pêş perdeyê û di bin banê siyasetê de kêmaniyên xwe veşêre.

Destpêka kamiliyê di rakirina vê perdeyê de ye. Lewre di wêjeyê û felsefeyê de cih ji pîroziyan re tunneye.

Beradayî

Jean-Paul Sartre di berhema xwe ya bi navê *Qu'est-ce que la littérature* (Wêje çi ye?) de, sê pirsan dike: «Nivîsandin çi ye? Em ji bo çi dinivîsîn? Em ji bo kê dinivîsîn?». Ev pirs dê me bibin armanca nivîsandinê û herweha ew ê wateya karê nivîskariyê jî ji bo me zelaltir bikin. Di rewşa

milletê kurd û zimanê wî de, ev pirs ji bo erka wêjeyê girîngtir dibin, lewre wêje divê bi kêrî tiştekî were. Di civaka ku pirsgirêkên wê yên siyasî û civakî û zimanî hebe de, bê guman, dê pirsgirêkên takekesî bi rengekî cuda peyda bibin, û hingê wêje di van waran de bi kêr were. Berhema ku ne di warê zimên de û ne jî di warê civakî de bi kêr neyê, ji bo me "beradayî" ye, lewre di rewşa ku Kurd tê de ne de, wêjeya kêfê ancax dikare wêjeyeke laqayt û sivik be.

Weke ku herkes dizane, Ehmedê Xanî jî di destpêka *Mem û Zînê* de, di beşê «sebeba nivîsîna pirtûkê bi zarê kurdî» de, ev pirs bi awayekî gellekî aşkere ji xwe kiribû û bersiveke têra xwe nefspîçûk jî di pey wê re dabû û pejirandibû ku armanca wî ew bû ku li hember Tirk û Ereb û Eceman rûmeta Kurdan biparastaya û ji ber wê, di wê dema ku bi pirranî bi zimanê osmanî berhem dihatin nivîsandin de, wî ew mesnewiya bêhempa bi kurdî nivîsandibû.

Gelo nivîskarên me yên îroj çî qasî hay ji rastiyeke xwe hene? Gelo çiqasî li xwe mikur tên? Di vê rewşa Kurdan de, li xwemikurhatin dîtina rastiyeke ye. Ahmedê Xanî di *Mem û Zînê* de, gava ku behsa rewşa Kurdan dike dibêje ku ew "*filcimle ne cahil û nezan in, emma di yetim û bê mecal in*" û rewşa wan bi bêxwedîtiya wan ve girê dide. Weke ku em ê bi dû re bibînin, du sed sal bi şûn de, êdî Kurdine din ghiştin û van Kurdên ku bi çand û perwerdehiyeke din rabûne bi çavekî din li civaka xwe diniherî. Di serê sedsala 20'an de, êdî bi awayekî aşkere di kovara *Rojî Kurdê* (1913) de dihat gotin ku "*Kurd nexwende û nezan in*". Di kovara *Hawarê* (1932) de gazinek ji "*nezaniyê*" dihat kirin û apolojîya "*xwendin, hînbûn û hînkirinekê*" dihat kirin.

Ma di civakeke weha de ku hê bi hînbûn û hînkirinê ve mijûl e, mirov çawa dikare behsa kamiliyeke rewşenbîrî, wêjeyî û siyasî bike û rabe û hêviya wêjeyeke xurt bike?

Wêje û siyasat

Weke ku di dema *Hawarê* de weha bû, di destpêka wêjeya Kurdên sovyetê de û di wêjeya Kurdên bakurî ya salên 1980'î de jî her eynî reng û eynî deng hebû. Kurd bindest bûn, zimanê wan di derdoreke teng de hatibû asêkirin û ber bi wendabûnê ve diçû. Lê, di rewşeke weha de ziman cudahiya wan ya bingeşîn bû û rengê wan yê xweser bû. Ji ber wê ye ku Celadet Bedirxan netewebûyin bi zimanî ve girê dida. Lê belê Celadet Bedirxan ji tevgera Xoybûnê hatibû, Erebê Şemo endamê Partiya Komunîst bû û Kurdên bakurî ku li Ewropayê dest bi wêjeyê kirin jî hemû ji tevgerên marksîst dihatin.

Madem zimanê kurdî di perwerdehiyê de nayê bikaranîn, madem her Kurdê xwende teqez bi zimanine din jî dizane, û madem nivîskarên kurd xwe bi xwe hînî xwendin û nivîsandinê bûne, hingê tercîha nivîsandina bi zimanê kurdî, di rewşa milletê kurd de ancax dikare bi siyasîyê ve were nirxandin. Lewre, gava ku daxwaza nivîskariyê di dilê mirov de hebe û mirov tercîha xwe ya zimanî li ser zimanê kurdî deyne, hingê ew tercîh siyasî ye. Ji ber wê ye ku di bingeheên wêjeya kurdî de, weke ku li cem Ahmedê Xanî û sebebên nivîsandina wî ya bi kurmanciyê jî diyar dibû, heger xemeke mirov ya siyasî nebe, mirov nikare di sedsala 20 û 21'ê de bi kurdî binivîsîne, nemaze jî bi kurmancî.

Gava ku em sibêjin wêjeya kurdî siyasî bû, divê mirov destnîşan bike ku ev siyasî li gora dewran diguherî. Di dema Ahmedê Xanî de, nivîsandina bi kurmanciyê nîşana hebûna wan bû û li dijî Tirk û Ereb û Eceman bû, lewre wan henekê xwe bi Kurdan û zimanê wan dikir. Di dema Hawarê de, qedexeya tûnd ya li ser zimanê kurdî nû dest pê kiribû û nemaze Dewleta Tirk bi awayekî aşkere bernamêya asîmîlekirinê dabû ber xwe ku vê bernamêyê ji asîmîleya zimanî dest pê dikir û xwe digihand koçberkirina Kurdan û bicihkirina wan ya di nava Tirkan de. Hingê, armancê jê “tirkkirina” wan bû û bi awayekî diyalektîk, ziman ji xwe ber di destê Celadet Bedirxan de dibû alaya kurdî.

Di dema Erebê Şemo de, kurdî ji bo propagandaya bolşevîzmê bi tenê alavek bû. Ji ber wê ye ku Erebê ku li gundê xwe şivanti dikir, piştî ku di artêşa rûs de dibe wergêr û li bajêr jî fêrî bolşevîzmê dibe, vedigere gundê Kurdan û li dijî axa û begên kurd propagandayê dike. Divê mirov bi bîr bîne ku heger weha nekiraya pirtûkên wî dê nehatana çapkirin, lewre di dema sovyetê de wêje di bin çavdêriya Partiya Komunîst de dihat çapkirin û mecbûr bû ku bi kêrî pêşketina civakê bihataya, yanî mecbûr bû ku propagandaya îdeolojîk ya lenînîzmê di wêjeyê de bihataya kirin. Yanî “bikêrhatin” di her demê de li gora fikra serdest tê nirxandin. Ji ber wê ye ku di destpêkê de ew roman (*Şivanê Kurmanca*) bi rûsî nivîsand, lewre ziman wê demê ne girîng bû, lê bi dû re bi kurdî jî nivîsand, lewre xwe dabû qebûlkirin û êdî karîbû bi zimanê xwe binivîsandaya.

Di dema Kurdên bakurî yê piştî 1980'ê de ne mecbûrî hebû û ne jî zordestî. Lewre wan li Ewropayê dest pê kir. Gava ku ew piştî cûntaya leşkerî ya 1980'ê ghiştin welatên Ewropî, hemû hê jî di nava komên xwe yê siyasî de bûn. Herçend li binxetê li şopên pêncî sal berê rast hatin jî, li Swêd û Almaniyayê lê hay bûn ku zimanê wan ne qedexeyê û dikarin pê binivîsin. Alîkariyên diravî ku welatên ewropî bi nivîskaran dikir divê di vira de weke alaveke xurt were nirxandin. Lewre li Swêdê pîrraniya

weşanxane û kovar û pirtûkan bi alîkariya dezgehên hikumetî ve derketine. Cara yekem bû, wêjeya kurdî di serbestiyê de dihat kirin, lê belê dîsa jî, ji ber ku yên ku ew wêje dikir bi xwe siyasî bûn, rengê siyasî her li ser wêjeyê bû. Ziman û wêje êdî dibûn çalakîyên îdeolojîk.

Di romana Mahmûd Baksî ya bi navê *Gundikê Dono* de behsa gundekî Xerzan dibe, lê belê diyaloga ku Zibeyrê Ehmêyê ku yek ji lehengên romanê ye di dawîya romanê de dike, bi me dide zanîn ku ji bo nivîşkêr çîrok bi tena serê xwe ne bes e û mecbûr e ku aşkeretir bike, hingê hemû fikrên ku bi bicihkirina çîroka şerrê li dijî feodalên hatine saz kirin, bi diyalogeke rût û rasterast bi dawî dibe û rengê romanê yê siyasî aşkere dike.

Madem weha ye, gelo çi pêdivî bi romanê hebû?

Bîr

Li gelek deveran, yek ji pirsên ku wêjehez û nemaze romanhezên me ji xwe dikin jî ev e:

«Ji bo çi em jî nikarin romanên weke yên xelkê binivîsîn?»

Ji bo ku mirov bikare bersiva vê pirsê bide, divê mirov berê behs bike bê romanê li cem xelkê çawa dest pê kiriye.

Julia Kristeva di berhema xwe ya bi navê «Le texte du roman» de dibêje ku romana Antoine de Sale ya bi navê «*Le Petit Jehan de Santré*» (1456), yekem romana fransî ye ku bi «pexşanê» hatiye nivîsandin. Berî vê romanê, romanên helbestkî hebûn ku mijarên xwe ji destan û efsaneyên devkî werdigirtin û ew vediguheztin ser nivîsê.

Em werin ser mijara xwe ya romana kurdî². Dîroka romana kurdî (kurmancî) ya ku em bi «*Şivanê Kurmanca*» ya (1935) Erebe Şemo didin destpêkirin heta niha 196 roman dîtine. Weke tê zanîn, heta sala 1980'ê jî, hejmara romanên kurdî 12 bûn. Romanên kurdî yên yekem ku bêtir di bin bandora «sosyalîzma rûsî» de diman û mijarên wan jî an li ser şoreşgeriyê an jî li ser dîroka kurdan û destanên wan bû û mixabin ji hêlên romanên rûsî yên estetîkî û stîlîstîkî jî têra xwe bêpar bûn. Li welatekî mîna Rûsyayê ku romannivîsên mîna Gogol, Dostoyewskî û Tolstoy nas kirine, romannivîsên kurd yên pêşîn (Erebê Şemo, Eliyê Ebdilrehman, Heciyê Cindî) gelekî dûrî qalibên romana gerdûnî man û romanên xwe

² Em mijara berhemên wêjeyî di vê nivîsê de bi zaravayê kurmanciya jorîn bi sînor dikin.

bêtir, li gora pêvajoyê, ji bo perwerdekirina civakê ya polîtîk bi kar dianîn û dûrî xemên estetîkî bûn.

Vê yekê heta niha jî her bi vî awayî xwe di gellek romanên kurdî de diyar kir û romana kurdî jî herweha xwe di warê teknîkên vegotinê de, di nava tevgerike teqlîdkirina romanên ewropî û yên tirkî ya qels de vegevizand û rengê xwerû ava nekir. Vê yekê kir ku vegotina kurdî ji ruhê xwe yê ku di destan, çîrokên gelêrî û kultura dengbejiyê de diyar dibe bi dûr bikeve û xwe li ser hîmine dejenerebûyî ava bike. Ji ber vê hindê, heta ku romana kurdî ji teqlîda xwezayî bi wê de neçe û xwerûbûneke mijar û vegotina edebî di kurdî de ava neke jî, em ê her pirsên weke ya jorê ji xwe bikin.

Vegotina hunerê romanê, weke ku di hemû vegotinên nivîskî de weha ye, bingeha xwe ji kultura devkî stendiye. Ev kultura devkî berhema "bîra giştî" ye ku dibe "bîra civakê". Bi hemû zimanan çandeke devkî heye ku piştî peydakirina nivîsê, hêdî hêdî qels bûye û aktuelbûna xwe wenda kiriye. Nivîsê çalakiya vegotina devkî ji holê rakir, lê belê, tu carî jî dev ji peywendiyên xwe yên bi wê re berneda. Di vê têgehê de, ji bo roman-nivîsiya kurdî, mixabin pirsgirêkek heye. Lewre, di pêvajoya veguheztina ser forma romanê de, pêwendiya ku diviya di navbera vegotina devkî û ya nivîskî de bihataya avakirin, pêk nehat. Pêvajoya guherîna ber bi pexşanê û formên wê yên biyanî ve jî, beyî ku di kamiliyê re derbas bibe, xwe di ser gellek qadan re çeng kir û xwe da tengala zimanên ku ev nêzî çar sed sal in romana modern dinivîsin.

Ji ber ku hunera romanê li cem Kurdên bakurî rasterast bi teqlîdkirina romana biyaniyan ve pêk hat. Di vê teqlîdê de jî, ziman ji dewlemendiya xwe ya devkî bêpar hate hiştin û kêr nimûneyên dijberê wê dikarin werin peydakirin. Hewla nivîskarên ku ferhengan an jî ferhengên biwêjan di pêvajoya nivîsandina romanên de datînin ber xwe, aha ji ber vê sedemê ye, lewre nivîskar ji binî ve ji bingehe zimanê xwe bi dûr keti-bûn. Lê, ne bi tenê bikaranîna zimên û şêwaz hate guhertin, hevoksaziya kurmanciyê jî herweha para xwe ji vê dejenerebûyinê wergirt. Wek mînak, rêngdêr û hokerên ku ji bo vegotina bûyeran alî zimên dikin û di wêjeyê de gellekî girîng in, bi awayekî giştî, naşibin rengdêr û hokerên ku em di berhemên dengbejiyê de dibînin. Lê belê, ew bêtir dişibin rengdêr û hokerên ku em di zimanên ciranên de dibînin. Di vî warî de zimanê tirkî ji zimanê kurdî bêtir ji bo nivîskariya me ya bakuriyan bûye çavkanî. (Elbet mirov nikare ji bo hemû nivîskaran behsa heman hel-wêstê bike.)

Gava bi giştî mirov bala xwe dide zimanê romanên kurdî, mirov dibîne ku pirraniya nivîskarên me yên hemdem ji naskirina çanda me ya vegotina devkî bi dûr in lê gelekî nêzîkî edebiyata tirkî ne ku ew bi xwe jî bi teqlîda edebiyata fransî pêk hatiye. Hingê hin romanên kurdî, ji ber vê yekê, dibin teqlîda teqlîdê.

Du mînakên wêjeya kurdî ku taybetmendiya wê nîşan didin

Pexşan, weke awayê nivîsê, teşeyekî zimên yê bipêşketî ye. Muzîk û rîtmên zimanekî bi lêgerînên pexşanê ve dikarin zimanekî nivîsê yê bipêşketî ava bikin ku, li gora zimanê devkî, bibe zimanekî bikêrhatî him ji bo ragihandinê û him jî ji bo vegotinên wêjeyî yên nivîskî.

Bikaranîna derengmayî û bi dû re jî kêmbikaranîna pexşanê di pêşketina kurmanciyê de şikestineke çilo pêk anîbe jî, niha girîngtirîn astenga li ber zimanê me ew e ku me hê jî ev pirsgrêka ku çareserîya wê dê ji bo zimanê me bibe şoreşek baş fahm nekiribe û rê li ber vê seqetiyê negirtibe. Berpirsiyariya vê kêmaniyê, elbet li ser milê nivîskar û weşangeran e.

Beyî ku em bixwazin behsa têkiliya hişî û zimên bikin, divê mirov bibêje ku hişê nivîskariyê çiqasî bipêşketî be, ew ê di bikaranîna derfetên zimên de jî ew qasî zîrek be. Lewra xurtbûna nivîskêr xwe di zimanî wî re dide der.

Ev hişmendiya pexşanê ku nemaze di berhema Marcel Proust de (Li Pey dema wendabûyî) xwe bi hevokên kompleks nîşan dide, dikare di berhemê de jî bi awayekî din derkeve holê. Lewre pexşan, hemû derfetên zimanekî yên kêmbikarhatî derdixe holê û wan çalak dike. Ji ber wê ye ku divê mirov tucarî nebêje «bipêşxistina zimên». Mirov nikare zimanekî bi pêş ve bixe, lê belê mirov dikare derfetên wî yên ku di ragihandin û ravekirinê de pêwîst in kişf bike û bi xelkê jî bide naskirin. Lewre derfetên hemû zimanan yek in, lê belê hemû ziman mîna hev di hemû waran de nayên bikaranîn.

Li gora Proust, zîrekiya nivîskarekî di hevokên wî de ye û pisporên wî, li ser pirsgrêka hevokên wî yên dirêj, dibêjin ku ji ber wê ye ku Proust hewil daye ku gelek agahiyan di nava hevokê de û bi carekê bide. Lewre, di jiyanê de tişt bi hev re di nava peywendiyê kompleks de ne û hiş wan teva vê peywendiya wan nas dike û madem di navbera wî û zimên de peywendiyê rasterast heye, hingê wan weke ku werdigire jî dîtîsîne ser zimên û ji zimên jî ser nivîsê.

Ligel gellek nûbûnên din ku bi pexşanê re hatine zimên, di vegotina romanesk û wêjeyî de bikaranîna hevokên kompleks ku weke haveynê

zimanê kemilî tê pejirandin, ji bo nuha radeya herî bilind e ku ziman dikare xwe bigihîne, lewre awayên hişî yên tevgerê û dîtina wî ya global û dawerivandina tiştan ya ji aliyê hişî ve, bi tenê bi bikaranîna zimanekî weha ve guncav e. Heger hiş mirovekî şoqereş teva hevalê wî yê bêvil-dirêj û hevala wî ya guhbel û pismamê wî yê kose û dotmama wî ya devçarox dibîne û wî weha li cem xwe nas dike, hingê ziman jî divê vê peywendiya wî ya bi tiştan û kesan re weke xwe bide. Di zimanê nivîsê de jî ev peywendiya jiyane bi rêya hevokên kompleks û gihanekan ve tê sazîkirin ku di zimanê kurdî de awayên wan yên hêsan di jiyana rojane de gellekî tên bikaranîn. Karê nivîsê îroj ew e ku awayên veşartî derxe holê û sînorên zimanê me bicerribîne.

Di roja îroj de, ji nava derfetên pexşanê, ya ku ji zimanê me kêr maye jî ew e ku ev taybetmendiya pexşanê baş nehatiye fahmkirin. Elbet, ev yek ji bandora zimanê devkî tê. Lê belê, hevokên kompleks, beyî ku bibe armanc, dikarin rêyê li ber qutbûyîna vegotinên wêjeyî bigirin ku em di gellek berhemên kurdî de dibînin. Erê, mebest zimanê nivîskî ye, lê ev awa dikare zimanê devkî jî biguherîne.

Ji bo têgihîştinê, çêtir e ku mirov mînakê bide.

«*Hecî Zorav dixwest, xwe ji Zibeyr xilas bikira. Wî ev kar û bar jî dabû Hesên Meysê. Roj tune bû ku Hesên bela xwe li Zibeyr neda. Lê Zibeyr nediket dafikên Hacî Zorav. Haya Zibeyrê Ehmê ji bayê dinê hebû.*»³

Vegotineke wêjeyî ya pêşketî ku derfetên zimên baş bi kar tîne, dê tucarî van hevokên jorê venewêne. Divê baş were fahmkirin ku di vê mînakê de behsa stîla vegotinê nabe. Lewre vegotineke wêjeyî dikare bi hevokên kurt jî were kirin. Lê belê, em di stîla vê nimûneyê de bi guman in, lewre ji stîleke vegotinê bêtir, bandoreke zimanê devkî aşkere dibe ku ev bandor ji bo vegotina wêjeyî ya hemdem û gihîştî dikare bibe sedema qelsiya vegotinê. Ji ber wê ye ku di van pênc hevokan de du caran navê Hacî Zorav, du caran navê Hesên Meysê û çar caran jî navê Zibeyrê Ehmê tê gotin ku mirov ji bihistina heman navî aciz dibe. Lewre dubarekirina nava û bûyeran û peyvan, di nava wêjeya vegotinê de weke nîşanên qelsiyê tên hesibandin. Ev kar karîbû bi alîkariya cînavan jî bihataya kirin ku dê karê vegotinê hêsantir bikiraya.

³ Mahmut Baksî.- *Gundikê Dono*.- Stockholm Orfeus, 1988.- 107 r..- (r. 27). (Yek ji wan romanên ku nivîskarê vê nivîsê jê hez dike ev romana Mahmûd Baksî ye, ji ber wê, gava ku ew ji bo ravekirina hin tîgehên nimûneyên vê romanê bi kar tîne, dive mirov nebêje qey ew romanê rexne dike. Di van mînakên de bi tenê behsa zimên dibe.)

Ka em agahiyên ku nivîskar bi van hevokan vedibêje, deynin ber xwe.

- 1- Hecî Zorav dixwaze xwe ji Zibêr xilas bike.
- 2- Ji bo vî karî, peywîrê dide Hesenê Meysê.
- 3- Hesenê Meysê bela xwe tim di Zibêr de dide.
- 4- Lê Zibêr nakeve dafikên wan.
- 5- Hayê Zibêr ji bayê dinyayê heye.

Di vê mînakê de, pênc agahî hene ku nivîskêr, beyî ku ji derfetên ziman û nivîsandinê destkewtî bibe, heryek bi hevokekê rave kiriye. Hingê, mirov dikeve wê baweriyê ku ev hemû bûyer ji hevdu cuda tev gerriyane, lê belê bûyera yekem sedema ya duyem e û ya sêyem jî bi wê ve girêdayî ye. Bûyera çaran bi awayekî kronolojîk encama wan bûyeran e, herçend tu peywendiyeye organîk di nava wan de nebe jî. Lê belê, bûyera pêncan ku dibe sedema bûyera çaran, nîşan dide bê çima hersê bûyerên destpêkê bi ser neketine. Hingê, ev hemû bûyer di nava hev de ne û bi hevdu girêdayî ne. Madem hiş van bûyeran di nava hev de weke fikreke giştî qebûl dike, ji bo çi mirov mecbûr dimîne ku di vegotina zimanî de wan bûyeran ji hevdu cuda bike?

Ger em bixwazin ji bo heman agahiyan awayekî vegotinê yê din bi kar bînin, nivîskarî dê bi temamî biguhere :

« Hecî Zoravê ku dixwast xwe ji Zibêr xelas bikiraya, ji bo vî karî Hesenê Meysê peywîrdar kiribû. Digel ku roj tune bû ku Hesenê Meysê bela xwe di Zibêr de nedida jî, Zibêrê ku hayê wî ji bayê dinyayê hebû, tucarî nediket dafikên wan. »

Mirov dikare bi gihaneka «û»yê, vê mînakê bi hevokekê jî vebêje.

« Hecî Zoravê ku dixwast xwe ji Zibêr xelas bikiraya, ji bo vî karî Hesenê Meysê peywîrdar kiribû û digel ku roj tune bû ku Hesenê Meysê bela xwe di Zibêr de nedida jî, Zibêrê ku hayê wî ji bayê dinyayê hebû, tucarî nediket dafikên wan. »

Bi guhertina me re, hemû agahiyên ku têkildarî hev in, beyî ku ji hevdu qut bibin, ji bo ku herka zimên û ya vegotinê xera nebe, li dû hev in. Lewre, heger Zibeyrê Ehmê zilamekî zîrek e û hayê wî ji dinyayê heye û vebêjer jî Zibeyrê Ehmê teva van taybetmendiyên wî dadiwerivîne, hingê gava ku mirov navê wî bibêje û behsa bûyera wî bike, mirov nikare van agahiyan ji bîr bike. Heger nivîskar ji bîr bike jî, hiş ji bîr nake. Heger bi rastî jî peywendiyek di navbera zimên û hişî de hebe, hingê divê em tiştan û kesan û bûyeran weke ku di hişî de hene rave bikin. Ziman gava ku kete nava tevliheviyên tevgerên hişî, hingê dikare hemû derfetên xwe yên mirî çalaktir bike.

Erê, kurmercî xezîneyek e, kesê ku daketiye bînê bîrê, heta nuha destvala venegeriyaye. Lê dîsa jî derfetên zimanê me yê vegotinê hê baş nayên bikaranîn. Ma gelo divê mirov vê kêmaniyê bixwe stuyê kurmerciyê an nivîskariyê?

Îdeolojî an jî ajîstasyona wêjeyî

Gava ku mirov bandora siyasatê û tevlêbûyina nivîskaran ya şexsî jî li berhemên wan zêde bike, hingê mirov divê çend pirsên din jî aşkere bike. Nimûneya ku me bi Zibeyrê Ehmê û diyaloga wî ya dawîn da, li vira girîngtir dibe. Lewre, Zibeyr di dawîya romanê de tê û bi çend hevokan hemû romanê şirove dike û nîşan dide ku armanca Mahmûd Baksî ravekirina şerrê feodaliyê bû ku ev jî ji çepgiriya wî dihat.

Nivîskarek divê li hember bûyerên berhema xwe bi çi helwestê tev bigere? Gava ku mirov bala xwe dide hin berhemên kurdî, mirov zelalkirina hin têgeh û tevgeran, weke pêdiviyekê li ser milê xwe hîs dike.

Di gotarên vegotinî de, demên cuda rên hemberî hev: dema nivîskêr, dema xwendevîn, dema vegotinê, dema bûyeran. Gava ku mirov behsa “wexta bûyerên romanê” dike, divê em ji bîr nekin ku cudabûnek di nava nivîskêr û vebêjêr û lehengan de heye. Heger ev hersê dem tev li hev bibin, pirsgrêkên avakirinê dikarin di berhemê de peyda bibin. Ji xwe, ger mirov bihêle, weke ku Benvenîst (*Problèmes de Linguistique Générale*) dibêje, «bûyer xwe bi xwe vedibêjin» û pêdivî bi vegotina nivîskêr jî tune ye. Bi vî awayî, em dikarin bibêjin ku qerekerê vebêjeriyê di tevahiya bûyerên berhemekê de heye. Rêlibergirtin an jî qutkirina vê pêvajoya vegotina bûyeran ku xwe bi xwe pêk tê, rêyê li ber avakirina berhemekê têkûz jî digire.

Em mînakê bidin:

Di çîroka xwe ya bi navê «şeva spî» (*Kakil*, weşanxaneya Sî, 2002) de, çîroknivîsê kurd Dîlawer Zeraq, behsa Muxliso dike ku di bin berfa spî de bi paqijkirina camên erebeyan nanê xwe derdixe. Nivîskar, ji bo vegotina çîroka xwe, dema nuha bi kar tîne, lê balkêş e ku ji bo şayesên mîna «*Berfê zêde kiriye û êdî canê wî li ber tevzîne ye*», dema niha û ya bihurî bi hev re bi kar tîne. Ev jî diyar dike ku hîlbijartina wextan bi awayekî rêk û pêk pêk nehatiye. Lê balkêşiya vê çîrokê ya ji bo mijara me, ne di vê taybetmendiya wê de ye. Di vê çîrokê de em Muxliso û serboriya wî ya ku di nava rastiya Kurdan re xwe dide der dibînin û bûyer heta deverekê, xwe bi xwe vedibêjin. Ji bo mijara me jî ya balkêş ew e ku nivîskar di deverê çîrokê de (r. 8) sînorên vegotina wêjeyî xirab dike û teva dem û kesayetiya xwe ve, dikeve nava dem û bûyerên çîrokê.

«Pişt re ka bêje ji ber çi ye, kurik gavek bi paş de davêje. Şewla projektorê ji şevê diteyise û li rûyê wî dixê; şanika ku li ser govika wî ya rastê ye, siyeke zirav û dirêj li ser dêma wî çêdike. Ez wî ji vê şanikê nas dikim.»

Heta nuha me «ez» nedîtibû. Êdî em dibînin ku kesekî nû ji nişka ve dikeve nava çîrokê. Ji ber ku heta dawiya çîrokê kesekî din xuya nabe, em fahm dikin ku ew «ez» nivîskar e û rasterast bi xwendevanê xwe re dipeyive, lewre ew weha bawer dike ku çîroka wî têra vegotina rewşê nake û ji ber wê xwe mecbûr hîs dike ku zelaltir bike.

Nivîskar weha dewam dike:

«Hûn jî wî nas dikin. Ew Muxliso ye. Ew parçeyek ji me ye; hemû encamên şer û pevçûnên hatî jiyîn xwe di rûyê wî de dane der. Wî êşên ku li ser navê me kişandine, li aliyê çepê ya lêva xwe ya jêrîn li hev civandine.»

Piştî van hevokên ku herka vegotinê didin rawestandî, nivîskar dîsa ji çîrokê bi dûr dikeve, bi gotineke din, belaya xwe ji bûyeran ve dike û dihêle ku bûyer xwe bi xwe vebêjin.

Di berhemên edebî de, ji ber vê taybetmendiya bûyeran, mirov nikare li gora kêfa xwe herka vegotinê rawestîne û tê de nirxandinên xwe yên şexsî bike. Di sedsala 19'an de nivîskaran ev yek dikir, lewre tecrûbeyeke xwendinê hê li civakê belav nebûbû. Ji ber wê ye ku, di *Mirovên Hejar (Les misérables)* de, gava ku Jean Valjen di girtîgehê de li ser rewşa xwe difikire, Victor Hugo bûyeran radiwestîne û bi xwendevanên xwe re dikeve nava munaqaşeyekê. Hugo di wî beşî de xwendevanan agahdar dike ku lehengekî romanê dikare xwe bi xwe jî bifikire û wan fêrî vê teknîka vegotinê dike. Hingê, em fahm dikin ku, di dema Victor Hugo de, vegotina wêjeyî hê xwe ava dike. Helwêsta ku Hugo di sedsala 19'an de wergirtibû û helwêsta hin nivîskarên kurd hê jî dişibe hev. Çanda xwendin û wejeyê çandêke giştî ye û Kurd jî bi zimanine din fêrî xwendinê bûne. Ji bilî rewşên awarte, Kurdê ku romanekê bixwîne, teqez bi zimanine din jî romanin xwendine. Ji ber wê, em dikarin bipejirînin ku çandêke wî ya xwendinê heye. Hingê, êdî pêdivî pê nîne ku em ji wî re bibêjin ku lehengek dikare xwe bi xwe jî bifikire, lewre wî ev yek di pirtûkine din de teqez dîtiye.

Di gellek berhemên me yên edebî de hin helwêstên nivîskaran yên şexsî di nava bûyerên berhemên wan de xwe didin der. Herçî helwêstên wan in, rast in û mafdar in, lê dive mirov ji bîr neke ku bûyerên berhemeke edebî di nava cîhana xwe de hene û rastî û nerastiya wan me têkildar

nake. Ji xwe, ew bûyer çendî «derew» bin jî, baweriyekê bi mirov re çêdikin, lewre ji ber “xwesepandina” wan, ew bûyerên ku têne vegotin bi me weke ku rast bin xuya dibin. Têvlêbûyina nivîskêr, dê herweha herka vegotinê qut bike û rengê çîrokê jî biguherîne. Bi vî awayî, ew peywendiya dîrokî ya di navbera xwendevên û wêjeyê de jî derban dixwe.

Ev kamiliya nivîskariyê ku me behsa wê dikir jî di vira de baştir xuya dibe. Wêjeyê fahm kiriye ku divê bi kêr were, fahm kiriye ku divê ziman bikemile, lê ji bo kamiliyên din, ji wêjeya kurdî re hê piçekî din jî heye. Heger em bibêjin ku «bîra giştî» çavkaniya wêjeya devkî ye û bi vî awayî dibe çavkaniya wêjeya nivîskî jî, divê em ji bîr nekin ku gava ku bîra giştî veguhêze ser «bîra şexsî» hingê dibe huner û wêjeya ku bi wateya hemdem em jê fahm dikin. Bîra Kurdan ya giştî bi goristanan ve hatiye dagirtin, lê bîra şexsî ya ku yekem berhema wê û herweha yekem romana wê «*Mem û Zîn*» bû, di dema me de, sê sed sal piştî Ahmedê Xanî, tiştekî zêde li xwe zêde nekiriye. Bi tenê hewldan hene ku nîşan didin bê mirov dikare çî bike.

Weke ku Sartre digot: «nîşandayin guhertin e».